



**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê EDEBIYATA KURDÎ**

**GEŞEDANA ZIMAN Ê WÊJEYA KURDÎ DI KOVARÊN REWŞEN,
JIYANA REWŞEN Ê REWŞEN-NAMEYÊ DE**

**Amadekar
Dilaver DÖĞER**

TEZA DOKTORAYÊ

**Şêwirmendê Tezê
Doç. Dr. Canser KARDAŞ**

Bîngol-2021

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê EDEBIYATA KURDÎ

GEŞEDANA ZIMAN Ê WÊJEYA KURDÎ DI KOVARÊN REWŞEN,
JIYANA REWŞEN Ê REWŞEN-NAMEYÊ DE

Amadekar
Dilaver DÖĞER

TEZA DOKTORAYÊ

Şêwirmendê Tezê
Doç. Dr. Canser KARDAŞ

Bîngol-2021

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

REWŞEN, JIYANA REWŞEN VE REWŞEN-NAME
DERGİLERİNDE KÜRT DİLİ VE EDEBİYATININ GELİŞİMİ

Hazırlayan
Dilaver DÖĞER

DOKTORA TEZİ

Tez Danışmanı
Doç. Dr. Canser KARDAŞ

Bingöl-2021

NAVEROK

NAVEROK	III
BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ.....	VI
KURTE	VII
ÖZET.....	IX
ABSTRACT	X
PÊŞGOTIN	XI
KURTKIRIN	XIII
DESPÊK	1
BEŞA YEKEM	7
ŞÊWEYÊKÎ SERDESTİYÊ: MÊTINGERÎ	7
1.1 Pênase û Naveroka Mêtingerîyê	7
1.2 Guherîna Mêtingeriya Kevnereng û Peydebûna Mêtingeriya Rengmodern.....	8
1.3 Neteweyên Bîçûk û Mêtingeriya Navsînori	9
1.4 Pêkanînên Mêtingeriya Rengmodern	12
1.4.1 Yekzimanî	14
1.4.2 Yekdestkirina Agahiyê.....	16
1.4.3 Yekçandî.....	18
1.4.4 Dîkekirin.....	20
1.4.5 Yekzanavî	23
1.4.6 Asîmîlasyon.....	24
1.5 Encamên Mêtingeriyê.....	28
1.5.1 Nebanbûn	28
1.5.2 Durehî.....	34
1.5.3 Cewêlekî.....	39
BEŞA DUYEM	44
WEKÎ WARÊ HEBÛNÊ: ZIMANÊ KURDÎ.....	44

2.1 Binavkirin	44
2.2 Wekî Şûngeha Hebûna Zimanî û Perwerdehiyê: Medrese	46
2.3 Kurdîya Kurmancî di Ş'irên Klasîk de	50
2.4 Rewş û Statuya Zimanê Kurdî ya ji sedsala 19an heta sedsala 20an û Hin Weşanên Derçûyî.....	65
BEŞA SÊYEM	76
WEKÎ BIWARA DERBIRANÊ: WÊJEYA KURMANCÎ	76
3.1 Wêjeya Kurmancî ya Klasîk.....	76
BEŞA DER-BIWAR (I)	83
Modernbûna Kurdan û Çalakgeriya Modern ya Bîreweriya Kurd(an).....	83
3.2 Wêjeya Kurmancî ya Modern.....	89
3.2.1 Qonaxa Ajdanê: Rojî Kurd û Jîn	89
3.2.2 Qonaxa Pêkhatinê: Hawar	95
3.2.3 Qonaxa Şikestî: Tîrêj.....	98
BEŞA DER-BIWAR (II).....	101
Avakirina Zanava Tirk û Pêkanînen Asîmîlasyonîst yên Tirk(î)kirinê	101
BEŞA ÇAREM	111
KOVARÊN REWŞEN, JIYANA REWŞEN, REWŞEN-NAME.....	111
4.1 Rewşen.....	111
4.1.1 Ranêzikiya Zimanî di Rewşenê de	114
4.1.2 Ranêzikiya Zanava Neteweyî di Rewşenê de	117
4.1.3 Ranêzikî û Hewldana Fêrgehbûnê di Rewşenê de	120
4.1.4 Ranêzikiya Wêjeyî di Rewşenê de	123
4.1.5 Ranêzikiya Wergerê di Rewşenê de.....	126
4.1.6 Nav û Nasnava Nivîskarên Rewşenê	129
4.2 Jiyana Rewşen	130
4.2.1 Ranêzikiya Zimanî di Jiyana Rewşenê de.....	135
4.2.2 Ranêzikiya Wêjeyî di Jiyana Rewşenê de.....	138
4.2.2.1 Helbesta Kurmancî ya Modern di Jiyana Rewşenê de	141

4.2.2.2 Çîroka Kurmancî ya Modern di Jiyana Rewşenê de.....	147
4.2.3 Wekî Biwara Sêyem: Werger.....	154
4.2.3.1 Wekî Bizava Wergerê: Jiyana Rewşen.....	156
4.2.4 Nav û Nasnava Nivîskarên Jiyana Rewşenê	161
4.3 Rewşen-Name.....	163
4.3.1 Eger û Armanca Derçûna Rewşen-Nameyê.....	165
4.3.2 Ranêzikiya Wergerê di Rewşen-Nameyê de.....	168
4.3.3 Ranêzikiya Wêjeyî ya di Jiyana Rewşen-Nameyê de	170
4.2.4 Nav û Nasnava Nivîskarên Rewşen-Nameyê.....	176
ENCAM.....	177
ÇAVKANÎ:	182

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım *Rewşen, Jiyana Rewşen ve Rewşen-Name Dergilerinde Kürt Dili ve Edebiyatının Gelişimi* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

30 /09 / 2021

İmza

Dilaver DÖĞER

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dilaver DÖĞER tarafından hazırlanan **GEŞEDANA ZIMAN Û WÊJEYA KURDÎ**
DI KOVARÊN REWŞEN, J. REWŞEN Û REWŞEN-NAMEYÊ DE başlıklı bu çalışma,
23.09.2021 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [*oybirliği/oy çokluğuyla*]
başarılı / ~~başarısız~~ bulunarak jürimiz tarafından *Kürt Dili ve Edebiyatı* Anabilim
Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan	: Doç. Dr. Ayhan TEK	İmza:
Danışman	: Doç. Dr. Canser KARDAŞ	İmza:
Üye	: Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU	İmza:
Üye	: Dr. Öğr. Üyesi Hemin OMAR AHMAD	İmza:
Üye	: Dr. Öğr. Üyesi M. Emin PURÇAK	İmza:.....

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun
...../...../ 20..... tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul
edilmiştir.

Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA

Enstitü Müdürü

KURTE

Piştî ku di sala 1991ê de, qedexeya li ser zimanê Kurdî rabûn, di nav sînorê K.T.yê de, kovarên bi navê Rewşen, Jiyana Rewşen û Rewşen-Nameyê derçûn.

Kovarên navborî, bi nivîsarên ku weşandine, tevkariyeke mezin bo geşedana ziman û wêjeya Kurdî kirine. Di van kovaran de, bi taybetî di warê helbest û çîrokê de, ji alî teşe û naverokê ve guherîneke taybet pêk hatiye. Û helbest û çîrokên hatine weşandin, ji alî naverok û sosyo-polîtîkîya xwe ve, xwedî taybetîya dij-serdestî û dij-mêtingerîyê ne.

Çîrok û helbestên ku hatine weşandin, bêtî ku ji nirx û taybetîya xwe ya wêjeyîbûnê dûr bikevin, bi naveroka xwe ve, ketine nav hewldanekê da ku rewş û deravên wekî ‘bêzanavî’, ‘dîkebûn’, ‘durehî’, ‘lixwenebanî’ û ‘cewêlekî’ya zimanî ku wekî encama pêkanînên serdestî û qedexekirinan li wan qewimiye, ji navê rakin.

Em ê di vê xebata xwe ya lêkolînê û hûrgerînê de, hewlê bidin da ku bidin nîşan ka hewldana ku di biwara ziman û wêjeyê de li dar ketiye, bi çi awayî teşe girtiye û di ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî de geşedaneke bi çi rengûawayî pêk hatiye.

Peyvên Sereke: Ziman, Wêje, Rewşen, Jiyana Rewşen, Rewşen-Name

ÖZET

Kürtçeye uygulanan yasakların 1991 yılında kanunen sınırlı da olsa kaldırılmasıyla beraber, Türkiye Cumhuriyeti sınırları içerisinde yaşayan Kürtler, sırasıyla ve periyodik olarak Rewşen, Jiyana Rewşen ve Rewşen-Name dergilerini yayınlamışlardır.

Bu dergiler, yayınladıkları yazılarla Kürt dili ve edebiyatına önemli katkılarda bulunmuşlardır. Özellikle şiir ve öykü alanında, biçim ve içerik açısından önemli değişiklikler gerçekleşmiştir. Yayımlanan şiir ve öyküler, içerik ve sosyo-politik özellikleri açısından, anti-iktidar ve anti-sömürgeci özelliğe sahiptirler.

Yayımlanan öykü ve şiirler, edebi değer ve özelliklerinden bir şey yitirmeden, o zamana kadar maruz kaldıkları dilsel kimlikten uzaklaşma, ötekilik sorunsallığı, melezlik, yabancılaşma ve madunlaşma gibi durumları işlemişlerdi.

Bu dergiler bu haliyle Kürt dili ve edebiyatının gelişmesine büyük katkı sunmuşlardır. Bu çalışmamızda, adı geçen dergilerde yazılan yazılar çerçevesinde, Kürt dili ve modern edebiyatının gelişimini inceleyip gelişim sürecinde oluşan biçimlenmeleri inceleyeceğiz.

Anahtar Kelimeler: Dil, Edebiyat, Rewşen, Jiyana Rewşen, Rewşen-Name

ABSTRACT

After the ban on Kurdish language was lifted in 1991, literary journals like Rewşen, Jiyana Rewşen and Rewşen-Name were published in Turkey.

The aforementioned literary journals made a great contribution to the development of Kurdish language and literature with the writings they published. In these journals, especially in the genres of poetry and short story, distinct changes happened in terms of literary form and content. And all these published poems and stories had characteristics of counter-hegemony and were anti-colonial in regards of their content and sociopolitic.

These published poems and stories, without losing their literary characteristics and value, struggled to rule out conditions like ‘disidentification’ ‘otherness’, ‘hybridity’, alienation and subalternity which were imposed on them as a result of oppressive and banning policies.

In this research study, we will try to show how these efforts took a shape in the field of literature and language and what kind of developments took place in Kurdish Kurmanci.

Keywords: Language, Literature, Rewşen, Jiyana Rewşen, Rewşen-Name

PÊŞGOTIN

Ziman, heke bi tenê wekî navgîna ragihandin û jihev famkirinê were qebûl kirin, dê ji gelek aliyên ve kêmasî bimîne di warê kartêka wî ya li ser mirovan û tevkariya wî ya bo teşegirtina jiyana mirovan. Loma jî, kartêka ku ziman li ser jiyana û li ser giyanê mirovan dike, bi mirovan re arîşeya hebûniyê jî çêdike. Arîşeya ketî behsê, ji ber pircureyîbûna zimanan e ku mirov gava hay ji vê pircureyîyê dibin, bi jêcihêbûna xwe dihisin û jê û şûnde êdî hebûniya mirovan li wan dibe gelemşe û êdî zimanê xwe û digel wê jî çanda xwe di ser vê arîşedariyê re li xwe qebûl dikin. Hest û xwazeke xwezayî bi wan re çêdibe bo xwedîtîlêkirina çand û zimanê xwe; û wekî refleks an jî hînbûyîneke hebûniyê, hewla parastina cihêtiya çand û zimanê xwe jî bi mirovan re dide der.

Helbet heke tu destkarî bo resenê û xwezayîbûna zimanê mirovan û pê re jî çanda wan neyê kirin, arîşe(dari)ya hebûniyê ku me xistiye behsê, bi awayekî erênî li dar e. Lê belê, gava li ser ramana netewesaziyê û bi armanca homojenkirin û yekrengiyê, destkarî li ziman û li reng û awayên çanda etnîk yê komên mirovan yê din tên kirin, ev yek bi xwe re arîşeya pêwendîya serdest(î)-bindest(î)yê jî diafirîne. Neteweya ku li ser komên etnîk an jî neteweyêke din serdestiya xwe datîne û pê re jî pêkanînen xwe yê yekrengiyê li dar dixîne, dibe sedema bindestbûn, pêşvenêçûn û şûndemayîna ziman û çanda neteweyên din. Navê pêkanînen ku em behs jê dikin; asîmîlasyon e ku pêkanînen yekrengkirinê, bi mirovên neteweyên bindest û marastî re, rewşên wekî ‘dûrketina ji zanava zimanî’, ‘dîkebûn’, ‘durehî’, ‘nebanbûn’ û ‘cewêlekî’yê çêdike ku her yek bi tena serê xwe bi arîşeya hebûniyê ve jî bestandî ye.

Wêje, wekî têgih û biwareke taybet, wekî wêjeya nivîskî û wêjeya devkî li hev dabeş dibe. Wêjeya devkî, wekî derfeteke zimanî ya derbirînê li ba hemû gelan bûye rê û mesîleke vegotinê; û wekî destpêk serê wê yî li wî alî ne diyar e û çavkaniyên wê digihîjin gelek sedem û biwaran. Bi taybetiya xwe ya dîrokîbûnê ve jî, kelepûr û paşxaneyêke hêjayî balpêdanê bo neteweyan ava dike. Herçî wêjeya nivîskî ye, ji ber ku li ser kaxiz û wekî deq û tekstekê tê dariştin, li ba hemû gel û komên etnîkî, pêwîstî bi zimanekî yekreng dibîne da ku kesên ku bixwînin bi heman awayî jê fam bikin. Digel wê jî, zimanê ku êdî nivîskî ye û li ser nivîskîbûna xwe, ‘jêcihêbûn’a xwe jî bi awayekî berbiçav dide der; êdî zimanê neteweyî ye jî; û pê re jî yek ji hêmana xurt û diyarker ya hebûniya neteweyî ye.

Kurdan, wekî komeke etnîk û neteweyekê, ji Îslamiyetê û şûnde, desthilatdariya xwe, ya ku dê bibe diyarker çarenûsa ziman û çand û aqûbeta neteweya wan, winda kiriye. Loma jî, ji danîna medreseyan û şûnde, zimanê wan, -û pêre jî çanda wan- ji ‘qada giştî’ dûr maye û bi taybetî piştî çarparçebûna ax û warê wan, çand û zimanê wan êdî ji keys û derfetan bêpar maye da ku karibe xwe derbire. Piştî avabûna wê, Kurdên ku di nav sînorê K.T.yê de dijîn, bi carekê re arîşeya hebûniyê li wan qewimiye ji ber ku hemû hêmanên çand û zimanê wan hem wek qanûnî hem jî wek qada giştî ya fermîbûnê, hatine qedexekirin. Digel ku pêwendîya serdest(î)-bindest(î)yê li dar bûye jî jiyanekê ku ji ziman û çand û zanaveke yekreng pêk tê li wan hatiye sependin; û rastî çerx û diranokên asîmîlasyonê hatine. Wekî encama van sependin û pêkanînên asîmîlasyonîst, arîşe û gelemşeyên; 1) zanava (identity) zimanî û neteweyî, 2) dike(bûn) (other), 3) nebanbûn (alienation), 4) durehî (hybrid), 5) cewêlekî (subaltern) ya zimanî bi takekesên Kurd re dide der.

Xebata li ber destan, di ser wan her pênc (5) têgihan re, li rewş û derava Kurdên ku di nav sînorê K.T.yê de dijîn, hûr dibe û di çarçoveya dij-serdest(î)yê de, li ser naverok û kartêka sê kovarên bi navê Rewşen, Jiyana Rewşen û Rewşen-Nameyê, disekine û li ser rengûawayê geşedana ziman û wêjeya Kurdî ya modern ya di van kovaran de hûrgeriyê dike.

Di demajoya vê xebatê de, şewirmendê min Doç. Dr. Canser Kardaş bi dîtîna û pêşniyazên xwe ve aso li min firehtir kir û wan kir ku ez karibim vê xebata hanê bibim serî; spasiya xwe bo hemûyan dibêjim.

Dilaver DÖĞER

KURTKIRIN

NÇM: Navenda Çanda Mezopotamyayê

B. Z.: Berî Zayînê

D. S. Ş. H.: Dibistanên Seretayî yên Şevînî yên Herêmî

P.G.K.: Partiya Gel ya Komarê

F.G.C.: Firqeya Gel ya Cumhuriyetê

O. T.: Ocaxa Tirk

S.D.T.: Saziya Dîroka Tirk

S.Z.T.: Saziya Zimanê Tirk

P. Z.: Piştî Zayînê

B. Î.: Berî Îslamiyetê

P. Î.: Piştî Îslamiyetê

C. H.: Cemiyeta Hêvî

C.T.T.K.: Cemîyeta Teavûn û Terakkî ya Kurd

D. O.: Dewleta Osmanî

Î. O.: Împaratoriya Osmanî

K. T.: Komara Tirkiyeyê

Amd.: Amadekar

F.G.C.: Firqeya Gel ya Cumhuriyetê

M.M.M.T.: Meclîsa Mezin ya Miletê Tirk

D.O.: Dewleta Osmanî

K. T.: Komara Tirkiyeyê

D. T.: Dewleta Tirk

Çev.: Çeviri

Wer.: Werger-Wergerandin

C.: Cild

DESTPÊK

Di destpêka teza xwe de em ê pêşî di heqê mijara tezê, armanca tezê, sînorên tezê, arîşeyên tezê, rêbazên tezê, jêderên sereke yên tezê û plana tezê de agahiyan bidin. Piştî van agahiyan em ê bi rengekî kurt behsa çarçoveya têgihî ya teza xwe bikin. Di binê vê sernavê de em ê di heqê hin têgihên girîng de, ku mijara teza me li derdora wan digere, agahiyên termînolojîk û teorîk bidin. Ev têgih; zanav, dîke, durehî, nebanbûn, cewêlekî ne.

Mijara Tezê

Mijara teza me; geşedana ziman û wêjeya Kurdî di kovarên Rewşen, Jiyana Rewşen, Rewşen-Nameyê de, li ser danîna rastê ya rewşa zimanê Kurdî ye ku li Tirkiyeyê piştî salên 1923yê di her warê jiyanê de hatiye qedexekirin. Digel vê yekê jî, mijara teza me, di ast nivîskî de, serê pêşîn berê xwe dide wêjeya klasîk ya bi Kurmancî ku di warê wêjeya nivîskî de ji bo wêjeya moderna ya bi Kurmancî bûye kan û bingeh. Digel vê yekê jî, di warê têgihî de, li ser pêwendîya ziman ya bi têgihên zanav, dîke, durehî, nebanbûn û cewêlekî hûr dibe.

Tevî ku zanav têgiheke nû ye jî, ji ber ku di xwezaya mirovan de wekî pênasebûneke taybet hatiye zanîn, di serdemên pêşîyê de, berî ku neteweyên modern yên ji sîstema kapîtalîst ava bibin, wekî têkilîyên desthilatî û serdestî û bindestî, di ser çand û ziman û car caran jî di ser bîrûbawerîyên dînî re, mirov û komên etnîk, di ser van taybetîyên xwe re hatine pênasekirin û wê hingê ev pênasekirin bûye zanava wan û pê hatine nasîn.

Digel vê yekê jî, pêwendîyên serdestî û bindestîyê yên di navbera komên etnîkî de heyî, bêtir ku bê pênasekirin, di warên sosyolojîk, aborî û dînî de rewşeke dîkeyî bi pêş de aniye. Her çend ev rewşa dîkeyî wekî têgihekê nehatibe pênasekirin jî di ser jêbûnên (aîdîyetên) etnîkî, dînî, çandî, zimanî û hindê caran jî di ser aîdîyetên terîtoryayî re, mirovên bindest wekî dîke hatine dîtin û pêwendî bi wan re hatiye danîn. Serdestîya ku di van waran de li dar ketiye, bi xwe re di biwara nivîskî de jî pergalek çêkiriye. Ev pergal; di ser zimanê komên etnîkî an jî di ser qebûlî û qayîlîya bi rezadilî ya bîrûbawerîya dînî re pêk hatiye. Vê pêqayîlîya hanê, bi xwe re rewşa duzimanîya bi dil û pê re jî durehîya asofireh ava kiriye.

Bi avabûna neteweyên modernên li ser sîstema serdestîya kapîtalîst, serdestîya ku di rengê mêtîngerîyê de dirûv daye xwe, ji bo berdewamkirina desthilat û pîlansazîya xwe ya di warên ramanî û îdeolojîk de, qayîlîya ku di dem û serdemên berê de hebûne şikandiye û awayê zortêdan, kotekîkirin û lêferzîkirinê ji xwe re kiriye rê û rêbaz. Vê rê û rêbazê û pêkanînên pergala serdestîya mêtînger, ji serî de kiriye ku hem dîketî di asta neteweyî de pêk bê hem jî kiriye ku duzimanî û durehîya bi şeweyê pêqayîlî ava bûyî, bişikê û nebanbûna li taybetîyên xwe yê etnîkî li mirovan biqewime. Navê vê qewimandinê asîmîlasyon e ku yek ji pêkanîna sereke ya serdestîya mêtînger e. Her wiha, cewêlekî wekî regekî encamî ya van pêkanînên serdestîya mêtînger wekî qonaxa dawî li mirovên bindest diqewime ku di xwe de hemû encamên têgihên dîtir, zanav, dîketî, durehî û nebanbûnê dihevin.

Girîngiya Tezê

Zanava Kurdî, ji serdemên klasîk bi vir de ye, hem wekî ziman hem wekî çanda etnîkî hem wekî bîrûbawerîyên dînî û hem jî di qada nivîsê de wekî gelekî etnîk ya xwedî wêjeyeke nivîskî hatiye zanîn û qebûlkirin. Wêjeya nivîskî ya Kurdî ya klasîk, pareke pir zêde, li ser zaravaya Kurdî ya Kurmancî ava bûye û geşe daye xwe. Girîngiya vê xebatê ew e ku em hewlê didin da ku nîşan bidin û pê re jî biçespînin, zimanê Kurdî û bi taybetî jî zaravaya Kurmancî; wekî zimanê komeke etnîkî û pê re jî wekî zimanê neteweyekê, ji mêj ve ye di warê pêaxaftin û pênivîsînê de li dar e û wêjeya wê her geşe bi xwe daye.

Armanca Tezê

Teza me serê pêşîn li xwe dike armanc da ku bide nîşan û biçespîne; di dem û qonaxên berê yê klasîk de, berî ku sîstema netewesazîya kapîtalîst û mêtînger li dar bikeve, zimanê Kurdî û bi taybetî zaravaya Kurmancî, wekî zimanê komeke etnîkî, di hemdê xwe de, li ser nîrx û mîrateyên çandî, folklorî û bîrûbawerîyî wêjeyeke xwe ya nivîskî ya klasîk ava kiriye. Di vê avabûnê de, bêtir ku dîrketinek ji taybetîyên zimanê gel yê pêaxaftinê pêk were, kes û nivîskarên Kurd bi regekî pêqayîlî zimanên dîtir hîn bûne, ew ji bo xurtîtkirina derbirana xwe ya wêjeyî bi kar anîne û pê re jî teqlên girîng yê nivîskî dane ziman û wêjeya Kurdî ya bi Kurmancî.

Û digel vê yekê, teza me, di hîm û esasa xwe de, li xwe dike armanc ku dayne rastê û biçespîne ku çi gava sîstema serdestîya mêtînger û pêkanînên wê yê ku li ser têgiha asîmîlasyonê saz in, li ser neteweya Kurd tê meşandin, wê hingê di ruh û hiş û bîr

û awayê famkirina jiyane ya kes û mirovên Kurd de guherîn çêdibin. Ev guherîn, guherînen ne asayî ne û ji ber ku rê û rêbaza danqebûlkirineke kotekî û zordarî tê meşandin û serdestiya ziman û çandeke dîtir lê tê ferzkirin, ji alîyekî ve jî travmatîk e; ev reng travmatîkî, ji ber derba bêhemdxwarî ye ku bi taybetî birînen nekew û şopên kûr di hiş, bîr, dil û têgihana mirovan de dihêle. Ev şopên kûr, serê pêşîn xwe wekî xwenansînê di warê zanavê de, pê re bi pêşdeçûna pêwendîyên bi serdestê xwe re di warê dîketîyê de, dûre di warê hînbûn û hînkirina zimanekî biyan ya bi kotekî û zortêdayînê di warê durehîya neyînî de, paşê li ser zaltî û serwerîya zimanê ku pê asîmîle bûye di warê lixwe nebanbûnê de û axir wekî encama tevdeya pêkanîna serdestiya mêtînger ya kapîtalîst di warê cewêlekîyê de xuyanî dibin.

Teza me di vekolîn û hûngerîya xwe de, li xwe dike armanc da ku nîşan bide ka Kurd, piştî ku rastî serdestiya mêtînger ya asîmîlasyonîst hatine, ji bo parastina zanav, ziman û xwebûna xwe, hewlên bi çî rengî dane. Bi taybetî bala xwe dibe ser piştî salên 1990î, ku pêkanînen asîmîlasyonîst sistîyeke ne hêja daye xwe û lêkolanê li serê dike û hewlê dide ku dayne rastê ka Kurdiya Kurmancî di sê kovarên bi navê Rewşê, Jiyana Rewşen, Rewşen-Nameyê de bi kîjan hewldan û xebat û pêkanînen zimanî û wêjeyî geşê bi xwe daye.

Sînore Tezê

Xebatên li ser ziman xwedî dorhêl û sînore berfireh in. Hema bêje her ziman, zaravayên xwe hene û bi giştî wêjeya gelek zimanan li ser zaravayekê, tew hin caran jî li ser devoka zaravayekê, ava bûye. Kurdî jî çar zaravayên xwe yên hîmî û esasî hene. Lê belê hem ji ber ku wêjeya Kurdî ya klasîk wekî bîngeh bi zaravaya Kurmancî ava bûye hem jî kovarên ku çavkanî û xwespêrên me ne û bûne warê lêkolîn û hûngerîya vê xebatê, bi tevayî li ser vê zaravayê ne, me vê di xebata xwe ya lêkolînî, hûngerî, dahûrandînî û çespendînî de, sînore xwe yî zimanî di dorhêla Kurmancî de hişt û hem wekî zarava em li ser man hem jî wekî wêje lêkolana xwe li serê kir.

Arîşeyên Tezê

Ji ber ku qad û biwara vê xebata me ya lêkolînî û hûngerîyê li ser berhem û pirtûkên çapkirî ne û di warê ziman de jî me xwe li dîroka dûr ya ziman neqewimandiye, arîşeyên ku em ê nikaribin di lêkolîn û hûngerîya xwe de kûr û dûr biçin, derneketin pêşberî me. Lê belê, ji ber ku di dema weşandin û belavkirina kovarên Rewşen û Jiyana Rewşenê de, gelek caran berhevkirin û danîna hikmê qedexekirinê ya

li ser van kovaran pêk hatiye, wekî fizîkî bidestxistina hejmarên kovaran çetînî derxist pêşberî me û di pêdeçûna xebatê de xwe wekî arîşeya sereke da der.

Rêbaza Tezê

Rêbaza sereke ya tez û xebata me, vekolîn û hûrgeriya li ser lîteratura heyî û berhemên çapkirî ne ku ji tezê re bûne çavkanî. Di vî warî de, me serê pêşîn, di warê ziman de, li ser berhemên klasîk lêkolînek pêk aniye ku ev berhem bi taybetî di warê zanav û durehiya zimanî de wekî çavkaniyên sereke li pêş me ne. Pê re jî, tevî ku me hin taybetiyên herêmî yên zimanê berhemên klasîk dîyar kirine û wekî taybetiyeke hevpar çespendine jî, me bi rêbazeke danberhevî, zimanê Kurdiya Kurmancî ya berhemên klasîk bi Kurmanciya îroyîn re daye ber hev û hewl daye ku nîşan bidin û daynin rastê ka guherînên çawa pêk hatine.

Her wiha, di warê têgihên tez û xebata xwe de jî, dîsa li ser lîteratura heyî û berhemên çapkirî, me di warê zimanî de rêbazek daye ber xwe da ku nîşan bidin, gelo hînbûna zimanê duyem, sêyem ya bi pêqayîlî durehiyeke zimanî ya çawa çêdike û gelo ev durehiya zimanî encamên erênî bi xwe re tîne an jî neyînî û ev encam bandoreke çawa li ser zanava neteweyî datînin. Pê re jî me hûr kolaye ka di serdestiya mêtînger de, piştî hînbûna zimanekî duyem ya bi zortêkirinê, encamên çawa derdikevin rastê û dîsa me bi rêbaza danberhevê, ev her du encam, -encama serdema wêjeya klasîk û encama serdema wêjeya modern-, dane ber hev û pê re jî her du qonaxên wêjeya nivîskî ya bi Kurdiya Kurmancî hevrû kiriye.

Çavkaniyên Sereke yên Tezê

Di teza xwe de me xwe spart gelek çavkaniyan û ew bi kêrî xwe anîn. Ji bo çarçoveya teorîk ya vekolînê, me xebatên ku di biwarên antropolojî, etnolojî, felsefî, siyasî, psîkanalîz, civaknasî, lêkolînên li ser zimanzanî û wêjeyê de hatine kirin û weşanên ku her yek bûne parçeyekî lîteratura Kurdiya Kurmancî, bi kêrî xwe anî. Di biwara antropolojî û etnolojiyê de me berhemên wekî; Jan Assmann (2018) *Kültürel Bellek*, C. Lévi Strauss (1997) *Irk, Tarih ve Kültür*, ji bo warê zanava etnîkî û neteweyî me xebata Anthony D. Smith ya bi navê *Ulusların Etnik Kökeni* û Umut Özkırımlı (1999) *Milliyetçilik Kuramları: Eleştirel Bir Bakış*, wekî jêdereke referansê hîlbijart. Di warê felsefeyê de me berhemên wekî Martin Heidegger (2018) *Varlık ve Zaman*, Karl Marx (2007) *Yabancılaşma: 1844 El Yazmaları* li xwe kir çavkanî. Di warê siyasî de me bermehên wekî Minoo Alinia (2007) *Diaspora Mekanları-Kürt kimlikleri-Öteki olma*

deneyimleri ve aidiyet politikaları û Albert Memmi (1996) *Sömürge ve Sömürgeleştirilen İnsan* wekî referans hilda. Di warê psîkanalîzê de jî berhema Jacques Lacan (2013) *Psikanalizin Dört Temel Kavramı* û di biwara civaknasiyê de berhemên wekî Peter Wagner (2005) *Modernliğin Sosyolojisi; Özgürlük ve Cezalandırma* û Anthony Giddens (2000) *Sosyoloji* bûn yek ji wan çavkanîyên ku me serî lê daye. Di biwara zimanzanîyê de berhema D. N., Mackenzie, (1981) *Kurdish dialect studies* û Brian Weinstein (1979) *“Language Strategists: Redefining Political Frontiers on the Basis of Linguistic Choices”* li me bûn referans û di warê wêjeyê de jî me berhemên wekî Abdurrahman Adak (2019) *Teşeyên Nezmê di edebiyata kurdî ya klasîk de* û Walter G. Andrews (2017) *Şiirin Sesi, Toplumun Şarkısı* li xebata xwe kir çavkanî.

Plana Tezê

Ev tez ji destpêk, ji sê beşan, ji du beşên derbiwar, ji encamê pêk hatiye. Di destpêkê de bi tevî mijar, armanc, girîngî, sînor, arîşe, rêbaz, jêderên sereke û plana tezê, ji bo çarçoveya teorîk ya tezê, li ser têgihên zanav, dîke, durehî, nebanî, cewêlekî gengeşeyeke literatûrê û termînolojîk hatiye kirin.

Di beşa yekem de, wekî dem, li ser serdema nivîskariya Kurdiya Kurmancî ya klasîk hatiye sekinandin, hûrgerî li ser zimanê berhemên klasîk hatiye kirin û digel wê jî lêkolîna li ser dirûvgirtin û reng û awayê ziman hatiye kirin û danberheviyeke taybet li ser zimanê berhemên klasîk û zimanê berhemên modern hatiye kirin.

Di beşa duyem de, wekî qonaxa nivîskî, li ser berhemên klasîk û modern ya wêjeya Kurdî ya bi Kurmancî lêkolîn hatiye kirin. Di warê naverok, teşe, şêwaza nivîsînê de hatine dahûrandin û danberheviyek di navbera rengûawayê geşedana wêjeya klasîk ya Kurdiya Kurmancî û wêjeya modern Kurdiya Kurmancî de hatiye kirin. Digel wê jî, ji alî taybetiyên zimanî û wêjeyî ve guherîn û ji alî rengûawayên zanavî, dîketî, durehî, nebanî û cewêlekîyê ve çespandin û tespît hatine kirin.

Di beşa sêyem de, di hemû hejmarên kovarên Rewşen, Jiyana Rewşen, Rewşen-Nameyê de, li ser ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî ya modern, hûrgerî û lêkolîn hatine kirin û di kontekst û çarçoveya têgihên zanav, dîketî, durehî, lixwenebanbûn û cewêlekîyê de çespandin hatine kirin û rengûawayê geşedana ziman û wêjeya bi Kurdiya Kurmancî li rastê hatiye danîn.

Di beşên derbiwar de, li ser agahîyên ku hem ji bo armanca tezê bivênevê ne hem jî alîkar in ji bo naveroka tezê, hatiye sekinandin û agahîyên di van beşan de hatine

dayîn, hem ji bo çarçoveya teorîk ve hem jî ji bo nirxandin û dahûrandina mebest û naveroka tezê bûne palder.

Di encamê de, li gorî lêkolîn û hûgeriyên ku me kirine, di kontekst û çarçoveya zanav, zanav, dîketî, durehî, lixwenebanbûn û cewêlekiyê de, me dahûran û nirxandinên çespanandinî kirine û bandora serdestiya mêtînger ya li ser polîtîkayên asîmîlasyonîst avabûyî ya li ser ziman û wêjeyan destnîşan kiriye û hizirên xwe yên angaşî danîne rastê.

Çarçoveya Têgihî Ya Tezê

Çarçoveya têgihî ya teza me, li ser konteksta serdestiya mêtînger û bindestiya ku bi taybetî di biwarên ziman û wêjeyê de ji mafê xwe yên xwederbiranê bêpar maye, ava dibe. Di vê deqband û çarçoveyê de jî, wekî encama pêkanînan serdestiya mêtînger, li ser têgihên *zanava neteweyî*; ku arîşeya nimandina hebûnîyê, *dîketî*; ku arîşeya nimandinê, *durehî*; ku arîşeya xwederbiranê, *nebanî*; ku arîşeya jêbûnê, *cewêlekî*; ku arîşeya derbûna ji jiyanê bi mirovê bindest re çêdike, hûgerî û dahûrîn tê kirin. Naverok, pêdeçûn, çespan û encamên ku di tezê de tên danîn û destnîşankirin, di deqbenda serdest-bindestiyê de û li ser têgihên diyarkirî tên dahûrandin.

BEŞA YEKEM

ŞÊWEYÊKÎ SERDESTIYÊ: MÊTINGERÎ

1.1 Pênase û Naveroka Mêtingerîyê

Mêtingerî, hem wekî têgih hem jî bi naveroka xwe ve, berê mirov dide pratîk û pêkanînên ku hatine kirin. Têgiha mêtingeriyê, ji alî gelek ramanweran ve tê pênasekirin. Her yek bi awayekî din û ji awirekî dîtir ve bala xwe dibe ser sedem û pêkanînên wê. Li gorî Rupert Emerson, “Mêtingerî, ew serdestî ye ku neteweyeke bihêz zalbûna xwe li ser neteweyeke bêhêz dimeşîne” (1965: 6). Serê pêşîn ev pênaseya Emerson, berê me dide zaltiyê; zaltiya ku di navbera du gelan de dikeve behsê û dibe serdestî. Digel vê yekê, ev pênase pirsên xwe jî tîne bi xwe re. Gelo zaltiya ku ji alî neteweyekê ve, wekî yekalî, tê meşandin, xwe dispêre kîjan hêzê? Gelo ev hêz, ji destpêkî ve hêzeke hiqûqî ye an jî leşkerî ye? Heke em bixwazin biçin sedemên destpêka pêkanîna vê zaltiyê em ê guh bidin Marc Ferroyê dîrokzan ku dibêje, “Mêtingerî, dagirkirina axa gelekî din, ajotin û berhilanîna ji wê axê û bicîkirina koçber û cîhêliyan ya li ser wê axê dihevine û ji ber vê şîroveyê, dîroka bikaranîna vê têgihê diçe heta bi Yewnanên kevn jî” (2002: 19). Pênaseya Ferro bi me dide zanîn ku serê pêşîn dagirkirin û zeftkirina axekê heye. Nexwe, me divê em pêşî bala xwe bidin pênaseya têgiha dagirkirinê. Di ferhenga Tirkî de, dagirkirin, wekî “Bidestxistina ciyekî” (Püsküllüoğlu, 2012: 492) tê pênasekirin. Li gorî Zana Farqînî, dagirkirin, “Bidestxistina ciyekî bi rêya şer” (2004: 422) tê pênasekirin. Bozarslan jî dagirkirinê wekî, “Girtina welatek, herêmek an ji ciheki di bî zora çek û dayina dest lî ser wî welatî” (Bozarslan, 2011: 569)¹ pênase dike. Her wiha, ferhenga Salah Saadallah ya Îngilîzî-Kurdî jî peyvê wiha pênase dike, “Occupy; dagîr kirin” (2000: 773). Li hêleke din, Loomba dibêje, “Têgiha kolonyalîzmê (yanî mêtingerî), ji peyva *colonia* tê ku tê wateya; jîngeheke nû ya li welatekî...komên mirovan ku girêdana xwe ji warê bav û kalan nabirin û têkiliyên xwe yên pê re diparêzin lê di herêmeke nû de cîwar dibin” (Loomba, 2000: 18, 19).

¹ Di jêgirtina ji vê çavkaniyê de me dest neda rastnivîsa orîjînal ya berhemê.

Gava em ji van pênaseyanê bidin rê, em ê karibin bêjin, dagirkirin, wekî pêkanîn di xwe de zordariyekê dihevine û ev zordarî jî serê pêşîn bi hêz û qeweta leşkerî, yanî pêkanîna tundî û şideteke çekdariyê, dihevine. Loma jî, gava em bala xwe didin serdema berîya danîn û sazkirina dewletên modern yên neteweyî ku ew dem, dem û çaxa împaratoriyan destpêkî ye, em dibînin ku zeftkirin û vegirtina (fethkirina) axê armanca herî pêşîn û sereke ye. Ferro di warê vegirtina axê de dibêje, “...kevneşopa Ereban, seferên Xaçperestan û vegirkerî (fethkerî) û lêbelavkerî (expansionism) ya Ewropîyan wekî yekem derbirana emperyalîzmê ye” (2002; 24). Heke em ji vî awirî ve berê xwe bidin pênaseyê, em ê karibin bêjin, serdestiya ku em behsê jê dikin, ji mêj ve, di dem û çaxa împaratoriyan de hebûye û bi dagirkirin û vegirtina axa gelekî, an jî bi dagirkirina axa împaratoriyeke dîtir li dar bûye. Xuya ye ku; çendî ku berîya serdema modernîzmê, ji alî vegirtina axê ve, mêtîngerî hebûye jî, wek têgiheke berfireh û têr naverok nehatiye pênasekirin û ev pênase maye piştî hilweşîna serdestiyên împaratoriyan destpêkî. Heke em bala xwe bidin jimêjvetiya wê, em ê karibin ji bo vî cureyê mêtîngeriyê bêjin, mêtîngerîya kevnereng ku piştî serdema modern û kapîtalîzmê guheriyê û regekî dîtir daye xwe.

1.2 Guherîna Mêtîngerîya Kevnereng û Peydebûna Mêtîngerîya Rengmodern

Mêtîngerîya kevnereng an jî mêtîngerîya berî kapîtalîzmê, bi awayekî aşkera û berbiçav, li ser zeftkirin û vegirtina axekê hûr û kûr dibe. Ji ber hindê jî, piştî zeftkirinê, mêtîngerîya kevnereng, ji ber ku “...demajo aşkera ye û bi hêsanî tê çavdêrîkirin, em dikarin bêjin, hêza mêtîngerîya kevnereng ya zaltiyê pir ne xurt e” (Îplikçi, 2017; 1528) û loma jî nikare paldereke xurt ji bo zeftkirin û vegirtina xwe peyde bike û ji alî meşrûbûn û xwemeşrûkirinê ve qels e.

Di vê çarçoveyê de, em dikarin bêjin; ‘ji ber ku hêza mêtîngerîya kevnereng ne xurt e’, di demajoya dîrokî de jî dê nikaribe bibe xwedî rengûawayekî kudbar (dombar). Loma jî, piştî derketin û danîna sîstema kapîtalîzmê, reng û awayê mêtîngerîya kevnereng guheriyê. Sîstema aborî-civakî ya kapîtalîzmê ji gelek aliyan ve kartêka xwe li jîyan û danûstandinên her cureyî ya jîyanê kiriye. Lê belê, kapîtalîzmê, bi berfirehbûna xwe ve, “...sîstema feodal ji navê rakiriyê û du aliyên dîtir yên hêzê saz kiriye. Ew hêz; sîstema dewleta modern û aboriya kapîtalîst ya cîhanê ye” (Îplikçi, 2017; 1530). Loma jî aliyekî kapîtalîzmê heye ku dibe bingeha mêtîngerîya

rengmodern. Ev bingeh hem ji hêla aborî, hem ji hêla civakî hem jî ji hêla newekheviyên civakî ve li dar e. Digel vê yekê, ramana marksîst jî, cihêtiyeke balkêş datîne navbera mêtîngeriya kevnereng û mêtîngeriya rengmodern û dibêje, “Tevî ku mêtîngeriya berê di serdema pêşkapîtalîzm de hene jî, mêtîngeriya rengmodern, li Ewropayê bûye hevalbenda avakirina kapîtalîzmê” (Bottomore, 1983; 81).

Gava em bala xwe dibin ser sedem û mercên danîn û avakirina sîstema kapîtalîzmê, em dibînin ku kapîtalîzm hewceyî nakokîyan e û bi awayekî bivênevê jî bi newekheviyan didebire. Ji ber ku mêtîngeriya di serdema împaratoriyan de heyî, ne li ser berjewendiyên aboriyê lê belê li ser berjewendiyên axê ye, bêtir li ser bacwergirtinê dimeşe û “di sîstema împaratorî de, civakên ku ne wekhev in, di nav hev de têkiliyên pir nêz û xurt datînin” (Îplikçi, 2017; 1531). Loma jî, newekhevî di nav civakên împaratorî de, ne gelemşeyeke diyarker e. Digel vê yekê jî, di serdema emperyalîya împaratoriyan de, kesê emperyal, -siltan, qral an jî împarator-, wekî berevanê berjewendiyan jî hatiye famkirin. Li ser vê famkirinê jî, hatiye gotin ku “...rêya herî baş ya famkirina ji mêtîngeriya ew e ku mirov wateya wê bi demajoyên dîrokî ve girê bide. Loma jî, mêtîngerî, bi awayekî ji awayan berî kapîtalîzmê jî hebûye û li dar bûye” (Loomba, 2000; 22). Heke em ji vê hizira Loomba bidin rê, em ê karibin bêjin, hemin ku wek, siltan, emperyal an jî împarator, armanc parastina berjewendiyan be, çendî ku sîstema aborî-civakî ne kapîtalîst be jî, ev armanc di xwe de parastina berjewendiyên aborî jî dihevine. Wekî ku Edmund Burke jî bal birîye serê û gotiye, “Rewşa ku di dema mêtîngeriya de hebûye piştî mêtîngeriya jî her hebûye û domandiye” (2008; 66). Loma jî, em dikarin bêjin, aşkera û diyar e ku mêtîngerî bi gelek cureyên pêkanînê xwe ve xwe heyî dike û di ser sîstema kapîtalîzmê re bêtir rengê mêtîngeriya modern dide xwe ku; ev encam jî berê me dide destpêka modernîzmê û avabûna netewe-dewletan.

1.3 Neteweyên Biçûk û Mêtîngeriya Navsînorî

Em ê serê pêşîn bixwazin têgiha ‘mêtîngeriya navsînorî’ rave û şîrove bikin da ku karibin dîtîna û raman û angaştên xwe yên li ser vê hîmê ku em ê bi pêş de derpêş bikin, xweşikî bidin zanîn. Ji bo vê yekê jî em ê berê xwe bidin Miroslav Hroch ku dibêje “...neteweyên modern li ser du hîmên esasî derketin” (2011; 30). Piştî wê jî têgihên ‘neteweyên mezin (serdest)’ û ‘neteweyên biçûk’ diafirîne. Hroch, bêtir ku gotinê bi vir de û wir de bike, rasterast li ser pênaseya xwe dimîne û wiha didomîne,

“Du model hene. Modela yekem neteweyên mezin (serdest) in. Em dikarin Fransa, Îngilistan, Almanya û yên din bo mînakê bêjin. Modela duyem jî neteweyên biçûk in. Em dikarin neteweyên wekî Îrlandî, Bask, Breton, Çek û Hirwat wekî mînak bêjin” (Hroch, 2011; 30-31). Gava em bala xwe dibin van her sê neteweyên mezin ku Hroch bi taybetî ew dane pêş, em dibînin ku ev her sê neteweyên ji beşa mezin, gelek taybetiyan di xwe de dihevin. Ji van taybetiyan sê taybetî gelek berbiçav in; ax, ziman û xwe-rêveberiya van her sê neteweyan, di ger û pêdeçûna dîrokî de, kêr zêde, bi navê neteweya wan hatiye zanîn û bilêvkin.²

Ji hêla din ve, diyar e ku di serdema împaratoriyan de, gelek netewe an jî komên etnîk hebûn ku di nav împaratoriyan de mabûn û ji ber çewisandina rêveberiya împaratorî, wek neteweyên mezin derneketin rasta dewletên dinyayê ku piştî “Modela netewe-dewlet bi Şoreşa Fransayê derket mexderê (...) neteweyên wekî Kurd, Bask û Îrlandî mane wek neteweyên hindikanî” (Habermas, 2010: 121). Loma jî, ji bo neteweyên mezin, em dikarin berê xwe bidin Anthony Smith ku pêşî lêpirsînê li reh û jêderka komên etnîk dike û beşek ji komên etnîk ku li gorî pênaseya Hroch dikevin kategoriya ‘neteweyên mezin’, wekî neteweyên hebûna xwe peyitandî bi nav dike û dibêje,

“Ew yên ku zana van neketiye ber pirsyan, nehatine sirgûnkin, axa wan û çanda wan nehatiye çewisandin, pêwîstî pê nabînin ku li jêderka xwe bigerin. Ew ê tenê wisa ji jor de biqîrin. Neteweyên wekî Îngilîz û Fransîz jixwe bêtir ku mîl û bîranînên wan yên dîrokî hebin, xwedî zana van neteweyî ne” (2002; 22).

Heke em li ser peyta Smith bisekinin, em ê karibin bêjin, ji bo ku neteweyek karibe bibe neteweyeke mezin, divê aliyek û rengûawayekî xuya hebe ku karibe xwe bipeyitîne. Çi ye ew alî? Her wekî Miroslav Hroch di vî warî de jî bala me dibe serê û dibêje, “Di dîroka neteweyên mezin de, ‘çîneke sêyem’ li ber rêveberên feodal rabûye û xwe wekî nûnerê hemû neteweyê daxuyandiye. ya rast, ‘çîna sêyem’ nûneriya hemû hemwelatiyan di xwe de dihevine xwe pê re jî dike yek” (2011; 29). Nexwe em dikarin

² Çendî ku navê Îngilistanê heta demekê wekî Împaratoriya Brîtanyayê dihat zanîn jî diyar e ku ew jî beşek e ji etnisîteya ku wekî netewe îngilîz tê zanîn. Her wiha, dewleta Almanan navê Qraliya Prusya li xwe kiriye ku di navbera salên 1713-1867an de li dar bûye. (www.tr.m.wikipedia.org)

bêjin; neteweyên mezin, çendî ku bûne pêşengên modernîzm û derketina ramana netewe û neteweparêziyê jî, jixwe wan berî vê qonaxê, wekî netewe, hebûna xwe peyitandîye û ji ber ku zordarî û çewisandinên Smith çêkirî li wan neqewimiye, bi awayekî xwezayî jî pêşîya wan vekirî bûye da ku karibin bibin neteweyên mezin. Herçî neteweyên biçûk in, Hroch wan bi awayekî din jî pênase dike û dibêje,

“Gava em dibêjin neteweyên biçûk, em behsa wan gelên etnîk dikin ku bi demeke dirêj bûne bindestên neteweyeke serdest û ji ber vê yekê pêgirtîbûnek çêbûye di navbera her du aliyan de; û rengê vê pêgirtîbûnê (tabîiyet) ji bo her du aliyan jî dibe xwedî karaktereke bingehîn” (2011; 31).

Di vê pênaseyê de, aliyê esasî ev e; ji bo ku neteweyek têkeve nav kategoriya neteweyên biçûk, wekî helûmerceke sereke, divê demeke dirêj wekî bindest mabe -û dibe ku di roja îroyîn de ev bindestî bikude.- Û pêgirtîbûneke taybet jî wekî encama vê bindestiyê xwe li pênaseyê ferz dike. Nexwe em ji bo têgiha ‘pêgirtîbûnê’ dikarin bêjin, karaktera wan çî dibe bila bibe, çî serdest çî jî bindest, her du netewe di demajoya têkiliya serdest-bindest de, hev dinasin, hev dizanin, der heqê hev de dibin xwedî zanîn û agahiyên ezmûneyî, -helbet di nav van agahiyên de, pêşdaraziyên ku nehatine şikandin û yên ku digel ezmûneyîbûna xwe qet neguherîne jî hene.- ji hev hez dikin an jî hez nakin, hizirên hişk û nerm yên der heqê hev de çêdibin bi wan re û bivênevê di warê çandî û zimanî de jî têkiliyeke wan ya xurt çêdibe û bivênevê di hin waran de ji hev dixwin jî. Em dikarin bêjin gotina Hroch ya ku dibêje, ‘pêgirtîbûna wan ji bo her du aliyan jî dibe xwedî karaktereke bingehîn’ li ser vê danûstendîyê dimîne. M. Hroch, modela duyem ku neteweyên biçûk tê de dihevin, digel pênaseya jorîn bi kok û naverok dike û dibêje, neteweyên biçûk;

“Gava wekî neteweyên modern derdikevin mexderê, (a) çîneke wan ya serdest ku ji koma wan ya etnîk e, tune ye, loma jî ji alî komeke etnîk ya dîtir ve tîr birêvebirin û avaniya koma wan ya etnîk kêr e, (b) yekîtiyeke etnîk (pê re jî dîrokî) û siyasî saz nekirine, (c) kevneşopî û kelepûreke wan ya wêjeyî ya bi zimanê wan tune ye an jî di demekê de hebûye lê ji navê wînda bûye an jî çilviriye (dejenere bûye) û ji reseniya xwe dûr ketiye” (2011; 30).

Ev pênase berê me bi aliyê geşedana neteweyên biçûk ve dike ku ji demekê ve mane bindest -an jî hê jî bindest in- û piştî geşedaneke neteweyî bûne xwedî xwe-desthilat. Îcar ku em ji xwe bipirsin û bêjin, gelo vê rewşa neteweyên biçûk ji kîngê ve dest pê kir? Helbet em dikarin bêjin, jixwe ji ber ku di serdema împaratoriyan de, netewe û neteweparêziya ku bi wateya îroyîn û modern ku em fam dikin, tune bûye; destpêka serdema modern û derketina neteweyên mezin, kêr zêde, rastî heman demê tê. Loma jî, terîtoryaya neteweya biçûk, ya di nav terîtoryaya împaratoriye ya berfirehkirî û firehnîşankirî de mayî, piştî lidarketina modela netewe-dewletê jî dimînin di nav sînoran de û ji ber hindê jî, pêkanînen netewe-dewletên avabûyî jî di nav têgiha ‘mêtingeheke navsînori’ de bi keys dibe.

1.4 Pêkanînen Mêtîngeriya Rengmodern

Pêkanînen mêtîngeriye, ji gelek aliyan ve bandorê li ser gelê bindest dike ku serdestî li ser tê kirin an jî hatiye kirin. Ev bandor ku bi taybetî di serdema mêtîngeriya rengmodern de derdikeve rastê, bi awayekî giştî li ser çand, ziman û wêjeya gelê etnîk an jî neteweya bindest çêdibe. Di mêtîngeriya rengmodern de, gelê xwecih, yanî gelê bindest ku zaltî li ser ax û jiyana wî hatiye kirin û warê wî bûye mêtîngeh, ji gelek aliyan ve bi navendê ve, yanî bi navenda hêza ku mêtîngeriye pêk tîne ve tê girêdan. Ev girêdan ne bi dilxwazî ye û rengê pabendî û çavlidestî di xwe de dihevine ku ji aborî, zanîn û agahî, dad û hiqûq, ji perwerdehî heta bi teknolojiyê, bi gelek cureyan pêk tê.

Digel vê pabendî û çavlidestiyê, mêtîngerî bandora xwe bêtir di biwara derûniyê de li mirovê mêtîngehê dike. Ev bandor, serê pêşîn li ser mandelekirinê rûdinê ku Dominique Schnapper di vî warî de dibêje, “Mêtînger, gelê mêtîngehê wekî parçeyê esasî û kakilîn yê xerabiyê dibîne” (2005; 243). Peyteke bi vî rengî rasterast hizira, mêtînger serê pêşîn mirovbûna mirovên mêtîngehê red û neyîn dike, bi me re çêdike. Ji ber ku armanca mêtînger lidarxistina serdestiya xwe ye, ji bo pêkanîna vê yekê, xwe ji tu rêyan bêpar nahêle. Loma jî, neyînkirina mirovbûna mirovê mêtîngehê, serê pêşîn tevlihevî û neliheviyên derûnî çêdike ku Ania Loomba, vê yekê di ser têgihên ‘reş û spî’ yê Frantz Fanon re rave dike û dibêje, “Ji bo kirdeya spî, xwebûna kesê reş ne tu tişt e, lê belê ji bo reşê ku dikeya wê ye jî, xwebûna kirdeya spî her tişt e ku mirovê reş xwaz û arezûya wê dike” (2000; 170). Neyînkirina mirovbûna mirovê mêtîngehê, di warê takekesiyê de jî neliheviyan bi xwe re tîne. Heke em ji awirê dikekirinê û ji hêla

psîkoanalîtîk ve berê xwe bidin vê arezûyê, em ê serî li ‘teoriya neynikê’ ya Jacques Lacan bidin ku dibêje, “Kirde, gava di çaxa pitikê de de li neynikê dinêre, teyisîna xwe ya di neynikê de wekî kirdeyeke biyan fam dike û xuyanga xwe ya di neynikê de jî ‘wekî dîkeyekê’ saz dike” (2013; 96). Em ji vê teoriyê digihîjin ser wê fikrê û dikarin bêjin; kirdeya spî, gava di neynikê de mirovê reş dibîne, hebûniya mirovê reş wekî neynika hebûniya spîbûna xwe û ‘wekî dîke’ saz dike; û her wiha xwebûniya xwe jî di ser ‘neyînkirina taybet ya bo dîketiyê’ dike hebûniyeke mirovî; loma jî ji bo ku karibe hebûniya xwe li xwe meşrû bike, pêwîstî pê dibîne ku mirovê reşik bi awayekî ‘dermirov’ saz û pênase bike.³ Û ev pênasekirin bi gelek cure rengdêran dide der ku Frantz Fanon ji bo vê dermirovkirinê ji berevajiyê ve û pir bi zelalî dibêje; “Mirovê reş, ne mirov e” (2014; 2).

Mirovên mêtîngehê ji ber ku “...tu carî nikarin bi wekî takekes bîn karakterîzekirin û bes mafekî wan heye; windabûn û têdeçûna di nav kollektîvîteyeke anonîm (nediyar) de” (Memmi, 1996; 88), di warê takekesiyê de, ji alî mirovê mêtînger ve ‘wekî heyîneke ku xwedî tu taybetiyekê nîn e’ tê pênasekirin û di warê xwebûniyê de jî ‘wekî tu tişt tê qebûlîkirin’; piştî ku hay jê dibe ku mirovê serdest, serweriyeke taybet pê dike û dikeve rewşa derûnî ya xwekêmdîtîne; û wekî encama bandora vê derûniyê jî dikeve nav hewla xwedanqebûlîkirinê û; ev hewl êdî jê re xwaz e (arezû) ku “Yek kesek ji mirovê mêtîngehê tune ye ku ji bo rojekê be jî nexwaze bikeve şûna mirovê akincîbûyî”⁴ (Ferro, 2002; 206). Ev xwaza mirovê mêtîngehê yê tê marastin; wekî xwazeke dîtî û hestpêkirina hebûniya xwe li ber me disekine; û heke em car din di ser neynika Lacan re bihizirin, ji hêlekê ve jî ev xwaz; xwaza şûnguhezandina kirdeya berneynik û ya di nav neynikê de ye. Loma jî, kakilê vê xwaza şûnguhezandinê, danqebûlîkirina hebûniya xwe ye; ji ber hindê jî mirovê mêtîngehê dikeve nav hewla xwedanqebûlîkirinê. Wekî çawa Fanon jî li ser vê yekê dibêje,

“Rastiyek heye li rastê: Mirovên spî xwe di serfêza mirovên reş de dihesibînin. Rastiyeke dîtî jî ev e: Mirovên reş, çiyê wan tê here jî dixwazin zengînî û berfirehiya ramana xwe nîşanî spiyan bidin. Ji bo vê

³ Em têgiha ‘reş-mirovê reş’; di vê xebatê de wek têgih, bi wateya ‘kesê bindest û marastî û dikekiri’ bi kar tînin.

⁴ Akincîbûyî: mirovê serdest yê di mêtîngehê de bi cî bûyî

jî, tim û tim dikevin nav hewla xwepeyitandinê ku ji alî aqil û jîrîtiyê ve ji spiyan ne kêmtir in” (2014; 5).

Xuya ye ku ev hewla xwedanqebûlîkirinê jî ji hestê xwekêmhîskirinê dizê ku tenê di biwara derûnî û ruhî de sînorkirî namîne; bi awayekî pirrehendî dîtîyê ser warên dîtîr yê wekî ziman, çand û zanînê jî. Ev pirrehendiya hestê xwekêmdîtîne, hem dike ku ji hemû aliyan ve her parçe bi hev ve bestandî bin û hem jî dike ku her parçe di biwara xwe de xwedî têkelî û geremolîyên taybet be. Yek ji sedema vî hestê xwekêmdîtîne û hewla xwedanqebûlîkirinê û xwepeyitandinê bandora pêkanîn û bêjara mêtîngerîya rengmodern e.

1.4.1 Yekzimanî

Bêjar û îdeolojî du tîgîh in ku nikarin ji hev cihê bîr fikirandin.⁵ Heke em bi awayekî di ser re derbirin, em ê karibin bêjin, bêjar, ji bo gotin, vegotin û raguhastina ramanên îdeolojîk bi roleke girîng radike. Ji ber ku peyva ku wek tîgîh ji alî serdestiya mêtînger ve hatiye avakirin, êdî di xizmeta berbelavkirina ramana wê ya îdeolojîk de ye jî. Her çî qas bêjar awayekî ji awayan ya bikaranîna zimên e jî, bêjar bi tenê bi zimên ve jî ne sînorkirî ye. Ji ber ku bêjar di xwe de, ne tenê wateyê, ramanê, ramanêke danandî jî diheve. Yanî, ziman, -û pê re jî her parçeyekî wî-, di nav avaniya ku tê de tê bikaranîn dibe xwedî wateyekê. Ev wate di nav rewş û qewaman de distewe û di wan helûmercan de jî raman ava dibe. Nexwe em dikarin bêjin ku ziman di vê wateyê de alavekî îdeolojîk e jî. Ev awa alavbûna zimên dibe sedem ku ji hin aliyan ve rasteqînî bîr afirandin lê ji hin aliyan ve jî rasteqînîya hatî veşartin, aşkera bibe.

Di helûmercên mêtîngerî û mêtîngehiyê de, rewşa ziman xweserî xwe û guhartî ye. Ji ber ku ziman, awayê bikaranîna wî ya wekî bêjar û raman û wateya ku di bêjarê de diheve, pêwîstî bi mêtîngerîyê re çêdike ku ramana xwe bigihîne her takekesî û li serê bisepîne. Ev pêwîstî bivê nevwê divêtiya desthilatê bi xwe re tîne. Em dikarin bêjin, cîhanêke zimên heye û mêtînger dixwaze serdestî li vê cîhanê bike ku “Armanca esasî ya mêtîngeran hikmîkirina rihetiya mirovan e: li her tiştê ku ew hildiberînin, awayê hilberandina wan û awayê belavkirina wan; yanî hikmîkirina cîhana zimên ya jiyanî rasteqîn” (Thiong’o, 2017; 44). Mêtîngerî vê daxwaza xwe bi zimanê xwe pêk tîne ku bi

⁵ Em peyva îdeolojîyê bi wateya ramanên hevpar û tevdeyî yê pêkanînê mêtîngerîyê bi kar tînin.

taybetî bi danîna qanûnan zimanê xwe dike zimanê tekane ya ‘meşrûbûyî ya qanûnî’; û pê re jî qanûnê li mirovên mêtîngehan ferz dike ku bi tenê bi wî zimanî biaxivin û vê yekê jî bi rêya perwerdehiya bi yekzimanî pêk tîne; û di vê pêkanînê de êdî nivîsîn û bidestxistina agahiyan bi zimanê mêtînger e. Di vê qanûndanîn û lêferzkirinê de armanca sereke ev e; hikimkirina li hişûbîr û cîhana zimanî û çandî ya mirovên ku tên marastin. Ev hikimkirin jî di ser bêjarê re pêk tê ku “Her serdestî rejîma xwe ya rasteqîniyê (heqîqetê) ava dike û di vê çarçoveyê de jî agahî desthilatê, desthilat jî agahiyê hildiberîne. (Foucault, 2000; 58)

Desthilata ku agahiyê hildiberîne, pêwîstî pê dibîne wê agahiyê li gorî bêjarên wê avakirî berbelav bike û bike agahiya giştî. Rê û rêbaza vê yekê jî, qedexekirin e ku yek ji pêkanînên mêtîngeriyê yên sereke, ‘qedexekirina zimanê neteweya mêtîngehan’ e. Ev qedexekirin pirrehendî û piralî ye ku Michael Foucault jî dibêje, “Bêjar, ji alî desthilatê ve bi rêbazên lidervehiştinê tê hilberandin. Yek ji van rêbazan, ‘qedexekirin’ e. Qedexekirin bêtir di biwarên polîtîk û zayendî de derdikevin pêşberî me” (1992; 295). Rêbaza lidervehiştinê ya ku Foucault behs jê dike, di heman gavê de du tiştan di xwe de dihevin; mêtîngerî bi qedexekirina zimanê mêtîngehan, a) pêşî mirovên mêtîngehiyê li derveyî agahiya rasteqîn dihele û rê li ber digire û nahêle ku kes bi behre û şiyana xwe ya famkirina bi zimanê dayikê heqîqeta xwe bibînin, b) û pê re jî rê li ber digire ku mirovên mêtîngehan nikaribin bi çand û kelepûr û adet û toreyan xwe ve jiyanê hilberînin û ‘mîrovbûna xwe’ bidomînin.

Ji ber ku pêwendiyên di navbera ziman û çanda neteweyekê de heyî, di asta jiyanî û hestpêkirina hebûniya xwe de xurt û xwedî rehên kûr e, ev pêwendî hilberandin û kudandina jiyanê jî bi xwe re tîne û ji alî hebûniyê ve jî dibe sedem ku mirov hest bi xwe bikin. Nigûgî Wa Thiong’o, li ser demajoya pêkanînên mêtîngeriyê dibêje;

“Ji bo mêtîngeriyê ev yek du aliyên demajoyê dihevin: 1) herifandina çand, huner, dans, dîn, dîrok, cografya, perwerde, ziman, hunera axaftinê û wêjeya mirovan an jî bi awayekî bi zanebûn kêmîxistina wan û 2) berzûbalakirina zimanê mêtînger” (2017; 44).

Loma jî em dikarin bêjin, armanca mêtîngeriyê ya di qedexekirina zimanê mirovê mêtîngehiyê de, -an jî neteweya ku serdestî lê tê sepan- ew e ku; jiyanê li mirovên bindest biherifîne û li gorî bêjar û armanca îdeolojiya xwe ji nû ve saz bike.

Mêtingerî, bi qedexekirina ziman, ji bo bidestxistina encama bênavber ku her û her berê xwe dide pêkanîn û encamên dîtir, agahiyê û rêya bidestxistina agahiyê yekdest dike da ku karibe raman û îdeolojiya xwe ya sazîrî li kar xê û bisepîne.

1.4.2 Yekdestkirina Agahiyê⁶

Agahî, digel hilberînên ku di gelek aliyên jiyanê de tên pêkanîn, heyî dibe û bi vê heyîbûnê jî namîne û her û her xwe nû dike. Ev xwenûkirin, ne tenê bi hilberînên jiyanî ve girêdayî ne. Her wiha, desthilata heyî, ji bo aqûbet û encama baş ya sepanînên xwe, ji aliyekî ve pêwîstî pê dibîne û agahiyên heyî di danîna qanûn û qedexekirina zimanan de asê dike û ji aliyê din ve jî bi yekdestkirina agahiyê û bi bêjara mêtîngîrîyê heyîbûna xwe qewî û domdar dike. Loma jî, em dibînin ku di navbera desthilat û agahiyê de têkiliyeke dualî û cihêreng heye. Ev dualî li ser ‘bêyîhevnebûnê’ê ye ku Vedat Çelebi jî balê dibe serê û dibêje, “Desthilat û agahî tim û tim tên pevexistin. Têkiliyên desthilatê her tim agahiyê hildiberîne û agahiya ku hatiye hilberandin jî tim û tim bandorên desthilatê belav û berfireh dike” (2000; 512).

Pêwîst e em diyar bikin ku agahiya ji alî desthilatê ve tê hilberandin, bi awayekî teqez û bêguman ji alî zimanê desthilatê ve tê sazîkirin ku hem bi awayekî serdestî hem jî bi awayekî mêtîngîrî li dar e. Digel vê jî, “Dewletên ku heqê wan heye di nav sînorên xwe yê siyasî de hêzên meşrû bisepînin, polîtîkayên wekî zimanekî neteweyî, sistemeke hevpar ya perwerdehiyê û leşkeriya bêgavî dimeşînin” (Sadoğlu, 2003; 21). Loma jî, dibe ku ev desthilat dewleteke neteweyî be û mêtîngîrîya navsînorî bisepîne li ser neteweyeke dîtir an jî dibe ku ev desthilat dewleteke mêtîngîr be ku bi awayekî dersînorî pêkanînên mêtîngîrîyê li dar dixê.

Di hemû rewşan de jî, serdestiya heyî, serê pêşîn hewcetî bi ziman dibînin û bi polîtîka û pêkanînên xwe yê yekzimanî, agahiya heyî, -an jî yê hatî komkirin- û agahiya ku di jiyanê de tim û tim tê hilberandin di destê xwe de dihelin û wê li gorî bêjara xwe derpêş û belav dikin. Îcar heke em bizanibin hewcetiya bo ziman, ji alî mêtîngîrîyê ve çawa tê dabînkirin, em ê car din berê xwe bidin Hüseyin Sadoğlu ku dibêje, “Perwerdehiya bêgavî, bi awayekî dîrokî, wekî alavê herî bi bandor yê

⁶ Em ê ji niha û pê de peyva ‘agahî’yê hem bi wateya ‘agahiya bo haydariyê’ hem jî bi wateya ‘zanîna zanistî, perwerdehî, dîsîplînê cihê cihê, rojnamegerî û hwd’ bi kar bînin.

netewesazkirinê hatiye bikaranîn” (2003; 23). Em ê di ser van gotinan re karibin bigihîjin fikrekê û bêjin; çendî ku di netewesaziyê de ev rêbaz kartêker e jî, yek ji stûneke esasî ya mêtîngerîya modern yekdestkirina agahiyê ye û helbet ji bo yekdestkirina agahiyê, serdestî an jî desthilatbûn bi tena serê xwe têr nake. Pêwîst e ku mirovên di mêtîngehan de bi zimanekî hatibin perwerdekirin û bêjara ku armanc û ramana desthilatê radigihîne, ji alî mirovan ve bi heman awayî bê famkirin. Ji ber hindê ye ku perwerdehiya bi zimanê mêtînger li ser mirovên mêtîngehê tê ferzkirin.

Desthilata mêtînger, bi rêya pêkanînên yekzimanî û perwerdehiya bêgavî û pê re jî bi komkirin û yekdestkirina agahiyên berê û agahiya ku her tim ji nû ve tê hilberandin, car din rasteqîniyeke li gorî xwe saz dike ku Gül Turanlı jî balê dikişîne serê û dibêje, “Desthilata ku zaltî dike biryarê dide ka rasteqînî çi ye” (2017; 101). Desthilat digel ku rasteqîniyê ava dike, li gorî wê rasteqîniyê jî agahiya heyî di destê xwe de dihêle û bi qasî ku karibe mirovên ku tên marastin bi rê ve bibe, wê agahiyê belav dike. Desthilata mêtînger ku bi yekdestkirina agahiyê zaltiya xwe dimeşîne, hem agahiyê ji bo rêvebirina mirovên mêtîngehê wekî alavekî bi kar tîne û hem jî dike ku mirovên ku tên marastin bi qasî ku ew destûrê bide nêzî cîhanê bibin. Ji ber ku “Kî ku agahiyê di destê xwe de bigire ew xwedî ramanekê cîhanbîniyê ye” (Foucault, 2000; 118) bi vî awayî pêwendîya bindestan ya bi cîhanê re jî saz dike.

Nexwe em dikarin bêjin, mirovê ku ne xwedî cîhanbîniyê ye, ji kan û warên hilberandina agahiyên jiyanî, ya ku tim û tim nû dibe, bêpar e û di heman demê de jî ji jiyanê dûr e. Yekdestkirina agahiyê, yek ji pêkanîn û sepandinên mêtîngerî û desthilatdariyê ye ku ji bo berdewamiya serdestiyê tiştekî bivênevê ye. Ji bo vê jî; serê pêşîn yekzimanî li mirovên bindest û mirovên mêtîngehê yên ku tên marastin ferz dike û yekzimanî dibe sedem ku bergehên li ber hiş û mêjiyên mirovan tengtir bibe û agahiya tê bidestxistin yekreng be û li gorî bêjar û ramana mêtîngerîyê bê famkirin. Di vê biwarê de, yekzimanî û yekdestkirina agahiyê, dike ku mirovên dûçarî sepandinên mêtîngerîyê tên; ji pencereyekê li jiyanê binêrin, “negihîjin ‘wêdetirê xwe’ û ji jiyanê dûr û biyan bimînin” (Said, 2012; 15) û ne xwedî cîhanbîniyê bin û ji bidestxistina tiştên dûr bêpar bin û bi demajoyê re, bi wateya ‘famkirina ji jiyanê û hilberandina jiyanê’ pey der pey bibin yekreng; û wekî bindestê di bin serdestiya mêtînger de bibin mirovên yekçand.

1.4.3 Yekçandî

Çendî ku ji peyva ‘cultura’ ya Latîni hatiye wergirtin jî, wateya çandê ku di zimanê Fransî de diheve, berê me dide pênaseya herî rast ku em karibin li ser wê hûgeriyê bikin. Çand di zimanê Fransî de bi wateya, “Demajoya avabûn û pêşdeçûnê tê pênasekirin” û “Di vê wateyê de, têgiha çandê, xebatekê di xwe de dihevine ku li ser xwezayê amade û ji bo pêşvebirina rengûawayên potansiyel an jî ji bo likarxistina hin rengûawayên ku dibe ku pêk bên, tê kirin” (Bourse, 2009: 43). Nexwe em pir bi rihetî dikarin bêjin, çand, xwedî ger û demajoya jiyanê ye, bi reng û awayê jiyanê ava dibe. Her çand, wekî encama vê demajoyê di nav mirovên civakê de dibe regekî hevpar ku mirovên heman civakê hem bi vî awayî hev nas dikin hem jî ji alî xweşahî, çetînî, qewamî û gelek aliyên jiyanê ve dibin xwedî hişûbîreke hevpar. Pê re jî mirovên wê civakê dibin borîrojeke hevpar ku “Borîroj ji ber xwe ve çênabe, ew encama binyat û avabûna çandî û nûnertiyê ye” (Halbwachs, 2016: 72). Borîroja hevpar, ya ku wek encama binyat û avabûna çandî pêk tê, nûnertiyeke hevpar dike û di nav mirovên civakê de regekî taybet dide xwe ku em jê re dibêjin; gerdîş, an jî kelepûr.

Gerdîş, bi pêkhatina xwe ve, dinyayeke çandî bi mirovên civakê re saz dike ku ev dinyaya çandî dibe rêyek ji bo çêbûna zanaveke çandî. Her çend “Zanav, taybetiyeke hebûna mirovan e ku li tu tiştî nayê dagerandin, bêguman zanav takekesî ye lê bi taybetî jî kollektîf e. Zanav pirseke hişberiyê ye ku hem di asta takekesî hem jî di ya civakî de têbor e” (Bourse, 2009: 113-139). Hemin ku zanav û hişberiya wê di asta serhişî de ye, nexwe heta ku takekes negihe xwehişberiyê, em ê nikaribin çêla zanaveke takekesiyê bikin. Loma jî, pîrsek di vî warî de xwe li me ferz dike; ‘em bêjin, di takekesî de gihana ser hişî pêk hat, îcar ew ê pal û pişt xwe bispêre ku derê?’ Li ser wî cî û şûngeha ku em pîrsê dikin, Jorge Larrain, pênaseyeke balkêş dike û dibêje,

“Herî kêma du rê hene ku mirov dikare bi wan jî zanava çandî fam bike.

1) Zanava jêderkparêz ku bergirtî û teng e; diparêze ku zanava çandî, diyardeyeke temambûyî û kakileke stewandî ye. 2) Zanava dîrokî ku hewîner û bervekirî ye; diparêze ku zanava çandî her tim xwe hildiberîne û ew ê tu carî temam nebe” (1995: 217).

Şûngeha ku Larrain amaje pê dike, çî wekî ‘jêderkparêzî’ çî jî wekî ‘dîrokî’, xwe digihîne cî û şûngeha ku jihevcihêtiya takekes û civakê jê dizê. Di ser vê re em digihîjin

pêşencamekê û dikarin bêjin; dibe ku zanava me ya takekesî hebe, lê belê ji ber ku em ê nikaribin ezmûneyên xwe, her wekî ku em jê fam dikin, veguhêzînin kesên dîtir, dê ezmûneyên me nebin nimandineke kollektîf û dê ezmûneyên me bi hêsanî nebin zanaveke çandî. Loma jî, ji alî ziman, perwerde û ezmûneyên jiyana hevpar û ji alî hestpêkirina ji jiyane û hizirîna der barê jiyane de, hevpariyek divê ji zanava çandî re. Hevpariya em behs jê dikin ne yekçandîtî ye ku ji bo pêkhatina bi sanahî û domdariya mêtîngeriyê yek ji rê û rêbazên sereke ye. Ji ber ku mêtîngerî; ji bo avakirina yekçandîtîyê, pêşî zanava çandî ya mirovê mêtîngehê –ya ku berî ku serdestiya mêtînger pêk were, di her du pênaseya Larrain kirî de jî heye- an paşçav dike an jî tune dihesibîne. Di her du rewşan de jî, qebûlkirinek heye ku di paş perdeya bêjara îdeolojîk ya mêtîngeriyê de dimîne. Ew jî qebûlkirina jihevcihêtiya çandan û zanavên çandî ye.

Em dikarin li ser vê qebûlê wiha bêjin; jihevcihêtiya çandan, me bi çandên ku xwedî pergalekê ne û li gorî xwe tîrî pîkanîna re rû bi rû dihele. Ji ber ku her çandek xwedî pergalekê ye, di pîkanîna hêmanên çandî de tu şaşî ne nakeve behsê. Her wiha, aliyê li hember, ne ew alî ye ku divê mirov pê re pev biçe, lê belê ew alî ye ku mirov divê mirov bi hevqebûlekê li ser hin hêmanan li hev bike. Lê belê, çandî ku ev yek li rastê heqîqetê be jî, bêjara îdeolojîk ya mêtîngeriyê ku heqîqetê li gorî xwe ava dike, tim çav berdide ciyê dîkeyê. Loma jî, ji bo ku karibe yekçandîtîyê saz bike, divê bi wî ciyê ku yê dîkeyê ye, bilîze; û di vê lîstina xwe de jî hem mirovê mêtîngehê dike lîstikvan hem jî temaşevan; ji ber ku “Çanda ku di statuya mêtîngehiyê de hatiye westarkirin, hem heye hem jî hatiye şîmakirin û li dijî mirovên xwe govaniyê dike” (Fanon, 1967: 44). Hem di lîstikvanî hem di temaşevanî û hem jî di govaniyê de nîşaneyên jihevcihêtiya çandan heye ku ew jî rasterast berê xwe dide awayên zanavan. Ev awayên zanavan, kêliya ku xwe didin der, di heman kêliyê de jî heqîqeta çanda mêtîngehê didin rûyê mêtîngeriyê, loma jî mêtîngerî çêtir nabîne xwe ji heqîqeta ku bi bêjara xwe ya îdeolojîk ava kiriye, dûr bike û tê dixebite ku di wî ciyê dîkeyê de yekçandîtîyê saz bike. Mêtîngerî, di vê sazîkirin, pênasekirin û pîkanîna yekçandîtîyê de jî, bi temamî mirovên bindest yê endamên mêtîngehê wekî alav an jî wekî heyînen çalak û aktîf bi kar tîne.

Di demajoya vê bikaranîna mêtîngeriyê de, em car din rastî hişberiya zanavî tîrî ku di heman demê de qada derhişê jî di xwe de dihele. Yanî, mirovê mêtîngehê, çi gava dibe temaşevan di heman gavê de jî ji xwebûniya xwe dûr dikeve û dikare ji wî

ciyê ku ji xwe dûr ketiye li heqîqeta xwe û li heqîqeta avakirî binêre. Lévi Strauss di vê mijarê de bala me dibe ser nîşaneyên sembolîk yê çandê, çêla karaktera hevpar û taybet ya diyardeyên civakî dike û dibêje, "...derhiş, wê keys û derfetê dide me ku em karibin di heman kêliyê de, hem rastî awayên çalakiyên xwe hem jî rastî awayên çalakiyên dîkeyê bîn" (2013: 35). Heqîqeta ku mêtîngeriye bi bêjara xwe saz kiriye, bivê nevê mirovê bindest yê mêtîngehê, wekî listikvan rastî xwe û rastî awayê çalakiya xwe tîne û pê re jî wekî temaşevan rastî mêtîngerî û awayê çalakiya wê tîne. Ji ber ku 'govaniyê jî bi mirovê bindest dide kirin', di demajoya pêkanînê yekçandîtiyê de, mirovê mêtîngehê hem li çanda xwe neban dibe hem jî dibe 'dîkeya kêfî' ya mêtîngeriye.

1.4.4 Dîkekîrin

Dîkekîrin, di bingeha xwe de daxwazeke xurt ya nasînê dihevine. Ji ber ku heyîn an jî mêtîngeriya ku dîkekîrinê pêk tîne, serê pêşîn pêwîstî bi zanîn, nasîn û pênasîkirina xwe dibîne. Loma jî, daxwaza nasînê, çendî ku di serî de wek daxwazê be zanîn jî, ji bo pêkanînê mêtîngeriye dibe rê û rêbazeke bivênevê. Mêtîngerî, berî her tiştî, bi bêjara xwe pêşdaraziyekê bo mirovê mêtîngehê saz dike da ku karibe bêjara xwe ya îdeolojîk ku bi sepandinê mêtîngeriye hatine afirandin, cî bi cî bike. Ji ber ku di pêşdaraziyê de tu demajoyeke agahdariyê nîn e der heqê heyîna li pêşber de pêşdarazî awayek ji awayan alîgirî ye. Loma jî, hemû gotin, bêjar û ramanên ku li ser pêşdaraziyê tên derbirîn, di heman demê de hem neyînkirina rasteqîniya heyîna li pêşber e hem jî ji bo avakirina xwe ya li gorî raman û bêjara xwe, bikaranîna heyîna li pêşber e. Piştî ku mêtîngerî, armanca xwe ya pêşîn, yanî nasîna li ser pêşdaraziyê, dibe serî, vê carê jî di ser bikaranîna zimanê bêjarî re, li ser pêşdaraziyên neyînî û qonax û demajoya dîkekîrinê temam dike.

Ji ber ku pêşdarazî alîgir e û "Pêşdarazî ew tişt e ku; refere û amaje bi raman û reftarên mirovên ji komekê dike ku ji bo mirovên ji komeke dîtir heye" (Giddens, 2000: 227), mêtîngerî, ji bo pêdandin û qayîmkirina raman û îdeolojiya xwe, bi pêşdaraziya ku çêdike, pêwîstî bi nasînê dibîne. Zygmunt Bauman, gava li ser tîgiha 'biyan' disekine, ji berevajiyê ve bala xwe dide heyîna ku li hember e û li ser vê dibêje, "Ji bo ku ez karibim kesekî wekî 'biyan' qebûl bikim, divê qet nebe ez hin tiştan bizanibim der heqê wî de" (2018: 66). Nexwe, ji bo nasyarî û hevnasînê pêwîstî bi hawîrdoreke hevpar heye

da ku ew hawîrdor bibe qada jiyanê hevpar. Loma jî, nasyarî hêmayêke heyîniyê di hişê mirovan de saz dike ku heyîna li hember, her çend li ser pêşdarazî an jî agahiyên şaş an jî rast hatibin avakirin jî, hene û qebûlkirî ne. Wekî çawa Bauman dibêje, “Heke heyînen din ne li hawîrdora min bûna, têkiliyêke min bi wan re çênebûya, ew ê ji bo min nebûna ‘biyan’, lê belê ew ê bibûna ‘netukes.’” (2018: 67) Nexwe em dikarin bêjin; naskirin û zanîna tiştan ya der heqê mirovan de, wan ji ‘tukesbûn’ê xelas dike; û di heman demê de hema dike ‘nas’ hem jî dike ‘biyan.’

Dîkekîrîna di biwara zanava çand û zimanî de, bi temamî, ji bo biserketina pêkanînen mêtîngîrîyê ye ku di xwe de hêmanên wekî afirandina bêjara mêtînger, dermîrovîkirin, nasîna di ser pêşdarazîyê re, yekzimanî, yekçandî û zanava etnîk, -ku bi çand û ziman çêdibe- dihevine. Mêtîngerî, ji bo pêkanîna û biserxistina armancên pêkanînen xwe, serî li jihevcihêtiyan dixê û pala xwe dide wan. Jihevcihêtiya zimanî û çandî, çendî ku jiberxweve û xwezayî ye jî, li gorî jêfamkirinê û pêkanîne bi rolên erênî û neyînî radibe û “Jihevcihêtiya çandî, awayên zanavan dide ber pirsyaran. Awayên zanavan, ji ber nîşaneyên ku tiştan bi bîr dixin, her tim ‘kêm’ in an jî bervekirî ne ji bo şîrove û wergera çandî” (Bhabha, 2016: 299).

Mêtîngerî, ji bo şîrove û wergera çandî, bervekirîbûn û jihevcihêtiya çandan bes ji hêla neyînî ve û heta tu bêjî bes bi xurtayî bi kêrî xwe tine. Herçî nîşaneyên ku di nav çandê û digel wê jî di nav ziman de ne, ji bo sazîkirina zanaveke yekçandî û yekzimanî, ji bo mêtîngîrîyê wek zêrê zêran e. Loma jî mêtîngerî, di avakîrîna dîkeya xwe de, serê pêşîn serî li van her du hêmanan dide ku bi awayekî xwezayî û ji ber xwe ve ji hev cihê ne û “Gava ‘heyîna cihê’ nîrxekê dide heyîna dîkeyê, bêjara ‘çanda min’ wek pîvan bi kar tine” (Schnapper, 2005: 25-26) û di vê deravê de ‘heyîna cihê’ mêtînger bi xwe ye ku cihêbûna wê di ser ‘mîrovê mêtîngehê’ re diyar dibe. Mîrovên mêtîngehê, çendî nûnertiya ‘heyîna cihê’ bike ew çendî jî şûna xwe ya dîkebûnê zexm dike. Belê ev zexmkirin jî li ser pîvana ku ‘heyîna cihê’ datîne pêk tê. Yanî, kêmbûn û temambûn, xurtbûn û qelsbûn, liêrbûn û lijorbûn, bi giştî li ser vê pîvankîrîna ‘heyîna cihê’-yanî heyîna serdest- pêk tê. Ji bo bicîhatina van pîvanan, divê bêjara ku di ser pêşdarazîyê re hatiye avakirin û nasîna ku bes bi agahiya hawîrdorê pêk hatiye, xwedî rengûawa û naverokeke neyînî be. Loma jî, “Nûnertiya ‘dîkeyê’ li gorî divêtî û pêdiviyên rêveberiyên mêtîngîrîyê diguhere” (Loomba, 2000: 138). Li ser vê guherîna pêdiviyên mêtîngîran em dikarin bêjin; çî gava bindest sernerm bin mêtînger wan li gorî

serî tewandina wan wan nas dike û pê nase dike lê çî gava bindest serî hildidin, awayê nasîna mêtîngerîyê diguhere û ji ber ku ew awa nasîna li dijî pêdiviyên wê ne, pê nase diguhere û dibe ‘xwecihên hov’.

Mêtîngerî, bi rêya van pêkanîna û sepandinên xwe yê pîvanî, zanavek jî ji xwe re ava dike. Ev zanav, dîsa li ser daraz û agahiyên neyînî ava dibe ku bo nasîna mirovê mêtîngehê û bindestkirî hatiye danîn. Mêtîngerî, di vê pêkanîna xwe de, tenê bi mezinkirin û hurnîsandana çanda xwe namîne, her wiha zanava xwe ya çandî jî li ser dijberiyê ava dike. Ev dijberî di pêkanîna dîkekîrî de, aliyê ‘em’ê û ‘ew’ê saz dike û “Zanava çandî mîna ku li dijî komên din be tê pê nasekirin û bi vî awayî jî, fikra li dijî ‘wan’ an jî li dijî ‘kesên dî’, ‘em’ tê parastin û jihevcihêbûna çandan tê mezinkirin” (Larrain, 1995: 225). Ev mezinkirin, di her warî de bi zimên û bi bêjara ku bi zimanê mêtînger hatiye afirandin, tê cîbicîanîn. Wekî encama vê cîbicîanînê, dîkekîrineke dualî pêk tê. Yanî, mirovê mêtîngehê bindest yê jî xwe di ser pêkanîna mêtînger re ava dike û wekî encama vê avakirinê jî dibe dîke ku “Gelê ku bindest e û bawer kiriye ku axaftina bi zimanê serdest û pêkanîna çanda wê, tiştêkî rûmetdariyê ye û ew ê bi vî awayî karibe derkeve ast û bilindbûna çanda serdestan, ‘dîke’ ye û li xwe neban e” (Fanon, 2014: 20). Zimanê mêtînger, wekî zimanekî ku li mirovê mêtîngehê hatiye ferz kirin; bi rêyên wekî qedexekirina zimanê mirovê mêtîngehan, perwerdehiya bêgavî ya bi zimanê mêtînger, bi nivîsîna berhemên wêjeyî yê bi zimanê mêtînger û bi agahî û ragihandinên wê, dibe kan û sedem ku mirovê bindest yê mêtîngehê, bêyî haya xwe û mîna ku parçeyekî jê be, zanava çandî ya serdestan qebûl û navoyî bike.

Hewldanên ku angaştî serwerbûna çanda mêtînger dîkin, aliyên herî girîng yê qewînkirina mêtîngerîyê ne. Wekî destpêk, lêferz kirina zimanê mêtînger ku bi qedexekirina zimanê xwecihî tê qayîmkirin, bi xwe re perwerdehiya yekalî û yekzimanî tîne. Demajoya perwerdehiya ku bi vê pêkanîna û sepandinê dest pê dike, pey der pey berê xwe dide qonaxa avabûna zanaveke çandî ya li ser nîrx û zimanê mêtînger avabûyî ku bi xwendin û şûştina hiş û mêjiyê mirovê mêtîngehiyê û bi pûçkirina çanda wî ya xwecihî dest pê dike. Bêjara sereke ya demajoya xwendin û şûştina hiş û mêjiyê mirovê mêtîngehê, ‘serwerbûn û hejrabûn’ çand û zimanê mêtînger û ‘nîzm û nehêjabûn’ çanda mirovê bindestkirî yê mêtîngehê ye. Ev bêjar, ji bo afirandina hêmayên dîkekîrî ne ku di helûmercên mêtîngerî û mêtîngehiyê de li ser bingeha pêşdarazan tên afirandin

û bi awayekî hevdemî, bi sepandina yekzimanî, yekçandî demajoya yekzanaviyê tê sazkin.

1.4.5 Yekzanavî

Zanav, bi hemû aliyên xwe yên ku bi bîr dixê ve, hatina nasînê diyar dike ku “Zanava min, ji tiştên ku ez wan dixwazim û bi qan qayîl im zêdetir, ‘çawabûna min û çawa hatina nasîna min e.’” (Connolly, 1995: 92). Loma jî, her takekes pêwîstî pê dibîne ku ji alî takekes an jî civakeke din ve bê nasîn. Ji ber ku zanav bi awayekî pîralî “...der barê hebûniya me ya polîtîk ya xwedî dorhêleke berfireh de ye ku; hevyekî û jihevcihêtî, jêbûnî û xweserî, ewlehî û azadî, pişkî û gerdûnî tê de cî bi cî dibin” (Mollaer, 2018: 31). Çendî ku hatina nasîn mirovbûna takekesî datîne holê jî, di warê zanava etnîkî-neteweyî û di warê pêwendîya serdestî-bindestî de ku êdî nasîn û zanîna civakê û diyarkirina zanava wê li dar e, ev yek ew çend zelal nayê holê. Ji ber ku di têkiliya ‘serdestî-bindestî’yê de, aliyekî wek zanav û ji alî hatina nasînê ve li ser e, pêşdetir e û rêje û bandora nasîna wî aliyî wek meşrûbûna qanûnî xurttir e. Loma jî, serdestî û çewisandîneke xuya li dar e ku “Gava di helûmercên zîlm û çewisandinê de, komên etnîkî bi awayekî dîrokî neyên nasîn an jî şaş bîna nasîn, hewcetiya hatina nasînê bi awayekî lezgînî xwe lê zal dike” (Taylor, 1996: 41-50).

Ji bo ku em karibin xweşikî rengûawa û kartêka vê nasînê û avakirina zanavê ya li ser vê nasînê daynin rastê, divê em berê xwe bibin ser jihevcihêtiyan ku di navbera takekes, civak (komên etnîk) yên newekhev (nejihev) de dikeve behsê. Heke em pîrsa, ‘Gelo mirov, wekî takekes an jî komên etnîk, di xweza û kakilê xwe de ji hev cihê ne an jî jihevcihêbûna wan piştî tê diyarkirin û pênasekirin?’ ji xwe bikin em ê karibin bêtir xwe nêzî rastiyê bikin. Helbet jihevcihêbûna takekesan di ast û qonaxeke dorfireh û di heman civak û komên etnîkî de jî li dar e. Loma jî, em ê li ser ‘hevyekî û jihevcihêbûn’ê bêtir bala xwe bibin ser komên etnîk yên ji hev cihê ku mirovên tê de dikevin ber behsa ‘hevyekî’yê. Fîrat Mollaer radigihîne me ku Niall Lucy di vî warî de dibêje,

“Ji alî zanavê ve tu tişt jiberxweve naqewime. Wekî mînak, em dikarin bêjin zanava Ayê amaje bi zanava neteweyî dike, lê belê gava em jihevcihêtiyan binin ber çavên xwe, em ê bêjin: bûyîna ji zanava Ayê di heman demê de nebûna ji zanava Byê an jî Cyê ye. Digel vê yekê jî, dibe ku gelek kes ji zanava Ayê bin. Wate ji vê yekê ew e ku; zanava Ayê ne

tenê ji zanavên din yên neteweyî cihê dibe, di heman demê de di nava xwe de jî ji hev cihê dibe” (2004: 52).

Li ser van dîtinên Lucy, ew bîrûbawerî bi me re çêdibe ku; ‘hevyekî’ya di nava zanava neteweyî an jî komên etnîkî de dikeve behsê, ji ber kartêka jihevcihêtiya neteweyên dîtir e. Loma jî Fanon bi pêdagirî û teqezî dibêje, “Tiştê ku cihûyê dike cihû, heyînê antîsemît e” (2014: 52). Her wiha, gava em têgihên, ‘jihevcihêti’ û ‘dijberî’yê bi hev re dihezirin, em dikarin bêjin, dibe ku jihevcihêti kartêkeke mezin û giran be di warê avabûna zanava neteweyî, -komên etnîkî- de, lê belê ev jihevcihêti di heman demê de hebûna ‘dijberî’yekê ye jî.⁷ Û gava em li ser vê diyalektîkê car din vedigerin ser Lucy ku dibêje, “dibe ku zanava Ayê jî di nava xwe de ji hev cihê bibe” em dibînin ku pêwendiyê dijberî hev heye di navbera ‘hevyekî û jihevcihêtiyê’ de. Loma jî, dema em digihîjin ser ast û qonaxa pêwendiya di navbera serdestî-bindestiyê de heyî û em dijberiya desthilatî ya di navbera wan de tînin ber çavên xwe, em car din û xweşîkî dibînin ku zanav; ji bo avabûna xwe û wekî binêvnevêtiyê hebûniyê, hewceyî jihevcihêtiyê dijber e.

1.4.6 Asîmîlasyon

Netewe-dewlet ji bo peyitandina heyîna xwe û danqebûlkirina meşrûbûna xwe hewcetî bi hin hêman û diyarker yên dewletbûnê dibîne. Yek ji wan, belkî jî girîngtirê wan, ziman e. Gava di deqbanda (context) netewe-dewletê de tê gotin, ziman; bes yekzimanî tê famkirin ku ew jî zimanê netewe-dewletê ye û li ser piraniya etnîsîteyekê an jî bi rêya qanûna ku ji alî etnîsîteya serdest ve hatiye danîn, tê qebûlkirin. Pêwîstiya bi axaftin û nivîsîna bi zimanekî, çendî ku bi awayekî guherbar derdikeve pêşberî me jî, diyardeyê xweserî netewe-dewletê ye ku wekî dîrokî pir nû ye. Loma jî, zimanê etnîsîteyên hindikanî yên ku di nav netewe-dewletê de cî didin xwe, bi piranî ne li ser qanûnê ne û ji ber vê yekê jî, serdest meşrûbûna wan jî dixin ber gengeşeyê. Ji ber ku di hemû waran de pêwîstiya netewe-dewletê bi ‘hevyekî’ û ‘ahengî’yê heye, “Netewe-dewlet, di nav sînorên xwe de, li xwe û li hebûna xwe ferz dike ku zanava neteweyî û zanava polîtîk hevaheng û lihevguncandî bin. Zimanê hindikaniyan bi kelepûr û paşdemayînê ve tê biyekkirin û wisa tê pênasekirin” (Durgun, 2014: 130). Netewe-

⁷ Di vê çarçoveyê (context) de, em peyva ‘dijber’ bi wateyên, 1) contrary-karşî û 2) converse-zî, bi kar tînin.

dewlet, bi qanûndanînê, zimanê etnîsîteya piraniyê wekî zimanê netewe-dewletê qebûl dike; û ew ziman di heman demê de dibe zimanê fermî jî; statuyek bo wî ava dibe û di ser vê statu û fermîbûnê re jî meşrûbûna wê ji gengeşeyê tê birandin. Ji ber ku, “Netewe-dewlet polînkirina fermî hildiberîne” (Bourdieu, 2016; 205) qanûnîbûn statuteyeke polînkirî bo zimanê fermî çêdike û di warê meşrûbûnê de pêşî li wî zimanî vedike. Lê belê, çendî ku ev yek di ser danîna qanûnan re tê pêkanîn jî, di warê danqebûlkirin û serwextkirina meşrûbûnê de têr nake, ji ber hindê jî netewe-dewlet, yanî serdestî, hincetêke qewîntir ji hebûna xwe re ava dike û navê wê hincetê jî dike ‘hişmendiya embûn’ê; û wekî peyta vê hişmendiya hanê jî, guherandin û veguherandina etnîsîteyên ku wekî hindikanî di nav netewe-dewletê de cî didin xwe, dike armanca sereke. Her wiha, zimanê netewe-dewletê ku zimanê etnîsîteya piraniyê ye û bi sepanîna qanûnî hatiye danîn, di vê pêkanîna guherandin û veguherandinê de, navgîneke kargîn û kartêker e. Du aliyên vê kargîniyê hene. Yek jê avakirin û danîna zimanê standard e ku bi awayekî armanckirî destkarî li ser ziman tê kirin. Ev yek hem ji bo diyarkirina zimanê netewe-dewletê hem jî ji bo pihêtkirina ‘hişmendiya embûn’ê pêkanîneke bivênevê ye ku “...Ancax piştî avakirina zimanê hevpar, mirov dikare behsa ruhê civakekê bike”⁸ (Gökberk, 1999: 84). Standardkirina zimanekî, li ser pîlansaziya zimên dimeşe û wekî endezyariya zimanî zêdetir li ser hêmanên hundirîn yên ziman disekine ku ji diyarkirina rehên peyvan, bihevkirina peyvan, jihevkirina awayê gotin û nivîsîna peyvan û hwd. pêk tê.

Aliyê din yê kargîniyê, asîmîlasyon e; di warê pêkanîna xwe de, bi temamî destkariyeke derveyîn e ku ziman zêdetir navgîn e ji bo gihîştina armancê. Asîmîlasyon di ferhenga Salah Saadallah de wekî, “assimilate: 1. mijandin, 2) bihujandin” (2000: 70) û di ferhenga Ali Püsküllüoğlu de jî wekî, “Asimilasyon: 3. Farklı kökenden gelen azınlıkları veya etnik grupları, bunların kültür birikimlerini, kimliklerini baskın doku ve yapı içinde eriterek yok etme”⁹ (2012: 185) tê pênasekirin. Di her du pênaseyan de jî, du hêlên hevpar hene; a) asîmîlasyon di armanc û pêkanîna xwe de helandin û tunekirin e, b) asimîlasyon demajoyek e ku bi helandinê dest pê dike, her bi armanca tunekirin û windakirinê dikude. Herçî Löffler e, asîmîlasyonê wekî “jihevbûn û wekxwekirin”

⁸ Armanc ji gotina hevpar zimanê standard e.

⁹ Helandin û tunekirina komên etnîkî an jî hindikaniyên ku ji jêderkeke dîtir in û zanav û paşxaneyê wan ya çandî ya di nav binyad û avaniyeke serdest de.

(Raguhastin: Şeker û yên din 2015: 73) pênase dike. Di vê pênaseyê de, têgiha ku bi peyva ‘wekxwekirin’ê ava dibe, tundî û kotekîyekê jî di xwe de dihevwîne û bala me dibe ser têkiliya ku di navbera serdest-bindest de heye ku ev têkilî her li ser qanûn û pêkanînen serdestan li dar e. Her wiha, Löffler pê de diçe û dibêje, “asîmîlasyon, ji du alî ve tê bikaranîn; 1) ji hêla amprîk ve ku mirov dikare wê wekî jihevûna sosyalî (civakî) û kulturî (çandî) bi lêv bike, 2) ji hêla normatîf ve ku awayê mengî (îdeal) ya entegrasyona koçberan e” (Şeker û yên din, 2015: 93). Di her du alîyan de jî komek etnîk yê hindikanî, ji gelek alîyan ve rengê etnîsîteyêke din digire ku mirov dikare bêje bi giştî taybetiyên xwe yên berê wînda dike. Herçî Riva Kastoryano ye, ji awirê vajî de bale dibe ser vê tunebûnê û dibêje, “Asîmîlasyon, wekî encam ‘jinavêrûna reng û teşeyên nebanbûnê’ bi xwe re tine. Ev encam, çanda jêderkî bi temamî wînda dike” (2000: 47).

Ji aliyekî din ve Betûl Dîlara Şeker û yên din radiguhêzînin ku Berry asîmîlasyonê dixê nav armancên hevçandbûnê û dibêje,

“Gava asîmîlasyon, ji bo gelekî etnîk ku bi dilê xwe dikeve nav wê çerxê pêk bê, modêla ‘Mencela Helînê (Melting Pot)’ li dar e. Lê belê gava bo asîmîlasyonê zor û kotekî li wî gelê etnîk were kirin, modêla ‘Beroşa Hemet (Pressure Cooker)’ li dar e ku gava zêde pest û hemet lê bê kirin dibetiya teqînê pir zêde dibe” (Şeker û yên din, 2015: 44).

Ev peyt û pênaseya Berry car din berê me dide pênaseya Löffler ya ‘jihevûn’ û ‘wekxwekirin’ê ku modêla Mencela Helînê ji bo ‘jihevûn’ê û modêla Beroşa Hemet jî ji bo ‘wekxwekirin’ê lê tê. Loma jî, Berry, li ser vê yekê namîne û gaveke din jî pê de diçe, diyar dike û dibêje, “Ji bo ku asîmîlasyon bi her awayî pêk were, divê hem asîmîlasyona çandî hem jî asîmîlasyona binyadî (structural) pêk were” (Şeker û yên din, 2015: 43). Li gorî her du helûmercên ku Berry ji bo asîmîlasyona temambûyî datîne, em dikarin bêjin, asîmîlasyona çandî; helîn û windabûna di warê ziman û hêmanên çandî de ye ku êdî mirovê ku ji etnîsîteya bindest e û dûçarî asîmîlasyonê tê, bi temamî ji zimanê xwe dûr dikeve, jiyana wî mirovî ya rojane jî ne bi zimanê xwe yê dayikê û jêderkî ye û loma jî nikare jiyana xwe bi rêya ziman û çanda xwe ya resen jî pêk bîne. Asîmîlasyona binyadî (structural) jî, amaje bi windabûna jêbûnê (identity) dike ku mirovê ji etnîsîteya bindest, bi her du modêlan jî dikeve ber çerxa asîmîlasyonê û wînda dibe. Ev windabûn,

bi temamî ew windabûn e ku Kastoryano behs jê dike; yanî ev reng windabûn bi asîmîlebûnê pêşî li nebanbûnê jî digire.

Digel vê yekê, Claude Lévi Strauss jî bi heman awayî balê dibe serê û dibêje, “Tiştê ku jêderka çandê di xwe de dihevine, ew berpirsiya pêwendîdanîna bi hev re ye ku ji sê biwaran, -ziman, lêzimî, aborî- pêk tê. Ev berpirsî dibe jêderka derketina hemû çandan” (2016: 129). Her sê biwarên ku Strauss bala me dibe serê, di pêkanîna qanûnên serdestiyê de hem bandorker hem jî diyarker in. Ji ber ku ziman ji gelek aliyan ve dikare nûnertiya çandê bike û pê re jî dikare asta pêwendîya ku di navbera hêmanên çandê û zanavê de heye bigihîjîne lêzimiya hevetnîkî. Edward Sapir, di vî warî de bala me dibe ser civakîbûnê, para zêde dide zimên û wiha dibêje, “Ziman, hêzeke mezin ya civakîkirinê ye, belkî jî di nav hêzên heyî de, yê herî mezin e. (...) Di heman demê de, zimanê hevpar, dibe semboleke hêzdar ya mirovên ku bi wî zimanî dipeyivin” (1999: 75). Peyta Sapir ku pareke zêde dide civakîkirina zimên û hêmana *lêzimîya* ya Strauss di heman biwarê de digihîjin hev ku; lêzimî di heman demê de civakîbûna mirovan e ku têkiliyeke nêz û nasyar bi hev re datinin. Loma jî, em dikarin bêjin, asîmîlasyon û hemû pêkanînen wê, di heman demê de ji du aliyan ve civakîkirinê li xwe dike armanc; 1) armanca yekem ew e ku; asîmîlasyon hewl dide ku civakîbûna komên etnîk-bindest yên hindikaniyê, ku ji mêj ve de *lêzimîya* xwe pêk anîne, ji civakîbûna xwe ya heyî dûr bixîne; sedem û hêmanên ku komên etnîk pê civakî bûne ji holê rake, 2) armanca duyem ew e ku; piştî jîholêrakirina sedem û hêmanên civakîkirinê yên komên etnîk-bindest, asîmîlasyon û pergala wê hewl dide di bin têgiha ‘em-me’ de civakîkirineke nûtir û dîtir ava bike. Armanc û hîm û sedema vê avakirinê bi temamî yekrehendî ye ku koma etnîk-serdest, yanî mêtîngerî, her dixwaze rengê xwe bide mirovên koma etnîk-bindest û bi vî awayî wî bike ‘ji xwe’.

Asîmîlasyon û pergala wê, ji bo ku bigihîje armanca xwe, pêwîstî pê dibîne berê xwe bide bîr û hafizeya komên etnîk-bindest. Loma jî, *lêzimîya* Strauss behs jê dike, ji aliyekî ve jî, bi ziman û çanda hevpar bîr û hafizeya mirovên ku ji koma etnîk-bindest in, ava dike. Ev bîr, di heman demê de, misogeriya hebûniya çandî û zimanî ya koma etnîkî jî diyar dike. Loma jî, asîmîlasyon, ne tenê pêkanînek e, digel wê, demajoyek e ku piştî qedexekirin, tunehesibandin û windakirinekê, tim û tim li ser jêbirin û şuştina bîra çand û zimanî ya koma etnîk-bindest dişixule. Di vê demajoya jêbirin û şuştinê de armanc hemû hêmanên heyînê yên berî mêtîngerî yên koma etnîkî ye ku “...ji bo ku

hişûbîrê bike dîlê xwe hewl dide ku dem û qonaxa berî mêtîngîrîyê jê bibe, bimale” (Césaire, 2005: 49-50). Dîlbûna ku Césaire behsê jê dike, di hîma xwe de, radestgirtin û *wekxwekirina* piştî qonaxa asîmîlasyonê ye ku êdî tu şop ji bîra koma etnîk-bindest nemaye û ji rewşa dîlbûnê jî veger ne mimkun e. Digel vê yekê, F. Fanon jî balê dibe ser mirovê ji koma etnîk-bindest ku piştî demajoya asîmîlasyonê li çerxa *wekxwekirin* û şûştina hiş û bîrê ketiye û dibêje, “Du rehendên mirovê reşik hene. Yek jê derbar hevîjadên wî ne, ya din jî derbar mirovê spî ye. Reftarên wî yên bo mirovê reş û bo yên spî ji hev cihê ne. Ev jihev cudabûn û jihevparvebûna xwebûnîyê bi temamî ji ber pest û çewisandina mêtîngîrîyê ye” (2014: 11). Ev destnîşnakirina Fanon berê me dide ‘jihevbûna’ Löffler ku amaje bi demajoya pêdeçûnê ya asîmîlasyonê dike û amajepêkirinên Strauss yên ‘ziman û lêzimî’yê jî di xwe de dihevine. Loma jî, em dikarin bêjin; heke demajo û pêkanînen asîmîlasyonê ya li ser mirovê koma etnîk-bindest hatî meşandin bi temamî bi ser keve, nexwe ‘hiş û bîr û ziman û lêzimî’ya mirovê bindest rengêkî dîtir digire. Ew êdî ne mirovê berê ye. Loma jî reftarên wî yên bo mirovê bindest û yên bo mirovê serdest ji hev cihê ne. Piştî bandorên demajoya asîmîlasyonê bi her sê qonaxên ku David Cyrstal diyar dike, “1) qonaxa zorê, 2) qonaxa duzimanî, 3) qonaxa yekzimanî” (2015: 98-99-123-124) mirovê ji koma etnîk ya ji hindikanî û bindest êdî xwedî hiş û bîreke dîtir e ku piştî qonaxekê, ji ber ku tu *lêzimî* di navbera nîşan de namîne, mirovê bindest û marastî, dûçarî encamên asîmîlasyonê yên wekî ‘lixwenebanbûn’, ‘durehî’ û ‘cewêlekî’yê tê.¹⁰

1.5 Encamên Mêtîngîrîyê

1.5.1 Nebanbûn

Peyva ‘neban’ di ferhengên kurdiya kurmancî de wiha tê pênasekirin: 1) “neban: wek termeke zoolojiyê û civati, lawîreka mê ya nûzayî ya ku çêleyeka xwe ya sawa hinê mêtîna bî guhanê nake. (Bozarslan, 2018: 333)”¹¹ 2) “neban (II): 1. alîşîk olmayan 2. yavrsunu emzirmeyen hayvan. (Farqînî, 2004: 1270)”¹² 3) “neban: yê hinde tiştan na pejirînît, nemaze kewalên mê, dema kar yan berxê xwe wernagirit û nahêlit şîrê wê

¹⁰ *Cewêlek*: Ev peyv Osman Sebrî bi *nêz-wateya* ‘subaltern-madun’ bi kar aniye. Em ê ji niha û pê de peyva ‘cewêlek’ ji bo vê têgih û naverokê bi kar bînin. (Nivîsara bi navê “Serxwerabûna Fransîyan” ya di pirtûka Hevalê Çak de, *Weşanên Lîs*, 2011, rp, 104 Kovara Ronahî, hejmar...).

¹¹ Me dest neda rastnivîs û rênişa ku M. E. Bozarslan di berhemên xwe de bi kar tîne.

¹² 1. yê/a ku ne hînbûyî ye, 2. ajalê ku kara xwe bi guhan nake

bixot” (Botî, 2007: 433). Di her sê pênaseyan de tiştê hevpar, jixwedûrkirina makê ya berxê xwe ye. Yanî, heyînek heye û ji heyîn (û tiştê) ji derveyî xwe re sar dimîne û jê dûr dikeve. Loma jî, em ê ji vê çarçoveyê bidin ser rê û wekî wateyeke mecazî, vê wateyê, ji hêla makê ve ku ji berxê xwe dûr dimîne, qebûl bikin û bi wateya ku di warê civakî de tê bikaranîn, bi kar bînin. Em ê peyva neban bi temamî bi wateya, ‘sarbûn, dûrketin, jêqetîn û jêveqetîna ji xwe, ji heyîn an jî ji tiştê ji xwe û nêzî xwe’yê bi kar bînin.

Di warê hîskirin û hayjêbûna heyîniyê de, jihevcihêkirina ‘ez û ew’ê çî di nav çandekê de çî jî di navbera çandan de, qada xwe berfiretir dike û di ser vê berfirehiyê re tê famkirin. Wekî mînak; mirovên ku bawerî bi dînekî tînin an jî nayînin, mirovên ku ji herêmekê ne an jî nîn in, mirovên ku maldar in an jî xizan in, mirovên ku ji heman komên etnîkî ne an jî ne jê ne... Ev jihevcihêkirin hemû di roja îroyîn û di biwara têgihbariyê de tê li ser têkiliya ‘ez’ û ‘dîke’yê dimîne. Dîke, li derveyî ‘ez’ê ye û ne derbar ‘ez’ê ye. Em ê di vê qonaxê de careke din jî teoriya Lacan ya neynîkê bînin bîr xwe û bi kurtasî bêjin; Ez, ji bo ku heyî be, ji bo ku were famkirin û hem ew hay ji xwe bibe û hem jî mirovên din hay ji hebûna wî/ê bibin, xwe diyar û pênase dike. Gava ew vê yekê dike, di heman demê de, xetek û qadek ya xwe jî diyar dike; û pê re jî xet û qada heyîna din jî diyar dike û “Ancax dikare bi pênasekirina van qonaxan bibe ‘ez’” (Kiraz, 2011: 153).

Helbet nebanbûn, ne tenê yekalî ye. Heke em nebanbûnê yekalî bifikirin û bêjin, ‘ez’ek heye û hemû heyînen ji derveyî wê ‘ez’ê neban in jê re, nexwe hemû heyîn ji bo hev an neban in an jî ne neban in. Loma jî, nebanbûn têgiheke wisan e ku berê wê bi xwenaskirinê ve ye jî. Digel wê, kirdeyek ji bo xwenaskirinê hewceyî ‘ez’êke dîtir e û divê wê heyîne jî nas bike. Hegel di diyalektîka efendî-kole de ev yek daniye rastê û dibêje; “Efendî kole nakuje. Ji ber ku efendî ‘xwebûniya xwe ya serbixwe’ deyndarî ‘xwebûniya neserbixwe ya kole’ ye” (1986: 143). Gava em bi baldarî li vê pênaseyê dinêrin, dibînin ku teoriya Lacan ya neynîkê û diyalektîka Hegel ji aliyê ‘hevdivêtiya kirde û tişte’yê de digihîjin hev. Em di ewledariya vê pevgihîştinê de dikarin bêjin, ‘neban û nebanbûn’ ne yekalî ye, lê dualî ye; ev dualîbûn li ser dîkekirinê dibe xwedî bingeş û ji bo hatina naskirinê û danîna xwebûniya xwe, -çî serbixwe çî ne serbixwe- her du alî hev divên.

Nexwe em dikarin bêjin, qonaxa dîkekîrînê ji aliyekî ve demajoya nebankîrînê ye jî. Ji ber ku gava kirdeyek xwe pênasê dike, tiştêyekê jî ji xwe re diyar dike; û bi vê diyarkîrînê re wê ji xwe dûr dike; û bi vê dûrkîrînê re jî wê ji bo xwe dike heyîneke ‘xerîb, biyan, namoyî û dereke.’ Dominique Schnapper behsa vê tîkîliya ku li ser neyîniyê ava dibe, dike, li ser du şeweyên vê tîkîliyê dimîne û dibêje,

“A yekem, ‘Reftara ciyawazkerî ye ku cihêtiya di navbera heyînan de heyî tê çesandin. Ev ciyawazî bivênevê li ser hîma ‘kêmbûn’ê tê avakirin. Yanî gava aliyek pênasêya xwe dike, dixwaze bêje, taybetiyên erênî ku bi min re hene bi ‘yê/a din’ re tune ye” (2005: 25-26).

Reftara ciyawazker, dîkeyê hem qebûl dike hem jî wê neyîn (red, înkâr) dike û vê yekê jî bi dorê dike; pêşî ciyawazkirînê piştî jî neyînkîrînê pêk tîne. Ev awa tîkîliya ku bi dîkeyê re tê danîn, gelek rûxîner, tuneke û neyartîhez e. Herçî şeweyê dîtir yê vê tîkîliyê ye, Schnapper di barê wê de dibêje,

“A duyem, ‘Li ser bingeha gerdûnîkerî û asîmîlekerî ava dibe. Ev reftar dibêje, mirov tenê ji ber ku mirov in wekî hev in; û bi vî awayî jî dixwaze bêje, dîke ‘ew’ê de dîtir e. Yanî, ‘dîke’ divê wekî ‘ez’ê be. Ya ku gerdûnî ye di nav çanda ‘ez’ê de tê asîmîlekirin. Ev jî ew şeweyê ku rengê xwe dide dîkeyê û bi vî awayî wê tune dike” (2005: 27).

Di vê reftarê de, jixwedûrkîrîna dîkeyê nakeve behsê. Lê belê çendî ku dîke wekî tiştêyekê di nav kirdeyê de diheve, ew çend rengê wê digire û dîsa ji heyîna xwe, ji rengê xwe, ji pênasêya xwe, ji hayjêbûna xwe dûr dikeve û dîke, -yanî tiştêya kirdeyê-bi awayekî ji awayan dîsa tê neyînkîrîn (înkarkîrîn).

Me di serî de gotibû, nebanbûn demajoyeke dualî ye. Heta vê derê em li ser yekalîbûnê man ku ew jî li ser kirde-tiştê ava dibe ku aliyek her tim kirde aliyê din jî tiştê yanî dîke ye. Îcar, aliyê duyem yê nebanbûnê ew e ku; mirov bi xwe hem bibe kirdeya xwe hem jî tiştêya xwe; yanî mirov bi xwe bibe dîkeya xwe. Di vê qonaxê de, mirovek kîngê xwe bide ber bayê guherînê hingê dikare nêzî xwe bibe û dikare bi xwe re tîkîliyeke kirde-tiştêyî dayne. Gava mirovek bi hişberiyekê dikeve nav demajoya guherînê, bi vê kirîna xwe re dibetîya lixwenebanbûnê jî mimkun dike. Em dikarin bêjin; her tiştê ku diguhere hin tişt û taybetiyên ji teşê û dirûvê xwe yê berê wînda dike. Heke wîha ye, nexwe di nebanbûnê de jî guherînek li dar e. Guherîn, di heman demê de,

kirasguhertin e jî; û ev yek hem dikare ji hêla derveyîn ve hem jî ji hêla navxweyî ve pêk bê. Loma jî, heke kirasguhertin parçeyek ji guherînê be, nexwe "...nebanbûn; bi wateya giştî, bûyîna kesekî ji bilî xwe an jî veguherîna li kesekî ji bilî xwe ye..." (Timuçin, 1992: 16-23). Hemin ku her heyîna ku diguhere, êdî rengê xwe yî berê winda dike û dibe tiştekî nû yî dîtir; û hemin ku "Her guherîn bi awayekî ji awayan nebanbûn e jî" (Kiraz, 2011: 161), mirovê lixwenebanbûyî mirovekî nû yê dîtir e jî. Pê re jî em dikarin bêjin, nebanbûna ku bi 'bûyîna' tiştekî din, bi 'bûyîna' heyîneke din li mirovan diqewime, zêdetir ji ber bandorên derveyîn in û mimkun e ku guherînen hundirîn ne li ser hîm û bingeheke xurt bin. Ji ber ku her çend di 'bûyîne' de guherîn hebe jî, ev guherîn ne li ser vîn û hişberiyê şiyar e. Loma jî, dibe ku her guherîn ne guherîneke erênî be. An jî, dibe ku her guherîn 'nebanbûneke' erênî bi xwe re neyîne. An jî dibe ku nebanbûna di vî warî de dikeve behsê, ji *nebanbûnê* zêdetir, *tunebûn* û *windabûn* be.

Her wisa, ji bo ku em karibin xweşikî ji 'guherîn'ê fam bikin, -ya ku Kiraz behs jê dike û wateyê erênî ya nebanbûyîne lê bar dike-, pêwîst e em berê xwe bidin demajoya 'xweguhertin' û 'xweavakirin'ê. Loma jî, em ê ji serî de hizira xwe daynin û bêjin; 'xweavakirin' ne bi 'guherîn'ê pêk tê, lê belê bi 'xweguhertin'ê pêk tê. Ji bo 'xweguhertin'ê, li mirov merc e ku çandekê biafirîne da ku karibe hem têkiliya xwe ya bi xwe re hem jî têkiliya xwe ya bi xwezayê re saz bike. Ji ber ku mirov bi çanda ku afirandiye, têkiliyên xwe saz dike û çî gava dikeve qonaxa xweguhertinê, 'xweavakirin-xwepêkanîn'ek jî li dar dixê. Li hêla din, nebanbûyîna kes û takekesan û nebanbûyîna girseyî (an jî civakî) jî hene ku hin caran di civakekê de bes beşek an jî hejmarek mirov hene ku nebanbûyîn li wan diqewime. Karl Marx, hem wekî girseyî hem jî wekî takekesî li ser nebanbûyîne disekine. Piştî ku li ser berhênana mirovan ya bi xwe bi xwe re, ya bi mirovên din re û ya bi xwezayê re disekine û wan dadihûrîne, pênasê xwe li ser hîma ked û berginda kedê datîne û dibêje;

"a) di pergala kapîtalîst de, kesên ku dixebitin ne di sehitiya xwe lê di sehitiya karsaz de ne, loma jî li keda xwe neban in, b) ji ber ku berhema ku kedkaran ew hilberandiye ne ya wan e lê ya karsaz e, kedkar li berhema xwe neban in, c) mirovê ku li keda xwe li berhema keda xwe neban be li xwe jî neban e, d) mirovê ku li keda xwe neban bûye li heyîn û mirovên derveyî xwe jî neban e" (2007: 28-29-30-31).

Di pênasikirina Marx de, bala me diçe ser, ‘xwedîbûna keda xwe.’ Û hema di pey re jî gava em bala xwe didin pênaseya Hegel ku li ser nebanbûnê dibêje,

“Ez’a ku hê negihîştiye hişberiya hebûna xwe, (*tez*) ji bo ku bigihîje hişberiya hebûna xwe rastî heyîna ku ne ‘ez’ e, yanî rastî dikeyê tê (*antîtez*) û di dawiya vê lêrasthatinê de, ‘ez’ êdî ‘ez’ek e ku gihîştiye hişberiya hebûniya xwe (*sentez*)” (1986: 33-34).

Em dikarin bêjin, ‘he(xwe)bûniya’ ku bi pênaseya Hegel dide der û nebanbûyîn di ser wê re tê pênasekirin, li ba Marx, bi rengekî din, bi rêya kedê û ‘xwedîbûna keda xwe’ derdikeve rastê. Hegel di ser ruh, giyan û hayjihebûnaxwe re nebanbûyînê dide ber qonaxan û di dawiyê de awayekî azadiyê an jî hayjixwebûneke taybet dispêre takekesan. Marx jî vê azadiyê di ser xwedîbûna kedê re dide takekesan. Di pênaseya Hegel de nebanbûyîn takekesî ye, lê di pênaseya Marx de, nebanbûyîn hem takekesî hem jî girseyî (an jî civakî) ye.

Ji hêla din ve, ‘takekes’ carinan di nav girseyê de wekî ‘her kesî’ ye. José. O Gasset balê dibe ser vê rewşê û der heqê mirovê ku di nava ‘her kesî’ de dijî, wiha dibêje,

“Di dîroka mirovahiyê de, ji bo takekes sê qonax hene ku bi awayekî zêde û geremolî tim dubare dibe; 1) takekes hest pê dike ku xwe winda kiriye, di tiştên derdora xwe de kûr çûye; ev dîkebûn e, 2) takekes bi hewldaneke xurt dikişe nav kozika xwe û li ser tiştên li dorhêla xwe û li ser serdestiya xwe ya li ser wan hiziran çêdike; ev yek dikûrdeçûna xwebûniyê ye, 3) takekes car din li dinyayê xuya dike û li gorî pîlana ku berê hatiye kirin, dest bi liv û tevgerê dike; ev jî çalakî, jiyana çalak, yanî praxis e” (1995: 38).

Li ser van peytên Gasset bala me car din diçe ser pênaseya ‘jixwedûrketina’ ku Hegel behs dike. Ev pênas li ba Gasset dibe ‘xwejêdûrxistineke bi xwehişberî’ û ‘lixwevegerîna’ Hegel ku bi bandora tiştên derveyîn pêk tê li ba Gasset bi hişberî diqewime û bi ‘çalakî’ li xwe vedigere, xwe heyî dike û nav lê dike ‘çalakiya jiyane-praxis’. Her wiha, Gasset bi van peytên xwe re bala me dibe ser takekesê di nav girseyê (civakê) de û em pê dizanin ku; gava mirov di nava ‘her kesî’ de ciyek bide xwe û piştî xwe li rastiya heyî (an jî li heqîqetê) bizivirîne, li xwe neban dibe. Yanî Gasset jî, bi

wateya lêçûn (dirûvpêketin) û bûyîna wek dîkeyê; bûyîna wek her kesî, bûyîna wek dorhêlê û bûyîn kesê ji derveyî xwe), wekî (li xwe)nebanbûyîn qebûl dike.

Yek ji hêmana ku têkiliyeke xwe ya nêz bi nebanbûnê ve heye, çand e. Ji ber ku “Çand, awayekî mirovîkirina xwezayê ye” (Uygur, 2003: 17) carinan ew bi xwe dibe kan û kewara nebanbûnê. Loma jî, di heman demê de warek e ku mirov bi xwe diafirîne, ava dike û tê de dijî; û em dikarin bêjin, çand, wekî berhemeke mirovan, ne xwezayî ye. Hemû tiştên di vê berhemê de ji xwezayê dûr in loma jî nebanbûn bi mirovan xuya dike û derdikeve rastê. Her wiha, mirov gava çandê diafirînin, li xwezayê neban dibin. Bi vê wateyê, çand qonaxa tiştêbûnê ye jî. Mirov ji bo ku xwe ava bikin, dikevin nav hin çalakiyan; çanda ku diafirînin, bi çalakiyên mirovane yên “bi rêya ziman, dîn, mîtos, huner, zanistê” (Cassirer, 1980: 71), ji nifşekê vediguhêzînin nifşa dîtir û hebûna xwe, xwebûna xwe, hayjixwebûna xwe û çalakiyên xwe didomîne. Di domana vê demajoya veguhastinê de, çand jî mirovan bi pêş dixê û ji ber ku “Çand, helûmerca sereke ya hebûnîya mirovan e” (Uygur, 2003: 18) bi pêdeçûna dem û qonaxên veguhastinê re, çand û hemû hêmanên wê dibin rengêkî taybet ya hebûna takekes û civakê.

Em dikarin li ser van pêzanînan hizirekê ava bikin û bêjin; hemin ku çand yek ji taybetiyên xweser û sereke ya civakan e û her civak xwedî çandêke taybet e; û ji ber ku her gel û komên etnîk, bi awayekî û li gorî xwe têkilî bi xwezayê re daniye û destkariyên xwe jî li gorî wê pêk aniye, jihevcihêtiya di navbera civakan de heyî jî diyardeyeke ne xwezayî ye. Loma jî divê guherînen ku di çanda civakekê de çêdibin dîsa bi destê endamên wê civakê ve bînin pêkanîn û çî gava, ji derve de, ji alî çanda serdest ve destkarî li çandêke were kirin, wê gavê çilvirîna wê çandî dikeve behsê; û çanda destkarî lê hatî kirin, bi hêmanên ku ‘ne jê ne’ û dikevin navê, diçilvire; ji kan û sedemên xwe yên afirînê dûr dikeve û bi her qonaxê re jî hêmanên wê yên resen tên tunekirin û windakirin; helbet ne tenê hin hêmanên tên windakirin, di heman demê de civakek (û pê re jî takekes) bêbîr û bêdîrok tên hiştin.

Helbet windakirina çandan û pê re jî bêbîr û bêdîrokhiştina takekes û neteweyan ne bi pêwendiyêke xwezayî ye; bi destkariya hêzekê pêk tê ku “Çand, bi demê re, bi awayekî êrîşkar, bi netewe an jî netewe-dewletê re tê bilêvkirin; û dibe kana zanavê û ‘em’ê ji ‘ew’ê cihê dike” (Said, 1998: 4). Tundiya ku Said bi gotina ‘êrîşkar’ behs jê

dike, kana sereke ya pêkanînên serdestiya mêtinger e. Serdestiya mêtingeriyê, serweriya nîrxên çandên xwe li civak û komên etnîkî yên bindest ferz dike û pê re jî çanda gelê bindest bînîrx dike. Ji ber ku çanda gelên bindest jî destkariyeke dîrokî ye li ser xwezayê û bi qonaxên dîrokê re hatiye afirandin û ji ber ku serdest tu serwerî li ser xwe qebûl nakin û “dixwazin çanda xwe di navenda jiyanê de bi cî bikin,” (Fromm, 1981: 48) her tim di nav hewldanê de ne ku destkariyê li çanda bindestan bikin. Ev destkariyên ku di her helûmercê de bi rêya ziman tên pêkanîn, derbeke taybet li hiş û bîra mirovên bindest dixin û ji demekê û şûnde jiyar û ezmûnên wan “li bêjînga bîr û hişberiya wan nakevin; û dimînin di qada derhiş de” (Fromm, 1981: 54) û her ku diçe ‘jêdûrbûnek’, ‘hayjênebûnek’ û ‘neçalakiyek’ê ava dîkin bi mirovê bindest re û wekî encama vê qonaxê berê takekesên bindest bi alî lixwenebanbûnê ve diçe. Hemî ku ziman hêmaneke sereke ya çandê ye, nexwe mirovê marastî, bi gelek navgînên asîmîlasyonê; bi taybetî bi tundiya ku bi ‘kêmnîrxkirina nîjadî’ tê meşandin, ji hebûna xwe, ji hêmanên hebûniya xwe sar dibe, jê dûr dikeve û piştî bihurîna di qonaxekê re, li çand û zimanê xwe neban dibe.

1.5.2 Durehî

Durehî, serê pêşîn wek peyveke teknîk ya bîyolojîyê tê zanîn û qebûlîkirin. Durehî, di bîyolojîyê de wekî, “Cureyê nû ku ji pevgihana du ajal an jî riwekan çêdibe” (tr.m.wikipedia.org) tê pênasekirin. Her wiha, di fehenga Salah Saadallah de jî durehî wekî, “hybrid. durîh, pîç, dureg, melezi” (2000: 534) tê pênasekirin. M. E. Bozarslan jî wiha pênase dike durehiyê, “dureh, 1-kesê ku jî alî dê û bavê xwe ve jî du nejadan e. 2-Lawîrê ku jî du lawîrên jî du rehên cuda hatîne dinê” (2011: 783). Em ji van pênaseyan digihîjin ser fikrekê û dikarin bêjin, durehî (melezi), ji pêkvedana ji du reh, ji du nîjad û ji du cureyên ji hev cuda pêk tê.

Me destnîşan kiribû ku asîmîlasyon, wekî pêkanînekê meyla xwe dide ser wekhevîkirinê û vê yekê jî bi jinavêrakirina cudatîyên heyî pêk tîne. Wekî ku M. Bourse ji bo asîmîlasyonê balê dikêşe ser etno-parêziyê û bi taybetî dibêje, “Asîmîlasyon, di çarçoveya civakî û komelî de diyardeya wekhevbûnê diyar dike; wekî bingehe asîmîlasyon çalakiya wekhevîkirinê ye...” (2009: 81). Çalakiya ‘wekhevîkirinê’ ku Bourse balê dibe serê, li ba Löffler dibe ‘wekxwekirin’ ku di bingeha xwe de digihîje dûrxistin û qetandina etnîsîteyekê ya ji borîroja xwe. Helbet borîroj, ne tenê ew demajo,

çalakî û hilberandin in ku li paş rojên îroyîn mane. Têkiliyeke borîrojê ya bi roja îroyîn re heye û ev têkilî bestîneke xurt bi dema niha re çêdike. Çendî ku borîroj bi awayekî giştî û ji gelek hêlan ve li ser qebûlkirina hizira, ‘borîroj maye di borîrojê de’ dimîne jî, “Dema borî tu carî ne ew tişt e ku di borîrojê de qewimiye: dema borî tiştêkî wisa ye ku her tim di nav dema niha de geş û zindî ye” (Bergson, 2013: 46). Heke em li ser vê fikra Bergson bimînin, em ê karibin bêjin, nexwe çalakî û berhênanên ku di borîrojê de hatine pêkanîn, di heman demê de li gorî hiş û bîra wê demê hatine kirin û her roja ku ji bo roja îroyîn bûye borîroj, di nava xwe de hiş û bîreke çandî û zimanî jî dihevine. Digel vê jî, borîroj bi çalakî û berhênanên xwe ve bîreke çandî jî ava dike. Loma ye ku xwehişberbûna mirovan, di vî warî û di qonaxa avabûna bîra çandî de girîng û kartêker e ku “hişberiyêke bêbîr tune ye” (Bergson, 2013: 63). Nexwe em digihîjin ser fikrekê û dikarin bêjin, asîmîlasyon bi pêkanîna xwe ya ‘wekxwekirin’ û ‘wekîhevkirin’ê re, mirovan ji bîr û borîrojan wan jî sar û dûr dike û bi vî awayî jî dike ku mirov li xwe neban bibin. Lixwenebanbûna mirovan, di qonaxa duyem de ku Gasset diyar dike, mayîna di nav nal û bizmar de ye. Ev demajo, li ba Gasset, demajoya lixwegeerîn û dikûrdeçûn e ku ji bo avakirina xwebûniyê bingeh e. Li gorî peytên Gasset, di dawiya qonaxa duyemîn de, takekes xwe ji dîkebûna ji qonaxa yekem bêrî û safî dike û wekî heyîneke xweser li xwe vedigere. Ev lixwevegerîn bi temamî li ser xwehişberiyê ye. Loma jî, çalakiya jiyanê û praxisa tê de li dar e. Çalakî û praxisa li dar ketî, takekes dibe di qonaxa sêyem ya Gasset destnîşankirî de bi cî dike ku Gasset qonaxa sêyem, wekî qonaxa xwehişberiyê diyar dike; û ev qonax ji hêla bîra çandî ve qonaxa rizgarbûna ji nebanbûnê ye jî. Ji ber ku “ji bo hunera bîrê şûngeh çî be, ji bo çanda bibîrxistinê jî dem ew tişt e” (Assman, 2001: 35) dem; hem bi pêkanînen asîmîlasyonîst û dîkekîrinê dibe sedema pêkanînen jixwedûrman û lixwenebanbûnê hem jî bi kartêka hiş û bibîrxistina demê, dibe diyarkera lixwevegerîna li ser bîra çandî.

Ji hêla din ve, bîr, ne tenê ew tişt e ku; tiştên ku di borîrojê de bi serî de hatine û qewimîne di hiş de bîr zindîkirin. Bîr wekî berhênanana takekesî an jî tevayî (kollektîf), veguhastina borîrojê ya bo roja îroyîn e. Çi wekî takekesî çî jî wekî tevayî, bîr bi awayekî çandî jî tê avakirin. Loma jî Paul Connerton bala me dibe ser vê yekê û dibêje, “Bîr, demajoyêke wisa guherbar e ku ji borîrojê zêdetir ji alî dînamîkên dema têdeyî ve tê diyarkirin. Bîr li gorî pêdiviyên dema têdeyî ji nû ve reng û dirûv digire” (1999: 25-31). Ger em di ast û benda takekes de li van peytên Connerton binêrin, em ê karibin

bêjin, bîra takekes wekî berhênana takekesî, li gorî roja îroyîn borîrojê bi bîr tîne û tiştên bi serî de hatî û hilberandî di roja îroyîn de car din saz dike û bi wateya Gasset diyarkirî, bi rêya çalakiya (praxis) takekesî, xwe di roja îroyîn de ji nû ve ava dike. Her wisa, digelheviya bîr û kevneşopê pêwendiya di navbera takekes û civakê de heyî tîne bîra me ku em dikarin bêjin; her takekes cuda cuda bi bîr dixê û bi hev re kevneşopên civakî pêk tînin. Digel takekesî, aliyekî wê yî tevayî (kollektîf) jî heye ku takekes di heman demê de tiştan bi heman awayî an jî nêzî hev bi bîr tînin. Ev yek jî tevayîbûna (kollektîfbûna) bîra wan diyar dike.

Em digihîjin pêşencamekê û dikarin bêjin; çî takekes bi tena serê xwe dikare bi bibîrxistinê borîrojê bîne roja îroyîn û li dar xîne, çî jî civak wek tevayî dikare wê yekê pêk bîne. Loma jî, lihevkerin û hevdemiyek jê re pêwîst e ku di heman demê de pêqayîliya civakê jî tê de bi cî dibe. Em dikarin bêjin ku heke civak pê qayîl be û tercîh bike jî, takekes wek kirdeyekî bibîrxistinê pêk neyînin, dê gerdîş pêk neyê. Loma jî, em ê bêjin; di her helûmercê de girîngiya takekes heye û em ê car din biçin ser qonaxên Gasset diyarkirî em ê ji *qonaxa dîkebûnê* dest pê bikin, di ser *qonaxa kişîna nav kozika* xwe re bibihurin û bigihîjin *qonaxa liv û tevgera ku jiyanê praxis* li dar dixê.

Di qonaxa yekem de, takekesê dîkebûyî, hem pêkanîna ‘wekxwekirin’ê lê hatiye qewimandin hem jî bûye tiştê kirdeyekê serdest û çendî ku nexuya û xumam be jî ji kok û bingeha xwe ya çandî bi temamî qut nebûye. Yanî çendî ku li xwe neban e jî, ji aliyê hestpêkirinê ve, bi tayekî xav be jî, hê jî li ser hîm û bingeha xwe ye. Ji ber hindê, çendî ku di vî halî de jî durehiyek pê re peyde bûye jî hêj ne di haya rewşa xwe de ye. Tenê hest pê dike û di asta ‘ruh’ de ku Hegel diyar dike, jê haydar e. Loma jî, pêwîst e takekesê ku di vê qonaxê de ye, vekîşe nav kozika xwe, di kûr de biçe û li ser xwe bihizire. Di vê demajoyê de, takekes bi temamî ji civakê qutbûyî ye û di qonaxa biryargirtinê de ye. Takekesê ku biryara xwe li ser xwebûniyê datîne, di qonaxa sêyem de car din xuya dike. Yanî, car din dibe kirdeya xwe; û êdî ev kirdebûn ne tenê bo xwe ye, bo heyînên dîtir e jî. Ji ber ku dest bi liv û tevgerê dike, yanî çalakî û praxisa jiyanê li dar dixê; û di jiyanê çalakgeriyê de, dîketiya lê qewimandî nade aliyekî û li ser biryara xwebûniyê xwe(ve)avakirinê pêk tîne. Takekesê ketî behsê êdî ne neban e; ew heyîn e ku ji qonaxê nebanbûnê bihuriye û di dawiya vê qonaxê de, bi çalakî jiyanê xwe, xwe veava kiriye û êdî ew; xwedî du ‘ruh’, xwedî du bîranîn, xwedî du çand û xwedî du zimanan e.

Herçî takekesê di qonaxa sêyem de ye, jiyana xwe li çerxa çalakiyê xistiye û bûye kirdeya xwe, êdî durehî ye. Ev durehî, ne li ser ‘serdestiya rehekê’ ava ye. Helbet, her ‘reh’ek li gorî çalakiya ku takekes di jiyana xwe de li dar dixê, li dar e û digel çalakiya takekesê çalak e. Ev çalakî bi temamî li ser ‘xwehişberî’yê ava ye ku di vê qonaxê de tu xem û arîşeya hatina nasînê û hatina zanînê bi takekesî re çênabe.¹³

Xwedîbûna du hiş û bîrî, yanî rewşa ‘durehî’yê, ne tenê mayîna di navbera du ziman û çandan de ye. Her wiha, hayjêbûnek e ku bi rêya jihevcihêbûna çandan dide der. Hêmanên çandên ji hev cihê ku nûnertî dike bo têkiliya *lêzimîyê* ya di navbera komên etnîkî de, dike ku her yek hêman bi tena serê xwe bibe diyarker di avabûna hiş û bîra durehî de. Yanî hişê durehî, hem ji bo xwe xwehişberiyê ava dike hem jî ji bo hebûniya heyîna din xwehişberiyê ava dike.

Ji ber ku asîmîlasyon yek ji pêkanîna sereke ya mêtîngeriye ye û rasterast berê xwe dide otantîkiya ziman û çanda komên etnîk yê bindest, dibe ku durehî, her tim ne tişteki erênî be û ji alî mirovê marastî ve wekî kartêkeke neyînî bide der. Yanî çendî ku li gorî pênaseya nebanbûnê ya Gasset kirî, di qonaxa sêyem de, takekes digihîje qonaxa ‘çalakî û praxisa jiyanê’ û me ev qonax bi çalakiya ‘xwehişberiyê’ û bi qonaxa durehîbûnê ve bestand jî, durehî; her tim ne bi xwehişberiyê pêk tê. Ji ber ku dibe ku takekes di qonaxa duyem de bimîne asê û nikaribe di asta hişberiyê de hay ji dîketiya xwe hebe û loma jî jê neyê ku di warê bibîrxistina bîra çanda xwe ya resen de çalakiyekê li dar xe û mimkun e ku di vê rewşê de, takekes –an jî civak- bimîne wek durehê bi dil. Armanca me ji vê gotinê ew e ku em dixwazin bêjin, dibe ku durehî wekî; a) *durehiya bi dil*: Ev cure durehî, li hember asîmîlasyonê ne bi gazin e û pê razî ye ku li çand û zimanê xwe, li heyîna xwe ya etnîkî neban bibe, loma jî ji alî serdest û mêtîngeran ve çî li ser bê pêkanîn, dipejirîne. Ev awa durehî, di heman demê de ketina takekesê ya ber çerxa asîmîlasyonê ye û temambûna demajoya nebanbûnê ye ku takekes êdî ji hemû taybetiyên çand û zimanê xwe- û her wiha ji taybetiyên otantîkiya xwe- dûr e û pêkanînen ‘wekxwekirin’ û ‘wekîhevkirin’ê bi rêjeyeke zêde li serê xuya ye. Her çî qas wekî pêhisîn rengê xwe yî otantîk û çanda xwe ya resen bi xwe re bigerîne jî, ne mimkun e ku takekesê bi vî rengî ku kefi behsê, derbasî qonaxa sêyem bibe; bi şêweyekî xwehişberiyê hay ji otantîkiya xwe hebe û pê re jî xwe ji nebanbûnê bêrî û rizgar bike û

¹³ *Xwehişberî: em ê vê peyvê bi wateya, (bi îng: self-consciousness, bi tirkî: öz-bilinç) bi kar bînin.*

têkeve qonaxa durehiya berevajîker; b) *durehiya berevajîker*: ku li ser çalakkirina jiyanê û şikandina qonaxa nebanbûyîna ava dibe û ji ber ku durehiya berevajîker “Demajoya berevajîkirina neyînkirina fermî ye. Durehî, terabûn û jicîşiqitîna hemû qadên serdestî û jihevcihêkeriyê nîşan dide. Durehî, daxwazên narsîstîk û lasayîker yên hêza mêtînger li hejê dixê” (Bhabha, 2016: 219-223) Loma jî, ji bo ku karibe li ser zanava takekesî û etnîkî xwe heyî bike, pêwîstî bi berevajîkirineke giştî dibîne ku Bhabha vê qonaxê wekî “demajoya berevajîkirina neyînkirina fermî” (2016: 223) bi nav dike.

Demajoya ‘berekavîkirina neyînkirina fermî’, di heman demê de, hem ‘xwerizgarkirina ji nebanbûnê’ hem jî gavavêtina berpêyî ‘durehiya berevajîker’ dihevinê di xwe de. Ji ber ku di her duyan de jî, libersekinîn û berhîngariya bo serwerî û otorîteya fermî heye ku li ser pêkanîna asîmîlasyonê, ‘wekxwekirin’ û ‘wekîhevkirin’ê li xwe dike armanca sereke. Rabûna takekesê marastî ya li ber fermîbûna neyînker ya mêtîngeriyê, dike ku otorîteya çanda otantîk û resen –ya ku ji alî serdestiya mêtînger ve hatiye binpêkirin- car din û ji nû ve çalak bike. Ev çalakkirîn, bi temamî ew qonaxa çalakkirîna jiyanî û praxisê ye ku Gasset behs jê dike.

Takekesê ku karibe xwe bigihîne asta ‘durehiya berevajîker’ hewceyî ‘nasyariyeke hevger’ e. Çi gava ji qonaxa duyem ya Gasset diyarkirî derbasî qonaxa sêyem dibe û çalakiya jiyanî li dar dixê; û êdî nebanbûna ku bi nasyariya çand û zimanê serdest yê mêtînger pêk hatiye, dikeve qonaxa berevajîkirinê. Demajoya vê berevajîkirinê kartêka ‘xwenaskirina di ser heyîna din re’ (Bauman, 2018) û ‘xwedîzanavbûnê’ (Bhabha, 2016) zêdetir dike ku hem di warê ‘zanava etnîkî’ hem jî di warê ‘zanava takekesî’ de li dar e û ‘qonaxa xwedîzanavbûnê’ dike ku takekes bi xwehişberiyekê xwe ji kartêkên neyînî yên nebanbûnê bêrî û xelas bike û berê xwe bide kartêkên erênî yên ‘durehiya berevajîker.’

1.5.3 Cewêlekî¹⁴

Peyva cewêlek, bi şêweyê ‘subaltern’ berê “li Ewrûpayê, ji bo pênasekirina tişteki leşkerî dihat bikaranîn” (Spivak, 2017: 83). Wekî têgiheke polîtîk, cara yekem ji alî Antonio Gramsci ve hatiye bikaranîn. Gramsci, “Ji bo ku nekeve ber benda sansûra girtîgehê, peyva cewêlek li şûna peyva proleter û bi wateya ‘çîna rêjeya duyem’ bi kar tîne” (Raguhaştin: Spivak, 2010: 55). Lê belê, piştî vê bikaranînê Gramsci bi xwe jî ji vê wateya ku lê bar kiriye dûr dikeve û bêjar û têgiha ‘cewêlek’, li gorî biwar û dîsîplînên ku tê de tê bikaranîn, wateyeke taybet û xweserî wê biwarê hildide. Ebru Yetişkin, ji bo ku têgih baş were famkirin, xebateke taybet dike û wiha dibêje, “Li şûna ku peyva cewêlek, zanaveke ku kom û grubekê nîşan dide, pênase bike, divê wekî dînamîkekê bê nîrxandin ku dibe sedema guherîna civakî û ‘dîtirbûnê’ di xwe de dihevine” (2010: 15). Ev balpêdana Yetişkin, wateya têgiha cewêlekê berfirehtir dike û rê li ber me vedike ku em karibin di biwarên dîtir de jî li ser têgihê bihizirin. Dîsa, Spivaka ku di vî warî de xebatên berfirehtir û kûrtir kirine û hema bêje têgiha cewêlekê pê re tê bilêvkirin, di biwara marksîst û femînîzmê de car din şîrove kiriye û rehendekê dîtir daye pênaseya têgiha cewêlekê. Spivak pêşî diyar dike û dibêje, “Cewêlek, ne ew kesên ku fermanê didin, lê kesên ku fermanê hildidin, tîne bîra me. Cewêlek, di heman demê de, wan kesên ku nikarin bigihîjin pergalên hevvelatîyê tîne bîra me” (2017: 21). Bi pênaseya Spivak, berê me diçe ser kirdeya serdest û mêtînger ku ‘dîketî’ li mirovên bindest pêk anîye. Loma jî, rehendekê dîtir ya têgiha cewêlekê derdikeve mexderê ku em dikarin bêjin, cewêlek di biwara sosyo-çandî de jî li dar e ku ji aliyê pêkanînên leşkerî, ekonomî-polîtîk û bêjarên mêtînger ve tîne fînansekin. Spivak jî balê dikişîne ser vê yekê û dibêje, “Mêtîngerî, di helûmercên ekonomî-polîtîk yên ku ji hev cihê dibin, di qonaxên dîrokî û di cografyayan de bi modelên heterojen re dixebite ku ji yekê zêdetir in” (2010: 59). Xuya ye ku yek ji modelên heterojen yên ku Spivak balê dibe serê, modela çanda etnîkî ye ku digel pêwendiyên serdest(î)-bindest(î)yê li kar e.

¹⁴ *Cewêlek*, (bi îng: *subaltern*, bi erebî: *madun*): Me ev peyv ji Osman Sebrî wergirt. Sebrî di pirtûka xwe ya bi navê *Hevalê Çak* de, gava behsa *tewqeyên çînî* yên Fransîyan yên ku li *Sûrî* dijîn dike, vê peyvê ji bo çîna herî jêr bi kar tîne û wiha dibêje, “Hingê di welatê *Franseyê* de sê birr xelk hebûn ku torin, olvan û *cewêlek*” (2011), *Hevalê Çak*, Diyarbakir: *Weşanên Lîs*, çapa yekemîn, rp, 104

Ji ber ku mêtîngeriya rengmodern jî wekî cureyekî serdestiyê ya modern e, loma jî, bi taybetî pêwendiyên kirde-tîşte ku ji bo serdestiya mêtîngeriya rengmodern li dar e, têkiliyên ‘ez’ û ‘dîke’ yê jî her heye. Çendî ku dîke(tî) têgih û afiraneke modernîzmê ye jî, di modernîzmê de, ji bo yê/ya din nîşandana rûxweşî tu car nakeve behsê. Tuğrul İlter di warê dîkeyê de jî pala xwe dide Bauman û dibêje, “Dîke ne biyan e, nas e. Her wiha cudatiya wê jî cudatiyeke kedîkirî ye; cudatiyeke pêşî hatiye kedîkirin paşê hatiye nasîn û piştî jî hatiye famkirin” (2006: 4). Têgih û pêkanînen ‘kedîkirinê’ ku İlter bala me dibe serê, di rave û şîroveyan cewêlekê de gelek kêrhatî ye ku em karibin xweşîkî tê bigihîjin û bêjin; Cewêlek ji hêlekî ve jî, ji wan mirovan pêk tê ku serdestiyê nekariye wan kedî bike-an jî bi gotineke din, nekariye an jî nexwestiyê wan bike dîke.- Bülent Somay, pêşî li ser hevoksaziya Îngilîzî ya cewêlekê disekine û balê dikişîne ser ‘sub’ê ku di peyva Îngilîzî ya ‘subaltern’ de heye û dibêje,

“Divê em nebêjin qey her kesê ku li ‘jêr’ e, cewêlek e. Ji bo ku kesek, komeke etnîk, çandek, jinek, proleterek, gundiyeke, reşîk, hevzayend bibe cewêlek divê bibe aliyekî serdestî-bindestiyê ku di têkiliyeke deshilatîyê de heye; yanî cewêlek digel dîkeya xwe (an jî wekî dîkeya yê/ya din) heye” (2008: 155).

Somay, asoyeke dîtir û berfirehtir datîne pêşberî me ku em di warê famkirin û ravekirina têgiha cewêlek de hinekî din jî pêşde diçin û dikarin bêjin; ji bo hebûna cewêlekiyê têkiliya serdest(î)-bindest(î) wekî tiştêkî bivênevê ye. Êdî xweş diyar e ku pêwendiya di navbera ez û dîkeyê de heyî, ji bo heyîbûna serdest(î) û bindest(î) yê jî tiştêkî bivênevê ye. Loma jî İlter car din bala me dibe serê û dibêje, “Ji bo ku em karibin hê xweşiktir ‘dîke’ yê bizanibin, em di hemû helûmercan de, hewceyî têkiliya diyalektîk ya di navbera ‘ez/dîke’ de heyî ne ku Hegel daniye” (2006: 4).

Demajoya tiştêkirinê ya mêtîngeriye, di heman demê de demajoya heyîkirina xwe ye jî. Loma jî, divê pêşî aliyê ku qels e, bihata çewisandin û kêmxistin. Heke pêkanîn û sepandinên mêtîngeriye bi rêyeke razîbûnê bihata qebûlîkirin û biçûya serî, wê hingê dê tiştêya afirandî wek ‘dîke’ bihata qebûlîkirin. Demajoya ku pêkanîn û sepandinên pircure tê de bi cî dibû, wekî asîmîlasyon dihat bilêvîkirin. Spivak jî li ser vê demajoyê disekine û bi şîroveyekê re vê demajoyê wekî, “Naskirina dîkeyê ya bi rêya asîmîlasyonê” (2016: 73) pênase dike. Bi vê raveya Spivak em pê dizanin ku

asîmîlasyon, ne tenê pêkanîneke ‘wekxwekirin’ û ‘wekîhevkirin’ê ye, di heman demê de jî, pêkanîneke seandinî ya ‘nasîn-zanînê’ ye ku di dawîya demajoya dîkekîrînê de pêk tê. Li hêla din, Shiva li ser demajoya ‘nasîn-zanîn’a dîkeyê wiha dibêje, “Mêtinger(î), pêşî takekes (an jî civak), bi pêkanînên ‘anîna ser kêmxistinê’ û ‘şîdeta epîstemîk’, nîvhêro dike, yanî tîne ser rêya heqiyê û dike meriv, paşê wî/ê wekî dîke dinase” (1993: 232). Di vê demajoya nasîna dîkeyê de, pêkanîna ‘şîdeta epîstemîk’ girîng e ji bo angaştî xwe ya diyarkirina ‘cewêlekî û cewêlekîrîna çandî’ ku em ê li serê bisekinin. Michel Foucault, der barê epîstemeyê de pênaseyekê dike û wiha dibêje, “Epîsteme, ew pergal e ku; ji jihevderxistina rastiye ya ji çewtiyê zêdetir, pêkan dike ku rastiye ji rastiya ku ne zanistî ye were jihevderxistin” (2011: 222). Bi vê pênaseyê em tê digihîjin ku du rengûawayên rastiye heye; yek jê ji çewtiyê tê jihevderxistin ya din jî bi me dide zanîn ka rastiya wê çendî zanistî ye an na. Nexwe, rastiya ku dê ji bo angaştî me bibe rênîşandêr û em ê bala xwe bidinê û tê bixebitin ku kartêk û encamên ‘şîdeta epîstemîk’ daynin rastê, ew rastî ye ku dê berê me bibe ser ramana zanistî. “Spivak, ji têgiha ‘şîdeta epîstemîk’ ya Foucault daye ser rê û têgiha, ‘binpêkirina epîstemîk’ saz kiriye” (Yetişkin, 2010: 18). Binpêkirina epîstemîk, bi rêya şîdeta epîstemîk tê pêkanîn. Loma jî, tê de pêwendiyên serdest(î)-bindest(î)yê heye ku berê me dide desthilata ku zanîn-agahiyê di destê xwe de dihele û “Mirov dikare şîdeta epîstemîk wekî ‘bernameya bêdenghiştinê’ pêk bîne ku dike ku pêwendiyên desthilatî û serdestiyê car din were hilberandin” (Yetişkin, 2010: 18). Bernameya ku desthilat ji bo ‘bêdenghiştinê’ saz dike û pêk tîne; bi temamî ‘bêparhiştina ji zanîn-agahiyê’ li xwe dike armanc. Loma jî, pêkanîna mêtingeriyê dixwaze kirdeya ku tê marastin, li gorî armanc û mebestên mêtinger û wekî ‘dîkeya’ wê ava bike û pê kar bike. Helbet mêtinger vê yekê bi lêferzîkirin û xurtîlêkirinê pêk tîne. Lê belê dibe ku rêbazên vê xurtîlêkirinê, bi sê awayan be; 1) bi kotek û darê zorê, 2) bi lêferzîkirina meşrûbûna qanûnî, 3) bi qayîliya dil. Zanîn-agahiya ku tê hilberandin, bi van rêbaz dibe navgîneke desthilatîyê û digel ku bi van rêbazan cewêlek bêdeng tê hiştin jî, gava bernameyên aborî, çandî û polîtîk tîne pêkanîn, şîdeta epîstemîk derdikeve holê.

Di vê qonaxê de, pirsê ‘gelo hiş û hişberiya mirovê rastî şîdeta epîstemîk hatî û hatî ‘cewêlekîrîn’ çawan li kar dikeve û çalak dibe?’ me li xwe şiyar dike. Ji bo bersiva vê pirsê, em ê serî li Bauman bidin ku dibêje, “Mirovê ku hatiye dîkekîrîn, serê pêşîn di qada hatina nasînê de hatiye bicîkirin” (2018: 66). Loma jî, hatina nasandinê ya takekes,

dibe bingeh ku hişberiya wî li ser pêqayîliya dîketiyê ava bibe. Ev hişberî, li gorî kartêka xwendewariya takekes reng dide xwe. Heke takekes, yek ji tewqeyên civakê yên xizan an jî ji koçber û bindestan be, dibe ku rengê hişberiya vî takekes, ji ber bandora sepandin û pêkanînên serdestiyê, zêdetir nêzî hişberiya serdestan be. Digel vê jî, ji ber ku Spivak ji hêla dîtir ya berevajî de lê dinihêre, balê dikişîne û dibêje,

“Ne tenê mirovên xizan di nav têgih û pênaseya cewêlek de bi cî dibin. Di heman demê de, cewêlek ji wan mirovan pêk tê ku; di warê çandê de bi pêş ketine, rastiyê an jî qenciyê pir baş nas dikin û dizanin, lê belê ji maf û derfetên xwe ‘bêpar’ mane” (2016: 95).

Em bi vê peyt û balpêdana Spivak, li ser wê fikrê dimînin û dikarin bêjin; mirovên ku di gelek waran de bi pêş ketine û di bikaranîna agahiyê de bi tu awayî tengas namînin, bi rêbaza ‘veşartina agahiyê’ û bi pêkanînên desthilata sermiyandar an jî mêtîngeriya yên cure cure, ji mafên xwe hatine bêparkirin; loma jî vê bêparî û bêderfetiya kiriye ku ew bibin cewêlek. Helbet cewêlekbûna wan, nikare kartêkê lê bike ku xwehişberiya mirovên xwende ku ji berê de çalak e, li paş perdeyê bimîne.

Em ê di vê qonaxê de, ji bo gihîştina encamê, warê likarketin û çalakebûna hişê cewêlek li xwe bikin qada hûrgerandinê û di pirsan de biçin û bêjin: Gelo çi kartêk dibin sedem ku cewêlek jiyanê xwe li kar bixin û bi wateya Gasset diyar kirî de çalakiya jiyanî, -praxisa jiyanê- pêk bînin? Û heke takekesê cewêlekkirî bizanibe ku digel her tiştî jî hin tişt hebin û nehêlin ew çalakiyan di jiyanê xwe de pêk bîne, nexwe cewêlek divê çi bike? Gelo divê bi axive an jî gelo ew ê karibe bi axive? Heke axaftin bi agahiyê re têkildar be, xwehişberî jî bi agahiyê re têkildar e. Hemin ku “di navbera hişberî û agahiyê de têkiliyeke beramberî heye” (Lenin, 2011: 98), ev têkiliya beramberî, rasterast di têkiliya serdest(i)-bindest(i)yê de jî li dar e ku di navbera mêtînger û mirovên mêtîngehan de heye. Ji ber ku şîdeta epîstemîk bêdenghiştina mirovên marastî li xwe dike armanca sereke, berastengkirina axaftina cewêlek û bêdenghiştina wî, ji bo pêkanînên mêtîngeriya û ji bo domdariya hebûna wê tiştêkî bivênevê ye. Loma jî em ê di vê qonaxê de bala xwe bidin Spivak ku di ser femînîzmê re hûrgerî û hûrkolanê li ser zanav-zayendê dike û dipirse, “Gelo cewêlek dikare bi axive?” û di helûmercên pêkanînên desthilata sermiyanê kapîtalîst û postkolonyal de li ser derfetên xwederbirana cewêlek disekine û bersiva xwe dide û dibêje, “Na. Cewêlek nikare bi axive” (2016:

110). Bersiva ku Spivak dide, hem xwehişberî hem jî çalakî û praxisa jiyanê pûç dike û nade ber çavan.

Her çend peyva ‘serîhildanê’ hişkayî û şidetike taybet di xwe de dihevine jî, wekî berxwedan û guhnedana sivîlî, rê û awayekî xwederbirînê ye û “Her çi qas bêzarûziman be jî, gelo tu tişt tune ye ku cewêlek li hemberî vê zilm û zordariyê bike? Serîhildan, berxwedan, qet nebe guhnedana sivîlî” (Somay, 2008: 161). Her sê rêya çalakkirina jiyanê, -serîhildan, berxwedan û guhnedana sivîlî- ya ku Somay derpêşî me dike, her yek awayekî axaftinê ye jî.

Herçî pirs, ‘gelo cewêlek dikarin bi axivin’ her li rastê ye û Somay bi dirêjahî li serê disekine û dibêje,

“Mimkun e ku em du bersivên ‘erê’ bidin vê pirsê. ya yekem: Erê, cewêlek dikarin bi axivin, lê bi qasî ku zimanê ezbeniyê xwe, -serdestê xwe- qebûl bikin û xwe jî di bêjar û gotinên ezbeniyê xwe de bi cî bikin. ya duyem: Erê, cewêlek dikarin bi axivin, lê belê di cî û dema ku ezbeniyê wan destûr da wan û di çarçoveya hengûşahiyê de dikare xwe derbibire û derkeve derveyî bêjar û gotinên ezbeniyê xwe. Yanî çendî ku hengûşahî ji alî cî û demê ve di çarçoveya ezbenî de asê bimîne jî, bêjar û gotina cewêlek, ji alî binyadî ve, ji ya ezbenî cuda ye” (2008: 188).

Çendî ku Somay, rewşa hengûşahiyê cureyekî wekî azadbûn û serbestbûna cewêlek bibîne û bi awayî berbendkirî be jî keys û derfeta axaftinê dide cewêlek jî, ew bi xwe peyta xwe ji bîr dike ku wî “...li hemberî vê zilm û zordariyê (...) serîhildan, berxwedan, qet nebe guhnedana sivîlî” (2008: 161) pêşniyazî cewêlekan dikir. Loma jî, em ê li ser van pêşniyazên Somay bisekinin û em ê ji bo angaştê xwe bêjin; 1) heke cewêlekê serîhildayî û dest bi berxwedanê kirî, bi wateya Gasset diyarkirî, xwehişberiya xwe ava bike, bêtî ku li benda destûra ezbeniyê xwe bisekine, dikare bi rêya çalakkirina jiyanê azadî û serbestiya xwe bi dest bixe, 2) heke cewêleka xwehişberiya xwe avakirî, digel pêkanînên bêparhiştina ji agahiyê, bi xwe karibe zanîn û agahiya xwe ya ku bo çalakiya jiyanê hewce ye, peyde bike û dayne rastê, 3) û heke cewêleka xwehişberiya xwe avakirî, piştî têkşikandina nebanbûyîna li xwe, li şûna ku lasayiya serdestên xwe bike, di çarçoveyêke durehiya berevajîker de, dinyayeke xwe (ve)ava bike; dê karibe bi axive.

BEŞA DUYEM

WEKÎ WARÊ HEBÛNÊ: ZIMANÊ KURDÎ

2.1 Binavkirin

Li ser nav û bilêvkirina zimanê Kurdî gengeşeyên piralî hene. Ev gengeşe zêdetir li ser dîroka dûr û şaristanîyên wê demê tê kirin ku Med wekî bavûkalên Kurdan tîr qebûlkirin û ew bi wî zimanî axivîne. Digel wê jî, me divê em destnîşan bikin ku “...gelek lêkolîner jêderkên Kurdan ya bi gengeşe bi herêmeke ku rojavayê Îran, bakurê Iraq û başûrê rojavaya Tirkiyeyê ve girê didin û tim û tim dibêjin; Kurd neviyên Medan in (B.Z. 728-550)” (Hassanpour, 2005: 120). Ev awa girêdan dike ku zimanê ku Kurd pê diaxivin -Kurdî-, ji aliyê dîrokî ve bigihîje taybetiyeke xweserî xwe. Ev taybetî Kurdî dibe datîne ciyekî wisa ku êdî dikare wekî zimanekî serbixwe bê qebûlkirin û tevî ku “...der heqê proto-zimanê wan de, yanî Farisiya Kevn, kêmtir tê zanîn jî, Kurdî endamê zimanên Îranî yê rojavayî ye” (Öpengin: 2014: 19). Ev peyt me hinekî din jî nêzikî dîrokê dike ku em karibin hinekî din jî pêbawer bin ku Kurdî zimanekî bermayîyê zimanê Medan e. Loma jî Hassanpour di pêdeçûna nivîsara xwe de me digihîjîne wî seriyê rastiya qebûlbar û dibêje, “Pêwendiya bi Medan re, tenê ‘berayînî’ çênake, digel wê jî ji alî zimanî ve têkiliya Kurdan û neteweya serdest, yanî Îraniyan, ji hev cihê dike” (2005: 120 -di beşa têbiniyê de-).

Geşedan û pîrhêlbûna Kurdî bi serboriyên neteweya Kurd re ji nêzik ve têkildar e ku di ger û demajoya dîrokê de lê qewimiye. Faik Bulut, qewimînên di dîrokê de li xwe dike palder û dibêje, “Parçebûnên siyasî û lihevdaşbûnên cografîk yê ax û terîtoryaya ku Kurd lê ne, di ger û demajoya dîrokê de kartêkeke neyînî daniye ser geşedanên Kurdî” (1993: 13). Peyteke bi vî rengî, bivênevê bala me dibe ser guherînên cografîk ku di nav dewletên serdest de pêk hatine; ax û terîtoryaya ku Kurd lê dijîn jî para xwe jê girtiye û ev guherînên cografîk ji hêlekê de bûye sedem ku geşedana Kurdî, -bi çî rengî dibe bila bibe-, rastî hin neyîniyan were. Ev neyînî, hem ji hêla diyalektê ve hem jî ji hêla pêşketina zimanekî yekgirtî ve li Kurdî qewimiye. Loma jî;

“Zimanê Kurdî di avaniyeke polydialectic de geşe bi xwe daye. Zimanê Kurdî bi rêbaza tundî li çar parçeyan hatiye dabeşkirin û pê re jî gelê Kurd di nav sîstemên hişk û zilmkar yê polîtîk de hatiye çewisandin. Ev

yek jî bûye sedem ku Kurdî nebe zimanekî hevîrtî û nebe zimanê neteweyî”¹⁵ (Jusupova, 1993: 15).

Gava em peyta Bulut û Jusupova digihînin hev, em dibînin ku parçebûnên welatên Kurdistan ya wekî ax û teritoryaya siyasî bi xwe re tundiyeke taybet ya mêtîngeriyê anîye ku li ser zimanê Kurdî wekî sistematîk hatiye pêkanîn. Her wiha, bi me ve jî nas e ku parçebûnên Kurdistan yê cografîk û siyasî bandoreke rasterast li ser zimanê Kurdî daniye û ji alî zaravayî ve jî vê bandorê kiriye ku Kurdî hem bibe zimanekî pirzaravayî û hem jî bi demajoyê re ev zarava ji hev dûr bikevin. Loma jî ev dûrketina ji hev, ji hêla dîroka zimanê Kurdî û binavkirina wî ve jî bûye sedema gelemşe û gengeşeyan.

Ji bilî navlêkirinên li ser edebiyatê ku bi temamî li ser Kurdiya Kurmancî û bi cureyê şîra klasîk pêk hatiye, zimanê Kurdî, ji alî gelek dîroknas û zimannasan ve, wekî zimanekî banî tê binavkirin û li zaravayan tê dabeşkirin. Di *Şerefnameyê* de ku li ser dîroka Kurdistan e, Şerefxanê Bedlîsî dibêje, “Eşîretên serekî yê Kurdistan, di warên ziman, urf û adet û rewşên xwe yê civakî de dibin çar beş: Beşa yekan: Kirmanc (Kurmanc), Beşa duyan: Lor. Beşa sisiyan: Kelhur. Beşa çaran: Goran” (2007: 101). Digel vê yekê jî D. N. Mackenzie di gotareke xwe de ji hêla cografîk ve zimanê Kurdî dike sê kom, “1) Zaravayên bakur (Hekarî, Amedî, Botanî, Behdînanî), 2) Zaravayên navendî (Sorani, Mukrî, Erdelanî), 3) Zaravayên başûr (Kirmanşanî, Lekki, Zengene)” (1981) Li hêla din, A. Hassanpour, zimanê Kurdî li ser axaftin û nivîsandina yekgirtî polîn û bi nav dike û dibêje, “Kurdî, li ser standardîzasyonê wek Kurmancî (Kurmanciya bakur), Sorani (Kurmanciya naverast) û Hewramî (Di lîteratura Rojavayî de wekî Goranî û Zazayî tê zanîn) li hev dabeş dibe” (2005: 79). A. Maruf jî dinivîse û dibêje, K. Kiornelli ku di navbera salên 1936-1937an de li warê Kurdistan geriyaye û der heqê zimanê Kurdistan de gelek gotar nivîsîne, di vî barî de wiha dibêje, “Kurdî ji zaravayên başûr û bakur pêk tê. Her zaravayek jî di nava xwe de şax bi şax berfireh dibe” (1974: 10-11). Çendî ku Kiornelli agahiyeke wisa dide me jî, navê zaravayên Kurdistan bi lêv û bi nav nake. Lê em digel agahiyên dîtir ku me di lêkolîna vê beşê de ji zimannas û dîrokzanan hilgirt, dikarin bêjin ku Kurdînas zêdetir li ser hevhezir in ku Kurdî wek navê zimanekî banî tê qebûlkirin ku wek hîm û esas ji van zaravayan pêk tê:

¹⁵ *Polydialectic: Pirzaravayî*

1) Kurmancî; a) Kurmanciya bakur, b) Kurmanciya başûr (sorani), 2) Goranî; a) Zazakî (Kirmanckî), 3) Lorî.

2.2 Wekî Şûngeha Hebûna Zimanî û Perwerdehiyê: Medrese

Piştî misilmanbûnê, Kurdan demeke diyar lê ne dirêj, hem di warê cografîk hem jî di warê siyasî de an bi awayekî bajar-dewletî an jî di ax û teritoryayeke berfireh de desthilata xwe domandine û “Serdema berî hikumeta Kurdan, ji sedsala VII heta bi sedsala Xan dewam kiriye” (Adak, 2014: 163). Nexwe em dikarin bêjin, xwe-desthilata siyasî û terîtoryayî ya Kurdan ya piştî Îslamiyetê, di sedsala 10an de dest pê kiriye. Wekî pêkanîn û lidarxistina pêdiviyên vê xwe-desthilatê, her çend li ser dîn û ‘yekzimanî’ya Erebi be jî, ji bo gihîştina bo zanîn û zanistê, wekî sistema perwerdehiyê sistema medreseyê hatine qebûlkirin û vekirin.

Medrese wekî peyvek Erebi, ji sazûna xwe ve hinekî naverok û sedemên xwe jî aşkera dike. Wekî wateya şûngehî, “Ew cî ye ku li welatên misilmanan zanistên ku li gorî dînê Îslamê ne, didin xwendin” (Püsküllüoğlu, 2012: 612) tê diyarkirin. Wekî wateya naverok û sazûna peyvê, “Wateya medreseyê cihê dersê ye. Mehna dersê jî, rakirina tiştekî ji holê ye ku ew tişt nezanî ye” (Qedri, 1996: 10) tê pênasekirin. Wekî sedema dînî jî M. Emîn Narozi dibêje,

“Di sala 638an de, xelîfeyê duyemîn Hz. Umer mamosteyên Qur’anê şandine gelek welatên Îslamê û ferman derxistiye ku her kes roja înan li mizgeftê bicive. Vê yekê weha kiriye ku li navendên sereke yên welatên Îslamê digel peydakirina tofêk zanayan bi xwe re sazûmaneke perwerde û xwendinê jî aniye holê” (Raguhastin: Epözdemir, 2015: 8-pêşgotina yekem).

Daxuyan û danzanîna Narozi, pir zelal diyar dike ku sedema avakirina medreseyan, desthilata Îslamê ye li ser welatên ku misilmantiyê qebûl kirine; û ji bo hînkirina xwendina Qur’anê ye û pê re jî ji bo pêkanîna hemû qaydeyên Qur’anê ye. Loma jî, çendî ku gel û welatên misilmanî qebûlkirî xweyî zimanekî xweser bûne jî, bername û mufredatên perwerdehiya di medreseyan de bi zimanê Erebi bûne û;

“Îlm û xwendin û perwerdeya misilmanan ji destpêka îslamiyetê ve dest pê kiriye. Demeke dûr û dirêj çand û zanîna îslamî ne yekserî û yek awa ye. Yanî sistema perwerdehiyê tam rûneniştîye û ev yek heya dawiya

sed sala 11ê mîladî û serdema Atabegiyên Selçoqî û Siltan Selahedînê Eyûbî bi vî rengî meşiyaye” (Epözdemir, 2015: 15).

Serdar Şengül jî li ser girîngiya medreseyan disekine û dibêje, “Medrese saziyên perwerdehiyê yê herî girîng in ku di helûmercên cihê yê cografîk û dîrokî de dirûv girtine û heta roja îroyîn hatine.” (2016: 182). Digel sedema avakirin û naveroka perwerdehiya di medreseyan de, Şakir Epözdemir ji alî dîrok, sazûn, kartêk û fonksiyoneliyê ve jî li ser medreseyan disekine û wiha li hev dabeş dike:

“Pêla yekemîn (622-1100) di dema Emewîyan û dewletên Kurdan de, pêla duyemîn (1100-1400) di dema Selahedînê Eyûbî de, pêla sêyemîn (1400-1700) û pêla çaremîn (1700-1850) di dema geşbûna mîrektî û desthilata Kurdan de, pêla pêncemîn (1850-1925) piştî tesfiyekirina mîrektî û fermanrewayên Kurdan ya ji alî Osmaniyan ve û pêla şeşemîn ango pêla global jî piştî avabûna Komara Tirkîyeyê ku çavên xwe ji tarqîeta Neqşî(bendî)yan re girtine” (2015: 19-30).

Ev awa lihev dabeşkirin, rewşa desthilata Kurdan ku pê re rewşa zimanê Kurdî jî diyar dike, bi me ve aşkera dike. Em pê re jî dikarin bidin ser şopa demajoya geşedan û şikestina pêşveçûna zimanê Kurdî jî. Herçî naverok û awayê perwerdehiya medreseyan e, ew jî bi zimanê Erebî bûye. Di vî warî de Zeynelabîdîn Zinar, agahiyeke wiha radigihîne me,

“Kitêbên ku di medreseyan de didan û dihatin xwendin, bi Erebî bûn. Nêzî sed kitêb dihatin xwendin lê piraniya kitêbên ku bi Erebî bûn nivîskarê wan Kurd bûn. Ev rasteqînî, baldarî û eleqeya mela û feqiyên Kurd ya bo zimanê Erebî jî datîne rastê” (2012: 259).

Serdar Şengül jî di xebata xwe ya meydana de ji devê melayekî Kurd yê bi navê Mela Sadîk radigihîne me ku mela dibêje, “Ilmên medreseyê bi Erebî ne. Em mecbûr in van dersan hildin an na em ê nikaribin îbareyên rast bixwînin û wateyên rast bidin wan” (Şengül, 2016: 193). Bi van agahiyan em xweşîkî fam dikin ku zimanê kitêbên ku di medreseyan de hatine xwendin bi giranî û zêdetir bi zimanê Erebî bûne. Herçî beş û branşa kitêbên hatine xwendin e, Mamoste Qedrî jî li ser mufredat û bernameyên medreseyan disekine, agahiyeke berfireh dide û dibêje,

“Di medreseyê de 12 ilm dihatin xwendin. Kesê ku ev 12 ilm xelas dikirin re ‘mucaz’ ango ‘xwediyê îcazetê’ dihat gotin. Mehna îcazetê

destûr e. Ango ji xwediyê wê re destûr hatiye dayîn ku êdî dikare melatî yanî seydatî bike û dersan bide”¹⁶ (2006: 10).

Naveroka bernama û mufredata M. Qedrî dayî, hê zelaltir bi me ve dide xuyan ku zimanê Erebi di xwendina medreseyan de zimanê ‘yekziman’ û zimanê serdest bûye. Lê dîsan jî me divê em balê bibin serê ku çendî ku serdestiya zimanê Erebi tu carî ji ser medreseyan kêr nebûye jî, di dema desthilat û hikumdariya mîrektiyên Kurdistan de, rewşa zimanê Kurdî ya li pêşberî zimanê Erebi û Farisî de hinekî guheriye. Mamoste Qedrî dîsan li ser vê yekê radigihîne me û dibêje, “Heya sala 1591’ê zayîn kitêbên ku di medreseyan welat de dihatin xwendin erebî bûn û seyda û mela dîsa wan bi zimanê kurdî didan” (2006: 10). Digel vê yekê, Zeynelabîdîn Zinar jî li ser heman dabaşê radigihîne û dibêje, “Kitêbên Erebi ku di medreseyan Kurdistan de dihatin xwendin, ji bo feqîyan ji alî seydayan ve bo Kurdî dihatine wergerandin” (2012: 259). Em ji van agahiyan digihîjin wê zanînê ku; di destpêka avakirina medreseyan de, kêr zêde heta pêla sêyemîn, -çend salên pêla sêyemîn jî tê de- zimanê perwerdehiyê bi temamî Erebi bûye, digel wê jî çend dersên bi zimanê Farisî jî hebûye; û di vê biwarê de bi temamî serdestiyeke zimanê Erebi û kartêka zimanê Farisî hebûye li ser feqî û melayên Kurd. Lê belê, di nîveka pêla sêyemîn de desthilata mîrektiya Kurdistan xurt bûye û hebûna desthilatiya Kurdistan kiriye ku ev rewş biguhere.

Her wiha, divê em balê bibin serê ku nîveka pêla sêyemîn piştî şerê Çildêran (Çaldîran) dest pê dike ku piştî wî şerî di navbera dewleta Osmanî û mîrektiyên Kurdistan de lihevkirinek çêbûye û “...îmtiyazên ku rêveberiya Osmanî dane mîrên Kurdistan, bûye sedem ku di nav Kurdistan de, di biwarên siyasî, civakî û bi taybetî di biwara zimên de hin guherîn û veguherînên cihê û erênî pêk werin” (Kavak, 2015: 48). Ji vê qonaxê û şûnde hindik be jî hebûna xwe-desthilatiyê şewqa xwe daye ser ziman û wêjeya Kurd û;

“Ji sala 1591’ê pê ve kitêbên kurdî yên din jî hatine nivîsandin û di medreseyan de wekî kitêbên dersê cih girtine. Bi saya van berheman zimanê kurdî ji qonaxa perwerdehiya devkî derketiye, derbasî qonaxa perwerdehiya nivîskî bûye” (Qedrî, 2006: 10-11).

¹⁶ Mamoste Qedrî, agahiyeke din dide û dibêje, “12 ilmên ku min bi xwe jî di medreseyan welat de xwendine û xelas kirine, ev in: 1) Serf, 2) Nehw (ji van her duyan re bi gelemperî rêziman tê gotin), 3) Beyan, 4) Bedî’, 5) Me’anî (ji van her sêyan re îro belaxet/rewanbêjî tê gotin), Helbest û Edebiyat, 7) Mantiq, 8) Eqîde =Kelam, 9) He’yet, 10) Usûlu’l-Fiqih (Bingehên hîqûqa Îslamê), 11) Tefsîr (Şîroveya Qur’anê), 12) Hedîs (Gotinên Pêxember). Her wiha ji bilî van ilmên rêzê, ilmê “Siyer”ê (Jîneweriya Pêxember), tarîx û hinek ilmên din jî dihatin xwendin.

Qonaxa ku M. Qedrî radigihîne û amaje pê dike, qonaxa xurtbûna zimanê Kurdî ye ku piştî nivîsîna kitêbên Kurdî yên ji alî mela û alimên Kurdan ve û xwendina wan ya di medreseyan de, li dar ketiye. Aşkera ye ku di vê qonaxê de zimanê Kurdî bandoreke xurt li ser serdestiya zimanê Erebi û Farisî kiriye ku ji bo hînbûna gelek dabaşan zêde pêwîstiya feqî û melayên Kurdan bi zimanên dîtir nemaye. Zeynelabîdîn Zinar jî, ji alî wergera di navbera zimanan de pêkhatî ve balê dibe ser heman mijarê û dibêje, “Çanda medreyê ya bi sedan salan ji bo seyda û feqiyên Kurdan wergera di nav zimanan de hêsantir kiribû” (2012: 262). Ş. Epözdemir jî ji alî xurtbûna desthilatdariya mîrekiya Kurdan ve amaje bi xurtbûna zimanê Kurdî dike û dibêje, “Çi dema Kurdistan azad û aram bûye hingê alim, bîrewer û rewşenbîr di van deman de hêşîn bûne, şairên bêhempa yên Kurdan bûne berhemên vî zemanî” (2015: 23-24).

Di vê qonaxê de, em ê karibin bêjin medreyên Kurdan, piştî nîveka pêla sêyemîn û digel xurtbûna mîrekiyên Kurdan, hem ji bo zimanê Kurdî hem jî ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk bûye şûngeh û warên jêderkî û (çav)kaniyên ku bi taybetî bûne rê û mesîla geşedana zimanê Kurdî. Clémence Scalbert Yücel amaje bi şûngehîbûna medreseyan dike û dibêje, “Medrese li derdora kesên ku dinivîsin şûngehên karakterîstîk in” (2018: 172). Medrese, piştî hatin û danîna desthilata rêveberiya Îslamî ya Ereban, di destpêkê de bi armanca hînkirina xwendina Qur’anê û pê re jî serdestkirina zimanê Erebi û wekî ciyê perwerdehiya dînî hatine avakirin. Heta nîveka pêla sêyemîn, vê perwerdehiyê bi serdestiya zimanê Erebi û kartêka zimanê Farisî kudandiyê. Lê belê, bi taybetî “...piştî êrîşên Moxolan ku bûye sedema şikestina serdestiya dewleta Ebasiyan” (Adak, 2014: 197) û pê re jî bûye egera şikestina serdestiya zimanê Erebi ya li ser zimanê Kurdî, wekî encama vê rewşê “hikm û serdestiya mîrekiyên Kurdan xurt bûye” (Epözdemir, 2015: 24) û mela û seydayên Kurdan, li ser vê hikmdarî û serbixwetiya guherbar qonaxeke wisa bi heybet dan destpêkirin ku “Zimanê Kurdî ku bi saya medreseyan zengîniya xwe parast(îye) û li ser pêyan ma(ye)” (Zinar, 2012: 263),

Bi taybetî piştî bidestveanîna xwe-desthilatiyê, perwerdehiya di medreyên Kurdan de ku zimanê Kurdî di gelek mijaran de hat bikaranîn; bû diyarker a asta jorîn ya kan û egera hizirîn û afîrîneriyê û pê xwendewarî, alimî, zanyarî û bîrewerî peyde bû; û pê re jî bû sedema domdarî û kudbariya ziman û edebiyata Kurdî ya klasîk ku em

dikarin qonaxa piştî nîveka pêla sêyemîn, wekî ‘qonaxa vejîn û geşedana ziman û edebiyata Kurdî ya klasîk’ bi nav bikin.

Wêjeya Kurdî ya klasîk, heta destpêka sedsala nozdehemîn, bi temamî bi Kurdiya Kurmancî ye. Ev wêje li ser qayde û qalibên helbestên klasîk ya rojhilata navîn ku “...li ser wêjeya Îslamî ya bi zimanê Erebi ye...” (Adak, 2019: 18) ava bûye. Ji ber ku xebata me bi giştî û bi taybetî li ser zaravaya Kurdî ya Kurmanciya jorîn (bakur) e û ji ber ku heta sedsalên 19emîn hemû berhemên ji ziman û wêjeya Kurdî bi Kurmanciya jorîn in, em ê di pêdeçûna vê beşa xwebata xwe de, şewqa pênûsa xwe bibin ser ‘her sê gewreyên gewherî’ û em ê li ser zimanê berhemên wan hûr bibin da ku karibin pêşdeçûn û geşedana Kurdiya Kurmancî li gorî serdem û çaxan bibînin û destnîşan bikin.

2.3 Kurdiya Kurmancî di Şîrên Klasîk de

Wekî belge û agahîyên berdest, şa’irê yekem yê şîra klasîk ya bi Kurdiya Kurmancî Melayê Cizîrî ye. Ji ber ku Cizîrî di şîrên xwe de bi hesabê ebcetê sala rojbûna xwe nedaye, di vî warî de gelek lêkolîner dem û dîrokên cuda nîşan dikin. Loma jî, em ê bêtî ku dema rojbûn û mirina wî bidin zanîn, em ê bi danberheviya giştî ku me di nav hemû lêkolîneran de kiriye û çendî ku gelek lêkolîner li ser salê 1589/90-1639/40î li hev dikin jî, em ê tenê bêtî Cizîrî di salên nîveka duyem ya sedsala şazdehemîn û di nîveka yekem ya sedsala hevdehemîn de jiyaye.¹⁷ Dema ku Cizîrî li jiyanê xweş bûye, li herêma ku ew lê bûye “...desthilatdariya mîrektiya Ezîzan (Botan) li dar bûye” (Adak, 2014: 187) û digel wê jî “li Cizîrê medreseyeke Kurdan ya bi navê Medreseya Sor hebûye” (Epözdemir, 2015: 39). Ji ber hindê jî, “Cizîrî sey û perwerdeya xwe pêştî, di Medreseya Sor de, li nik bavê xwe pêk aniye” (Sağınç, 2002: 376). Piştî vê xwendinê, “Di 32 saliya xwe de, li gundê Strabasê yê Diyarbekirê ji Mela Taha îczet girtiye” (Adak, 2014: 216). Digel vê jî, Melayê Cizîrî “Mirovekî gelek şareza û zana bûye, pisporê edebiyata Ereban û Eceman bûye. Berhemên nivîskarên Ereban û Eceman yê dînnasiyê, felsefeyê, stêrkenasiyê û tebiyetnasiyê xwendiyê” (Kurdo, 2010: 120).

¹⁷ Em ê di vî warî de balê bibin ser nivîsa M.X (Xelîl Xeyalî) ya bi navê ‘Bextreşî û Mehrûmiya Kurdan’ ya di Rojî Kurd de ku li ser E. Herîrî û M. Cizîrî wiha dinivîse; “Eva mîsala Elîyê Herîrî ye nehsed û sî sal berê hatîye bi zimanê Kurdî beyt gotîye. (...) Melayê Cizîrî jî heştêsal berê da bi zimanê Kurdî dîwanek çekiriye” (Rojî Kurd, Weşanên War, rp, 94). Hemin ku em dizanin Rojî Kurd di sala 1913an de weşiyaye û M. X. di wê salê de ev nivîs nivîsiye, nexwe gumanek jî heye ku Melayê Cizîrî, di sedsala 12emîn de li jiyanê xweş bûbe.

Der heqê zimanê ku Cizîrî bi wan zanibûye de tu agahî û çavkanî di destê me de nîn e. Lê belê gava em li pergal û sîstema xwendina medreseyê dinêrin, em xweşîkî tê derdixînin ku Mela digel zimanê xwe yî dayîkê, bi Erebiyeke baş û pê re jî Farisî zanibûye û heye ku bi Tirkîya Osmanîkî ya wê hingê jî zanibûye an jî nasyarê wî bûye. Lê em vê zanebûn an jî nasyariya wî, di helbestan de, tenê di asta watedarî û bikaranîna peyvên de dibînin. Herçî berhemên Cizîrî ne, Arif Zêrevan di vî barî de radigihîne me û dibêje,

“Berhema naskirî ya Melayê Cizîrî, ‘Dîwan’ e ko bingehê wê ji 114 helbestan pêk tê. Ji bilî ‘Dîwan’ê hinek helbestên Melayê Cizîrî bi ‘Dîwan’ê re hatine belavkirin. Hevdubêja wî digel Feqeyê Teyran û digel mîrê Cizîrê du helbestên dirêj in. Helbesteka dî ya dirêj ko bi rêza ‘Ellah sehegaha ezet’ dest pê dike û çend helbestên dî bi ‘Dîwan’ê re hatine belavkirin û wekî berhemên Melayê Cizîrî tênê qebûl kirin”¹⁸ (2007: 13-pêşgotin).

Li ser agahîyên di destê me de û bi hebûna dîwanên ku heta niha wekî berhemên nivîskî berdest in, em dikarin bêjin, Dîwana Cizîrî berhemeke pêşîn e; hem wekî berhemeke ku wekî deq û kitêb hatiye nivîsîn hem jî wekî berhema yekem ya Kurdiya Kurmancî. Dîwan bi van taybetiyên xwe ve, barekî taybet dide ser xwe. Bi her hal em dikarin ji serî de bêjin; dibe ku Dîwan berhemek pêşîn be û ji ber pêşînbûnê jî di qelsî û kilûkêmasiya xwe de biçe. Her wiha, berevajîya wê, dibe ku ev berhema pêşîn û xwediyê wê, pêşeng bin jî. Ji bo ku em karibin vê yekê bibînin, em ê di vê beşa xebata xwe û di biwara zimên de dahûrîneke kurt li ser Dîwana Cizîrî bikin.

Serê pêşîn me divê em careke din jî balê bibin serê û bêjin, Cizîrî pir baş bi zimanê Erebi zanibûye. Hem wekî ji ber bandora dînê Îslamê ku di medreseyan de ders bi giştî bi zimanê Erebi bûye hem jî ji ber ku bi qasî ku em ji helbestên wî fam dikin, Cizîrî pêwîstîyeke bivênevêyî pê dîtiye ku di warê ziman û wêjeya Erebi û Farisî de xwedî zanîn û agahî be. Em vê bandorê û nîşaneyên vê zanînê di helbesteke wî de dibînin ku hin rêzikên xwe an jî hin beytan bi temamî bi zimanê Erebi nivîsiye. “‘Îd e û herkes ji dîdara xwe te lê pîroz e ‘îd/Ez tinê mehrûmê dîdar im bi şed menzîl be’îd/Her seher dihnêrim ez cana bi ahan ra ji dil/Bareke l-barî bi-is’adin eleyha yewme ‘îd/Ferre

¹⁸ *Me dest neda rastnivîsa jêirtina ji Zêrevan.*

‘eqî min lehîbî mişle bazin ew ‘uqab/Zabe rûhî mişlema inhelle fî narin celîd” (Cizîrî, 2010: 282)

Beyta yekem ya helbestê bi temamî bi Kurmancî hatiye nivîsîn. Beyta duyem, rêzika yekem bi Kurmancî rêzika duyem bi Erebi hatiye nivîsîn. Her wiha beyta sêyem jî bi temamî bi rêzika Erebi hatiye nivîsîn. Digel vê yekê jî, di rêzikên ku bi Kurmancî hatine nivîsîn de jî, peyvên ji zimanê Erebi hene. Em dikarin bipirsin û bêjin, gelo çi bûye sedem ku Cizîrî di helbesta xwe de helwêsteke bi vî rengî nîşan daye. Gava em li ser vê yekê hûr bibin em dikarin bêjin; a) li gorî rewş û helûmercên wê demê; ji ber ku zimanê Erebi zimanê serdest ê zanîn û xwendin û nivîsînê bûye û her wiha zimanê dîn û Qur’anê bûye, dibe ku nexwestiya di nivîsîna xwe de serdestiya vî zimanî biêşîne û xwestiya jest û hurmetekê nîşan bide, b) dibe ku xwestiya bêje, çendî ku heta niha bi zimanê Kurdî (û zaravaya Kurmancî) helbest tunebe jî, wate ne ew e ku dê tunebe jî û va ye ez bi vî zimanî helbestan dinivîsim digel ku rêzik û beytên Erebi jî tê de hene, c) dibe ku xwestiya spasî û şabaşa xwe bide Erebi ji ber ku di medreseyê de bi rêya wî zimanî bûye xwedî zanîn û zanyarî, d) dibe ku Cizîrî pir bi zanîn û bi şa’iriya xwe bawer bûye, loma jî di helbesta xwe de bi nivîsîna bi vî rengî xwestiya her du zimanan ji alî xurtbûn û têrkirinê ve bide ber hev. Hoşeng Osê jî li ser vê disekine û dibêje,

“Cizîrî, bi vî awayî, di zimanê Erebi de jî hostetiya xwe ya şa’riyê nîşan daye û xwestiya vê bêje: Helbest dikare bi pevrebûna gelek zimanan were nivîsîn. Lê belê tiştê rast ew e ku bandora zimanê Erebi li ser wî, li ser hevçaxên wî û li ser peyrewên wî pir zêde û xurt e” (2012: 198).

Helbet bandorlêkirin û bandorjêgirtin heq e û rewşeke xwezayî ye. Bi ya Harold Bloom, “Dawiya bandorjêgirtinê tune ye” (2008: 36). Pêwîst e em qebûl bikin ku li ser çi sedemê dibe bila bibe, nivîsîna beytên bi Erebi ji ber bandorgirtina ji ziman û çanda Erebi ye. Ev bandorjêgirtin, ne bi awayekî xwezayî, lê bi destkarî ye. Destkariya ketî behsê ferzkirina xwendina medreseyê ya bi zimanê Erebi ye. Loma jî, ev yek ne bi daxwaz lê belê bi lêsepandinekê jî pêk tê. Ji ber ku hêzên Îslamê li ser ax û welatê ku Kurd lê dijî desthilatdariyek daniye; ev desthilatdarî, çendî ku li ser bîrûbaweriya dînî be jî, di biwara zimên de gelên ku bûne misilman ew qas jî serbest nehiştiye. Ji ber ku kitêba pîroz Qur’an bi zimanê Erebi ye, her kes an jî gelê misilman ji bo famkirina wê mecbûr bûye hînî zimanê Erebi bibe, loma jî bi vê bandorê “Îslam, edebiyata bi zimanê Erebi xistiye Kurdistanê û şûn û warên dîtir” (Hassanpour; 2005: 120). Ji ber van eger û

faktoran, bandorjêgirtina Cizîrî jî bi awayekî ne xwezayî lê belê bi lêferzkirinê ye. Ev yek ne tenê ji bo Cizîrî, ji bo her kesê ku çûye medreseyan û bi zimanê Erebi hînî zanist û zanyariyên dinyayê bûye, wisa ye û tişteki jênerevîn bûye. Loma jî, çendî ku jênerevîn û bivênevê be jî, vê rewşê kiriye ku Cizîrî, wekî destpêk û pêşîn, bibe şaîrekî pirzimanî; û bi pirzimanîyê re jî bibe şa'îrekî pirçandî.

Bandora ziman û edebiyata Erebi ya li ser zimanên dîtir ne tenê ji bo Kurdî ye. Helbet, ev yek êdî ji bo gelên dîtir jî li dar e. Digel wê jî, ev rewş ji bo gelên ku çûne ser bîrûbaweriya misilmanîyê hem pêwîstiyek hem jî mecbûriyetek bûye. Loma jî, van her du sedeman kiriye ku yekem Dîwana bi Kurdiya Kurmancî li ser vê desthilat û bandorlêkirinê biafire û ji ber ku “Dîn û ziman, wekî du biwarên girîng yên îqtîdarê ne û ji bo ku rêveberên dînî çawa bixwazin gel jî wek wisa xizmet û suxrekariya wan bike, her du biwar jî xwedî girîngiyeke mezin in” (Şengül, 2016: 184). Loma jî, şûn û biwarek divê ku gel û desthilata heyî ji hev fam bikin. Biwara ku vê famkirinê mimkun dike jî, ziman e; zimanê ku yê te ye, tu pê dinivîsî lê ji aliyekî ve jî ji resenî û xwerûbûna xwe dûr e. Her wekî helbesta Cizîrî: “Mehbûbî bi dîl bit, me bi evrazî çi hacet/‘Enqa bi xwe bitin fir û perwazî çi hacet/Min nale refîq in xem û tehlî ne musahib/Firyadî enîsê min e demsazî çi hacet/Ger lu’luyê mensûrî ji nezmê tu dixwazî/Wer şî’rê Melê bîn, te bi Şîrazî çi hacet¹⁹” (Cizîrî, 2010: 238)

Me çend beyt ji vê helbestê wek mînak hildan da ku karibin behsa ast û rengûawayên ziman û ranêzikiya Cizîrî ya bo ziman heyî bidin der. Cizîrî bi beyta yekem di ser nîrx û hêjatiya hebûniyê re, Teyrê Enqa²⁰ dike sembol û nîşaneyê îrade, eşq û zanînê û balê dibe ser bixwebaweriyê. Ne tenê balê dikişîne, digel wê jî bixwebaweriya xwe di şûngeh û hebûna xwe de digihîjîne asteke bilind û vê astê jî bi gotina, “evrazî çi hacet” nîşan dike. Helbet dibû ku Cizîrî biketa dû efsûniya navê Teyrê Enqa û xwe di esmên de bi cî bikira. Pê re jî wî dikaribû bi peyva ‘esman’ behsa bilindahiya şûna ku lê ye bike. Lê belê wî wisa nekiriye; hem ji ber ku esman bêşûngehî ye û ger ku ew xwe di vê bêşûngehiyê de bi cî bike ew ê di bêserûşûniya esman de winda bibe hem jî ji ber ku esman û bêşûngehî yek ji cî, rengûawa, pênase û diyarkirina Xwedê ye. Cizîrî bi hostetiyê mezin peyva ‘evraz’ bi kar tîne ku ew jî ‘şûngeha ku ew

¹⁹ Du Şîrazî hene; yek jê Sadê Şîrazî yê dî Hafîzê Şîrazî ye û her du jî hevçaxê hev in û berî Melayê Cizîrî li jiyane xweş bûne û gengeşe heyê li serê ku ne diyar e ka Mela behsa kîjan Şîrazî dike.

²⁰ Ango Teyrê Simir an jî Teyrê Sîmûrg

lê ye' diyar dike. Helbet Cizîrî ne tenê bi bikaranîna peyvan hostetîya xwe ya zimanî û taybetîya zimanê Kurdî nîşan dide, her wiha bi bikarneanîna peyva 'esman' jî, reng û awayê zanîna xwe û xurtîya Kurdî nîşan dide. Peyva 'evraz' bi kar tîne û bilindahî û şûngeha bixwebawerîya xwe diyar dike. Ne tenê ew e yê ku di vê bilindahî û şûngehê de cî daye xwe; û bixwebawerîya wî ne tenê takekesî ye. Bi şîroveyeke dîtir ku em ê di dawîya mînakên de behsê jê bikin, ew bilindahî, şûngeh û bixwebawerîya hebûnîya xwe ye ku ji xwedîbûna ax, cî û war û şûngeh û dîrok û çand û ziman pêk tê.

Di beyta duyem de, Cizîrî behsa êşê dike. Ev êş ne tenê êşa wî ye. Êşa hevrêtiyê ye ku di peyva Erebi 'refîq' de watedar dibe. Ew balê dibe serê ku ew bi êşkêşanê radibe û rûdinê. Bi wan re diaxive. Loma jî 'fîryad' dostê wî ye, hewcetîya wî bi dostekî dîtir nîn e. Ev yek nîşaneyêke gazincê ye ku pir bi nermî û nazikî hatiye kirin. Ji bo ku ji alî muxataban ve bê famkirin, bi zanebûn peyv û rengdêrên bi Erebi hatine bikaranîn.

Beyta sêyem, pir bi aşkerayî qebxwestinek e. Bêjareke rasterast û deqerû ye. Tu tirs û fikara ku ji bixwenebaweriyê diqewime tune ye tê de. Berevajîya wê, Cizîrî bi vê beyta xwe, ne tenê xwe, hebûnîya xwe ya wekî Kurdbûnê û ziman û çanda xwe jî derpêş dike û li bîrûbawerîya xwe dike mertaleke jiyanî. Ji bo ku em vê angaştê xwe li ser hîmekê bidin rûniştandin, em ê bala xwe bidin Serdar Şengül ku agahiyeke giranbiha dide me û dibêje,

“Çendî ku perwerdehiya li ser hîma zanistên Îslamî di medreseyan de, hatine kirin jî, Pürcevadî ji Ahmed Gazalî dest pê dike û heta bi Attâr û Hâfîz tê û şa'ir û arîfên Faris analîz dike ku ew bi reng û awayê wergerandina Muhammedî vahyî ya bo zimanê xwe, demajoyeke pîrozwerkirina zimanê Farisî didin destpêkirin” (2016: 184).

Ne mimkun e ku cegerdarî û qebxwestineke bi vî rengî tenê li ser quretî û bixwebawerîyeke takekesiyê be. Helbet, şa'irî û zanatiya Cizîrî ne dabaşa gengeşeyê ye û em ê di beşa wêjeyê de behsê jê bikin. Lê belê, çendî ku di dem û çaxa Cizîrî de mîrekiyên Kurdan li ser hikm bûn jî, her wekî me destnîşan kiribû di wê demê de du dewlet (Osmanî û Safewî) bi hêzekê û bi xurtayî rabûbûn û deshilatî û hikmê Kurdan ya navxweyî dûçarî gefxwarinekê bûbû. Ji ber ku “Peywira 'nûnertîya ramanê li peyvan hatiye dayîn' hebûna ziman, serdestiyane ye” (Foucault, 1987: 21) û ji ber ku xwendin û perwerdeya di medreseyan de bi Erebi bû û serdestiya Erebi her li dar bû, Farisan bi

‘wergerandina Muhammedî vahyî’ serdestiya di warê ziman de dibirin ser zimanê Farisî û vê yekê îqtîdareke zimanî ji bo zimanê Farisî çêdikir.

Cizîrî bi bikaranîna peyva ‘lu’lu’, bi wateya ‘dur’ amaje bi zanînê dike.²¹ Zanîna amajepêkirî, bi zimanê perwerdeyê peyde dibe ku ew jî zimanê medreseyê, yanî Erebi ye û ji ber ku “Kî ku agahiyê di destê xwe de bigire ew xwedî ramaneke cîhanbîniyê ye” (Foucault, 2000; 118) zimanê Erebi jî zanînê di destê xwe de dihêle û xwedî ramaneke, -û digel wê jî xwedî desthilateke- cîhanbîniyê ye. Nivîskaraên Farisî ‘bi wergerandina Muhammedî vahyî’ dixwazin bibin xwedî vê cîhanbîniyê. Nanakirin, qebûlnekirin û qebxwestina Mela ya li ser desthilata Farisî ya heyî ku hewl tê dayîn bigihîje asta desthilata Erebi, di vê qonaxê de ye û Mela bi rêzika, “Wer şî’rê Melê bîn, te bi Şîrazî çi hacet” dixwaze amaje bi hebûna zimanê Kurmancî jî bike. Helbet ne mimkun e ku haya Mela jê tunebe ku di zimanê Kurdiya Kurmancî de nûner û şa’irê yekem e ku xwedî dîwan e. Loma jî ew bixwebawer e jî û hay jê heye ku divê wekheviyeke jiyanî û dînî hebe di navbera zimanê gelên misilmanbûyî de. Loma jî bi vê nanakirin û qebûlnekirina xwe ve, Mela helwêsteke dij-serdestî datîne û bi vê helwêsta xwe jî dibe pêşîn û pêşengê şa’irê ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî. Ew nabêje, ez li vir im tu çima min nabînî? An jî ew nabêje, ez li vir im ji kerema xwe re min jî bibîne. Ew pir bi bixwebawer û ji nava xwe têr dibêje, ‘ez li vir im û tu dil nekî jî bikî jî tu yê min bibînî.’

Cizîrî, di her awayê qebxwestina xwe de aşkera ye. Qet xwe virde û wêde nake. Ji bo vê yekê jî zimanekî rewan û fambar bi kar tîne. Loma jî gava dibêje; “Gulê Baxê Îremê buhtan im/ Şebçiraxê şebê Kurdistan im” (2010: 196)

Bi vê pênasekirina xwe tenê behsa xwe nake, di heman demê de, amaje bi warekî, bi welatekî, bi şûngehekê dike ku ew jî tê de cî bi cî dibe. Di vê qonaxê de em dikarin pêwendiya di navbera heyîn û tiştê de heyî bînin bîra xwe ku di teoriya neynikê ya Lacan de heye. Cizîrî, bi heman hewldan û helwêstê, bi bikaranîna ‘ez’ ya veşartî ya di “cînavka kesandinê” (Tan, 2011: 136) de, hem xwe hem jî warê xwe nîşan dide. Warê ku nav lê ziman e nîşan dide; zindiyê ku wekî ziman neketiye qada nivîskariyê nîşan dide; ruhê ku wekî ruhberê geş xuyanî nekiriye nîşan dide. Behsa ‘çiraxekê’ dide; çiraxa ku şewqa xwe ji ruhekî dide der; ji ruhê zimanekî dide der û bi

²¹ Cizîrî di sa bi zanebûn peyva ‘lu’lu’yê bi kar tîne tevî ku di gelek beyt û rêzikên xwe de vê peyvê hem wek ‘dur’ hem jî wek ‘dêmdur’ bi kar tîne jî. “Gewher û durra yetîm bê terk-i ser têtin teleb.. (2010: 232)” û “minnet ko îro dêmdurê” (2010: 338) û “Durdaneyê dêmgewher e, (2010: 422)”

peyvên wî zimanî ronî dike şevên zimanê Kurdiya Kurmancî ku heta wê çaxê kaxiz lê nebûne war û şûngeh. Warê mezin û berfireh ku zimanê Cizîrî lê saz e, Kurdistan e. M. Cizîrî navê warê xwe yî mezin ne tenê carekê, bi carên wekî “Ney tinê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê te bin” û “Tenha ne Kurdistan didin Şîraz û Yeng û Wan didin” dibêje û amaje bi hebûniyê dike. Hebûniya ku bi helwêsteke dij-serdestî radibe.

Û Cizîrî ji alî serdest û xwendeyên ne Kurd ve qet nakeve tatêla hatina famkirinê. Jê re qet ne xem e kî jê fam dike an jî nake. Bes bi helwêsteke dij-serdestî radibe; ew li dijî serdestiya zimanê Erebî ye ku bi rêya dîn û perwerdehiya dînî ya medreseyan dibe zimanê zanîn û cihanbîniyê û li dijî serdestiya Farisî ye ku bûye zimanê huner û hunerweriyê. Loma jî, bi helwêst e Cizîrî û vê helwêsta xwe bi ast û rengê zimanê ku di helbestên xwe de bi kar aniye, nîşan dide. Tevî ku bi Kurdiya Kurmancî dinivîse jî muxatabên wî hem deshilatdarên Kurd in hem jî wek helwêsteke etnîkî (û neteweyî) muxatabên wî Tirkên Osmanî, Ereb û Faris in. Her wiha, tevî ku dikare bi zimanê Erebî jî binivîse û qet tê de zehmetî jî nekişîne, ew xwe nade ber vê rihetiyê. Bi zimanê xwe yî dayikê, bi zimanê ruhê xwe, bi zimanê dilê xwe, bi zimanê xelkê xwe, bi zimanê ‘şebçiraxê şebê Kurdistanê’ dinivîse helbestên xwe û bi vî zimanî dadikeve meydanê û ji ber ku tu gengeşe li ser qebûl nake, dîsa bi vî zimanî dixwaze qeb û meydana şa’iriya xwe.

Herçî reng û awayê ziman e, em dikarin bêjin zimanê Cizîrî ji bo famkirinê giran e. Peyvên Erebî tê de têra xwe hene û xwe ji peyvên Farisî jî nade alî. Lê belê digel van yekê jî, zimanê Melayê Cizîrî yekreng û yekteşe ye. Em bi zimanê ku wî bi kar aniye û pê helbestên xwe nivîsiye hay jê dibin û dibînin ku di navbera Kurmanciya wê hingê û ya îroyîn de zêde guhertin tune ye û ji awayê xwe yî îroyîn ne dûr e. Tevî ku em dikarin bêjin bi qasî pênc sed salan di ser dema Cizîrî re derbas bûye jî, ji alî awa, hêmanên ziman û sazûna hevok û peyvên ve, ziman wek yê îroyîn e. Herçî awayê bikaranînê ye, em dikarin mînakê bêjin; “Hin ji nik dêrê ve tên, qesta tenîştê hin dikin/Ney ji van im, ney ji wan im, min derê xemmarî bes” (Cizîrî, 2010: 314)

Cizîrî di rêzika yekem ya vê beyta xwe de, cînavka ‘hin’ bi kar tîne; di ya pêşîn de wekî qaydeya gramerî, wê wek kirde di serî de dinivîse, lê di ya duyem de, cî lê diguherîne û her wekî Gilles Deleuze û Félix Guattari dibêjin, “Qaydeyeke gramerê berî ku bibe amajepêkera peyvrêziyê, amajepêkera îqtîdarê ye” (1990: 76) hem îqtîdara gramerê (ya kirdeya cînavkî) dişikêne, hem jî hukmê qaydeyê ziman hildide destê xwe.

Digel ku di Kurmancî de, li gorî belge û agahîya îroyîn ya berdest, wek dîwan, berhema yekem ya nivîskî ye ku Melayê Cizîrî wê bexşî nivîskariya Kurdî dike jî, xwe tenê bi zimanê adetî û rojane ve girê nade. Jixwe zimanê wî ji zimanê vegotina çîrokî dûr e û qet rengê xwe jî nadiyê. Mela di sazkirina rengdêran (hevalnav) de xwedî hostetiyêke taybet e. Çi gava hewce dike qet xwe jê nade alî û rengdêrên wekî, “dêmdûr, surşêrîn, neyşeker, surperî, heybetpiling, zuhrereng, gerdênşemal, şîrînkêlam, xweşxeram, dêmnedîr, serferaz, şevnîqab” saz dike û di helbestên xwe de bi cî dike. Dibe ew pêşeng ku rengdêrên wî afirandî û saz kirî, piştî bi qasî pênc sed salan, di roja îroyîn de jî xweşîkî bê famkirin û pir bi rihetî jî bê bikaranîn.

Destpêka duyemîn e Feqî. Ew jî her wekî Mela di navbera sedsalên 16. û 17. de jiyaye û her du şa’îrên pêşeng yên wêjeya Kurdî ya klasîk hevçaxê hev in. Li ser nav û nasnavê şa’îr gelek navên cuda tên bilêvkirin ku “Feqî bi navê xwe Mihemed, mexlesên wekî Mîm û Hê, Miksî û Feqî” bi kar anîne” (Adak, 2014: 237-238). Di helbestên xwe de, “Nasnavên Feqê, Têra, Feqê Heşêtê, Feqiyê Gerok, Meksî, Xoce, Mîr Mihê bi kar anîne” (Sadinî, 2009: 19). Digel vê yekê jî, “...wî bi zimanê teyr û terewulan dizanibû, bi dengê siruştî zindî û nezindî dizanibû, bi wan re qise dikir, ji ber wê yekê gelê Kurd navê Feqiyê Teyran lê kirine” (Kurdo, 2010: 92). Her wiha, “Feqehê Teyran, bi zimanê teyran dizanibû, ji lewre navê ‘Feqiyê Teyran’ lê kirine” (Azîzan, 1998: 812). Xuya ye, navê ‘Teyran’ ne bi hîlbijartina Feqî lê bi navlêkirina gel li ser wî maye. Ji ber ku “Feqî xwestiye ku mesaja xwe bigihêjîne xelkê xwe” (Sadinî, 2009: 62) loma jî her çi peyama gihandibe xelkê xwe xelkê wî jî bi hiş û qebûleke jidil ew peyama qebûl kiriye û pê re jî nemaye, li ba xwe nasnavekî giştî lê kiriye û nav lê bûye Feqiyê Teyran.

“Feqî, menzûmeyên bi navê Şêxê Sen’anî, Bersîsê Abid, Zembîlfiroş, (Kela) Dimdimê û helbestên curbicur nivîsîne” (Adak, 2014: 239-240-241-242). Her çend Sadinî navê menzûmeyê Qewlê Hespên Reş dide û dibêje, “Bi rastî min ev destana Feqiyê Teyran nedîtiye û derbareyî naveroka wê de jî tiştek nexwendiyê” (Sadinî, 2009: 59) Q. Kurdo jî ji A. Jaba radiguhêzîne me û di berhema xwe de balê dibe serê û dibêje, “Aleksandir Jaba dinivîse: ‘Şêxê Sen’an, Hespê Reş û Bersîs berhemên wî ne” (Kurdo, 2010: 93).

Feqî jî di medreseyê de perwerde bûye û “Wisa dixuye ku Feqiyê Teyran, ji feqîtiyê terfiyê melatî nekiriye” (Sagınç, 2002:369). Digel vê yekê jî wekî encameke xwezayî ya perwerdeya medreseyê bi zimanê Erebi û Farisî zanibûye. Di helbestên xwe

de ji van zimanan peyv bi kar anîne û “Bikaranîna Feqî peyvên erebî û farisî jî bêwezîndin nîn e. Wî peyvên tirkî ya wekî ‘yoldaş’ û ji zimanê din yê peyvên wekî ‘eylûl’ bi kar anîne” (Sadinî, 2009: 62-63).

Rengûawayê zimanê Kurdiya Kurmancî yê ku Feqî di helbesta xwe de bi kar anîye, hema bêje bi temamî zimanê gel yê danûstandina rojane ye. Çendî ku peyvên ji zimanên wekî Erebi, Farisî û ji yê din di helbestên wî de peyde bibin jî, Feqî bi piranî mîna ku bi gel re biaxeve û ji wan re behsa çîrok û qewam û meseleyan bike nivîsîne menzûme û helbestên xwe. Ji ber hindê ye ku gava Q. Kurdo navê wî hildide, dibêje; “...helbestkar û dengbêjê Kurd” (Kurdo, 2010: 92).

Feqî, ew şa’ir e ku helbestên xwe dibêje. Ji bo vê gotinê, zimanekî taybet û arizî xwe ava dike û di nav vî zimanî de, serî li peyvên zimanên dîtir jî dide; lê belê wan nake hêmanên zimanê xwe, berevajîya wê her yek di şûna xwe de bi kar tîne û dike reneki alîkar ji wate û naverok û kubariya ziman û gotinên xwe. Mînak ji helbesta *Beyta Dilî* : “Dilo rabe dilo rabe/Veke çavan ku êvar e/Nezan û bes di xew da be/Bi newmê ra mebe yar e” (Dêreşî, 2011: 148)

Çendî ku em çarînekê wekî mînak didin jî, ev helbest ji serî heta bi dawî bi vî rengî hatiye nivîsîn. Zimanekî petî û rewan yê gel û axaftina rojane. Her peyva ku hatiye bikaranîn, ji nêzikî pênc sed sal berê de maye; û bêtir ku ji awayê xwe yî gotinê bikeve û reng û teşe li xwe biguherîne hatiye heta roja îroyîn. Her wiha, her wekî me destnîşan kir, Feqî mîna ku bixwaze xemleke zimanî dayne nav çarîne, peyva ‘newm’ ya ji zimanê Erebi bi kar anîye ku dikaribû di şûna ‘newm’ê de peyvên wekî ‘xew’ û ‘xewn’ê jî bi kar bîne. Lê na Feqî, şa’ir e û ew zimanê xwe ya xweser ya helbest û gotinê saz dike.

Feqî reneki diyalogî jî dide zimanê xwe yî ku ji bo helbestên xwe diafirîne û vê yekê jî bi du awayan pêk tîne. A) Diyaloga yekalî ku ji aliyê hember gotinê lê venagere û diyalogê ew bi xwe bi du alî bi rê ve dibe. B) Diyaloga dualî ku wekî avêtina ber hev ya dengbêjî ye ku bi Melayê Cizîrî re datîne. Feqî helbestên xwe yê bi diyaloga yekalî hatî sazîkirin, bi zimanekî taybet ava dike û vê carê ne bo gel, bo helbest û şa’iriya xwe dinivîse. Di van helbestan de zimanê wî nêziktirî zimanê Melayê Cizîrî dibe. Gava em bala xwe didinê, em dibînin ku peyvên Erebi û Farisî bêtir dibin tê de. Mînak Ji helbesta *Ey Av û Av*: “Ey av û av, ey av û av/Ma tu bi ‘îşq û mu’hbetê/Mewc û pêlan

tavêy belav/Bê sekne û bê ra'getê/Ji kê ra dikî zikrî bi 'hal/Qey guşguşa nakî betal/Şubhetê min re'htê 'emal/Şevan û rojan xew netê/ (Dêreşî, 2011: 61-62)

Diyalog û pevaxaftina ku Feqî bi avê re dike, helbet ne ji bo famkirina her kesî ye. Ji ber ku Feqî vê diyalogê bes bi avê re dike û ji ber ku av xwedî dengêkî taybet e û divê Feqî jî dengêkî xwe yî taybet hebe da ku her du dengên taybetî xwe karibin di vê qada taybet de bigihîjin hev û ji hev fam bikin. Loma jî, rîtmek û newayek pêwîst e ji vî zimanî re; û ji bo xatirê vî zimanê taybet, Feqî xwe ji bikaranîna peyvên Erebi û Farisî nade alî da ku helbestên wî yên bi diyalogî ji saza xwe û zimanê sazîrî jî ji rîtm û newaya xwe nekeve.

Gava em dizanin ku wî menzûmeyên ji dastan û çîrokên gel nivîsîne, êdî em nikarin bêjin, Feqî tenê şa'ir e. Helbet li ser dîtin û famdariya wêjeyê ya wê rojê diviya wekî menzûme binivîsiya. Lê belê, bi taybetî nivîsîna Zembîlfiroş û Dimdim ku her du jî qewamên rûdayî ne -û em xweşîkî pê nizanin ka Feqî ji gel hildaye an jî gel ji Feqî hîn bûye- di nava gel de berbelav in, hewldaneke nû ye li gorî wê demê. Zembîlfiroş û Dimdim, bi giştî, di wêje û zargotina Kurmancî de bi devê dengbêj û çîroknivîsan gihîştine roja me. Helwêsta Feqî ya bi vî rengî ku rabûye *bi zimanê dengbêjiyane û kilambêjiyê* û bi teşeya menzûmeyê, dastana Zembîlfiroş ku “Evîna Zembîlfiroş û Gulxatûnê dibêje û di dema Merwaniyan de li bajarê Farqînê qewimiye” (Samur, 2012: 12) û dastana Dimdimê ku “Di sala 1610an de di navbera Kurdên kelehê û şahê Îranê Ebas de şerekî dijwar qewimiye û di encamê de kurdên li kelehê hatine kuştin” (Adak, 2014: 241) nivîsiye; helwêsteke jêderkî ye.

Ev yek bi temamî bi me dide nîşan ku pêwendîya Feqî ya bi gel re ji pêwendiyên wî yên bi derdora xwende yên medreseyê û deshîlata mîrekîtiyê xurtir bûye. Loma jî gel bala xwe daye ser van dastanan û “Belavbûna helbestên Feqiyê Teyran di nav xelk de peywendiyekî temam di navbera helbestvan û folklor da dirist kiriye. Her wek helbestên wî tevî folklor bûye” (Resûl, 1998: 87).

Xuya ye ku pêwendîya Feqî ya bi çanda gel û dastan û çîrokên gelêrî re heyî, kiriye ku zimanê Feqî bêtir nêzî gel be û menzûmeya Zembîlfiroş binivîse. Mînak ji menzûmeya *Zembîlfiroş*: “Dê dê hîlon dîsan bi coş/Carek ji carê mey binos/Bêjim qisa Zembîlfiroş/Da se'h bikin hîkayetê/Xatûn dibê çare tu nîne/Şerm meke were nivîn e/Min bi te daye evîn e/Da b'binim te lezetê” (Dêreşî, 2011: 189-199)

Gava em bala xwe dibin ser zimanê manzûmeyê, em dibînin ku ji bilî çend peyvên Erebi tu hêmanên zimanî tê de tune ye ku neyê famkirin. Her wiha, awayê nivîsîna menzumeyê jî, ji şeweyê helbestên klasîk yê wê hingê zêdetir diçe ser gotinên çîrokbêjî û dengbêjiyê ku gotina “Helbestên Feqî tevî folklor bûne” (Resûl, 1998: 87) kêr dimîne. Ji ber ku folklor jî tev li helbestên Feqî bûye û loma jî zimanê ku Feqî di helbest û menzumeyên xwe de bi kar anîne, bûye awayê pêşîn yê bikaranîna zimanê adetî, çandî, folklorî û rojane ya nivîskî.

Em ê karibin hinekî bi pêş de biçin û ji bo zimanê Feqî ku pê nivîsiye bêjin; zimanê Feqiyê Teyran ne tenê zimanê wî û ne tenê zimanê gel e. Çendî ku ew û Cizîrî hevçaxê hev in jî, Feqî ji Cizîrî cudatir helwêst daniye û ji bo her awa û şeweyê deq û helbestên xwe zimanekî dîtir yê taybet saz kiriye. Zimanê wî carinan bûye zimanê ku bi rêya peyvên ji zimanê Erebi û Farisî xwe li qayde û pîvanên kêşe û arûzê tîne carinan jî bi saya çîrok û dastanên gelêrî bûye zimanê gel ku danûstandinên rojane pê tê kirin.

Sedema vê rewşê dîsa durehî ye ku piştî Îslamiyetê li bîrewerî, xwendewerî û nivîskariya Kurdan qewimiye. Her wekî me bo Cizîrî jî got, Feqî jî ji ber sedema ku di medreseyê de bi Erebi û Farisî xwendiyê, bi awayekî destkarîlêkirî û lêferzkerî, ketiye ber çerxa durehiyê. Loma jî bandora du çandên dîtir jî lê bûye. Feqî vê bandora lê bûyî, her wekî Cizîrî, di xwe de mehandiye û xwe nedaye bayê zimanên dîtir. Lê belê, cudahiya Feqî ew e ku; wî digel ku di warê zimên de xwe nedaye ber bayê çand û zimanên dîtir, digel vê yekê jî, di şa’iriya xwe de zêdetir tercîha xwe ji çanda gelêrî û bermayiyên folklorîk yê Kurdan û (belkî jî yê gelên ciran) kiriye. Loma jî, em dikarin bêjin; Feqî, li ser dahûrana îroyîn ku li ser hîm û ramansaziya durehiya me diyarkirî hatiye danîn, li ser xeta ‘durehiya berevajîker’ cî li xwe xweş dike.

Her wiha, em dikarin li dû van destnîşankirinên xwe bêjin; Feqî kan û jêderkê duyem e ku di helbest û menzûmên xwe de; hem derdora xwendeyên ku bi zimanê Erebi û Farisî dizanin, li xwe kiriye muxatab û ber û bala wan aniye ser xwe hem jî rasterast gel û mirovên jirêzê û jêrçîn li xwe kiriye muxatab û bala wan li ser xwe hiştiye. Em dikarin bi dîtineke xweser jî bêjin ku; Feqî bi vî awayî xwestiye çîna desthil û çîna jêrîn di helbest û menzûmeyên xwe de bigihîne hev û rêya avakirina desthilata gelbûna etnîkî (bi gotina roja îroyîn, neteweyî) nîşanî wan bide. Digel vê yekê jî, Feqî alî û beşa ku Cizîrî kêr hiştiye, aliyê gel, çîrok û dastanên gel û gelêrî temam kiriye. Yek ji gewretiya wî ya xuyanî ew e ku Feqî hewl nedaye vê yekê bi helbest û edebiyata

xwe nîşan bide; berevajiya wê, wekî çawa em ji zimanê helbestên wî fam dikin, wî bi zanebûn û helwêsteke bi vî rengî daniye û bûye kan û jêderka gelêrî yê ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî.

Ehmedê Xanî, şa'irê sêyem yê ş'ira klasîk ya bi Kurdîya Kurmancî ye. Lihevkirineke giştî li serê heye ku "Xanî, di sala 1061/1651ê P.Z.ê li gundê Xanê ji dayik bûye"²² (Sağnıç, 2002: 394). Pê re jî "...kêm-zêde tifaq li ser çêbûye di sala 1121/1709an de li Bazîdê wefat kiriye" (Adak, 2014: 252). Xanî, gava hatiye temenê xwendinê, bi dorê, "Di medreseyan Xelat, Riha û Bedlîsê xendiye û mîrektiyên Behdînan û Serhedan ziyaret kiriye û navberekê ji bo perwerdehiyên çûye Bexda û Misirê" (Adak, 2014: 251). Xanî sê berhem û hejmarek jî helbest hiştine li dû xwe. Li ser zimanê berhemên wî Adak agahî dide me û dibêje, "Digel ku Xanî bi Erebi, Farisî û Tirkî jî dizanibû, berhemên xwe bi tenê bi Kurdiya Kurmancî nivîsîne" (2014: 257). Pê re jî der barê sedem û naveroka berhemên de agahiyeke kurt dide:

"Berhemên Xanî ev in: 1) Nûbihara Biçûkan: Ferhengeke menzûm ya Erebi-Kurdî û Kurdî-Erebi ye û ji bo pêdawistiyên zarokên Kurd bi zimanê Erebi bibe bersivê hatiye nivîsandin, 2) Eqîdeya Îmanê: Xanî xwestiye ku xwendekarên medreseyan eqîdeya dînê xwe bi Kurdî fêr bibin, 3) Mem û Zîn: Mesnewiyeke orîjînal e" (2014: 252-254-256).

Ev agahiya kurt ya der barê naveroka berhemên Xanî de, rasterast bala me dibe ser daxwaza wî ya zimanî. Ji ber ku, Nûbihara Biçûkan ferheng e û her wekî agahî û qebûleke giştî tê zanîn ku ji bo domdariya hebûniya zimanekî ferheng digel gramerê berhemeke bivênevê ye. Pêwîst e ku em balê bibin ser wê yekê ku; "Nûbihara Biçûkan ji alî dem, ji alî taybetmendiyên şiklî ve ferhenga menzûm ya pêşîn e" (Bolelî û Ertekin, 2017: 25-26) Her wiha, Nûbihara Biçûkan, ferhengeke bi du zimanî ye jî. Di vê ferhengê de, zimanê armanc, zimanê serdest Erebi ye. Loma jî, em di vî warî de dikarin bêjin; belê çendî ku berhema yekem ya ferhengî ye ew çend jî nîşaneyên duzimanî û dureshîbûna ziman û edebiyata Kurdî (Kurmancî) ye.

Xanî, digel vê jî, Eqîdeya Îmanê dinivîse da ku di medreseyan de serdestiya zimanê Erebi bişikê û zarokên Kurd bi zimanê xwe dînê xwe hîn bibin. Loma jî, wî berî ku wekî şa'irê dakeve meydanê û daxwaz û hêviyên xwe ji gelê xwe û ji desthilata

²² A. Adak *wekî ciyê jidayikbûna Xanî, Bazîd nîşan dide.* (Adak, 2014:250)

şikestî ya Kurdan bike, tiştê ku divê bê kirin, bi amadekirina berheman nîşan daye û rasterast amaje bi zimên kiriye. Her wekî Remezan Alan jî pêşî dipirse û dibêje, “Baş e derdê Xanî maddî bû?” û pê re jî di bersivê diçe û dibêje, “Naxêr!” û bi mînakdayîna ji beyteke Xanî didomîne,

“Wî pere, reş dikir û piçûk didît. Lêbelê ji qudreta wî ya manewî jî na xafil bû. Jixwe dema em bi riya metnê rengê vê qudretê dişopînin, em dibînin ku çavê Xanî li meşrûiyetekê ye. Meşrûiyetek ku meşkûkiyê tune dike, qîmeta meqalatan ji hev temyîz dike, îhtiyaca pejirandin û tesdîqbûnê bicih tîne” (2009: 57).

Ji van rave û peytên Alan, em çêtir fam dikin ku Xanî serê pêşîn ziman li xwe kiriye xem. Ji bo ku xema xwe û ya gelê xwe ji navê rake û derman peyde bike, berhem nivîsîne. Lê belê ev lêgerîna çare û dermanan bes ne li ser Kurdî ye; wî lidirabûneke sererast nedaye der, berevajiya wê bi qebûleke ji rezadilî, zimanekî din jî, zimanê Erebi xistiye nav lêgerîna xwe. Di Nûbihara Biçûkan û Eqîda Îmanê de du ziman hene û ya ku li ber çavan e û em dibînin, di ser Kurdî re Erebi tê hînkirin. Ji ber ku di helûmercên wê hingê de, asîmîlasyoneke rasterast û bernamêkirî ku siyaset û pratîka wê hatiye danîn tunebûye, em nikarin bêjin vê kirina Xanî xizmetî asîmîlasyonê dikir. Lê belê em dikarin bêjin, Xanî, bi qebûleke hem di ser dîn re hem jî di ser desthilata Erebi re ku ji qebûlkirina misilmaniyê ya Kurdan heta wê hingê jî bi xurtî li dar bû, zimanekî dîtir, zimanekî biyan, zimanê Erebi hînî zarokên Kurd dike. Belkî jî dixwaze rê li ber danberheva her du zimanan veke ku; heke mimkun be di siberojê de ew her du ziman karibin di ast û tanga hev de bîr berawirdkirin û Kurdî karibe qayîşê bi Erebi re bikişîne.

Xanî, piştî van her du berheman, mîna ku bixwaze paradîgmaya xwe ya der heqê rewş û statuya zimanê Kurdî û rewşa siyasî û civakî ya Kurdan diyar bike, Mem û Zîn nivîsiye. Digel ku tê de gelek mijar hene û mesnewî li ser evîna Mem û Zînê saz bûye jî, “125 beyta berhemê derbar Kurdî û Kurdan e” (Alan, 1997: 31). Xanî, bi tevî ku zimanê neteweya xwe li xwe dike arîşe û li ser vê arîşedariyê balê dibe ser zimanê Kurdî, wiha dinivîse: “Safî şemirandî vexwarî durdî/Manendê durê lîsanê Kurdî” (Xanî, 2008: 41)

Gava behsa zimanê Kurdî dike, bi awayekî kubarî û nerm dibêje, safî parzûnand û ya jêmayî vexwar û ya vexwarî jî herwek dur bû. Jixwe rengpêdana wî ya Kurdî û nîşandana wekî ‘dur’ bala me dibe ser veşartîmayîna Kurdî ku dixwaze bêje; heke

xweşikî bê deranîn û li ser kar bê kirin, dê wekî ‘dur’ bi şewq û mirêsdar be. Xanî gava behsa zimanê Kurdî dike qet berê xwe nade zimanên dîtir û hewl nade ku ‘dijberekî’ ava bike û pê hebûna xas û biqîmet ya Kurdî bide qebûlkirin; ew qîmeta hebûniya Kurdî dîsa bi pênasekirina wî dide zanîn û wiha dibêje: “Kurmancî ye sirf e, bê guman e/Zêr nîn e bibên, “spîdeman e”²³ (Xanî, 2008: 62)

Di vê beytê de Xanî ziman wekî Kurmancî bi lêv dike. Bêyî ku em li ser şaşîtiyekê bimînin, ji hêlekê ve jî em dikarin wisa bihizirin ku Xanî balê dikişîne ser berbelavî û pirendamiya zaravaya Kurmancî ku heta wê hingê jî, ji bilî Baba Tahirê Uryan (Hemedanî), berhemên Kurdî yên ji şîra klasîk bi zaravaya Kurmancî hatine nivîsîn.

Heke em zimanê ku Xanî bi taybetî di şahberhema xwe Mem û Zînê de bi kar anîye bikin behsê, em ê bêjin Xanî, li gorî her sê pêşrewên xwe, E. Herîrî, M. Cizîrî û F. Teyran, di berhema xwe de pir zêde ketiye ber bayê zimanê Erebi û Farisî; û di hin beytan de ev yek ew çend pir zêde berbiçav e. Her wekî: “Hindek di ea’lî ekabîr/Hindek di edanî û esaxir” (Xanî, 2008: 68) û “Lêkîn wî xerez ji guft û goyê/Meqsûd ji hinde cist û coyê” (Xanî, 2008: 242)

Gava em bala xwe didin beytan, em dibînin ku heke mirovekî ku baş bi Erebi û Farisî nizanibe dê nikaribe xweşikî ji van her du beytan fam bike. Herçî Kurmanciya beytan e, em tenê dikarin bêjin, di beyta yekem de, ‘hin+d+ek’ a cînavka nebinavkirî (Tan, 2011: 148) û “artîkîla ‘dî’” (Farqînî, 1997: 33) endamên Kurdiya Kurmanciyê ne, jê pêvtir hemû endamên zimanî bi Erebi û Farisî ne. Di beyta duyem de jî, cînavka ‘wî’, daçeka ‘ji’ û qertafa tewangê ya mê ‘ê’ û pê re jî cînavka nebinavkirî ‘hinde’ endamên zimanê yên Kurdiya Kurmanciyê ne.

Di Mem û Zînê de, pir zêde beyt hene ku wekî van her du beytan in û kesekî ku bi her sê zimanan nizanibe dê nikaribe jê fam bike. Digel vê jî, Xanî, di hin beytan de Kurmanciyê xwerû û zimanekî fambar bi kar anîye ku hejmara wan ne pir zêde ne. Her wekî: “Hindek bi peyayî çûne baxan/Hindek bi siwarî çûne raxan” (Xanî, 2008: 65)

Şahberhema Xanî Mem û Zîn, ji alî zimanî û ji alî peyvan û fonetîkê ve ji Kurdî (Kurmancî) zêdetir, deng û vedenga Erebi û Farisî dide. Ev yek jî dihêle ku berhem ji alî dengê ruhê Kurdî ve kêr û kulek bimîne. Loma jî, heta ku şahberhema Xanî bo

²³ *Me dest neda rastnivîsa beytan.*

Kurmanciya gel, ya ku ji dem û çaxa berê de maye- neyê lêanîn, ne mimkun e kurdên wê hingê û yên roja îroyîn xweşikî jê fam bikin.

Loma jî em dikarin bêjin, çendî ku Xanî, wekî pêşrewên xwe Herîrî, Cizîrî û Feqî tercîha xwe li ser nivîsîna bi Kurdiya Kurmancî kiriye û li ser helwêsta wan maye û çendî ku di biwara zimanî de serdestiya zimanên Erebi û Farisî qebûl nekiriye û bi reftareke dij-serdestî rabûye jî, wekî pêşrewên xwe nêzî zimanê gel nenivîsiye. Çendî ku wek Cizîrî zimanê Xanî jî asteke bilind ya wêjeyî li xwe dike armanc jî, Xanî ji Cizîrî cudatir tevdigere. Belkî jî li ser paradîgmaya xwe dimîne. Loma ye, Xanî paradîgmaya xwe li ser danzanîn û dannîşana têrdariya zimanê Kurdî ya bo wêje û perwerdehiyê û bêkêmasiya gelê Kurd ya bo desthilatdariyê daye rûniştandin. Ji ber hindê jî, desthilatdariyên gel û zimanên dîtir jî li xwe dike armanc û dibêje, “Da xelq-i nebêjitin ku Ekrad/Bê me’rifet in, bê esl û bunyad” (Xanî, 2008: 41) Û pê re jî hewl dide ku bi vê gewheriyê, qedrgiraniya ziman û wêjeya Kurdî bê zanîn û dibêje, “Şîrê hunera me bête zanîn/Qedrê qelema me bête zanîn” (Xanî, 2008: 37). Heke em bixwazin bi taybetî zimanê Mem û Zîn ya Xanî û ya Dîwana Feqî bidin ber hev em ê pir bi rihetî karibin bêjin; Feqî bi Kurmanciya gel ya petî, sade û fambar nivîsiye lê belê Xanî, ji zimanê gel dûr û bi *zimanekî elîtîst* nivîsiye ku carinan dibe durehî, carinan jî dibe sêrehî.

Herçî, mijar û paldera ku Mem û Zîn li ser e, Xanî dike şa’irê duyemîn ku bi reftareke çandgirî pal û piştî xwe daye çîrok û dastana gelêrî ya Memê Alan û jê çîrokeke dîtir saz kiriye û şahberhema xwe ya Mem û Zîn nivîsiye. Heke em bêjin; ev reftara Xanî, bi me dide zanîn ku Xanî, tevî ku pala xwe daye vegotinên gelêrî jî, xwestiye di vî barî de destkarî û mudaxeleyekê bike da ku dastana Memê Alan bi awayekî ji awayan darije ser kaxiz û nivîsê û ji kudbariya xwe ya vegotinê û berbelaviya xwe nekeve, em ê nekevin ber bayê fişalkirinê.

Em baş nizanin û nikarin bipeyitînin ka rasthatiniyeke têrbaş û mukemel e an jî pir bi hişmendî ye ku Feqî aliyê kêmmayî ya Cizîrî, ku çandgirî û girîngîpêdana bo folklor û vegotina gelêrî bû, tamam kir. Xanî jî, biwara ku wan her duyan kêr hiştibû; biwara danîna paradîgmaya neteweyî, yanî bikeyskirina pergaleke ku dê rêberiyê bike bo desthilatdariya neteweyî ya di warê siyasî û civakî de, tamam kir.

Her wiha, di vê qonaxê de em nirxandina zimanê ‘*sê gewreyên gewherî*’ dibin serî ku bûne jêderkên sereke û kanên neçik û pêşrewên rênîşandêr ji hemû peyrewên xwe re û em dikarin bêjin; -digel destpêka pir qels ya Eliyê Herîrî- bi taybetî Melayê

Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî, sê şaîr in ku li dijî serdestiya zimanê Erebî û Farisî ya di medrese, perwerdehî û di biwara zanînê de sekinîne û bûne eger û faktor da ku Kurdî (bi taybetî Kurmancî) di biwara wêjeyê de bi şewq û hîmên xurt berê xwe bide siberojê.

2.4 Rewş û Statuya Zimanê Kurdî ya ji sedsala 19an heta sedsala 20an û Hin Weşanên Derçûyî

Di salên destpêkê yên sedsala 19emîn de, yanî piştî Şoreşa Fransîzan, "...gel û komên etnîkî yên li Ewropayê ku di bin rêveberiya Osmanî de bûn, di hebûna xwe de şiyar bûn. (...) Tevgerên xwe yên neteweyî û neteweparêz dan destpêkirin" (Günel Tekin, 2012: 98). Helbet, ji ber ku pêkanînen Dewleta Osmanî zêdetir di rengê mêtîngerîya kevnereng de bû, di serî de dê berê xwe bidana gel û komên etnîkî yên bêhêz ku di bindestiya wan de dijîn. Loma jî, çawa ku Alişan Akpınar destnîşan dike û dibêje, "Hê ji dema Mehmûdê II. û pê de, dest pê kiribûn avaniyên wekî 'Hikûmetên Kurd' û herêmen xweser ji navê hatibûn rakirin û rêvebirina wan xistibûn destê sîstema navendî" (2012: 83).

Piştî biryara navendîkirina rêveberiyê ya dewleta Osmanî, gelek guherîn pêk tên. Lê belê ev guherîn yekser nayên qebûl kirin. Çendî ku piştî peymangirêdana Osmanî û Safewîyan gelek mîrektiyên Kurdan ji navê rabûbûn jî, mîrektiya Botanê ji hêza xwe ketibû jî, wekî mîrektiya dawî mabû li ser hikmê xwe. Loma jî, nanakirin û îtirazeke hêjayî gotinê ji vê mîrektiyê hilbûbû li hember polîtîkîya navendîkirinê ya dewleta Osmanî. Ji ber hindê Mîr Bedîrxan "...dixwaze serdestîya xwe li herêma kurdan xurttir bike û li dijî sîyaseta navendîkirinê ya osmanî, bi serê xwe tevdigere." (Zeraq, 1998: 40) Ev rabûna Mîr Bedîrxan Beg, wekî rabûn û serîhildana dij-serdestiyê mîna keke destpêkî ye ji bo Kurdên ku piştî peymana Qesrê Şîrîn di nav dewleta Osmanî de man bindest.

Çendî ku Kurd wekî navxweyî xwedî desthilatekê bûn û di biwarên wekî aborî, civakî, çandî, perwerdehî û hêza leşkerîya navxweyî de azad û serbixwe bûn jî, dane û agahiyên li ber dest ku me heta niha danî rastê, aşkera ye ku Kurdan zimanekî hebû; pê diaxivîn, têrî danûstandinên wan yên rojane, vegotina çîrok û dastanên wan yên gelêrî û dîrokî û wêjeya klasîk dikir; lê Kurdan zimanekî fermî ku pê perwerdehiyê bikin tunebû; da ku di pêwendiyên derveyî de wî zimanî bi kar bînin û di biwara têkiliyên dîplomatîk û desthilatî de jî zimanê wan li zimanê dîtir were wergerandin. Kurdan zimanekî fermî yê bi navê zimanê Erebî hebû ku pê perwerdehî didîtin. Kurdan sê

zimanên nîv fermî hebûn, -Osmanîkî, Erebi û Farisî- ku pê pêwendî datanîn û hay ji dinyayê dibûn.

Her çi qas dewleta Osmanî mîna ku jêbûna (aîdîyeta) etnîkî dernaxîne pêş û ferz nake xuya dikir û "...di sîstema Osmanî de cîyekî taybet yê Tirkî tunebû û ew ji digel gelên dîtir yê misilman mîletê serdest pêk dianîn" (Georgeon, 2005: 9) û gengeşeyên wekî zimanê fermî, zimanê hevpar çênedibûn. Piştî Tanzimatê her ku çû statuya ku dewleta Osmanî dida komên din yê etnîk guherî û;

"...di dema Meşrutiyeta I. de (1876) ku piştî darbeyekê hat îlankirin û di Kanun-i Esasî (yanî zagona bingehîn) de li ser zimanê fermî gelek gengeşeyên gur û kelegerm hatin kirin, xalbenda ku behsa zimanê dewletê dikir bi vî awayî hat sererastkirin: 'Teba-i Osmaniye'nin hidemât-ı devletde istihdam olunmak için devletin lisan-ı resmisi olan Türkçe'yi bilmeleri şarttır'"²⁴ (Akpınar, 2012: 84).

Piştî danîn û qebûlkirina xalbenkeke wiha "zimanê fermî yê dewleta Osmanî hatiye diyarkirin û navê wî zimanî jî êdî ne lisan-ı Osmaniye ye, lê Tirkî ye" (Akpınar, 2012: 84) Li ser vê rewşa girîng em dikarin bêjin; bi Kanun-i Esasî ya di sala 1876an de hati qebûlkirin û danîn, di dewleta Osmanî de demajoya yekzimanî û pêkanînen wê dest pê dike. Ji wê demê û bi şûn de, êdî ziman û perwerdehî jî de wekî navgînên îdeolojiya sazkirina neteweya Tirk bînan bîkaranîn.

Piştî Kanun-i Esasî tê qebûlkirin û bi awayekî qanûnî meşrûbûna zimanê Tirkî tê daxuyandin; di heman demê de bi awayekî nebinavkirî zimanên din jî bi awayekî ne-qanûnî û ne-meşrû tê daxuyandin. Ji ber ku bi xuyanîkirina zimanê Tirkî zimanên din jî tê nexuyanîkirin. Ev yek jî tê wateya qedexekirin û qedexekirina zimanên din ku navê wan di qanûnê de nehatiye nivîsîn û bilêvkirin. Ev awa qedexekirin, wekî encam qad û dorhêla bîkaranîna zimanên dîtir teng dike û ew di herêmen xwe de asê û heps dike. Wekî ku Clémence Scallbert Yücel di vî warî de ji Geoffrey Haig radigihîne û dibêje, "Binavnekirina zimanên qedexekirî, nexuyayîkirinê esehî dike û rast didêrîne û di heman demê de amaje bi mandelekirinê jî dike" (2016: 32).

Di vê çarçoveyê de, êdî em li ser zanyarî û agahiyên berdest dikarin bêjin, piştî jinavêrabûna medreseyan êdî tîkiliya Kurdan ya bi xwendina Kurdî re hat birîn an jî pir

²⁴ *Kesê ku tebayî Osmanî ye û bixwaze di karê dewletê de bixebite divê bi Tirkî bizanibe ku zimanê fermî yê dewleta Osmanî ye.*

û pir kêmtir bû. Kurdên ku di mektebên ku dewleta Osmanî li gorî sîstem û polîtîkaya zimanê Tirkî danîbû, perwerde dibûn, xebatên xwe yên di warê çand, ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî de di sazî û komeleyan de domandin. Digel wê jî rojname û kovar diweşandin ku tê de nivîsarên hizir û ramanî û yên li ser çand, ziman û wêjeyê belav dikirin.

Kovara Rojî Kurd, weşaneke perîyodîk e ku “Wek weşana C.H.yê ya Heyama Yekem, di sala 1913an de diweşe. Kovar, yekem weşana perîyodîk e ku ji alî cemiyetê (ve) hatiye weşandin. Kovar bi temamî çar (4) hejmar derketiye û her hejmar 32 rûpelan pêk tê” (Malmîsanîj, 2002: 138). Digel van agahiyan, Celîlê Celî jî dibêje, “Di hejmara çaran de navê kovarê bû Hetawî Kurd” (2001: 75). Çendî ku di kovarê de digel nivîsarên Kurmancî û Soranî, nivîsarên Tirkî hene û nivîsar wekî Beşê Kurdî (Kurmancî-Soranî) û Beşê Tirkî ji hev hatine qetandin jî, em ê li ser bingeha xebata xwe bimînin û bala xwe bidin ser nivîsarên Kurdiya Kurmancî û li ser awa û şeweyê bikaranîna zimên mînakî bidin. Mînakî me ya yekem çîroka bi navê Çîrok e ku ji alî Fuat Temo ve hatiye nivîsîn.

Ji çîroka bi navê Çîrok:

“Şewêş kurê şivanekî ye. Bo xwe deh salî zarok e. Belê pir çav vekirî ye. Şewêş dîya xwe nedîye. Bavê wî reben û belengaz e, qet tiştêkî wan tune... Maç kir. Paşî go: “Bavo tu îro bo çi wisan dereng mayî? Nota çi zû nehatî?” (...) Şivan çîqa dixast ku rabît derî vekit. Belê nexweşiyê wî nedihîşt. (...) Ka malê jî da çi pejdandine. Piçek tişt bînit bixwin. (...) Go “kurê min diltenik mebe.” (...) Çi dixwaze çê ke. Dilê wî meşkîne” (Temo, 2002: 36-37-38-hej,1).

Gava em bala xwe didin ser zimanê ku di çîrokê de hatiye bikaranîn, yekser em dikarin bêjin, çîrok li ser zimanê axaftina rojane hatiye nivîsîn. Loma jî tê de bikaranînen herêmî hene ku di roja îroyîn de jî mane û herêm bi herêm di Kurmancî de bi heman awayî tên bikaranîn. Di serî de, awayê gotina ‘Bo xwe deh salî zarok e.’ û awayê pîrskirina ‘Nota çi’ bala me dibe ser xwe ku ev awa gotin, heke di wê demê û di Kurmancî de hebûbin jî, niha hema bêje bi temamî ji navê rabûne. Çi nivîskî çi jî devkî em rastî wan awayan nayên. Dîsa em ji awayê bikaranîna lêkera ‘rabûn’ê ya wekî ‘rabît’ û lêkera ‘vekirin’ê ya wekî ‘vekit’ û lêkera ‘anîn’ê ya wekî ‘bînit’ fam dikin ku bandora devoka herêma Botan û Behdînan/Hekariyan li ser nivîsê heye. Her wiha, awayên

fermanê yê ‘mebe-meşkîne’ û awayên gotinên ‘cîkî’, ‘bal’, ‘çîqa’ jî ji alî devkîbûna xwe ve bala me dikişînin ser xwe.

Hînger pirtûkçeyek e ku “Ji alî Cemiyeta Hêvî (C.H.) ve bi navê; Hîngerê Zimanê Kurdî, Rehberê Zimanê Her Du Kurdî: ‘Kurmancî û Babanî’ ye” (Malmîsanîj, 2002: 183) hatiye weşandin ku; ji bo kesên ku dixwazin hînî zimanê Kurdî bibin wek rêberek hatiye amadekirin û di sala 1921ê de li Stenbolê hatiye çapkirin. Piştî salekê ji weşandina Hîngerê, “Di sala 1922yan de, xebatên C.H.yê hatine qedexekirin.” (Hîngerê Zimanê Kurdî, 2008: 36). Di Hîngerê de, digel mînakên ji axaftina rojane yê du zimanî (Kurdiya Kurmancî-Soranî (Babanî) û Tirkî) hin nivîsarên kurt hene ku der heqê demsalan, têkiliyên civakî û hwd. de ne. Herçî mînakên ji zimanê Hîngerê ne, em ê sere pêşîn bala xwe bibin ser kurtenivîsa ku wekî pêşekê hatiye nivîsîn.

Ji nivîsa bi navê Çend Gotin:

“Ev kitêbe piçûk û nehêja (Hîngerê Zimanê Kurdî) em çap dikin rêberkî bibe bo wan hevalan ku ziman[ê] kurdî nizanin; vî eserê xwe da em dixwazin bi tenê (peyvîn)a ziman[ê] kurdî hîn bikin. Loma em baş bala xwe nedane li imla û qawaîd.

Hingî ji destê me hatiye em xebitîne galegal çawa tê gotin usa bê nivîsîn. Bi nivîsîna ev kitêb carkî dî ji baş xuya dibe em çîqa hewce adilandina wan herfan e.

“Hêvî Civata Telebe Kurdan” dilşaye bi serkirina ev kitêb lê xebatê xwe neh salan. (Hêvî Civata Telebe Kurdan)” (Hîngerê Zimanê Kurdî, 2008: 44).

Di Hîngerê Zimanê Kurdî de, gelek peyvên ji Kurdiya Kurmancî-Soranî (Babanî) hene ku di zimanê rojane de tên bikaranîn û berginda wan ya bi Tirkî jî li digel wan hatine nivîsîn. Zimanê berhemê, zimanekî petî û wekî xwe ye û di roja îroyîn de jî bêçetinî û zehmetî tê famkirin. Belê, loma jî em dikarin bêjin zimanekî wekî xwe. Digel ku wekî xwe ye jî, ji xwe jî kêr e. Loma jî, hema serê pêşîn bala me diçe serê ku zimanê axaftinê têrî nivîsîna nivîseke wisa dike lê têrî bikaranîna têgihên zimanî nake û ji ber hindê ye ku gava dor tê ser têgihên zimanî, zimanê Erebi dibe fonksiyonel û peyv û têgihên ‘imla û qawaîd’ tê bikaranîn. Her wiha, di vê kurtenivîsê de du caran bala me diçe ser hevoksaziya Kurmanciyê ku em difikirin ku paşê guherin tê de çêbûye. Wekî mînak: Di hevokên, ‘Ev kitêbe piçûk û nehêja (Hîngerê Zimanê Kurdî) em çap dikin rêberkî bibe bo wan hevalan ku ziman[ê] kurdî nizanin’ de hevoka alîkar ya sedemî piştî

hevoka esasî ya lêkerî hatiye rêzêkirin. Lê belê gava em bala xwe didin hevoksaziya Kurmanciya îroyîn, em dibînin bêtir hevoka sedemî pêşî tê gotin û nivîsîn paşê hevoka hîmî. Her wiha, xuya ye ku bandora mentîqa zimanê Osmanîkî ku di wan dem û çaxan de êdî diçû ser Tirkî, li ser nivîskar heye ku di tewangên cînavk û bireseran de şaşîti tê kirin. Wekî mînak, ‘Loma *em* baş bala xwe nedane li imla û qawaîd’, ‘Bi nivîsîna *ev kitêb...*’ û ‘...bi serkirina *ev kitêb...*’ Bandora zimanekî dîtir ya li ser zimanê Kurdî, bo me dibe şanekên durehîbûna ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî ku bi hatina Îslamiyetê Kurd ji desthilata xwe ya rêvebirina biwarên wekî agahî û zanîn û perwerdehiyê ketin û serdestiya zimanê Erebi dest pê kiriye û ji dema Xanî ve ye ev yek dikude.

Em dikarin bêjin, amadekirina berhemeke wisa ya bi navê *Hînkê Zimanê Kurdî*, helwest û têgihaneke Xaniyî ye. Ji ber ku wê hingê jî perwerdehiya bi zimanê Kurdî ne xwedî desthilatekê ye û ji pergaliya dewletî û ji aboriya xurt jî bêpar e. Loma jî, endam, hezkir û ramanwerên vî zimanî, hewlê didin ku di ser zimanekî dîtir re zimanê xwe bi endamên neteweya xwe bidin hînkirin û her wiha belkî endamên neteweyên dîtir jî zimanê wan hîn bibin.

Awayê ku Kadri Cemil Paşa (Zinar Silopî) radigihîne ku “Hêvî ku ji nû ve dest bi kar û çalakîyan kir, kovareke bi navê Jîn diweşand û parastina doza neteweyî ya kurdan dikir” (1991: 60) M. Emîn Bozarslan jî radigihîne ku “Jîn di 7/11/1918an da li Stenbolê dest bi derketinê kirîye. Wisa tê zanîn ku organa ne resmî ya Komela Pêşketina Kurdistanê bûye. Jîn 25 jimare hatiye weşandin.” (1986: 5). Di dema weşîna kovara Jînê de ax û warê Kurdan hê jî du parçe bû û bi temamî di bin desthilata Dewleta Osmanî de bû. Li gorî ku M. Emîn Bozarslan dide zanîn,

“Xwende û zana û xwendekarên kurd yên ji hemû herêman yên wê demê ku li Stenbolê ne, bûne yek û ev xebat meşandine. Çend kurd yên ji Kurdistana Rojhilat jî di nava wan da hebûne. Di kovarê de her du zaravayên kurdî yên sereke, kurmancî û soranî, tev hatine bikaranîn; bi her du zaravayan jî nivîsar û helbest tê de hatine weşandin” (1986: 9-10).

Ji ragihandina Bozarslan jî diyar e ku kovara Jînê jî her wekî kovar û weşînekên beriya xwe, bi du zimanî der çûye. Kovar, wekî kartêka tunebûna xwe-desthilatiyê, her wekî weşînekên beriya xwe bi du zimanî bûye. Herçî reng û awayê zimanî yê nivîsaran e, em ê bala xwe bidin ser mînakên li jêr.

Ji nivîsa Li Ser Zimanê Kurdi

“Dema ku qala zimanê me tê kirin, du şolên giring, û li gora giringîya xwe jî têkilhev derdikevin meydana. (...) Rewşa îroyîn ya zimanê me, ji mahîyeta zimanekî zanyarî gelek dûr e. (...) Îhtîyac bi zimanekî musterek heye ku ew ziman bibe wasîta têgihîştinê û serwextkirinê di navbera hemî şaxên neteweyê me da ku nufûsa wî digîje milyonan. Her ku diçe ew îhtîyac dikeve rewşeka jînî. (...) Tiştekî dî jî ew e ku, bi awayê nivîsîn û rênivîsa me ya îroyîn, mirov çu wextek nikare bigîje karwanên zanyariyê û medeniyete yên ku bi leza elektrîkî pêş ve diçin; û ew valayîya ku sedsalan di navbera me û wan da vekirîye, bi awayê nivîsîn û rênivîsa me ya îroyîn nayê dagirtin”. (Bitlîsî, 1986: 16, c, 3, hej, 14)

Gava em bala xwe didin ser vê nivîsarê ku wekî naverok behsa geşepêdan û standardkirina û standardbûna Kurdiya Kurmancî dike, em dibinin ku hêmanên zimên yên ku hatine bikaranîn, bi temamî li ser yên roja îroyîn in ku di ser vê nivîsê re kêmkirî zede sed sal çûye û çî jî alî devokî çî jî alî giştî ve tu guherîn tune ye tê de. Digel ku aşkera ye ku nivîskar xwedî hişberiyê zimanî ye jî dîsa jî di awayê gotinên wekî ‘çutu’, ‘hemî-hemû’, ‘şol-şel’ de devoka xwe diparêze û bala me diçe sere ku veqetandeka mê ya di ravekê de bi tîpa ‘a’ û wekî ‘...ihtîyac dikeve rewşeka jînî’ hatiye bikaranîn tevî ku di raveka nêr de wekî ‘î’ ye jî; ‘...bi zimanekî musterek...’

Piştî têkşikîna serîhildana Agirî, kovara Hawarê, di 15ê Gulana sala 1932yan de bi xwedîtî, edîtorî û redaktoriya Celadet Alî Bedirxan, li Şamê dest bi weşana xwe dike. Weşana kovara Hawarê bi xwe re nûfî û pêşketinên girîng tîne. Hem di biwara zimên hem jî di biwara wêjeyê de. Herçî biwara ziman e, Hawar jî ber du egerên sereke di du biwarên zimanî de destpêkeke şoreşî ye ku Celadet li dar xistiye. Yek jê hema ji hejmara yekem de çapkirina kovarê ya bi tîpên Latînî jî. ya duyem, amadekirina gramera Kurdiya Kurmancî ye.

Kovara Hawarê, sere pêşîn ziman dixê navenda xwe û xebatên li ser zimanê Kurdî ya di kovarê de, di ser hemû xebatan re ye. Celadet ziman wekî navgîna sereke ya heyîne û pê re jî nasîne dibîne; ev nasîn û heyîn, heyîneke neteweyî ye ku rasterast û di ser zimên re amaje bi zanava neteweyî dike; û her wekî Brian Weinstein dibêje, “Heke ziman ji alî girseyê berfireh ve bê qebûlkirin û bi vê qebûlê re jî bê meşrûkirin, sembolên zimanî ji bo ronakbîrên siyasî dibin çeken hêzdar yên siyasî” (1979: 346)

Digel vê jî, ji ber ku hemû ramanwer û pêşengên netewesaz ziman wekî sedema esasî ya hebûniyê dibînin û loma jî Celadet yek ji wan rewşenbîrên siyasî ye ku di çalaki û xebatên xwe de bi rol û hizir û mîsyoneke netewesaz tevdigere; û her wekî ku Umut Özkırımlı radigihîne me ku Herder dibêje, “Tiştê ku mirov dike mirov, ziman e. Mirovbûn ew wate ye ku zimanekî te heye û tu di nav civakekê de dijî” (1999: 34), Celadet jî balê dibe ser zimanê neteweyî û heyîna neteweyî jî di ser ziman re saz dike û dibêje, “Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nasqirin. Lewma qo zman şerta heyînê ya pêşîn e”²⁵ (Hawar, 1998: 23, c. I. hej,1).

Celadet, hê di hejmara yekem de, rûpelên kovara Hawarê tenê bi nivîsên Kurdiya Kurmancî tije dike ku ev yek hem dîrokî ye hem jî ji wê hingê de çarenûsa ziman û nivîskariya Kurdiya Kurmancî diyar dike. Celadet, elfabeya Kurdî ya bi tîpên Latînî ku amade kiribû di rûpela sêyem de dide nasîn û pê dinivîse. Manifestoya xwe ya zimanê wekî pronivîs bi nav dike û wiha dibêje di her xalbandên pêşî de,

“1- Belavqirina Elfabeya qurdî di nav qurdan û hînqirina wê. Senifandina zmanazîna qurdî û hin bi hin di qomele de belav qirin û pêşdetir di şiqle qitêbê de derxistin. 2- Sehitiya zarên qurdî û berhevdaîna wan. Sehatî ser mirovatiya zmanê qurdî digel zmanên din yên arî. Sehatî ser bingehên zmanê qurdî ser dîroq û awayê rabûn pêşveqetina wî” (Hawar, 1998: 23, c. I. hej,1).

Celadet, di hejmarên 1-12-17-18 û 23yan ya kovara Hawarê de li ser elfabeya ku amade kiriye nivîsarên taybet dinivîse û bi hûrgilî hewl dide ku elfabeyê bide nasîn û zanîn. Digel vê jî li ser fonetik û morfolojiya Kurdî agahiyên dide ka çima wî elfabeya Latînî hilbijartîye. Her wiha, li ser zanîna qaydeyên zimanê xwe helwesteke Cizîriyane nîşan dide û berî ku der heqê gramera Kurdiya Kurmancî de qayde û rêzikên ku peyitandine, dayne rastê û bi xwendevanan û bi Kurdan bide nasîn, bi bixwebaweriyekê wiha dibêje,

“Ez qo qurd û qurdmanczman im û zmanê xwe rind dizanim û min ew bi heft heşt zmanên din danîye ber hev, qitqitên wi hûrhûnandine; keydeyên wî ji hev derêxistine, diqarim ji biyaniyan bêtir û kenctir debqera wi bidim xuya qirin û zanin” (Hawar, 1998: 23, c. I. hej,1).

²⁵ Celadet Bedirxan, di Hawarê de, ji hejmara 1. heta bi hejmara 23. Li şûna dengê ‘k’ ya zirav tîpa ‘q’ û li şûna dengê ‘k’ ya stûr jî tîpa ‘k’ bi kar anîye. Me jî dest neda orîjînalîya nivîsê û wekî xwe jê girt.

Li gorî Celadet, hebûna zimanekî têrî naskirin û meşrûkirina wî nake loma jî divê rêzimana vî zimanî were amadekirin. Loma jî, piştî hejmara 24an heta hejmara 54an xebatên xwe yên li ser gramera Kurdiya Kurmancî di beşa Kurmancî de diweşîne. Di hejmara 27an, di nivîsa xwe ya bi navê ‘Sê Tarîxên Hawarê’ de ku bi nasnava (mexlesa) xwe ya Xwediyê Hawarê nivîsiye, dibêje,

“Di Hawara pêşîn de min elfabiya xwe belav kiri bû. Di vê hejmarê de ezê dest bi belavkirina gramêra xwe bikim. Ev di zmanê Kurdmancî ya nivîskî de gaveke nû ye. Ji xwe hîmê zmanekî li ser sê hêmanên bingeîn sekiniye: elfabê, gramêr û ferheng. Me elfabê belav kir, îro jî dest bi belavkirina gramêrê dikin, ko Xwedê hez kir ferheng jî li pey e” (Hawar, 1998: 689, c, II. hej,27).

Lingê stûnî yê zimanê Kurdiya Kurmancî êdî temam dibe. Elfabe rûniştiye û êdî li ser ax û welêt belav dibe û tê nasîn û zanîn. Digel wê jî qayde û rêzikên zimên, yanî gramer amade ye û li ser zimanê heyî hatiye danandin. Mizgîniyek heye ku ew jî ferhenga peyvan ya zimanekî ye ku linge sêyemîn yê hîmî û esasî diyar dike.

Celadet, wekî amadekariya ferhenga Kurdiya Kurmancî, di hejmarên 1,2,3,4,6,7,8,19,20,27,28,30yê de beşa ferhengokê amade dike û tê de wateya peyvên Kurdiya Kurmancî dîsan bi Kurmancî rave û şîrove dike. Ev yek jî, di biwara ferhengsaziya bi Kurdiya Kurmancî de, piştî ferhenga Bazîdî ya bi navê *Ferhenga Kurdî ya Diyalekta Hekarî-Rewendî* xebata duyemîn e.

Herçî zimanê Hawarê ye, çendî ku Kurdî ye jî, dîsa her wekî kovarên beriya xwe, yên ku di nav sînorên dewleta Osmanî de weşiyabûn, bi du zimanî ye. Lê belê vê carê zimanê duyem ne Tirkî, Erebi an jî Farsî ye, lê Fransî ye. Herçî zaravayên Kurdî ne, nivîsarên ji zaravaya Kurdiya Kurmancî (Kurmanciya Jorîn) û Kurdiya Soranî (Kurmanciya Jêrîn-Naverast) di kovarê de hene. Digel vê yeke jî, ji kovarên cudatir, Celadet di nivîsa xwe ya bi navê, ‘Zarê Dumilî û Mewlûda Usman Efendî’ de, behsa zaravaya Dimilî (Zazakî, Kirmanckî) dike û di nivîsa xwe de digel Mewlûda Osman Efendiyê Babekî behsa Dimiliya Sêwrekê û Dumiliya Palûwî dike û du parçenivîsan diweşîne. (Hawar, 1998: 689, c, II. hej,23)

Weşandina kovara Hawarê ya ji alî Celadet Ali Bedirxan ve bi me dide nişan ku heta wê çaxê jî desthilata dawî ya navxweyî ya Kurdan ku mîrektiya Bedirxan Beg bû, li dar e. Lê belê ev desthilat êdî ne di warê rêvebirina ax, aborî, leşkerî, jiyana civakî û

perwerdehiya medreseyî de ye. Êdî ev desthilat û pêşengî di biwarên rewşenbîrî û pêşengiya zimanî û çandî de ye. Celadet A. Bedirxan ku elfabe û gramera Kurdiya Kurmancî danî, ne tene zimanzanek e ku "...bi zimanê kurdî, tirkî, erebî, rûsî, frensî, îngilîzî, elmanî, yûnanî û farisî dizanî" (Aydoğan Seydo, 2009: 50) dizane. Di heman deme de ew rewşenbîr e ku digel rola xwe ya rewşenbîriya siyasî, di biwarên ziman û wêjeyê de, bi rola xwe ya pêşengiya avakar jî rabûye ku em dikarin bi taybetî bejin; Celadet A. Bedirxan ew rewşenbîr û pêşeng e ku ji di warê zimên de bûye netewesaz.

Kovara Hawarê, digel guherandina elfabeya Kurdiya Kurmancî ku ji alî piranî kurmancîaxêvan ve tê bikaranîn, bûye qonaxeke diyarker. Ev diyarkerî ne tenê di warê zimên de her wiha di warê wêjeyê de jî darî çavan e. Loma jî kovara Hawarê di cî û şûngeheke wisa de cî dide xwe ku hem ji hêla wêjeyî ve hem jî ji hêla zimanî ve, xal û qonaxeke werçerxî ye.

Dema kovara Tîrêjê dest bi weşanê dike êdî pêkanînên asîmîlasyonîst yên K.T.yê bi giştî hatine cîbicîanîn û berpêyî encamên xwe ve diçin. Nifşa yekem ya Kurdên ku di nav sînorê K.T.yê de dijiyan jî, wê çaxê hema bêje êdî li jiyanê ne xweş in. Nifşa duyem jî êdî peyda bûye. Handan Çağlayan di vî warî de peytekê dike û dibêje,

"Heke em ji bo kesên ku zimanê wan ê dayikê li bajêr kurdî ye, di serî de meylên herî zêde dikarin werin giştîkirin tesbît bikin, em dikarin bibêjin, nifşên yekem bi kurdî, nifşên duyem bi tirkî/kurdî û nifşên sêyem jî bi tirkî dipeyivin" (2014: 63).

Kovara Tîrêjê, di sala 1979an de, ji alî nifşa duyem ya Kurdên ku di nav sînorên K.T.yê de li jiyanê xweş in ve, her wekî hemû kovara û weşînekên berî xwe, li derveyî ax û warê xwe, li bajarê K.T.yê li Îzmîrê bi "Biryara derxistina kovarê ji aliyê rêxistina siyasî (DDKD) ve..." (Amîda, 2016: 15) dest bi weşana xwe dike. Kovar ji sê mehan carekê, bi temamî çar hejmar derdiçe. Bi tevî hejmara sêyemîn li heman bajarî weşana xwe didomîne û hejmara dawî, yanî hejmara çaran, "...ji ber qewimîna darbeya 12ê Îlonê ya li K.T.yê li Stockholmê derdiçe" (Tîrêj, 1981: 3, hej, 4). Li gorî ku em ji naveroka kovarê agahî bo me peyde dibe, kovara Tîrêjê yekem kovara xwerû bi Kurdî ye ku di nav sînorên K.T.y de derçûye. Xwerûkurdîbûna Tîrêjê li ser du zaravayan e; Kurmanciya bakur û Kirmanckî (Zazakî, Dilmilî). Kovara Tîrêjê di pêşgotina hejmara yekem de bi van gotinan derdikeve pêşberî xwendevanên xwe:

“Xwendevanên Berêz, va em pêşbira lêxwediderketina çandeya me i jêmaye yên kevnare (klasik) û gelêrî, derdikevin. Dî aliki de vê jêmayeyê xwedî kîrin, parastin, dî aliye dîn de lêzêdekîrin û pêşvebirin. Ev dîvîyahîyek cîvaki û berpirsiyariyek diroki ya ku xwe bî dijwari dîdî pênandî. Bî vê derketinê, berpirsiyariya xwe ya arîzi ya diroki bî cih tinî û heta hoyên (şertên) me dest bîdî, em dê lî berpirsiyariya xwedî ha xwediderkevin. Lê jî derketina hejmara pêşîn pê de, hînek berpirsiyariyên girîngtir he ne ku, ev jî yên we xwendevanên berêz in” (Tîrêj, 1979: 3, hej, 1).

Jî pêşgotinê em fam dikin ku kovar bî derketina xwe ve ne alîgir e ku hemû binbarîyan bide ser milê xwe û loma jî piştgirî û berpirsiyeke taybet jî xwendevanên xwe hêvî dike. Di vê hêviyê de pardariya berpirsiyê heye ku di çar xalbendan de tîn derbirîn. Di xalbenda yekem de, dîde zanîn ku ew ne tenê li benda alîgiriya aborî ye, her wiha li benda xwendineke rexneyî ye jî. Di xalbenda duyem de, bî hêvî ye ku kesên ku bî xwendinê dizanin Kurdên dîn jî hînî xwendinê bikin. Di xalbenda sêyem de tê xwestin ku xwendevan nivîsan û berhemên gelêrî yên berhevkirî bişînin jî wan re. Di xalbenda çarem de jî jî bo domandina kovarê her cure piştgirî jî xwendevan tê xwestin.

Reftar û helwêsteke bî vî rengî, berê me dîde manîfestoya Hawarê ku sedema derçûna xwe di hejmara yekem de dida der û tevî ku rê û rêbazên ku dê bimeşanda û bî derketina xwe re elfabeyeke xwe jî danîbû û di gelek waran de jî xwendevanan tevkarî dixwest jî, dîsan jî jî bo meşandin û domandina kovarê piştî xwe nedispart xwendevanan û doza pardariya berpirsiyê li wan nedikir. Balkêş e ku tevî ku di dem û çaxa Hawarê de, teknîk û derfetên bikaranîna amrazên nivîsandinê li gorî dem û çaxa weşîna Tîrêjê hê zehmettir û kêmdarfet e jî, Hawar di bikaranîna tîpên elfabeyê de sererasttir û duristtir e. Çendî ku Tîrêj bî tîpên Latînî û bî giranî bî elfabeya Celadet danî weşanê dike jî, gava em bî hûrgirî bala xwe didinê, em dibînin ku Tîrêj di bikaranîna tîpên ‘î’ û ‘i’yê de ne li ser xeta Celadet û Hawarê ye û di berga pêşî û di rûpelên hundir de jî navê kovarê û wekî *Tîrêj* tê nivîsîn. Ev yek bî me dîde nîşan ku berpirs û redaksiyona kovarê di warê elfabeyê de; 1) an alîgir e ku tîpên ‘î’ û ‘i’ wekî elfabeya Tirkî ya Latînî be, 2) an jî zêde ne baldar û xwedî pûteyê ne di vî warê de.

Di her çar (4) hejmarên Tîrêjê de, ferhengokeke bî du zimanî, Kurdî-Tirkî (‘Kurmancî-Tirkî’ û ‘Zazakî (Dimilî)-Tirkî’) hatiye weşandin. Pêwîstiyêke bî vî rengî, jî

du aliyan ve ciyawaziya Tîrêjê ya ji Hawarê dide der; 1) Nifşa Hawarê, ew nivîskar bûn ku berdewama nifşa yekemîn bûn; û her çend perwerdehiya bi zimanê Tirkî ya di dibistanên K.T.yê de dest pê kiribûn jî, hê jî li bajarên Kurdistan zimanê serdest û yê yekemîn Kurdî bû. 2) Nifşa Tîrêjê, ji nivîskarên nifşa duyemîn bûn ku; perwerdehiya bi zimanê Tirkî ya di dibistanên K.T.yê de, êdî bi gelek awayên xwe ve berbelav bû û zimanê Tirkî, wekî zimanê serdestan ku dê bibe sedema ‘nebanbûyîn û durehî’ya mirovên Kurd û ‘cewêlekî’ya zimanê Kurdî, li bajaran ciyê xwe xweş kiribû; û pê dihat axaftin, di danûstandina rojane de rengê zimanê serdest dida û di ser pêkanînen serdest(î)yê re jî, axaftina bi zimanê Kurdî, ji binavkirina ‘zimanê nezanî û cahiliyê, zimanê hovan û zimanê tune’ hêdî hêdî berê xwe dida, ‘zimanê ku axaftina pê şerm e.’ Loma jî, ji alî ‘yekzimanî’yê ve, di Hawarê de, hewla avakirina zanava neteweyî ya li ser zimanê neteweyî hebû û li ser hîma dij-mêtingeriyê, zimanên serdestan hatibû neyînkirin (redkirin). Lê belê, her çi qas kovara Tîrêjê bi yekzimanî û du zaravayan (Kurmançî-Zazakî) derdiçe jî, helwêsta ‘dij-serdest(î)’yê ancax di pêkanîneneke bi vî awayî de mimkun e. Ji ber ku ne tenê nivîskar, xwendevan jî êdî kêr zêde ‘duzimanî’ ne û bi ser de jî; ji ber pêkanînen mêtingeriyê, zanîn û agahî jî êdî li ser sîstemeke ‘yekzimanî’ li dar e û nifşa duyem yê xwende û bîrewerên Kurd jî bi rê û alîkariya zimanê Tirkî dibin xwedî zanîn. Loma jî, tevî ku hin peyv di zimanê rojane de wekî adetî û banekî tên bikaranîn jî, ji ber ku Kurdî wek pergaleke perwerdehiyê bi pêkanînen modernîst re raserî hev nebûye, wateyên wan yê esasî û pêreyî, di hin biwar û dîsîplînen zanistî û hunerî de bûne ‘têgih’ û di çarçove û deqbandên (context) taybet de tên bikaranîn. Ji ber vê çendê, weşandina ferhengeke bi du zimanî ya di kovarê de, hem deraveke bivênevê ye hem jî nîşaneyê cîbicîbûna ‘duzimanî û durehî’yê ye ku asîmîlasyonê êdî berê xwe daye encamên xwe ku wekî, ‘nebanbûn’ û ‘cewêlekî’ya zimanî dide der.

BEŞA SÊYEM

WEKÎ BIWARA DERBIRANÊ: WÊJEYA KURMANCÎ

3.1 Wêjeya Kurmancî ya Klasîk

Çalakî û pêkanînen di warê perwerdehiyê ya di dema Cizîrî de, ji xwendina di medreseyê pêvtir xwedî tu cî û şûngehekê nîn e. Me bi nîşandana mînak û agahiyan jî dîtîbû ku zimanê perwerdehiyê yê di medreseyan de, Erebi bûye û kêmbê jî, di warê wêjeyê de hin kitêbên Farisî hatine xwendin. Em pê dizanin ku; her çî qas desthilateke Kurdan ya mîrekiya herêmkî û hikmîkirina navxweyî hebûye jî, dîsa her wekî me berê destnîşan kiribû ku; hem Qur'an wekî sereke çavkaniya zanistê û 'ilmê dihat qebûlîkirin û hem jî zimanê wê Erebi bû û hem jî 'ilmê di Qur'an û di kitêbên din yê dînî de heyî, qedexê û qedexekirî bû wergere bo zimanên dîtir.

Loma jî, em dikarin bêjin; çendî ku di serdema Cizîrî de, bi awayekî sistematîk pêkanînen asîmîlasyonê tunebûye û tu polîtîkayeke danandî ne li dar bûye jî, ji ber bêgavîtiya xwendina Qur'anê û hînbûna zanist û zanyariyên ku bi zimanê Erebi ne, takekesê ku diçe xwendina medreseyê û tê de heta bi ast û dereceya 'melatî'yê dixwîne; di serî de bêhemdî xwe bandorê ji zimanê duyem hildide û bi awayekî bêhay di hişê xwe de paşxaneyên her du çand û zimanana digihîne hev. Lê belê piştî ku di asta zimanê xwe yî dayikê de hîna wî zimanî dibe û pê re jî li çanda wî zimanî dibane, êdî jê û şûnde li ser wî zimanê ku ne ziman wî yê dayikê ye, dibe xwedî hişûbîrekê. Takekesê êdî her hêmana çanda nûhînbûyî bi hişberî, bi zewqwergerî û bi hayjêbûnekê pêk tîne û tev li praxis û çalakiyên xwe yê jiyanê dike.

Em wisa bawer dikin ku her sê pirsên me jî gihîştin bersivên xwe. Em dikarin pal û piştî xwe bispêrin van agahî û destnîşankirinan û bêjin; çendî ku Melayê Cizîrî, bi helwêsteke nanakirinê (îtîrazîkirinê) rabûbe û di vî barî de nêzî li ser fikira zanava zimanî ya neteweyî mabe û li ser serdestiya zimanê Erebi bi helwêst û reftareke dij-serdest(î) tevgeriyabe û diwana xwe bi zimanê Kurdiya Kurmancî nivîsîbe, dîsan jî, Cizîrî; wekî takekesek ku di qonaxên me diyarkirî re derbas bûye, yanî di xwendina medreseyê de gihîştîye asta Melatîyê, ne mimkun e ku di warê çand û zewqa estetîk ya

wêjeyî de jî ji çand û ziman û estetîka Erebi û Farisî bandor hilnedabe û di warê ziman de ‘kreolîze’ nebûbe.²⁶

Em ê bi xwendineke ji roja îroyîn karibin bêjin; Cizîrî bi nivîsîna dîwan û şîrên xwe bi Kurdiya Kurmancî, qebxwestinekê pêk tîne û zimanê Kurdî û hunera ku pê tê kirin bi hebûn û hunera xwe ve bi gewde dike û; bi vê dîtina xwe re jî, di çarçoveya praxis, çalakî û kiryariyê de, ji bo Kurdiya Kurmancî dîwanek datîne ser sifreya wêjeya Kurdî ya klasîk. Her wiha, digel ku dîwana Cizîrî, di warê estetîk, teşe, naverok û şêwazê de, dîwaneke ‘durehî’ ye û tevî ku wêjeya Kurdî ya klasîk “Naveroka xwe bi pîranî ji îslamê, rûxsara –teşeya- xwe ji zewqên edebî yên van çandan digirt” (Alan, 2019: 195), tu takekesekî Kurd xwe nedaye ber hilşandina vê avaniya ku bi eger û sedem û palder û hincetên xurt yên bîrûbaweriya dînî cî li xwe xweş û qewîn kiriye. Lê belê, Melayê Cizîrî, bi xurtayî û bi bixwebaweriyeke qewîn, xwe li vê yekê rakişandiye. Loma jî Cizîrî digel ku destpêk û pêşeng e, di heman demê de pêşvekir e jî. Pêşvekirîya Cizîrî, yek ji taybetiya karaktersîtîk ya pêşengiya wî ye ku Serdar Şengül di vê dabaşê de mînamekê radigihîne û dibêje; Şêx Elî, ku melayekî medrese xwendî ye, li ser pêşengî û yekembûna Cizîrî dibêje, “Mela bab e. –destpêk e.-. Tê de (*behs jê dîwan e*) her tişt heye. Her kes li gorî xwe tiştêk jê hildide. Hin kes eşq, hin kes zewq hin kes jî ‘ilm jê digire. Mela ji vir rabûye û ji vir e” (Şengül, 2016: 197).

Di van destnîşankirinan de du gotinan bala me dibin ser xwe: 1) *Mela bab e. Her kes li gorî xwe tiştêk jê hildide*: Gotina ‘bab’ amaje bi destpêkekê dike û pê re jî ‘her kes li gorî xwe tiştêk jê hildide’ li ser fikreke destpêkî, amaje bi jêderkbûnekê jî dike ku ev jêderkî pîralî ye û di her dem û deravê de dikare car din bo her tiştî bibe kan û jêderk. Ji ber ku “Fikra ‘destpêkê’ pevrebûneke têkiliyên wisa pêşniyaz dike ku avakirin û veavakirinê mimkun dike” (Said, 2009: 372) 2) Cizîrî ji kana ku ji vir e radibe û avakirineke wisa taybet mimkun dike ku jêbûn û aîdiyetekê jî dide der û dibe ‘babek’ ku

²⁶1) Creolization: Li gorî pênasîya Eduardo Glissant ku wî bi xwe têgih afirandiye, “durehîbûnek e ku di ziman û hunerê de tiştê ku nayê payîn hildiberîne. Rêyek e ku bîyî ku mirov ji xwe dûr bikeve xwe vediguherîne. Di kreolbûnê de belawelabûn keysa birêkûpêkbûnê çêdike; şok û zendegirtinên ku ji ber çand, lihevnekirin, bêserûberiyê çêdibin, şiyana afirîneriyê dide mirov” (Alpay Necmiye) <http://www.radikal.com.tr/radikal2/kreollesme-1039887/>

2) Kreolîzebûn (bi îng: creolization): Ji bo zimanê duyem yê pêwendiyê ku di warê zanîn û têgihîştin û bikaranînê de gihîştîye asta zimanê xwezayî (*dayikê*), tê bikaranîn. Her wisa ku takekesên ku kreolîze bûne, xwedî hemû taybetî û kargîniyên zimanê duyem in. Takekes mîna ku zimanê duyem zimanê wan ê *dayikê* be wî zimanî bi kar tînin. (İmer, Kamile (1990) *Dil ve Toplum, İstanbul: Gündoğan Yayınları*, r, 162, birincî baskı)2)

li ser hemû qebûlan e. Çawa ku “Destpêk ne tenê cureyekî çalakiyê ye, di heman demê de rewşa derûniyê ye. Awayekî xebitînê ye, helwêst û hişberî ye. Destpêk, ji bo her nivîskarî/ê, dana ser rêyekê ye ku dibe şûna tevlivînê” (Said, 2009: 15) wek wisa jî; destpêk(î)bûn çalakiyek e û Cizîrî jî di nav vê çalakiyê de ye. Wekî destpêk çirayek e; û *şebiçirax* e ku di roja îroyîn de jî şewq û ronahiya xwe dide ser *şebên* wêjeya Kurdiya Kurmancî ya klasîk.

Digel ş’ira Cizîrî, du afiranên Feqiyê Teyran hene ku nîşaneyên wergerê tê de hene. ya yekem dastana Şêxê Sen’an e. ya duyem jî ya Bersîsê Abid e. Bêguman, her du dastan û vegêran jî berî hebûna Feqiyê Teyran di nav gelan de hatine gotin. Şêxê Sen’an, cara pêşî wekî nivîskî ji alî Ferîddidun-i Attar (derdora 1140-1220) ve hatiye nivîsîn. (2006: 243) Bersîsê Abid jî, wekî qewameke çîrokî ye ku di civaka Cihûyan de hatiye gotin (Îmamoğlu, 2016: 457). Feqiyê Teyran jî, her du çîrok û dastan bi Kurdiya Kurmancî nivîsîne.

Wekî em dizanin, berî ku Feqiyê Teyran dastana Şêxê Sen’an binivîse, Cizîrî di beyteke xwe de ew bi nav kiriye û wiha gotiye: “Mey nenoşî şêxê Sen’anî xelet/Ew neçû nêv Ermenistanê xelet” (2010: 86) Digel vê yekê jî Î. M. Resûl di vî barî de dibêje,

“Şêx Senan dastanekî evînê ye û di nav Kurdan de bi navê Feqiyê Teyran ve hatiye nivîsîn. Ev di nav Kurdan de belave çî di zargotinên folklorî da çî ewên hatine nivîsîn ku li ser Feqiyê Teyran tê hesabkirin” (1998: 89).

Em ji gotinên “di nav Kurdan de belave çî di zargotinên folklorî da çî ewên hatine nivîsîn ku li ser Feqiyê Teyran tê hesabkirin” fam dikin ku; Şêxê Sen’an wekî devkî ketiye nav zargotina Kurdan jî û wekî çîrok û dastaneke belave ye û piştî nivîsîna Feqî êdî wekî ya wî hatiye hesabandin. Lê belê, li dijî vê hesabandinê, bi awayekî nivîskî peyitandî ye û li ber destan e ku dastan –an jî çîroka- Şêxê Sen’an zêdetirî 300 salan berî Feqî “ji alî Attar ve hatiye nivîsîn” (2006: 243). Her çî qas em mimkun qebûl bikin ku Şêxê Sen’an çîrokeke zargotina Kurdan e jî, her wekî ku me diwana Cizîrî wekî berhema yekem ya nivîskî ya wêjeya Kurdî ya klasîk qebûl kiribû, ji ber ku Attar ew nivîsiye, em ê qebûl bikin ku dastana Şêxê Sen’an ne afiraneke Feqî ye ne jî dastaneke ji zargotina Kurdan e. Bi vê qebûlê re pirsekê xwe dide der: nexwe Şêxê Sen’an ya Feqî wekî çî hatiye nivîsîn?

Digel vê yekê, Feqiyê Teyran çîroka Bersîsê Abid jî bi Kurdiya Kurmancî nivîsiye. “Wek çîrokeke gelêrî em dizanin ku çîroka Bersîsê Abid ji dema Feqî kevintir

e” (Karadeniz, 2015). Bersîsê Abid wekî “çîroka dînî” tê diyarkirin ku “...ji destpêka Îslamê ve ye di civaka Îslamî de bi awayekî devkî hatiye gotin” (Îmamoğlu, 2016: 245). Hemin ku diyar e ku çîroka Bersîsê Abid, bi awayekî ji awayan beriya Feqî hatiye gotin û çî di biwara dînî çî jî di biwara civakî de wekî çîrokeke gelêrî hatiye gotin, em ê bi hêsanî û bi paldana van agahiyan karibin bêjin; berdibetiyeke (îhtîmaleke) mezin e ku Feqî hem ji vegotinên gelêrî hem jî ji xwendinên xwe yên di medreseyê de ev çîrok wergirtiye. Pê re jî çîrok qulibandiye (wergerandiye) ser Kurdiya Kurmancî. Li ser van palderan, em li ser wê fikrê ne ku, Şêxê Sen’an û Bersîsê Abid ya Feqiyê Teyran, li ser teknîk û rêbazên wergerandinê yên ‘wergera serbest û wergera havjîpêanînê (lasayîkirinê)’ hatine nivîsîn û her du jî ‘lêanîn (adaptation)’ in. Divê em bêjin; ev yek ji hêjatî û qîmeta Feqî tu tiştekî kêr nake. Berevajîya wê, Feqî bi vê kirin û nivîsîna xwe ve rê li ber me vekiriye da ku em karibin wekî berdibetî (îhtîmal) û angaştekê bêjin, ‘dibe ku wergêrê yekem yê wêjeya Kurdî Feqiyê Teyran be.’

Xanî wekî şa’irê sêyem e di ş’ira Kurdîya Kurmancî ya klasîk de. Nivîskar û lêkolerên Kurd, yên wekî H. Qadirê Koyî, di *Dîwana* xwe de, Celadet Bedirxan, di nivîsarên di *Kovara Hawarê* de-, Îzzeddîn Mistefa Resûl bi pirtûka xwe ya bi navê *Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn* (Ehmedê Xanî û Mem û Zîn), H. Mem, -bi pirtûka ya bi navê ‘*Üçüncü Öğretmen Xanî* (Xanî wek mamosteyê sêyem)’ û Faik Bulut, bi pirtûka xwe ya ‘*Ehmedê Xanî’nin kaleminden Kürtlerin bilinmeyen dünyası* (Ji pênuşa Ehmedê Xanî dinyaya Kurdan ya nayê zanîn)’ Xanî, wekî ‘bavê neteweperwerên Kurd’ qebûl dikin û di tekstên xwe de hewl didin vê yekê bidin der. Helbet eger û palderên van kesan jî ne ji dîwarê xerabe ye. Dengê ku diçe wan jî ne ji kûpê vala ye. Xanî di gelek beytên xwe de nîşaneyên vê yekê daye. Ew sedema nivîsîna şahberhema xwe ya Mem û Zîn diyar dike dibêje, “Da xelq-î nebêjîtin ku Ekrad/Bê me’rîfet in, bê esl û binyad” (2008: 41). Berî her tiştî, Xanî bi bikaranîna peyva ‘Ekrad’²⁷ dibe şa’irê ku cara yekemîn vê peyvê di helbesta xwe de bi kar tîne. Çendî ku Cizîrî di dîwana xwe de çend caran peyva Kurdistan bi kar tîne jî, navê Kurd, wekî navê komeke etnîk an jî netewe, bi tu awayî bi kar nayîne. Ji vî aliyî ve ev awa reftara Xanî, hizira amajepêkirina gelekî, an jî neteweyekê dike. Xanî di beyta dûmahîkê de jî dibêje, “Enwaê’ milel xwedankitêb in/Kurmanc-i tenê di bê hesêb in” (2008: 41). Dîsan di vê beyte de, vê carê navê Kurdan

²⁷ *Ekrad, bi erebî: Kurd*

wekî ‘Kurmanc’ bi kar tîne. Ev awa bikaranîn, meyla hizirîna me dibe li ser vê yeke datîne ku; Xanî peyva Ekrad (yanî Kurd) wekî navê neteweyeke mezin qebûl dike û bi kar tîne lê peyva ‘Kurmanc’ jî wekî navê zimanekî ku amaje bi neteweyekê dike, bi kar tîne.

Ji ber ku ax û welatê wî du parçe ne û desthilatdariya neteweya wî bi mîrektiyan parçe parçe bûye, Xanî li ser wê hizirê ye ku divê desthilateke Kurdan hebe. Loma jî di beyta xwe de dibêje, “Rabit ji me jî cihanpenahek/Peyda bibitin me padişahêk” (2008: 37). Lê Xanî, bi daxwazeke hêvîdar ranabe. Bi praxis û çalakiyeke ku karibe hizir û paradîgmaya di hiş û mêjiyê xwe de li kar bixe û pêk bîne, reftarê nîşan nade. Tenê di rengê ‘gazinceke bangîn’ de wekî ‘xwaz’ekê dibêje.²⁸ Û çawa ku Ernest Gellner dibêje, “Neteweperwerî rêgezek e, divê yekeya siyasî û neteweyî bi hev re lihevkirî bin” (1992: 127) em vê lihevkirinê di beyta Xanî de nabînin. Ji ber ku Xanî, ji bo tiştê ku tune ye bang nake, ji bo tiştê ku pêk nehatiye, -û pêk nayê- bang dike. Loma jî, banga xwe her û her wekî gazincekê didomîne û gava di banga xwe de digihîje dawiyê, dibêje, “Xalib nedibû li ser me ev Rûm/Nedibûne xirabeyê di dest bûm” (2008: 38). Ev encamek e; Rûm, yanî dewleta Osmanî beşeke mezin ji welatê Xanî xistiye bin serdestiya xwe û Xanî, bi vê şikestîbûna ku ji ber vê encamê lê qewimiye, bang dike.

Bêyî ku em zêde pê de biçin, em ê karibin bêjin Xanî di gelek beytên xwe de, bi navê Ekrad (Kurd), bal bi hebûna gel û neteweyekê daye; û bi giştî ji bo navê zimanê neteweya Kurd jî, carinan peyva Kurdî carinan jî peyva Kurmancî bi kar aniye. Çendî ku Faik Bulut ji bo nîşaneyên neteweperweriyê yên di Mem û Zîna Xanî de heyî, dibêje, “...ev ruh û raman, ji Melayê Cizîrî derbasî Xanî bûye” jî (1995: 82) em dikarin bêjin; balkêş e ku Cizîrî çend caran navê Kurdistanê ji bo terîtoryayekê bi kar aniye û amaje bi cografya û welatekî ku Kurd lê dijîn kiriye, lê belê Xanî her tim navê Ekrad (Kurd) û Kurmancî bi kar aniye.

Li ser vê yekê em dikarin bêjin; ji ber ku dema Cizîrî li jiyanê xweş bû, Kurdistan yekparçe bû, îmaja welatekî yekpar(ç)e di hiş û bîra Cizîrî de xurt bû loma jî wî ew bi nav û lêv dikir û amaje bi terîtoryayê dikir. Lê belê, dema ku Xanî li jiyanê xweş bû, Kurdistan bi peymana Qesrî Şîrîn di navbera dewletên Osmanî û Safevî de bûbû du parçe. Loma jî îmaja welatekî yekpar(ç)e di hiş û bîra Xanî de xweşikî

²⁸ *Gazınca bangîn: gazınca ku ji tunebûnê lome nake, berevejiya wê, tunebûnê bi gazincê tîne ziman û banga heyîkirinê dike.*

rûnenîştîbû û wî, di helbestên xwe û di Mem û Zînê de -ji bilî carekê- navê ax û warê ku Kurd lê dijiyan, wekî Kurdistan bi lêv nekiribû?²⁹ Digel ku em ê nikaribin di ser bikaranîna navekî re ji bo vê pirsê bersîveke zelal û teqez daynin rastê jî, em ê karibin bêjin; Xanî, bi awayekî ji awayan, bi bikaranîna navê gelên din, amaje bi terîtoryaya axa Kurdan dike û wiha dibêje, “Ev Rom û ‘Ecem bi wan hesar in/Kurmanc-i hemî li çar kenar in” (2008: 39). Ev awa pênasekirina Xanî, gotina Martin Heiddeger tîne bîra me ku dibêje, “Sînor ne ew der e ku hebûna te lê diqede, sînor ew der e ku hebûna te lê dest pê dike” (2018: 152). Loma jî, Xanî, îmajê ax û welatekî Kurdan ya yekpar(ç)e ji wî aliyê din ve çêdike di hiş û aşopa xwe de; ew ji derveyî sînor û terîtoryaya axa Kurdan, li Kurdan dinîhêre û bi binavkirina navê Rom û Ecem jî doraliya (çaraliya) sînorê Kurdistanê ji derve de pênase dike û -çendî ku du par(ç)e be jî, amaje bi sînorê hundirîn dike. Ev yek jî nîşan dike ku tevî ku parçebûyî be jî, di hiş û bîra Xanî de îmajê ax û cografyayeke bi navê welat heye û Kurdên tê de ‘*hemî li çar kenar in.*’

Ehmedê Xanî, di Mem û Zînê de, herî zêde li ser ziman disekine. An jî em dikarin bi têgih û awirtêdanên îroyîn bêjin; paradîgmaya xwe ya li ser ramanweriya neteweyî, bi temamî li ser ziman datîne. Çawa ku me destnîşan kiribû, navê zimanê giştî, -ango yê neteweyî- wekî Kurdî an jî Kurmancî hildide. Ev yek bi me dide nîşan ku ranêzikiya wî ya bo ziman, taybet e û ziman ji bo wî navgîn û amraza jihevcihêkirinê ye jî. Heke em bi awayekî Foucaultiyane rabin, em dikarin bêjin; ji ber ku ‘*nûnertiya ramanê li peyvan hatiye dayîn*’ Xanî jî, hê di wê dem û çaxê de, ev nûnertî dida ziman. Yanî, çendî ku Xanî behs ji desthilata Kurdan dike û bi awayekî gazincane tunebûna îtîfaqekê ya di nav desthilatên Kurdan de dike û pê re jî dibêje, “Ger dê hebûya me jî xwedanek” (2008: 42) tu carî rê ji hizira xwe ya esasî şaş nake û hey pal û piştê xwe dide zimên, ‘ilm û zanîne tîne ser Kurdî û bi beyta “‘Ilm û huner û kemal û îzan/Şî’r û xezel û kîtab û dîwan” (2008: 42) û bi beyt û rêzikên, “Bîna vê ruha Cizîrî/Pê hey bikira ‘Elî Herîrî”, “Keyfek we bida Feqiyê Teyran” (2008: 42) silav li pêşrewên xwe dike û li ser nivîsîna wan ya bi Kurdî ku paşxane û mînak hiştine jê re, malavayî dide pêşrewên xwe û wan xelatdar dike. Digel vê yekê jî bi rêzikên wekî, “Kurmancî ye sirf e,

²⁹ Xanî, di Mem û Zînê û di beşa danasîna Newrozê de, sernavekî wisa bi kar aniye: “DASTANA BEYANA NEWROZA SULTANÎ TESMÎYÊ MEWSIMÊ SURÛR Û ŞADÎMANÎ BI MERSÛMÊ QEDÎMÊ KURDISTANÎ” (2005, MEM Û ZÎN, Stenbol: Weşanên Deng, çapa2’yan, rp, 218)

bêguman e”, “Manendê durê lisanê Kurdî”, “Kurmancî ye bûye şibhê bircan” (2008: 39-41-43) behs ji zimanê Kurdan dike û helwêst û ranêzikiyeke zimanî jî nîşan dide.

Her wiha Xanî, ew şa’ir e ku car pêşî ferhengeke duzimanî amade kiriye. Çendî ku ferhenga xwe ya bi navê *Nûbihara (Nûbara) Biçûkan* ji bo zarokan amade kiribe jî, xema wî ya sereke ziman e. Lê belê, her çi qas di raman û ranêzikiya xwe ya zimanî de bêtawîz xuya bike jî, Xanî hem di Mem û Zînê de zimanekî pir giran bi kar anîye hem jî ferhenga *Nûbihara Biçûkan* ne bi yekzimanî lê bi Erebi-Kurmancî amade kiriye. Di vê ferhengê de li xwe kiriye armanc ku di ser Kurmancî re Erebi hînî zarokên Kurd ku diçin xwendina medreseyê bike. Ev ranêzikî û niyet di awirê yekem û hîsîtiya pêşîn de baş û rast tê xuyan. Helbet em ê li ser rastiya wê nesekinin. Lê belê, pêwîst dike ku em balê bibin ser wê yekê ku; Xanî digel ku stûn û dîwarê paradîgmaya xwe ya neteweyî li ser ziman datîne jî, di helûmercên wê serdemê de praxis û pratîkeke ne li gorî ramana xwe pêk tîne. Ji ber ku di wê serdemê de, zimanê jiyanî yê yekem yê zarokên Kurdan Kurdî ye û zimanê Erebi, wekî zimanê medreseyê zimanê mecbûrî ye. Yanî Erebi, di warê perwerdehiyê de zimanê serdest e û xwedî îqtîdarekê ye. Xanî, wekî şa’ir, alim û ramanwerekî ku behsa tunebûna ‘xwedanê-desthilatê’ dike û doza desthilat û serdestiya Kurdan dike, di amadekirina vê ferhengê de bi xwe re dikeve nakokiyê. Ji ber ku di her şert û helûmercê de; gava kesek ku zimanê wî di pergaleke perwerdehiyê de ne zimanê sereke û serdest be û zimanekî dîtir zimanê mecbûrî yê xwendin û perwerdehiyê be û ew kes rabe wî zimanê serdest hînî kes û zarokên ku ne aîdî wî zimanê ne bike, em ê nikaribin bi hêsanî û bi awayekî objektîf bêjin; belê zarokên Kurdan bi ferhenga *Nûbihara Biçûkan* tenê hînî zimanê Erebi bûne. Naverok û teşe û şeweyê ferhenga menzûm ya *Nûbihara Biçûkan* nîşanî me dide ku; Xanî bi beytên xwe yên wekî, “Nar e agir, herr e germî, berd e sar/Selc û berf e, ma-û selsel her du av”, “Ricl e pê, û rukbe ejnû, betn e zik/Ssedr e sing, û cîdî ustû, ‘eyn e çav” (2008: 319) zarokên Kurdan dike mirovên duzimanî û bi awayekî ne xwezayî, lê bi rêbazeke destkarîkirinê dike ‘*durehî*’.

Digel vê yekê jî, Xanî di biwara kreolîzebûnê de ji Cizîrî û Feqî wêdetir e û ew; li ser zimanê Erebi bi temamî kreolîze bûye. Em dikarin wekî destnîşankirina vê yekê bêjin; Xanî di Mem û Zînê de zeryayek ji peyvên Erebi û Farisî ava kiriye û ristên wekî “Ecnasê milel mutî û munqad”, “Mecmûeê mumkinatê meqsûd”, “Keşşafê rumûzê hikmetu l-‘eyn” (2008: 52-53-55) nivîsîne ku di tu çarçove û hêmanên zimanî ve tu pêwendiya wan bi Kurdiya Kurmancî re tune ye.

BEŞA DER-BIWAR (I)

Modernbûna Kurdan û Çalakgeriya Modern ya Bîreweriya Kurd(an)

Wêjeya Kurdiya Kurmancî ya modern, biwareke taybet e ku me hîm û bingeha beşeke ji xebata xwe li serê daniye. Ji bo ku em karibin xweşîkî di hûrgerîna xebata xwe de biçin, pêwîst e berî ku em têkevin behs û dabaşa moderniyê; û bi kurtasî be jî bala xwe bidin ser rasthatinên Kurdan ya bi moderniyê re; nas bikin ka çawa ye reng û awayê kartêkên moderniyê yê ku li ser Kurdan çêbûye û li ser qonaxên teşegirtina moderniya Kurdan hûr bibin.

Heke me pirsek hebe ka modernî kîngê derketiye, em ê nikaribin xweşîkî dem û çaxekê diyar bikin bo bersivê. Her çî qas Anthony Giddens bo destpêka moderniyê dibêje, “...destpêka modernbûnê sedsala 17emîn e” (2018: 9) û Peter Wagner jî vê demê hinekî din bi paş de dide û dibêje, “...mirov dikare, serdema şoreşa demokratîk û endustrîyê, yanî werçerxa sedsala 18emîn wekî destpêka modernbûnê qebûl bike” (2005: 11). Gurminder K. Bhambra radigihîne ku Woolf destnîşan dike ku, “Dîroka Şoreşa Fransîz, wekî çîroka jêderkên dinyaya modern hatiye avakirin û vê dîrokê piştî bejara zanava Ewropaya modern çêkiriye” (2015: 118). Loma jî em jî dikarin bejin moderniyê; di qonaxên dîrokî, yê wekî Ronakbûn, Ronesans û Reform, Şoreşa Endustrîyê û Şoreşa Fransî, de dem bi dem daye der; û di dawiyê de ew qonax bi du têgihan; wekî “gerdîş” û “modern” hatine derbirandin. Piştî hîmgirtin û berbelavbûnê, ne tenê li Rojavayê, li hemû dinyayê, bûye bingehe û çarçoveya zal ya ramana siyasî û civakî.

Wekî zanîna giştî, bi me ve jî nas e ku; modernî, vehêlana wê zanyarî û agahiyê ye ku di yekdestiya bîrûbaweriya dînî de hewandî ye; yanî vehêlana wê agahiyê ye ku di dema berî moderniyê de, di ser bawerî û bawermendiyê re li dar bûye; û heke modernî, piştî vê vehêlanê; meyldan, qebûlkirin û pêkanîna agahiya epîstemolojîk be, ‘sekûlerî’ bivê nevē, dê wekî encama vê vehêlanê, derkeve pêşberî me û belkî jî bibe rêya famkirina ‘cudatiya çandan’. S. N. Eisenstadt, li ser guherîna ku di biwara agahiya epîstemîk de pêk hatine hûrgeriyê dike û dibêje,

“Demajoyên modernbûna çandî ya ku sekûleriyê jî dihewand, nîrx, gerdîş û veguhezkerên gerdîşê û pê re jî dîlnîzmî û qelenderiya nûneran jî lawaz kiriye. Van demajoyan; an kiriye ku ji aliyekî ve di navbera serdeqên çandî

yên di nav civaka neteweyî de rewşeke hevrikiyê çêbibe an jî kiriye ku sembol, gerdîş û çalakiyên çandî bîn afirandin û di nav komên berfireh de bîn qebûlkin” (2014: 36).

Çendî ku di navbera gerdîşparêz û veguhezkeran de hevrikî pêk hatibe jî, wekî encam, sekûlerî her ji bo bidawîbûna qonaxa pêşmoderniyê derketiye pêş û bûye diyarker a siberoja moderniyê. Lê belê modernî ne tenê ji sekûlerî û agahiya epîstemolojîk pêk tê. Bhambra ji Taylor radigihîne ku Taylor di pêdeçûna xwe de balê dikişîne û dibêje, “...çand, her ku dikevin nav çalakî û pêkanînên nû, bi awayekî beloq û aşkera ji hev cuda dibin. Loma jî, ya ku dikeve behsê ne modernîteya ‘sade û yekreng’ e, helbet dê modernîteyên alternatîf jî hebin ku bikevin behsê” (2015: 7). Ev nanakirina Taylor ji bo yekrengiya moderniyê ye. Ev awa nanakirin hem li ser ‘şûn’ê hem jî li ser ‘cudatiya çandan’ li dar e. Kartêk û diyarkeriya ‘şûn’ û ‘cudatiya çandan’ belî û durist dike. Ev peyt û destnîşankirinên Taylor bi me dide zanîn ku gotina, “Modernî wekî avaniyî gerdûnîker e” (Giddens, 2018: 173) hema wisa bi kartêkên moderniyê nade der û nayê erêkirin. Loma jî ji bo ku em karibin ji moderniyê baş fam bikin, pêwîst e em bala xwe ji ‘cudatiya çandan’ û ji ‘şûn’ an nedin alî.

Aşkera ye ku ‘cudatiya çandan’ di heman demê de amaje bi xweseriya civakan, komên etnîk- jî dike ku moderniya ‘yekreng’ bi giştî piştî avabûna netewe-dewletan wekî rengê moderniyê hatiye zanîn. Loma jî, berevajiya vê zanînê, destnîşankirina Anthony Smith ku dibêje, “Netewe, tevdehiyeke organîk e” (2002: 187) bala me bêtir dibe ser ‘cudatiya çandan. Ev yek jî ‘moderniyên pirrengî’ dixê behsê û li me dibe dabaş. Em bi vê dabaşê re, meyl û pala xwe didin ser vê fikra ku berdibetiyekê (îhtîmalekê) di hizira me de çêdike û em dibêjin; gelo gava ‘cudatiya çandan’ û ‘xweseriya komên etnîk’ neyê paşçavkirin, dibe ku ‘moderniyeke pirrengî’ peyde bibe. Arif Dirlik di vî warî de derpêş dike û dibêje, “...ramana ‘modernîteyên pirreng’, bi awayekî çandî diparêze ku moderniya di reng û dirûvên cuda de mimkun e û kesên ku li hember modernîteyê qeb dixwazin, di xwe de dihevin” (2003: 285). Em ji gotinên Dirlik fam dikin ku ‘moderniya pirreng’ di nav hewleke wisa de ye ku ne dixwaze ji aliyê ‘gerdûnîbûn’ê ne jî aliyê ‘cudagerî’yê bibe; loma jî ‘hewandinê’ pêk tîne. Çendî ku Dirlik peytên bi vî rengî dike jî, Bhambra li dijî vê yekê radibe û dibêje, “Moderniya pirreng jî bi awayekî ji awayan dîkeya xwe çêdike û ew dîke dibe nûnera gerdîşa ku bi temamî ji yên din cuda ye û dûre jî li dîkebûnê tê mehkûmkirin” (2015: 85). Dîkeya ku

di ‘moderniya pirreng’ de li dîkebûnê tê mehkûmkirin, ji ber ku di heman demê de nûnertiya ‘cudatiya çandan’ jî dike, di çarçoveya zanava çandî de jî di hewê. Bhambra, pê de diçe û sedem û egera nanakirina xwe ya ji bo ‘moderniya pirreng’ didomîne û dibêje, “...di teoriya moderniyê de tiştek heye ku ji cureyên pêwendîyan kêr maye; ew jî kolonyalîzm, yanî mêtîngerî ye” (2015: 85). Gava em helûmercên mêtîngerîyê bînin ber çavên xwe, em ê bizanibin ku di pêwendîya ku Bhambra behs jê dike de, pêwendîyeke serdest(î)-bindest(î) li dar e û çî wekî reng, çî wekî naverok çî jî wekî encam ev pêwendî dê her û her li ser rêveberên mêtîngerî bimeşe û pêkanînen wan û ast û qonaxa destûrdayîn û rêlêvekirinê her tiştî diyar bike.

Piştî têkşikîna şer û serîhildanên Kurdan yê di sedsala 19emîn de, “...helûmercên subjektîf ku piştî ramana şerê serbixwetîya Kurdan û derfetên çareserîya arîşeya neteweyî derketine holê, kiriye ku çîn û tewqeyên civakî nû û perwerî derkeve pêş” (Celîl, 2001: 15). Çendî ku avakirina ‘Aşîret Mektepleri (Mektebên Eşîretê) yê li bajarên mezin, kiriye ku zarokên Kurd, yê ku ji ber warguhêzîkirinê an jî ji ber daxwaza xwendinê, cara pêşî bi awayekî sistematîk ji ax û warê xwe û ji Kurdî dûr bibin û ji seqaya ruhê ziman û çanda xwe qut bibin û çendî ku van zarokan êdî hilma zimanekî dîtir hildane jî, wekî encama diyalektîka jiyanê, zarokên Kurdan bes bi xwendinê nemane, digel zarokên Tirk û Ermen û Arnawutan, xwe gihandine asta bîrewerîyê û dîsa wekî encama vê xwegihandin û xweavakirinê, xwendeyên Kurd di tevgera rewşengeriya di nav dewleta Osmanî, -Jön Türkler- de cî dane xwe ku ev tevger di heman demê de wekî hêza likarxist û pêkhêner ya moderniya dewlet û civakên Osmanî hatiye zanîn. Heta sala 1908an ku Jön Türk hatine ser hukm, xwende û bîrewerên Kurdan, yê ku ji bo xwendina di Mektebên Eşîretê hatine Stenbolê û hin ji rewşenbîrên wekî Abdullah Cevdet, Şerîf Paşa, Suleymaniyeli Tewfîq (Pîremêrd), Huznî Mukrîyanî, Ehmed Ramîz, Hemzeyê Muksî, Babanzade Îsmâîl Haqqî, “...li mektebên cedîd (harbîye, tîbbîye, mulkîye, darulmuellîmîn) xwendine” (Alan, 2019: 119), di nav berhelîstiya Îttihat Terakî û Jön Türkan de cî girtine.³⁰

³⁰ Tarık Zafer Tunaya *radigihîne me ku Abdullah Cevdet yek ji avakarên Îttihat Terrakî ye. “Îttihat Terakî: di sala 1889an de, bi serkêşîya İbrahim Temo, ji alî İbrahim Temo, Abdullah Cevdet, Hüseyinzade Ali Turan, İshak Sükutî û Mehmed Reşîd ve hat damezirandin”* (2015). *Türkiye’de Siyasal Partiler, İttihat ve Terakî: Bir Çağın, Bir Kuşağın, Bir Partinin Tarihi, İstanbul: İletişim Yayınları, cild 3, 258, altıncı baskı*)

Ji ber ku heta wê çaxê, desthilatdariyên Kurdan yê navxweyî, ku bi destê mîr û çîna arîstokrasiyê bi rê ve bûye, ji alî dewleta Osmanî ve ji navê hatiye rakirin û Kurd, wekî komeke etnîk ya misilman, wekî tebayeke Osmaniyan û wekî komeke etnîk ya bindest di nav dewleta Osmanî de (asê) mane; û modernî û rewşenîya Kurdan ya di biwara agahiya epîstemolojîk û ramana siyasî û civakî de, bi bestîbûna bi rewşenbîriya Osmaniyan (Tirkî) dest pê kiriye û bi wî rengî jî domandiye.

Wekî encama vê rewş û deravê, civak û neteweya Kurd, ji vî aliyê ve bêkes û xwedî maye û loma jî xwende û bîrewerên Kurd bi rola serkêşiya civakê rabûne. Ev rewş, careke din teorî û destnîşankirinên Miroslav Hroch tîne bîra me ku Hroch neteweyan wekî; 1) neteweyên mezin, 2) neteweyên biçûk, pênase dike û li gorî pênaseya wî, Kurd dikevin nav kategoriya neteweyên biçûk. Loma jî, em dikarin bêjin, heke rewş û derava civakê û neteweyek wiha be, wekî encameke bivênevê ye ku xwende û rewşenbîrên wê neteweyê bi vê rolê rabin û têkevin nav hewl û xebatan da ku karibin hişberiya neteweyî di ser çalakî û pêkanîna moderniyê re bimeşînin.

Mîrzade û xwendevanên Kurd, yê ku bi mezinên xwe re bi awayekî sirgûnî û warguhêztinî hatine Stenbolê û di mektebên Osmanî de xwendine û di xebata ronakbîriya Kurdan de bi rolekê rabûne, "...û ji bo ku Kurdan ji nav dest û lepên zordaran rizgar bikin, di sala 1897an de cemiyeteke nepen ava kirine û wekî weşîneka vê cemiyetê jî li Kahireyê rojnameya Kurdistan weşandine" (Malmîsanîj, 2002: 13). Rojnameya Kurdistan wekî yekem weşîneka Kurdan bûye ku di rêveberiya dewleta Osmanî de weşiyaye. Wekî sedema destpêkê, armanca wan bes li ser bidestxistina mafên xweserî û perwerdehiya bi zimanê Kurdî bûye. Loma jî li gorî ku em ji rojnameya Kurdistanê hîn dibin, "Pêşniyaz li hikumatê hatiye kirin da ku bi para perwerdehiyê ya ku ji Kurdistanê tê girtin, ji bo perwerdehiya herêma bê mezaxtin" (2018: 58, hej 5).

Gava em bala xwe didin, em dibînin ku bersiva hikumata Osmanî heman reftar e ku Eisenstadt destnîşan dike. Çawa ku di rojnameya Kurdistanê de hatiye weşandin, hikumatê di bersiva xwe de wiha gotiye, "Hikumat pêşî dê bi mektebên ku li paytextê û li bajarên nêzî paytextê ve mijûl bibe, helbet dê dor were ser Kurdistanê jî" (Kurdistan, 2018: 58, hej 5). Bersiva ku bi van gotinan li wan vegeriyaye, di heman demê de, helwêsta pûtepênedanê ya hikumeta mêtînger û serdest diyar dike. Gotina, *'helbet dê dor were ser Kurdistanê jî'* nîşaneyêke kêmxistinê ye dide der ku; *'Kurdistan ku dê*

dor were serê’ jî wekî parçeyekî dewleta Osmanî, di rêza talî ya duyem, sêyem de ye. Herçî çalakî û pêkanînen bîrewerên Kurd in, li ser vê dabaşê S. N. Eisenstadt, radigihîne ku E. Shils balê dibe ser guherînen ku di demajoya modernbûna dewleta mêtînger de li mêtîngehê pêk tên û dibêje,

“A yekem; ew kom bûn ku di saziyên perwerdehiyê yên nû de perwerde dibûn û di nav rêveberiyên kolonyal an jî di biwarên pîşeyî yên pircureyî de cî didan xwe. ya duyem; ew kom in ku bi saya peyanerên modern û kolonyal zengîn û mezin dibûn. ya sêyem; ew komên serdeq yên siyasî bûn ku serokî û serkêşiya bizavên neteweyî dikirin. Piraniya serokên yekem yên bizavên neteweyî ji malbatên maldar bûn. Wan bi temamî ji adet û tore û gerdîşên xwe bernedidan û xwe li hin aliyên jiyana modern anîn. Ev kes û kom bi piranî bajarî bûn; qet nebe li bajarên ku ketibûn bin rêveberiya mêtînger rabûbûn û mezin bûbûn” (2014: 151).

Di destnîşankirinên E. Shils de, *xalbenda yekem û sêyem* bi temamî rewşa Kurdên ku di serdema salên 1800-1918an de li Stenbolê bûn dide der. Loma jî, bêtî ku em bi vir de û wirde bikin, em dikarin bêjin, malbatên Bedirxaniyan, Mîkdat Mîdhad, Sureyya, Salih Bedirxan, ji malbata Cemîlzadeyan Ekrem Cemil Paşa, Kadri Cemil Paşa û ji malbata Babaniyan Îsmail Hakkî Babanzade, mînakên pir aşkera û li ber çavan in ku bi heman rol û kartêkê rabûne. Herçî Abdullah Cevdet, Modanî X. (Xelîl Xeyalî), Süleymaniyeli Tevfik (Pîremêrd), Memduh Selim Beg, Evdîrehîm Rehmî Hekarî û yên din jî ew kes û kom bûn ku bi rêya xwendin û perwerdehiyê, di moderniya welatê mêtîngeh de li bajarê mêtînger, li Stenbolê, serokî û serkêşiya bizavên modernî û neteweyî dikirin.

Ayhan Işık, li ser çalakî û kartêkên bîrewerên Kurdan yên ku di moderniya Kurdan û Osmaniyan de bi rolekê rabûne, bi taybetî bala me dibe ser Abdullah Cevdet û dibêje, “Abdullah Cevdet, mexlesa xwe ya ‘Bir Kürd (Kurdek) ku di avakirina Îttihat Terraki de jî bi kar anîbû, nediguherand û di nivîsên xwe de jî bi kar dianî” (2016: 33). Ji wê helwêsta Abdullah Cevdet wate ew e ku; bikaranîna mexlesa ‘Kurdek’, serê pêşîn zanava neteweyî aşkera dike û piştî jî wekî helwêsteke nanaker (îtirazker) û neyîner (redker) li hember Îttihat Terraki sekneke bîrewerîyane nîşan dide. Ev yek nîşanî me dide ku modernî û bîrewerîya Kurdan, wekî komeke etnîk ku bindestê Osmaniyan e, ji destpêkê ve her bi modernî û bîrewerîya Osmaniyan ve, yanî bi mêtîngerên xwe ve

bestandî maye. Loma jî, refleksên wan yên bo rêveberiya Osmanî li ser vê pêvebestandî reng û dirûv girtiye. Wekî encama vê pêvebestandî, çendî ku "...fikra serbixwetiyê di nav xwende û bîrewerên Kurdan de berbelav bûye" (Celîl, 2001: 21) jî, ji ber ku di vî warî de dest bi liv û tevgerekê nedikirin û her diman li benda fam û feraset û guherîna dîtinên rêveberên dewleta Osmanî, reng û awayê qonaxa moderniya Kurdan tu carî nedibû resen û bi awayekî serbixwe pêş de nedichû û her bi dewleta Osmanî ve diman dereng.

Helbet gava em li ser demajo û qonaxan li helûmercên ku li Kurdan qewimîne – an jî Kurdan li xwe qewimandine- lê binêrin, em ê bi palder û angaşên hîmdar û qewîn tenê nikaribin bêjin Kurd di moderniyê de dereng mane; ji ber ku moderniya Kurdan tu carî bi lihevraştinên xwezayî, bi destkariya wan, an jî bi pêwendîdanîna bi guherînên qonaxa modernbûnê re çênebûye. Xuya ye ku bîrewerên Kurdan hay jê hebûne ka rewş û helûmercên ku civaka Kurd tê de ye çi ye û çawa ye, loma jî di nivîsara destpêkî ya bi Tirkî ya bi navê "Amaç, Meslek" (Rojî Kurd, 2002: 14, hej, 1) de, bi mêjîzelaliyekê wiha tê gotin, 'Divê em li xwe mikur werin ku ji mêj ve ye têkiliya Kurdan bi dinyaya şareza ve qut maye, bi salan, li ser ax û warê ku lê dijîn, çi şewqeke hunerweriyê çi jî xîçek nîşaneyê 'ilm û zanistê lê nehatiye dîtin.' Digel wê jî, em bi awayekî zelal û bi fikreke rûniştî jî dikarin bêjin, Kurd di modernbûnê de hatine astengkirin. Ji ber ku dewleta Osmanî li ser pir-etnîkî bûye; û 'osmanîbûn' wekî nûnerê 'ummata Îslamê' hatiye danîn û zanava serdest ya ku li ser hemû komên etnîkî li dar bûye jî, 'osmanîbûn' bûye. Serdest û rayedarên dewleta Osmanî, ev yek bi gotinên bêjarî yên wekî 'çanda millî' û 'endamên ummeta Îslamê' bindoşek kirine û cihêtiyên herêmî û etnîkî, di nav 'îmaja ummet û millîbûnê' de meşrû kirine. Loma jî bi taybetî komên etnîk yên misilman û Kurd, di nava vê îmaja çekirî û afirandî de zêde pûte û girîngî bi cudatiya xwe nedane û di ser endamiya ummetiyê re, xwe bi neteweyên din re kirine yek.

Wekî encama vê îmaj û pêkanîne, xwende û bîrewerên Kurd yên destpêka moderniya Kurdan, pêwendî û 'wekheviyên dînî û yekwelatî' xistine navbera xwe û dewleta Osmanî. Ji ber hindê jî, di warê 'cudatiya çand û zimên' de, tu carî nikaribûne kartêkê li neteweyên din bikin. Berevajiya wê kartêka cudatiya neteweyên dîtir li ser wan çêbûye. Her çend ku ev kartêk di ser serdestiyê re be jî, bîrewerên Kurdan yên wê serdemê, pêkanînen serdestî û encamên wê qebûl kirine. Loma jî, moderniya Kurdan, hem ji alî zimanî hem ji alî ramanî hem jî ji alî feraseta moderniyê ve 'durehî' ye. Ji ber

vê çendê ye ku; tevî ku di warê qanûnî de tu astengî tunebûye û karibûne weşînekên ku zimanê wan xwerû bi Kurdî ne biweşînin jî; hem ji ber şûngeha jiyîn û derçûna weşînekan hem jî ji ber dûrbûna ji ax û warê hîmî û jêderkî ya zimanê Kurdî, xwende, nivîskar û bîrewerên Kurdan wan ev yek nekiriye û qebûla ku me behs jê kir jî li ser van egeran dane rûniştandin.

3.2 Wêjeya Kurmancî ya Modern

3.2.1 Qonaxa Ajdanê: Rojî Kurd û Jîn

Wêjeya Kurdiya Kurmancî ya klasîk, li warekî Kurdan; li ciyekî ku warê zanîn û şarezatî û sembola desthilata Kurdan e, li bajarekî ku warê çand û dinyadîtiniyê û yê ‘ilmê dînî û dinyewî û warê ku bajarê kakilê Kurdan e; li Cizîrê, kêr zêde di helûmercên xwezayî û jixweberî de bêhna xwe di ruhê zimanê Kurdiya Kurmancî de berda û bi navê Melayê Cizîrî bû hîm û bîngeha kelepûr û kevneşopiyek û bi quretiyeke hayjixwe, bi bixwebawerîtiyeke cîgirtî û bi xurtiyeke zimanî û wêjeyî derket ser dik û gorepana wêjeya dinyayê û got, ez li vir im û tu dil nekî jî bikî jî tu yê min bibînî.

Lê belê, piştî sê sed salan ji Cizîrî, wêjeya Kurdiya Kurmancî ya modern, ji war û bajarên xwe dûr, li bajarê sereke yê serdest û mêtîngerê xwe, li Stenbolê bi hewla ajdanê çavên xwe li roja xwe vekir. Heke em bipisin ka çi ne eger û sedemên vê rewşê, em ê ji serî de karibin bêjin; ev yek ne tercîh û hîlbijartina Kurdan e. Ji ber ku dewleta Osmanî, bi pêkanîna polîtîkaya ‘yekdestkirin agahiyê’ û pê re jî bi polîtîkayên xwe yên sirgûn û warguhêzîkirinê; Kurd û komên dîtir yên etnîk hemû bêgav û mecbûr hiştin ku ji bo hayjêbûna dinyayê berê xwe bidin bajarê Stenbolê ku nêzîktirî moderniya Ewropayê ye. Ji ber van eger û sedeman, em ê karibin bêjin; sedema ku wêjeya Kurdiya Kurmancî ya modern li Stenbolê aj û serî daye û ketiye nav hewla rabûnekê, bi giştî pêkanînen dewleta Osmanî yên mêtîngeriyê ne. Loma jî em ê di vê beşa xebata xwe de ji vî awir û riwangeya pêwendiyên di navbera serdest-bindest de heye, bala xwe bibin ser rewş û derava wêjeya Kurdiya Kurmancî ya modern.

Wekî me berê jî destnîşan kiribû, piştî ku xwende û bîrewerên Kurdan bi endam û rayedarên Îttihat Terraki re ketin dubendiyê, dest pê kirin komele û cemiyet ava kirin li Stenbolê. Van komele û cemiyetan, bi armanceke nûxwaz, ji bo pêşvebirina ziman, çand û mafên jiyanî yên Kurdan yên wekî perwerde û mafên hiqûqî û aborî, dest bi xebatê kiriye û kovar û rojname weşandine. Weşîneka yekem ku bi taybetî di warê

ziman û wêjeyê de nivîs diweşandin, kovara Rojî Kurd e (1913). Em dikarin kovara Rojî Kurd, wekî gav û ronahiya yekem ya wêjeya Kurdî ya modern nîşan û diyar bikin ku bi tenê çar hejmaran derçûye. Digel ku di kovarê de der barê ziman, nixrên neteweyî ya Kurdan û nivîsarên ku li ser bêjara balpêdanên neteweyî cî girtine jî, çîroka Fuat Temo ya bi navê ‘Çîrok’ (Rojî Kurd, 2002: 36-37-38-hej,1) ku bi vegotîneke çîrokiyane ya modern û bi teknîk û şêwaza diyalogê pêde diçe, wekî çîroka ji wêjeya modern hatiye weşandin. Çîroka Fuat Temo ya bi navê ‘Çîrok’ di heman demê de çîroka yekemîn ya wêjeya Kurdî ya modern e ku bi zaravaya Kurmanciya bakur hatiye nivîsîn.

Di kovara Rojî Kurd de, helbesteke bi navê “Hewar û Fîzar Misilmanî” (Modanî X., 2002: 70, hej 2) hatiye weşandin ku ya Modanî X. (Xelîl Xeyalî) ye. Gava em li naverok û riste û rêzikên helbestê dinêrin, serê pêşîn em xweşikî fam nakin ka helbest ji alî Modanî X. ve hatiye nivîsîn an jî wergerek e. Lê belê Remezan Alan bi balpêdaneke di cî de dibêje, “...di *Rojî Kurd* de, “Hewar û Fîzar Misilmanî” (2002: 70) ya Modanî X. (Xelîl Xeyalî) ku wî ev helbest ji Mehmet Akif (Ersoy) wergerandîye kurdî jî yekem wergera edebî ya kurdî ye”³¹ (2019: 22). Di ser vê balpêdanê re gava em bala xwe dibin ser helbesta şa’irê Tirk Mehmet Akif (Ersoy), em dibînin ku di risteyên destpêk û navîn de, Modanî X. hema bêje bi rêz û pêdeçûna orijînalê helbestê ve maye û bi rêbazên ‘*wergera yek bi yek*’ û ‘*wergera rave û şîrovekirin*’ê helbest wergerandine Kurdiya Kurmancî. Her wiha, Modanî X. çar rêzikên dawî yên helbesta M. Akif wernegerandîye Kurmancî û di şûna wan çar rêzikan de du rêzik nivîsîne ku bi temamî li ser rêbazên ‘*wergera rave û şîrovekirin*’ û ‘*wergera havjîpêanînê an jî lasayîkirinê*’ ne. Digel wê jî, Modanî X., bes navê xwe li bin nivîsarê nivîsiye û diyar nekiriye ku wî ew riste ji helbesta M. Akif wergerandine.

Weşîneke din ya ku di biwara polîtîka, çand, ziman û wêjeyê de bûye qonaxeke girîng ya bo wêjeya Kurdiya Kurmancî ya modern, kovara Jînê ye (1918-1919). Kovara Jînê jî her wekî kovar û weşînekên din yên ku beriya wê derçûne, sedem û armanca xwe ya derçûnê, di hejmara xwe ya yekem de û sernivîseke bi navê ‘*Maksadımız (Amrnaca Me)*’ de aşkera dike û wiha dibêje,

³¹ Navê helbesta M. Akif (Ersoy), “*Müslümanlık Nerede*” ye. (2010 Safahat, (Neşre Hazırlayan: M. Ertuğrul Düzdağ), Ankara: TDV Yayınları, birinci basım)

“Jîn ne ji bo bi destxistina lişteka (menfeet) maddî derdikeve. Amanca wê, belavkirina zanînê ye li ser jîyana kurd ya dîrokî, heqên wî yên neteweyî, bêjeya wî û rewşa wî ya civakî, ku ji sedsalên dirêj vir da hatine îhmalkirin” (Jîn, 1986: 9-10).

Ji sernivîsa Jînê em tê digihîjin ku kovar bi pirmebestî diweşe. Di nav armancên wê de, “...belavkirina zanînê ye li ser jîyana kurd ya dîrokî, heqên wî yên neteweyî, bêjeya wî û rewşa wî ya civakî” heye ku ev yek jî bendewariya me ya ji kovarê kêmtir dike; ji ber ku gelek çetin e ku kovareke wisa pirmebestî di demajoya weşana xwe û di biwara wêjeyê de karibe geşedaneke xurt bexşî paşxaneya Kurdî bike. Digel vê jî kovar, mîna ku weşînek û xebat û pêkanînên beriya xwe nebîne, an jî kêmbibîne, bi gotina ‘ji sedsalên dirêj vir da hatine îhmalkirin’ bi gotinên qelew û ji xwe razî dest pê dike. Yanî, armanca kovarê mezin û berê wê fireh e û ew dixwaze ne tene di warekî de, di hemû waran de xebatê bike ku belkî xebatên wê bibin sedem ku rengê modernîya Kurdan çêbibe û geşbûnekê jî bide der.

Di rewş û deraxeke bi vî rengî de, helbet dê pir ne mimkun e ku kovar di biwara wêjeya modern de pêşketinên xurt bide der. Loma jî, tevî ku di bîst û pênc (25) hejmarên kovara Jînê de, helbest, gotar û danehevên ji zargotinê cî girtine jî, tu yek jê nebûye nîşaneyê geşepêdanê û modernîya wêjeyê û nivîsa Kurdî. Ji bilî şanoya ku Evdirehîm Rehmî bi navê “Memê Alan nivîsiye û ew wekî ‘*du perde piyes*’” (1985: 674-678, 725-729) bi nav kiriye. Bi vê çalakgeriya wêjeyî, şanoya *Memê Alan* di şanogeriya Kurdî de bûye yekem şanoya Kurdî û her wiha di biwara wêjeyê de jî bûye yekem deq û teksta ku wekî şano hatiye nivîsîn.

Herçî behsê xeberê nivîsîna deqên wêjeyî ya li ser kelepûra zargotinê ye, nivîsîna şanoyê ya Evdirehîm Rehmî Hekarî ya di ser dastana *Memê Alan* re, helwêsteke Feqiyane û Xanîyane ye, ji ber ku; berî E. R. Hekarî, Feqiyê Teyran çîroka dastanî ya gelêrî Zembîlfiroş nivîsî. Ehmedê Xanî dastana *Memê Alan* li xwe kir palder û mesnewiya *Mem û Zînê* nivîsî. Ev reftara wan ku pal û meyla xwe didin kan û jêderka çand û folklorî, di heman demê de, hewldana vegerîna çavkaniya hîmî ye ku ‘cudatiya çandan’ û ‘cudatiya etnîkî’ nîşan dide. Ji ber ku Memê Alan û Zembîlfiroş, jixwe çîrok û dastan bûn û ew di şûngeha kan û jêderka vegotina wêjeya gelêrî ya Kurdan de bi cî bûbûn. Feqî, Xanî û Hekarî, ew çîrok û dastan ji nû ve nivîsîn; car din kan û jêderkê bi klasîk û çand û folklor û modern ve pevgihandin û car din rengê dîtir yê vegotinê

danê.³² Loma jî, em dikarin bêjin; her sê şa'ir û nivîskar jî, Feqî, Xanî û Hekarî, di vê biwarê de, bi berhemên ku cara yekem afirandin, hem di şûngeheke pêşengî de bi cî dibin hem jî berhemên wan, li gorî dem û çaxa xwe çalakger û *'afiranên nûxwaz'* in.

Çalakî û bizava xwende û bîrewerên Kurd ku bi taybetî di navbera salên 1850-1919an de pêk anîne, bi qas û awayê ku wan xwestiye û pîlan kiriye, neçûye serî û di hin waran de bi awayekî ne serketî bi encam bûye. Çendî ku rola pêkanînen dewleta Osmanî yê serdestî û mêtîngeriyê hebe di vê neserketîbûnê de û dewletê kend û kosp danîbin ber saziyên Kurdan û ev yek egera sereke be jî, em nikarin bêjin; sedem tenê ev e. Ji ber ku, bi taybetî di biwara wêjeyê de, ji bo serketîbûna xebat û çalakiyên bi vî rengî, pêwîstî saziyên wekî weşanxane, karxaneyên wekî çapxane û bi xwendevan û mirovên çalak heye; û pêwîst e ew sazî û xwendevanên wêjeyê çi wekî çendanî çi wekî çawanî bi her gavê re xurttir û zêdetir bin. Lê belê ji ber ku pergala rêvebirin û perwerdehiya qanûnî ya dewletê ya di wê dem û çaxê de rewş û keyseke baş nedaye Kurdan da ku karibin geşe bi xebatan bidin, hewldanên wan qut û birî maye.

Ev serdem, di biwara wêjeya Kurdî ya Kurmancî de hin nîşaneyên modernbûnê di xwe de dihevine. Di ser van nîşaneyan re, em dikarin bêjin, wekî destpêk û wekî *'qonaxa ajdanê'*; berevajîya pênasekirina Miroslav Hroch, ku dibêje, "...neteweyên biçûk, di zimanê xwe yî wêjeyî de jî ne xwedî kelepûrekê ne ku karibin seraqetiyê di berhênanên çandî de pêk bînin" (2011: 30) wêjeyeke neteweya Kurd ya xwedî kelepûr û kevneşopî heye ku hem ji alî wêjeya gelêrî û mît û dastanan ve xwedî nîrx û hêmanên bi vî rengî ye û hem jî ji alî wêjeya nivîskî û klasîk ve xwedî şahberhemên wekî *Dîwanên Cizîrî* û Feqî û mesnewiya *Mem û Zîn* ya Xanî ne; û digel wê jî, kuliya teke hêja heye di warê helbesta klasîk de; loma jî tu windabûn û dejenerasyonek li ziman û wêjeya kurdî neqewimiye.

Di serdema destpêka moderniya wêjê û nivîskariya Kurdî de ku em wê wekî *'qonaxa ajdanê'* bi nav dîkin, Kurd ji xwe-desthilatê bêpar bûn ku dê bibûya sedem û piştêka gavavêtina berpêyî qonaxa moderniyê; û di hemû waran de mabûn di bin destê dewleta Osmanî de. Di destê wêjeya Kurdî de, tenê ziman, kuliya wêjeya klasîk,

³² *Divê em bidin zanîn ku Pîremêrd jî, di sala 1932yan de, Mem û Zînê bi awayekî şanoyî û bi Kurdiya Kurmanciya Başûr (Sorani) dinivîse û bi praxis û çalakiyeke taybet, îcar Mem û Zîn ya klasîk bi form û teşeyê modern dinivîse.*

zargotin û çîrok û dastanên folklorîk hebûn. Lê belê çendî ku ev kuliya hebûn jî, ji ber ku “Sedema pirzanîna me ew e ku; em ji hêza aşopî ya kesên dîtir piştgirî hildidin û em xwedîyê wan zengîniyan in ku me ew ji bav û kalên xwe wekî mîrate girtine” (Calinescu, 2013: 23) û çendî ku kelepûreke hêjayî gotinê hebû jî, li gorî helûmercên hingê ku Kurd tê de bûn, têrî modernîyeke sererast û birêkûpêk nedikir.

Em dikarin bêjin, sedema esasî ya ku nehişt ku wêjeya Kurdî di dem û çaxa xwe de gavên xwe yên modernîzasyonê zexmtir biavêje, ev e; ji ber ku Kurd di hemû waran de, pêwendîya xwe ya bi dinyayê re di ser dewleta Osmanî re datanîn û di ser têkilî û nasîna wekî yek ji tebayên Osmanî re xwe digihandin Ewropayê; yanî ji ber ku Kurd wekî pergala jîyanê û desthilatê bi navîka xwe ve girêdayî pergala Osmanî ya bi mêtîngerîya kevnereng bûn û ji ber ku modernîya Kurdan, di ser van yên derengmayî re (tirk, faris û piştî jî ereb) pêk hatîye, “...mirov bibêje ya kurdan “du caran dereng maye” dê ne şaş be” (Alan, 2019: 27).

Loma jî, Kurd ne di modernîyê de, lê di çalakiya şînhatina li gorî dem û çaxê de dereng mane ku; parek jê bi avanekirina desthilateke serbixwe ve û para din jî bi fikr û bawerîya ‘ummetgeriyê’ ve standî ye. Ji ber ku di ‘qonaxa ajdanê’ de jî, beşek zêde xwende û bîrewerên Kurdan hê jî li ser hizira ‘ummetgeriyê’ bûn ku wan çareserî di bîrûbawerîya dînê Îslamê de didît. Di vî warî de, hem di nav bîrewerên Kurdan de ramanekê yekgirtî tunebû hem jî serê hin nivîskar û bîreweran lihevketî bû û ji ber ku “Di biwara modernî de yekem rengê xweser yê gelemşê û nelihevîyên ku derketine, sekûlerbûna azadiya dînî û çandî ne” (Eisenstadt, 2014: 53) hevnegirîya di nav bîrewerên Kurdan de heyî, nehiştibû ew ji pergala Osmanî biqetin. Gava ku Îsmail Hakkî Babanzade di *Rojî Kurd* de dinivîsî û digot,

“Ji bo Kurdan, her wekî milletên din yên Îslamî, -program ev e: Pêşî Îslam piştî Kurd. Ji ber ku Kurdî dê xizmetî Îslamîyetê bike berbelavkirin û giştîkirina Kurdî... Em nikarin ji bo milletê Kurd ku di ‘alema dîndariyê de navdar e, ji bilî vê programê programeke dîtir ya bilind û pêroz bifikirin” (2002: 51).

Her wiha, di heman hejmarê *Rojî Kurd* de, Doktor Abdullah Cevdet jî dinivîsî û digot,

“Em yekbûna hêmanan dixwazin. Divê em karibin ferdîbûna hêmanan jî bixwazin. Ev kêşê, yanî gotina ferdîbûn, ji alî sosyolojîk ve, nayê wateya

jihevcihêbûnê. Gotina pêşyan wiha dibêje; ‘Xwedê bira bira afirandine, her du jî cuda afirandine. Kurd dixwazin ziman û dîroka xwe bizanibin, dixwazin bigihîjin asta mirovên bilind ku hay ji kesayetiyên xwe yên milî hene. Ez bawer im ku hikumata me ya ku ronakger e bi çavekî baş dê li vê yekê binêre” (2002: 53).

Û nakokiya ku di nav her du ronakbîrên Kurdan de dida der, dikir ku ew ji hev bibin du beş. Beşek ku ‘Îslambûn dida pêşiya Kurdbûnê’ beşa din jî ‘Kurdbûn wekî biratiya neteweya din didît û dixwest arîşe di yekbûna vê biratiyê û ji alî hikumatê ve (yanî desthilata mêtînger) ve bê çareserkirin.’ Û digel vê yekê jî M.X. (Xelîl Xeyalî), hejmarek şûnde dinivîsî û digot,

“Ez berê berê nabê; îro hezar û sêsed sal e kû Kurd(me) qebûlê misilmanî kirine di nam û xebatê ha da qe nebî sî û çil hezar şêx, mela û feqî û mîr ji Kurdan gihane û di wê wextê da navdar e, ji bona dîn û dewlet xizmetê mezin kirine û kitêb çêkirine. Hal ev e kû ev xizmeta ha, ev kitêba ha temamê wî wenda bûye, navek wan nemaye, ewê maye jî malê Ereban û Eceman û Romîyan bûye, qederî zillek ji bo Kurdan faideyek nekiriye” (2002: 94).

Û bal dibir ser nirx û afirandên Kurdan ku ji ber nebûna desthilata Kurdan ji nav û navdariya Kurdan derketine. Vê rewşa ‘hevnegir û têr-nakokî’yê, nedihîşt ku yekbûneke neteweyî li ba bîrewerên Kurdan çêbibe ku di qonaxa Ayê ya M. Hroch diyarkirî de (2011: 28) nûnertiya neteweyekê dikirin. Loma jî, ew hem bi pergala serdest û mêtîngerê neteweya xwe ve diman bestandî û hem di moderniya jiyana civakî hem jî di moderniya wêjeya Kurdî de dereng û bêpar diman.

Di warê têgihên ku stûn û sedema xebata me li ser wan danandî ye, em dikarin bêjin; nivîskar û bîrewerên ‘qonaxa ajdanê’, piştî serdema klasîk, nifşa yekem e ku bi awayekî ji bêgavî û bi zextên pêkanînên mêtîngerîya kevenreg, li bajarên serdestê xwe rabûne û li wir xwendine an jî li ser ax û warê xwe rabûne, mezin bûne û di dibistanên serdestê xwe de xwendine û digel zimanê xwe yî dayikê, zimanê serdestê xwe jî hîn bûne. Ji ber ku takekesên nifşa yekem di dibistanên serdestê xwe de û bi zimanê wan perwerde bûne, di warê zimên de, bi temamî kreolîzebûyî ne ku dikarin wekî zimanê xwe yî dayikê zimanê serdestê xwe û zimanekî dîtir jî bi kar bînin. Loma jî, nifşa yekem; ji ber sedem û bandora vê ‘durehî’ û kreolîzebûnê weşînekên xwe bi du zimanî,

Kurdî-Tirkî weşandine. Ev rewş bi me dide zanîn û xuyakirin ku wêjeya Kurdî ya modern jî, di ‘qonaxa ajdanê’ de, hem di ser zimên re hem jî di ser nêrîn û awirtêdana wêjeya dinyayê ve ‘durehî’ ye.

Ji hêla din ve, çendî ku nivîskar û bîrewerên Kurd, di kovar û rojnameyên xwe de bal birine ser zanava zimanî û neteweyî ya Kurd(î) û xwestine ramana ‘cudabûna Kurdan ya çandî, zimanî, dîrokî û folklorî’ ya ji neteweyên din bidin zanîn jî, her wekî me di fikrên A. Cevdet de jî dît, hizira ‘biratiyê’ zaltir bûye û jixwe serbixweyîtiya ku dê piştî ‘qetîna ji serdestên xwe’ pêk were, qet neketiye behsê jî. Ji ber hindê jî, ramanweriya ku dê bibe pêşeng û serkêşê ramana zanava neteweyî ya Kurdan, berbelavtir û xurttir nebûye û negihîştîye gel û wekî encama vê yekê jî, qonaxa Ayê, yanî ‘qonaxa ajdanê’, hem ji alî bîreweriyê hem jî ji alî modernbûna wêjeya Kurdî ya modern ve qels û kêr maye.

3.2.2 Qonaxa Pêkhatinê: Hawar

Piştî avabûnê, rêveberên K.T.yê, soz û bextên ku di şerê derxistina hêmanên ne ji welat de dane Kurdan ji bîr dikin û zimanê Kurdî û hêmanên çanda Kurdan qedexe dikin. Li ser vê yekê, reaksiyona nerazîbûn û qebûlnekirina vê rewşê rû dide û “Di sala 1921ê de, li Erzerumê û ji alî serbazên kurd ku di artêşa osmanî de cî digirtin, rêxistina Azadî tê avakirin” (Minorsky û Thomas, 2008: 132) û rêxistin bi serkêşiya Şêx Se’îd “...di 13ê Sibata 1925an de li hember K.T.yê dest bi şer dike û di 15ê Nîsana 1925 an de têk dişike” (Özsoy û Eriş, 2007: 137-202). Piştî du salên bêdengiyê ya şikestinê, li gorî ku Rohat Alakom radigihîne me, “...di 5ê Cotmeha sala 1927an de, li Suriyeyê, rêxistina Xoybûnê ava dibe, (...) û endam û kadroyên wê zêdetir ji kurdên ku ji alî bakur wek sirgûnî hatine wir, pêk tê. (...) Yekem serokê rêxistina Xoybûnê Celadet Bedirxan e” (1998: 14-57). Wek endamên avakar yên Xoybûnê û ciyê wan yê sosyo-polîtîk yê di civakê de, bala me dibe ser bîreweriyê Kurd ku piştî avabûna K.T.yê nekariye li Stenbolê bihewe. Alakom di vî warî de jî radigihîne me û dibêje, “Rêxistina Xoybûnê pêkhatiya herî modern ya tevger û neteweparêzîya kurd e. Loma jî piştî ku serîhildana Agirî têk dişike, kadroyên Xoybûnê di biwara civakî û çandî de xebatan dimeşînin” (1998: 15-16). Yek ji xebata ku Alakom behs jê dike, Kovara Hawarê ye ku piştî têkşikîna du şerên li ser mafên neteweyî hatine kirin, derçûye. Bi derçûna xwe ve jî di biwarên çand, ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî ya modern de bûye qonaxeke

diyarker ku em ê ji niha û pê de wê dem û deraxê wekî ‘*qonaxa pêkhatinê*’ bi lev û diyar bikin.

Celadet Alî Bedirxan, di hejmara yekem ya Hawarê de, gava bi nivîseke pêşekî ya bi navê ‘Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê’ ku taybetiya manîfestoyê di xwe de dihevine, sedemên mebest û armancên kovarê dadixuyîne, wiha dibêje, “Hawarê siyaset ji civatên welatî re hiştiye. Bi siyasetê re bila ew mijûl bibin. Ew di warê zanîn, hiner û sinhetê de dixebitin” (1998: 23, cild, 1) Ev awa derbirîn ku aliyekî xebata avakirina zanava neteweyî bi wê de dike; û kesayetiyeke xweser li xebata taybet ya ku dê bê kirin, dibexşîne; û di heman demê de jî, di bingeha xwe de derbirîneke polîtîk e. Loma jî, nivîsa pêşekî bi me aşkera dike ku di heman demê de manîfestoya siyasî ya ziman û wêjeya kurdî ya modern ya sekûler e ku cara yekem di kovara Hawarê de bi bernameyeke ev çend birêkûpêkkirî tê daxuyandin. Xebata nûxwaz û ji hêlekê ve jî şoreşgerane ya Celadet Bedirxan ku di biwara zimên de jî dike, digel nîşanebûnê dibe bingeha sazkirina zanava neteweyî ya di ser zimên re. Celadet, ziman dike bingeh û sedema sereka ya hebûna Kurdan û wekî ramanwerê ku di ber sazkirina neteweyeke bi navê Kurd de xebatê dike, di Hawarê de bi hevokên wekî;

“Divêt bête zanîn qo zman jî hîmê heyîna me ye û bê zmanê xwe em niqarin bijîn dinav qoma miletan de...(…) ji ber qo miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi keweta du çeqan diparêzin: Ol yeq, zman dudo. Lê heqe ola miletê serdest û bindest yeq bibe, hingî çeq yeq bitenê ye û bend tenê zman e” (1998: 404-405, hej, 20).

helwêsta xwe ya sereke û bingehîn ya der barê zanav û netewesaziyê de datîne rastê. Celadet, serê pêşîn bo Kurdan pêwîstiya hatina nasînê destnîşan dike û dixwaze ew nasîn bi taybetiyeke yekta û bêhevta pêk were. Fîrat Mollaer li ser vê pêwîstiyê disekine, der barê wê pêwîstiyê de berê xwe dide têgihên ‘*wekhevî û jihevcihêtiyê*’ û dibêje, “Zanav, derbar hebûniya me ya polîtîk, xwedî dorhêleke berfireh e ku; *wekhevî* û *jihevcihêti*, jêbûnî û xweserî, ewlehî û azadî, pişkî û gerdûnî tê de cî bi cî dibin” (2018: 31). Ji ber ku zanav bi awayekî pîralî hebûniya takekes an jî civakê datîne rastê, pêwîstiya hatina nasînê, hewcetiyeke mirovane ye. Loma jî ziman, li ba Celadet, ji bo vê yektatiyê tekane heyîn e. Lê belê, gava Celadet ziman wekî tekane nîşaneya ‘*jihevcihêtiya*’ Kurdan ya ji serdestan (Tirk, Ereb û Faris) nîşan dide, ji bîr dike ku beşek Kurd hene ku ne ji dînê Îslamê ne û wekî ziman jî bi Kurdî diaxivin. Di vê

destnîşankirinê de ev heqîqet wisa li rastê dimîne. Tevî ku Kurd bi rêjeyêke zêde misilman in û bîrûbawerîyên wan yên dînî û yên serdestên wan yek e jî, yekbûna *cime‘teke mezin* ya di ser dîn re, heta wê hingê her tim berevajî li ser Kurdan hatiye bikaranîn. Loma jî, Celadet di haya vê yekê de ye û;

“...ne bendewar e ku milletên serdest di ser yekbûna *cime‘eta olî* re heqê kurdan jî li wan vegerînin û *cime‘eta mezin* ku tê xwestin ava bibe. Ew di ser paşxaneyekê re diaxive ku di hişûbîra kurdan de ava bûye” (Zeraq, 2018: 106).

Asta hayjêbûna Celadet ya li ser neteweyê bilind e; û bi qasî ku karibe bi hişberî bêjara (discourse) wê ya zanavî jî saz bike, binecih e. Loma jî, sere pêşîn ziman ji xwe re dike armanc û di ser zimên re jî bêjarekê ava dike; bêjara xurtkirina sedem û hêmanên zanava kurd. Ew sere pêşîn, dînê Îslamê ku Kurd û serdestên Kurdan bi hev re hevdîn in, ji vê bêjarê bêrî û dûr dike. Pê re jî di ser ziman û avabûna neteweyan re, bi riwangeyêke sekuler li arîşeya zanavê dinêre. Ji bo qayîmkirina zanava kurd jî roleke kartêkker dispêre zimên. Wekî helwêsteke dij-serdestî û dij-mêtinger nameyek ji M. Kemal Atatürk re dinivîse.³³ Ê bêtir ku li bende bimîne ku ji alî K.T.yê ve reftareke dilovaniyê an jî ranêzikiyêke berbihêriyê lê vegere, bes bi dayîna agahî û danzanîna zanistî (ne bi hewla danqebûlkirina heyîna Kurdî) li ser rengûawayê Kurdiya Kurmancî disekine û li pêşberî pergala asîmîlasyonîst û jinav(ê)bir ya pêknanînên K.T.yê helwêst û rabûneke dij-mêtinger ava dike.

Kovara Hawarê, ji alî naveroka xwe ya çandî û zimanî ve dibe diyarkera qonaxekê. Nivîsên ku di kovarê de cî digirin, bi şêwaz û naveroka xwe ve, ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî ji çarçove û deqbenda ‘ummetgerî’yê dûr dikin. Digel wê jî, nivîsên di Hawarê de weşiyane hemû bi Kurdî ne û wekî helwêst zimanê sê serdestan, - zimanê Tirkî, Farisî û Erebî- bi sekn û rabûneke neyînkir (redkir) hatiye biwêdekirin³⁴

³³ Bedirxan, Celadet Alî (2010), *Bir Kürt Aydınından MUSTAFA KEMAL’e Mektûb*, (Hazırlayan, Mustafa Aydoğan), İstanbul: Doz Yayınları, birinci basım

³⁴ Em di çarçova serdestiya rasterast de ku K.T., Komara Îranê û dewleta Iraq e, têgiha serdest bi kar tînin ku zimanê Kurdî lê ne fermî û qedexekirî ne. Loma jî çendî ku di dema weşana Hawarê de Fransî wek mêtinger serdestê Surî bin û di Hawarê de nivîsên bi Fransî weşiyabin jî, Kurdî nehatiye qedexekirin û serdestiyeke bi vî rengî li ser kurdî nehatiye sepandin.

ku “Cegerxwîn û nûnerên dî yên ekola Hawarê, heta jê hatiye peyv û ravekên zimanê Erebi, Farisî kêr bi kar anîne” (Laleş, 2012: 370).

Helbet, gava em ji roja îroyîn de li sekn û helwêsteke bi vî rengî binêrin, em ê pir bi hêsanî karibin bêjin; ev helwêst, di çarçove û deqbandeke (context) Fanonîst de, qayîmkirin û berz kirina ‘*reşbûn*’neke bêhempa ye; û bi reng û karektera neteweyî ku bi taybetî di biwara wêjeyê de dide xwe, rabûn û sekneke xurt e. Her wiha, Hawar ne tenê xebata ziman û wêjeyê dike; di heman demê de li ser hizira dij-serdestiyê doza maf û xwe-desthilata neteweyî jî dike; û li ser vê hizirê, bi bikaranîna awayê zimên û bi nivîsîna çîrok û helbestên ji mînakên wêjeya modern, kartêk û tevkariyên xurt li wêjeya Kurdiya Kurmancî ya modern dike.

3.2.3 Qonaxa Şikestî: Tîrêj

Piştî sî û şeş (36) salan ji rawestîna derçûna kovara Hawarê, kovara Tîrêjê derdiçe ku di biwarên ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî û Kirmanckî (Zazakî) de weşana xwe dike. Kovara Tîrêjê, li bajarê Tirkîyeyê, li Îzmîrê, sê hejmar çap dibe û bi piranî li welat belav dibe. Hejmara çaran ya kovarê, li Stockholmê çap dibe û piştî weşana xwe radiwestîne. Dema ku kovara Tîrêjê derdiçe, ji avabûna K.T.yê û pê de, dema dereng ya rabûna nîşîşa duyemîn e ku li gund, bajarok û bajaran zimanê wan yê dayikê Kurdî (Kurmancî-Kirmanckî) ye. Ev nîşîş, hem ji aliyê hînbûn û axaftina zimanê dayikê ve, yanî Kurdiya Kurmancî û Kirmanckî, ji derfetên ziman yên pêaxaftinê ne bêpar in hem jî bi temamî dûçarî pêkanînen asîmîlasyonê yên ji Plana Îslehkirina Şerqê hatine. Yanî nîşîşa duyem, ji alî sosyolojiya civaka Kurd ve, nîşîşa navberî ye ku rengê xwe daye Kurdiya Kurmancî û Kirmanckî (Zazakî). Loma jî hem ji hêla sosyo-polîtîk ve hem jî ji hêla sosyo-lînguîstîk ve derçûna kovara Tîrêjê, pêngaveke jiyanî ye.

Kovarên Hawar û Tîrêjê, alî armanca ‘domdarkirina çand û ziman û wêjeya Kurdî’ ve hevmebest in û heke bes bi vê egerê jî bimîne, em ê karibin bêjin, kovara Tîrêjê peyrewa kovara Hawarê ye. Digel vê hevmebestiyê; 1) ji alî bikaranîna ziman ve jî; her du kovar ji alî xwerûtî û duzaravayîbûnê ve wekî hev in ku; di Hawarê de nivîs û helbestên bi Kurmanciya Bakur û Kurmanciya Başûr (Soranî) weşiyane û di Tîrêjê de jî nivîs û helbestên bi Kurmanciya Bakur û bi Kirmanckî (Zazakî) belav bûne, 2) ji alî wêjeyê ve jî; a) helbestên di Tîrêjê de weşiyayî, her çend hin helbest wekî teşe û formdanê ve rengê helbestên Tirkî yên wê hingê bidin xwe jî, em dikarin bêjin; ji alî tema, naverok, şêwaz û bikaranîna zimanî ve dane dû ‘Bilûra Min’ û hemû helbestên di

Tîrêjê de weşandî; di çarçoveya helbesta serbest û aza de hatine nivîsîn, b) çîrokên di Tîrêjê de weşiyayî jî li ser hîma çîroka honaksaziya modern in û digel vê yekê jî, ji ragihandina Murat Varol agahî bo me peyde dibe ku, “Di hejmara duyem de, çîroka bi navê ‘Engîştê Kejê (Tiliyên Kejê)’ xwedî girîngiyeke taybet e ji ber ku yekem çîroka bi Zazakî ye ku bi honaksaziya modern hatiye nivîsîn” (2015: 145),³⁵ 3) ji alî wêjeya neteweyî ve jî; Tîrêjê daye ser şopa Hawarê ku di çarçoveya wêjeya neteweyî de Hawarê hîmeke qewîn û xurt danîbû. Loma jî, di hejmara yekem û di pêşeka derketinê de, bi gotina, “Her netewe, gel heta eşîrek jindar, lî dinê; xwedî zman, zargotin (folklor), wêje (edebiyat), bi kurtayî xwedî çandeki ye”³⁶ (Tîrêj, 1979: 3, hej, 1) rasterast bal li ser wêjeya neteweyî tê kişandin. Her wekî Hawarê, di heman pêşekê de, bi çar (4) xalbandan, manîfestoyeke kurt ya kovarê hatiye daxuyandin û bi mebesta xwedîlêderketinê, -ku ev hizir û mebest di Hawarê de bi rengê avakirinê ye- sedem û egera derketina kovarê hatiye aşkerakirin da ku pêşî li windabûna çand û ziman û wêjeya Kurdî bigire. Gava em bala xwe didinê, em dibînin ku; hem Hawar hem jî Tîrêj, di şûn û pêkanîneke pêşîlêgir de cî didin xwe ku sedema wan cuda ye. Loma jî, a) Hawar ji bo biserneketin û pêdeneçûna pêkanînên neyînkirin û xuyanînekirinê ya qanûnî ya mêtîngerîya K.T.yê dikeve nav hewl û xebatekê ku xwedî karaktereke pêşîlêgir e, b) Tîrêj, ji bo xurtnebûna pratîka asîmîlasyonîst ya K.T.yê û ji bo windanebûna çand û zimanê Kurdî dikeve nav hewl û xebatekê ku xwedî karaktereke pêşîlêgir e.

Her wiha bi van destnîşankirinên xwe em dikarin bêjin, hin cudahiyên Hawar û Tîrêjê jî hene; 1) di Hawarê de ferheng(ok) hatiye weşandin lê bi yekzimanî û bi Kurmancî-Kurmancî, lê belê di Tîrêjê de ferheng(ok) hatiye weşandin, lê bi duzimanî ye û Kurmancî-Tirkî, Kirmanckî-Tirkî ye, 2) di Hawarê de, di nav nivîsan de, bergînda

³⁵ Nevzat Anuk radigihîne me û dibêje, “Cara pêşî, di sala 1963yan de, di rojnameyeke ku bi navê Roja Nêwe û yek hejmarek weşiyayî de, du (2) nivîsên bi Zazakî hatine weşandin. Her du jî di rûpela çarem de hatine weşandin. Yek ji wan nivîsan, çîrokeke bi navê ‘Macera î Silêmonî Gince (Serhatiyên Silêmanê Gênc)’ ye ya din jî straneke bi navê ‘Xona Hecî’ ya ji herêma Bîngolê ye” (2012 “Kürt Gazeteciliği ve Zazaca”, II. Uluslararası Zaza Tarihi ve Kültürü Sempozyumu (04-06 Mayıs 2012), Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yayınları, s. 694) Lê belê tu belge û peyteke berbiçav tune ye ku em bizanibin ka çîroka behşjêkirî, çîroka gelêrî ye an jî çîroka honaksaz e. Loma jî em ê agahiya ku Murat Varol radigihîne me, wekî agahiya rast ya çavkaniyê qebûl bikin.

³⁶ Me dest neda awayê nivîsîn û bikaranîna tîp û herfan ya rastnivîs û redaksiyona kovara Tîrêjê.

wateya peyvên Kurdî yên nû an jî zêde nayên zanîn di nav parantezê de nehatiye dayîn, lê di Tîrêjê de ev yek hatiye kirin, 3) di Hawarê de çarînên Omer Xeyam ji Farisî û tefsîra Qur'anê û hedîsên pêxember jî ji Erebî bo Kurmancî hatine wergerandin û digel wê jî wergerên adaptasyonî ji Fransî hatine kirin, lê belê hê di hejmara yekem ya Tîrêjê de ji helbestkarê Tirk Nazım Hikmet du helbest ji alî Malmîsanij ve ji Tirkî bo Kirmanckî (Zazakî) hatine wergerandin û di heman hejmarê de, çîrokeke çîroknûs û romannûsê Tirk Sabahattin Ali ji alî M. Dewij ve û bi navê 'Estaneka Mêşna' bo Kirmanckî hatiye wergerandin. Ev yek bi me dide nîşan ku; a) nivîskarên Hawarê, herî kêrîbûne bi sê zimanan bixwînin û -belkî jî- binivîsin, b) nivîskarên Tîrêjê karibûne, herî kêrîbûn, bi du zimanan bixwînin û binivîsin.

Em li ser van destnîşankirinên xwe dikarin bêjin; digel hemû wekhevî û jihev cudatîyên xwe yên bi kovara Hawarê re, kovara Tîrêjê, hem di warê hizira neteweyî û hem jî di warê likarxistin û armanca pêşdebirin û xurtkirina çand û zimanê Kurdî ve, peyrewiyeke derengmayî ya kovara Hawarê ye.

BEŞA DER-BIWAR (II)

Avakirina Zanava Tirk û Pêkanînên Asîmîlasyonîst yê Tirk(î)kirinê

Piştî ku K.T. bi peymanê Lozanê ji alî di qada navneteweyî de bi awayekî fermî hat nasîn, rewşa Kurdan ya siyasî, civakî û zimanî ya ku ji destpêka Îslamîyetê heta wê hingê, bi temamî ne wekî hev be jî, kêr zêde nêzî hev bû, bi temamî serûbinê hev bû û guherî. “(...) hemû soz û bextên ku bo Kurdan hatibûn dayîn, hatin jibîrkirin. Mafên gelên Kurd, Çerkes û Lazan ku avakarên hîmî û eslî bûn, hat neyîn û mandelekirin” (Günel Tekin, 2009: 58). Çendî ku Îttihat û Terakkî piştî rûxîna dewleta Osmanî ji navê rabûbû jî, fikr û ramanên wê bizavê yê der heqê neteweya Tirk de, bêtî ku nerm û kêr bibin, domandin. Ji ber ku “...piştî ku rêvebirina dewletê ket destê kadroyên Kemalîst, ji ciyê ku Îttihat Terakkî mabû domand û bizava Tirkparêziyê ku feksa demê lê ketibû, geşe bi xwe da û domand” (Akçura, 2008: 75). Loma jî, Cumhuriyet Halk Fırkası (Firqeya Gel ya Cumhuriyetê) ku di 9ê Îlona 1923yan de ji alî M. Kemal ve hat damezirandin, armanca xwe ya bo hemû welat wiha dadixuyand:

“Sazkirina tevdehiyeke siyasî û civakî ya ji hev welatîyên ku hemû jî bi yek zimanekî diaxivin, bi yekbûna çand û îdealê bi hev ve girêdayî ne; yanî afirandina ‘miletê ku zimanê wî yê dayikê yek e, îdeala wî yek e û yekbûna wî yek e” (Günel Tekin, 2012: 99).

Piştî vê daxuyaniyê, êdî ji bo zanava Tirkbûnê biryarên fermî û qanûnî dihatin hildan û makezagona di sala 1924an de hatî amadekirin, hemû gelên li Tirkîyeyê wekî Tirk qebûl dikir û di xalbenda 88. de wiha dinivîsî: “Xalbend 88- Li ser hîma hev welatîyê, bêtî ku cudatiya dîn û nîjadê bê kirin, hemû gelên li Tirkîyeyê bi awayekî giştî (wekî Tirk) tê qebûl kirin” (Özyavuz, 1997: 289). Digel qanûnan ji bo saz kirin û berbelav kirin û danqebûl kirina zanava Tirk pênase li ser pênaseyê dihat kirin:

Ji gotinên Yunus Nadi:

“Tirkbûn ne ew tişt bû ku di berîka kesekî de pasaport û nasnameya Tirk hebe. Tirkbûn ew tişt bû ku diviya kesek bi çand, ziman, raman, dil û jiyana xwe ve digel Tirkan bûya” (Raguhaştin: Yeğen, 2011: 96).

İsmet İnönü dê piştî salekê dê ji dîplomatekî Îngilîz re wiha bigota:

“Em aşkera aşkera neteweparêz in û neteweparêzî xala me ya hevpar e. Li hember Tirkan ku piraniya vî welatî ne, tu bandora gel an jî komên etnîk tune ye. Em ê yê ku li dijî Tirkbûn an jî Tirkparêziyê derdikevin,

ji navê wînda bikin. Taybetiya herî girîng ku em ji kesên ku dixwazin xizmetî welêt bikin dixwazin ew e ku; divê Tirk û Tirkparêz bin” (Raguhastin: Bozarslan, 2004: 58).

Wezîrê dadê yê wê hingê Mahmut Esat Bozkurt jî gaveke pêşde biçûya û wiha bigota:

“Tirk, tekane efendiyê (serdestê) vî welatî ye. Kesên ku ne ji nîjada saf ya Tirk in, tenê mafekî wan heye: mafê xizmetkariyê, mafê kolebûnê” (Günel Tekin, 2009: 57).

Piştî deh salan ji weşîna pirtûka Ziya Gökalp ya bi navê *Türkçülüğün Esasları*, Munis Tekinalp ku “bi eslê xwe Cihû ye û navê wî yê rastîn Jacob M. Landau ye” (Raguhastin; Parmaksızoğlu, 1996: 1127), der heqê Tirkkirinê de pirtûkekê dinivîse; di vê pirtûkê de pênaseya Tirk tê kirin û wiha tê gotin: “Her kesê ku xwe wekî Tirk pênase dike, Tirk e” (Tekinalp, 2001: 46). Bi bêjarên bi vî rengî, di hiş û hizirê de dihat sazîkirin zanava Tirkbûnê. Bi danîna qanûnên makezagonî bi awayekî fermî û qanûnî dihat meşrûkirin. Lê belê, vê yekê dê têr nekira ku di nav sînorê K.T.yê de zanava Tirkbûnê xweşîkî bê rûniştandin. Hin pêkanîn dê bihatana cîbicînanîn ku hê di dema dewleta Osmaniyan de, piştî daxuyandina Kanun-ı Esasiye dest pê kiribûn ku yekem şanek û nîşaneyê wê qebûlîkirina Tirkî ya wek zimanê dewletê bû.

Û dê di salên pêşî yên avabûna K.T.yê û di civîna O.T.yê de M. Kemal wiha bigota:

“Mirovekî ku bi Tirkî neaxive û îdîa û angaştê bike ku Tirk e, ne rast e ku em bi vê bawer bikin. (...) Peywira *Türk Ocağı* yê me ya yekem ew e ku mirovên bi vî awayî bikin mirovên ku bi zimanê me diaxivin û dibin Tirkê hur” (Üstel, 1997: 366).

Dr. Şakir Turgut Bey:

“Mirovên ku li ser axa Tirkiyeyê dijîn û bi zimanekî din diaxivin, hêrsa me ya neteweyî radikin. Loma jî divê mirovên ku bi zimanekî ji bilî Tirkî diaxivin, werin cezakirin” (Üstel, 1997: 186).

İzzet Ulvi:

“Gelemşeya asîmîlasyonê gelemşeya ziman e. Divê kesên ku bi zimanê Tirkî naaxivin cezayê pere bidin” (Üstel, 1997: 199).

Di komcivîna Türk Ocağı ya 27ê Nîsana 1927an de, encûmenê mesaîyê Îshak Refet Bey, aşkera aşkera behsa asîmîlasyona Kurdan dike û mîna ku ji wê çaxê de hîm û bingeha ‘tunehesibandin’ê ava bike, dibêje:

“Divê em zêdetir girîngî bidin herêmên ku Kurd lê hene. Demajoya Tirkkirina Kurdan ne ew qas zehmet e. Dîroka Kurdan tune ye. Dîroka Kurdan bi dîroka Tirkan re li nav hev ketiye. Zimanekî bi navê Kurdî tune ye. Îro roj zimanê Kurdî ji heşt hezar peyvên pêk tê. Sê hezarê wan bi Tirkî ye. Bi qasî du hezarê wan Erebîya Kurdîbûyî ye. Bi qasî du hezar û pênc sed peyvên mayî jî bi Farisiya nû û kevn e. Efendîno, wekî zimanê Kurdî, tenê sê sed peyv hene di navê des” (Üstel, 1997: 202-203).

Ev gotinên li jor me mînakên wan dayî, bi me didin zanîn û aşkerakirin ku; neteweyek hatiye avakirin ku; sedem û bingeha avabûna wê jî li ser *xeyaleke cime’etî* hatiye danîn û polîtîka û pêkanînen wê jî li ser tunehesibandin, asîmîlekirin û jinavêwindakirina gel û komên etnîk yên din hatiye meşandin.

Herçî ziman e, di sazkirina zanav û neteweya Tirk de bûye navgîn û amûreke hîmî û sereke û bi roleke mezin rabûye û “Li Tirkiyeyê zimanê dayikê (tirkî) wekî zimanê tek û serdest hatiye dîtin. Di çarçoveya avakirina netewe dewletê ya derbasdar ya wê demê de (...) bi zimanê dewletê tirkî wek zimanê tek yê dayikê derdikeve pêş”³⁷ (Ersanlı, 2010: 107) û digel wê jî “Siyaseta asîmîlasyonê jî ji bo gihîştina vê armancê mîna navgînekê girîng hatin dîtin” (Çağlayan, 2014: 49).

K.T.yê bi pêkanînen xwe yên ku ji İttihat Terakki jê re mabû û rê û rêbazên asîmîlasyonê her kudand. Ji bo bi hincetkîrin û rûpoşkirina vê pêkanîna xwe, piştî xwe dabû peymanê Lozanê ku di vî warê de ji bo K.T.yê xala herî girîng ev bû; “Tenê hindikaniyên ne misilman hewceyî parastinê ne” (Ürer, 2003: 267). Kurd di dema Osmaniyan û di warê desthilata navxweyî de kêmkirî serdestê xwe bûn û digel komên etnîkî yên din jî kêmkirî bi zimanê xwe dijiyan û bi awayekî fîlî, civakî û mirovane hebûna wan ya etnîkî û cihêtiya wan ya çandî, zimanî dihat qebûlkirin. K.T.yê bi vê xalbendê ku di girêdana peymanê Lozanê (24/9/1923) de hem xwe ji berpirsiyariya dîrokî ya ji dewleta Osmanî mayî xelas dîkir hem jî rê pê diket ku pêkanînen xwe yên ji bo sazkirina zanav û neteweya Tirk bi rihetî bidomîne. Loma jî, hema piştî peymanê, ji bo

³⁷ Wergera ji *Tirkî ya jêgiranên ji pirtûka Heman Mal Zimanên Cuda (Handan Çağlayan, Weşanên DÎSAyê) ji alî Luqman Guldivê ve hatiye kirin.*

ku zimanên ji bilî Tirkî di her war û qadê de asê û asteng bikin, dest bi tevdir û pêkanînan kirin.

Piştî demekê, rêveber û desthilên K.T.yê, ji bo ku bale bi temamî bibin ser zanava Tirk û Tirkbûnê û pêkanînen asîmîlasyonê bidomînin, bi dest û derfetên dewletê saziyên sivîl damezirandin. Saziya Dîroka Tirk (Türk Tarih Kurumu), bi taybetî ji bo ku tezên wan yên li ser dîroka Tirkan wekî rastiyeke zanistî û heqîqetî bê berbelavkirin û ji bo ku bide qebûlkirin ku Tirk ji serdemên pir ji dûr ve li ser vê axê ne, hat damezirandin. S.D.T.yê, digel tezên dîrokî xebatên propagandayî jî dikirin ku gotina hişyarkirinê ya Afet İnan, “Heke zarokê Tirk bifikire ku di demeke nêz de koç kiriye hatiye vê derê, dê nikaribe bibe efendiyê esasî yê vî welatî” mîna keke aşkera û balkêş e û digel vê jî angaştên wekî “Tirk in yên ku medeniyet afirandin. Hunera hesin ji alî Tirkan ve di Asyaya Navîn de hat kifşkirin” (Günel Tekin, 2009: 89) diyar dikin ku hewldaneke saz kirinê heye ji bo zanav û neteweya Tirk û pê re jî tunekirina dîrok û hebûna Kurdan û komên din yên etnîkî û helandin û windakirina dîroka wan ya di nav dîroka Tirkan de. Her wiha, di biwara zimên de jî, Teoriya Zimên ya Rojê tê danîn. Li gorî vê teoriyê, “Tirkî zimanê yekem e ku ademîzad pê axiviye û jêderka makî ya hemû zimanên dinyayê ye” (Avcioğlu, 1978: 24). Gava em bala xwe didinê, teorî heye lê saziyek tune ye ku vê teoriyê li ser hîmekê bide rûniştandin. Ji bo vê jî di sala 1932yan de, wekî temamkera S.D.T, Saziya Zimanê Tirk (Türk Dil Kurumu) hat damezirandin. “Û vê saziyê, piştî damezirîna xwe, xebatên xwe yên li ser teza ku; zimanê Tirkî maka zimanên dinyayê ye û pir bi hîm û raxurt e û ji zimanên dîtir zengîntir e, domandin” (Günel Tekin, 2009: 99). Teoriya Zimên ya Rojê, digel teza xwe ya makbûnê, hebûna zimanên di nav sînorê K.T.yê de jî mandele dikir û “...li gorî vê teoriya nû, lêzimtiya Tirkî ya bi zimanên din re li aliyekî, dihat angaştkirin û parastin ku Tirkî ‘zimanê herî kevn û yê çandê ye’” (Ceyhun, 1993: 151).

Ziman di saz kirina zanava neteweya Tirk de, “ji bo yekîtiya endamên ‘*cime’eta xeyalî*’ wekî hêman û faktoreke girîng hatiye zanîn” (Balçık, 2008: 785). Di makezagona sala 1921ê de guhertin hatiye kirin û di sala 1923yan de xalbend û hikmê “Zimanê fermî yê dewleta Tirk, Tirkî ye” lê hatiye zêdekirin. (Balçık, 2008: 782) û bi vî awayî ‘yekzimanîya fermî’ bûye pîvana zanava neteweyî ya Tirk û pê re jî wekî ‘zimanê dayikê’ hatiye qebûlkirin. Ev yek bûye sedem ku zimanên dîtir yên li K.T.yê, hem qanûnî hem jî jixweberê bibin zimanên qedexekirî.

Yek ji pêkanînên Tirk(î)kirinê jî ‘Qanûna Îskanê (Qanûna Warguhêzîkirinê)’ ye ku di sala 1934an de hatiye qebûlîkirin. Qanûn bi xwe şanî me dide ka tundî û rehenda neteweparêziya Tirk çendî zêde û berfireh e. Ahmet Yıldız der heqê qanûnê de radigihîne û dibêje, “...bi taybetî dilsoziya bo çanda Tirkan û axaftina Tirkî ya wekî zimanê xwe yî dayikê wekî esas qebûl dikir û bi taybetî dixwest komên etnîk yên misilman û pê re jî yên ne misilman warguhêzî bike û bi vî awayî asîmîle bike” (Yıldız, 2007: 248-250). Digel vê yekê jî Günel Tekin balê dibe ser raporên veşartî yên li ser Plana Îslehkirina Şerqê û dibêje,

“Ev rapor herêma Kurdan dike du beş: Bakurê çemê Feratê û Rojhilatê çemê Feratê. Pêşînî ya wan herêman bû ku diviya pêwendiya wan bi tu awayî bi Kurdan re çênebûna. Di herêma duyem de jî ku bi temamî wekî Kurd dihat qebûlîkirin, dihat armanckirin ku Kurd ji warê xwe werin sirgûnîkirin û eşîr û komikên Tirk li wan deran bîn bicîkirin û bi vî awayî li her derê neteweya Tirk bibe piranî. (2009: 115)

Polîtîkaya warguhêzî û koçbarkirinê hê di dema Îttihat Terakki de dest pê kiribû û bêtir ku ji hev qut bibe, dem bi dem dihat pêkanîn. Vê yekê piştî destpêkirina rêveberiya K.T.yê ya Kemalîst her ku çû bi awayekî sistematîktir kudand.

Pêkanîna herî girîng ya asîmîlasyonê perwerdehî ye; û digel wê jî perwerdehiya bi yekzimanî ye. C. Scalbert Yücel radigihîne me ku Dominique Schnapper dibêje, “Dibistan, endamên civakê ku xwedî gerdûneke sînorkirî ne dike hevvelatî” (2016: 56). Her wekî me destnîşan kiribû zimanê Tirkî piştî danîna Kanun-ı Esasiye ya di sala 1876an û şûnde perwerdehî; çî di nav sînorên dewleta Osmanî çî jî di nav sînorên K.T.yê de ku em dikarin bêjin, wekî pêkanîn berde wama dewleta Osmanî ye, bi zimanê Tirkî ye. Ev rewş û statuya Tirkî ya bi piştgiriya hêza dewletî, di makezagonên salên 1924 û piştî jî di yên 1961 û 1982yan de hatiye dubarekirin. Digel wê jî di 3yê Adara sala 1924an de bi danîna qanûna Tevhid-i Tedrisatê perwerdehiya di dibistanên K.T.yê de bûye yekzimanî; yanî bi zimanê Tirkî” û digel vê jî ev qanûn “...bi rêgeza ‘Yek Ziman, Yek Dîn, Yek Millet, Yek Dewlet’ hatiye cîbicîanîn” (Günel Tekin, 2009: 73-104). Ev yek di sala 1925an de hatiye zexmkirin û her wekî Mehmet Bayrak jî dibêje, “Di sala 1925an de bi Plana Îslehkirina Şerqê axaftina bi Kurdî tê qedexekirin” (2013: 44). Her çî qas ev statuya Tirkî wek qanûnê hatiye destnîşankirin jî, bi taybetî di makezagonên sala 1924an û 1961ê de, ji ber ku her wekî Schnapper gotî, ‘hevvelatî

pêwîst e bo K.T.yê', wekî helwestekê navê zimanê Kurdî nehatiye bilêvkirin. Her wekî gotina G. Haig, "Binavnekirina zimanên qedexekirî, -bi taybetî Kurdî- nexuyayîkirinê esehî dike û rast didêrîne û di heman demê de amaje bi mandelekirinê jî dike" (Raguhastin; Yücel Scalbert, 2016:32) binavnekirina zimanê Kurdî, hem wek qanûnî hem wek pratîkî hatiye nexuyakirin û bi vî awayî jî tune hatiye hesibandin. Digel vê yekê jî, ev pêkanîna nexuyakirin ne yekalî lê belê dualî ye. Çawa ku Terry Eagleton jî destnîşan dike û dibêje, "Qanûna desthilata siyasî, çi gava ku têra xwe nexuyayî dibe wê gavê herî baş li kar dikeve" (1993: 33). Hem ji alî ya ku qedexe dike, -qanûn- hem jî ji alî ya ku tê qedexekirin, -zimanê Kurdî- ve; tiştekî beraqil e ku gava der heqê tiştekî de çi erênî çi jî neyîn tu tişt neyê gotin û navê wî neyê hildan, dê hebûna wî jî nekeve ber gengeşeyê.

Di perwerdehiyê de, ji bilî ferzkirina zimanê serdest li mirovên bindest, yek ji rêbaz û amûrên asîmîlasyonê jî, D. S. Ş. H (Dibistanên Seretayî yên Şevînî yên Herêmî) dibistanên şevînî ne ku bi taybetî ji cî û waran dûr tên avakirin. Cuma Çiçek ji Mfum Mensah radigihîne ku "Berî her tiştî dibistanên pergala dagirker ne li gorî pêdiviyên xwecihî û welatê wan, li gorî pêdiviyên welatê dagirker tên saz kirin" (2008: 7). Di pêkanîna asîmîlasyonîst de, rêbaza perwerdehiya yekzimanî û vekirina dibistanên şevînî, ji du pergalên du dewletan, Îngilistan û Fransa, hatiye wergirtin ku bûne mînakên mêtîngeriya bo dinyayê:

"Di pergala yekem de armanc gihandina çîneke-komeke elîtîst e ku ev kom ji aliyê xwîn û reng ve dagirkerî ye lê ji aliyê ziman, çand, fikr û ramanê ve dagirker e. Di pergala duyemîn de jî armanc, bi giştî hegemonyaya çandî û asîmîlasyon e, kuştin yan jî daxistina statûya çand û zimanên herêmî ye" (Çiçek, 2008: 7-8).

Dibistanên şevînî, ew saziyên perwerdehiyê ne ku; "...di demen nû yên mêtîngeriya de, ji alî dewletên Ewropayê ve hatine avakirin bo 'modernkirina' zarokên malbatên ku ji dûrî bajaran dijîn û van dibistanan li xwe kiriye armanc ku 'jiyaneke nû' hînî wan zarokan bike" (Işık û Arslan, 2012: 108). Gava em destnîşankirinên Çiçek bînin bîra xwe ku sîstema perwerdehiyê ya modern bi du awayan li kar dikeve, em ê karibin bejin; perwerdehiya di dibistanên şevînî de tê kirin di heman deme de yekrengiyekê jî bi xwe re tîne; û avakirina dibistanên şevînî ya K.T.yê bi temamî li gorî plana asîmîlasyonê ye. Zarokên ku ji dê û bavê xwe dihatin qetandin; di cî û warên dûr

de, diketin bin sehîfî û çewisîna rêveberên ku armanca wan Tirkkirina wan bû û her wekî Timothy Mitchel jî dibêje, “Xwedîdarî (otorite) û serşorî (îte’at), bêyî ku tiştek ji xwe kêmbike, li hemû dibistanê li dar diket û bi vî awayî hemû zarok, di ser zimanê Tirkî re tev li sîstemê dibûn û asîmîle dibûn” (2001:134–35).

Pêkanîna asîmîlasyon û sepandina her cure zext û çewisandinê ya K.T.yê, bi rê û rêbazên cure cure, carinan bi sistkirinê carinan jî bi jidandinê, heta sala 1980yî kudandiye. Di sala 1980yî de derbeyeke leşkerî li K.T.yê de li dar ket. Digel pêkanînên dîtir yê leşkerî, “...pêkanînên herî tund ji bo qedexekirina zimanên ne tirkî û nexasim jî ji bo qedexekirina kurdî piştî darbeya eskerî ya 12’ê Îlonê derdikevin holê” (Çağlayan, 2014: 52).

Di vî warî de em dikarin serî li makezagona K.T.yê bidin ku di destûra bingeîn de gelek xal hene ku armanca wan bi temamî qedexekirina Kurdî ye. Ji ber ku ji makezagona 1924an û ji Plana Îsleheta Şerqê û şûnde; bi saya pêkanînên qanûnî, fermî û pratîkî yê hatî kirin, komên etnîk yê di nav sînorê K.T.yê de, bi giştî li ber çerxa asîmîlasyonê ketibûn û bi giştî heliyabûn. Tenê Kurd mabûn ku hê jî bi hişkiyeke liberxwedêr bi zimanê xwe diaxivîn û doza mafên xwe dikirin. Loma jî, her wekî Çağlayan jî amaje pê dike, pêkanînên herî tund di vî serdemê de li Kurdan qewimîn.

Di makezagona ku di sala 1982yan de hat amadekirin û qebûlkirin, wiha dinivîse: “a) Çênabe ku bi zimanekî ku qanûnê ew qedexe kiriye, weşan werin kirin. (xal 26/bendên 3 û 4)- b) Ji bilî Tirkî çênabe ku zimanekî din wekî zimanê dayikê li saziyên perwerdehî û hîndariyê hînî hevvelatîyên Tirk were kirin û bi wan ders werin dayîn (xal 42/9)” (Armağan, 2014: 67- 89).

Em ji van xalbendên qanûnan fam dikin ku qedexekirineke zelal û hişk heye li ser zimanên ji bilî zimanê Tirkî. Dîsa bêyî ku zimanê Kurdî an jî zimanekî dîtir were bilêvkirin û binavkirin, bi gotina ‘zimanên ji bilî Tirkî’ hemû zimanên dîtir tên qedexekirin. Lê belê, wek berê jî me diyar kiribû ku ji bo hindikahiyên dînî yê di Lozanê de hatine qebûlkirin, ev yek ne li dar û ne têbor bû û dîsa bi zimanên wekî Fransî, Elmanî û Îngilîzî dibistan hebûn û digel zimanê Tirkî perwerdehî dihat kirin. Nexwe em dikarin ji van her du xalbendan vî encamê derînin ku; zimanên qedexekirî zimanê komên etnîkî yê di nav sînorê K.T.yê de bûne ku “Aşkera ye ku qanûna bi hejmara 2932yan ku di sala 1983yan de ket(îye) meriyetê, ji bo qedexekirina zimanê Kurdî (bû)ye” (Kubilay, 2004: 72-73).

Ji xalabendên makezagona sala 1982yan em têdigihîjin ku komeke din yê etnîk heye ku; di sîstem, polîtîka û pêkanînen asîmîlasyonê yên bi armanca Tirkkirinê hatine kirin de, hê nebûye Tirk. Koma etnîk û neteweya ketî behsê, Kurd in. “Kurd li karaktera asîmîlasyonîst ya bo zanava neteweyî ya ku wekî Tirk tê nîşankirin, razî nebûne” (Yeğen, 2009: 12). Ji ber ku di qanûnên heta wê çaxê hatine danîn de navê Kurdan nehatiye dayîn û bilêvkirin û bi awayekî ‘nexuyayî’ hatine hiştin, di heman demê de sîstema rêvebirina K.T.yê ya ji her aliyê ve, “Wekî îdeolojîk Kurd nekirine dîkeyên Tirkan” (Zeraq, 2014: 39).

Ev rewş, digel armancên siyasî û îdeolojîk, aliyekî kêmmayî dide hîskirin; avakirina cime’eta xeyalî hê neçûye serî, yanî xew bi dawî bûye lê xewn hê temam nebûye. Loma jî, divê ev demajo bi ‘dîkeye’ dîtir were temamkirin û ‘netewebûna Tirkan ya temamnnebûyî’ bigihîje dawî û axiriya xwe. Ji bo vê temambûnê jî awayekî bilêvkirin û binavkirinê yê taybet pêwîst e; ew awa jî bilêvkirin û binavkirina koma etnîk e ku nebûye Tirkê şareza û medenî; yanî “Bi bilêvkirineke riswayî ‘Tirkên çiyayî’ne û navê cografyaya wan jî ‘Rojhilata Anatolyayê’ ye” (Akin, 2007: 32). Piştî vê bilêvkirinê êdî ‘nûnertiya Kurdan’ di ser peyva “Tirkên çiyayî, Tirkên Zozanî” (Günel Tekin, 2009: 267) re ye. Yanî, Kurd û zimanê Kurdî êdî xwedî du awayên neyîniyê ne; hem xelkên binavkirî beşek ji Tirkan in hem jî neteweyeke bi navê Kurd tune ye. Vê pêkanîna homojenkirinê ya ku li ser komên etnîk yên ku di nav sînorên K.T.yê de dijîn, hatiye sepandin; bi taybetî bûye sedem ku zimanê Kurdî, di ‘qada fermî’ û hem jî ‘di qada giştî’ de bi tu awayî neyê temsîlkirin û wekî ‘şûngeheke parastinê’ di mal de asê bimîne.

Ji avabûna K.T.yê û şûn de, tevî ku di nav sînorên dewletê de zimanên ji bilî zimanê Tirkî hebûne jî, polîtîkayeke ‘yekzimanî’ hatiye pêkanîn. Rêveberî û rejîma ku xwestiye tenê neteweyeke homojen ya bi navê Tirk hebe di nav sînorê K.T.yê de, zimanê Tirkî wekî nîşaneyê hîmî û sereka ya Tirkbûnê daniye; û bi vê jî nemaye, zimanên dîtir li hemberî Tirkî wekî ‘talûke’ qebûl kiriye. Vê yekê kiriye ku ku polîtîka û rê û rêbazên asîmîlasyonîst bi hemû awayên xwe bên pêkanîn. Loma jî wekî encama vê pêkanînê, pêşî lê hatiye girtin ku; zimanên ji bilî Tirkî û bi taybetî zimanê Kurdî, nekeve ‘qada giştî.’ Di vê rewşê de xuya ye ku neketin û aktîfnebûna Kurdî ya ‘di qada giştî’ de û fermînebûn û meşrûnebûna wê ya di prensîbên gerdûnî ya wekhevîtiyê de, kiriye ku

hin encamên pêkanînên mêtîngeriye li Kurdî û li mirovên Kurd ku ji koma etnîk yên bindest in, biqewime.

Piştî derbeya 12ê Îlona 1980yê, qedexekirina ziman û çanda Kurdî ku yek ji pêkanînên mêtîngeriya navsînorî ya rengmodern e, kir ku civaka K.T.yê ber bi civaka yekreng ve biçê. Lê belê di vê yekrengiyê de, civaka Kurd; ji avabûna K.T.yê û bi wir de wekî civakeke pêgirêdayî rêveberiya K.T.yê bû û asîmîle nebûbû, -an jî li hemberî asîmîlasyonê li ber xwe dabû.- Û ‘dîkeyên’ ku beriya avabûna K.T.yê ciyê wan belî bû di komarê de³⁸ têrî sazûna neteweya Tirk nedikir û diviya Kurd jî bi awayekî ji awayan bihatana ‘dîkekîrin.’ Loma jî, pêkanînên piştî 12ê Îlona 1980yê, bi temamî li ser encamgirtina asîmîlasyona Kurdan û li ser armanca ‘dîkekîrineke taybet’ hatibû danîn. Ji bo vê armancê jî, hiştina derveyî qada giştî wekî rêbaza hîmî û sereke hatibû pêkanîn. Loma jî, digel rêbazên qedexekirin, asîmîlekîrin û Tirk(î)kirinê, civaka Kurd ya di nav sînorê K.T.yê de bû “...civaka cewêlek-dijber” (Fraser, 2005: 116-119)

Helbet, têgiha ‘cewêlek-dijber’ ku Fraser destnîşan dike, her yek ji aliyekî ve bo civaka Kurdî dide der. Herçî dijberî ye, çand û zimanê Kurdî û hebûna wan ya wekî civak, “...ji alî awir û dîtinên rêveberiya K.T.yê û îdeolojiya wê ve wekî ‘talûke’ hatiye qebûlkirin” (Kubilay, 2004: 66). Loma jî, ‘dijberî’ya Kurdan ya li pêş çavê rejîm û rêveberên K.T.yê, wekî teoriya neynikê ya Lacan e ku; K.T.yê, bi taybetî piştî sala 1980yê, ji bo ku karibe zanaveke bi navê Tirk ava bike, pêwîstî bi ‘dîkeye ne-dîke’ dîtiye û ew ‘dîkeya ne-dîke’ Kurd in ku di çav dewletê de ‘dijber’ in. Dijberiya wan jî îmajê ‘tiştêya’ di neynikê de ye ku hebûna kirdeya derveyî neynikê dinimîne û diyar dike. Herçî ‘cewêlekî’ ye, bi pêkanîna qedexekirinê û lîdervehiştina ji ‘qada giştî’ û tevlênêkirina ‘zemîna meşrû’ ya qanûnî pêk hatiye ku “...yek ji armanca Teza Dîroka Tirk ya bêparhiştina ‘bin-zanavan’ ya ji zemîna meşrû bû” (Sadoğlu, 2003: 280). Her wekî me destnîşan kiribû ku; zimanê Kurdî ji avabûna K.T.yê û heta sala 1991ê, wekî zimanekî ku ‘tune’ hatiye hesibandin û di qanûnan de nehatiye bilêvkirin. Vê yekê kiriye ku zimanê Kurdî, ji ‘qada giştî’ û ji ‘meşrûbûn qanûnî’ bêpar bimîne; ji bilî şûngeha xwe ya dorteng, yanî ji bilî malê, di tu qadên fermî de neyê bikaranîn û li hemberî zimanê Tirkî ku bi qanûnî meşrû ye û li hemû derên qada giştî pê tî axaftin,

³⁸ *Dîkeyên navborî; ew civak in ku bi Peymana Lozanê wekî ‘civakên nemisilmana’ hatine diyarkirin ku bi taybetî ji Rûm, Ermen û Cihûyan pêk tê.*

bibe zimanekî bin-ziman (sub-language); yanî li pêşberî zimanê Tirkî bibe zimanê cewêlek.

Bi taybetî, salên piştî 1980yê, li K.T.yê, di warê polîtîkayên asîmîlasyonê de, amaje bi qonaxeke gelek girîng dike. Di vê qonaxê de, têkiliya nîfşa duyem ya Kurdan ku li bajaran jî bi Kurdî diaxivin ya bi nîfşa sêyem re qelstir bûye.³⁹ Ev qelsî bûye sedem ku di warê çalakkirina Kurdî ya ji derveyî malê jî were asta tunebûnê. Hem polîtîkaya berbelavkirina saziyên perwerdehiyê ya K.T.yê û hem jî hiştîrkirina pêkanînen qedexekirina Kurdî, kiriye ku zimanê Kurdî, ji hemû çalakiya xwe ya jiyana rojane û ‘qada giştî’ bêpar bimîne; êdî bi temamî bibe zimanê ku tenê li malê pê tê axaftin. Vê yekê jî wekî encam kiriye ku zimanê Kurdî li pêşberî zimanê Tirkî bibe bin-ziman (sub-language), an jî bibe ‘zimanê cewêlekkirî.’

³⁹ *Me divê em diyar bikin ku di nav sînorê K.T.yê de, bo aktîfbûn û pêaxivîna Kurdî; 1) nîfşa yekem kême zêde di navbera salên 1900-1950yê de ye ku li bajaran bi giştî bi Kurdî diaxive û ‘yekzimanî’ ye, 2) nîfşa duyem di navbera salên 1950-1990î de ye ku li bajaran nîve nîv bi Kurdî diaxivin ku ‘duzimanî’ ne, 3) nîfşa sêyem di navbera 1975-2000î de ye ku li bajaran bi piranî bi Tirkî diaxivin ku ‘duzimanî’ ne û 4) nîfşa çarem jî, piştî salên 2000î de ye ku li bajaran bi giştî bi Tirkî diaxivin û berpêyî ‘yekzimanîyê’ ve diçin.*

BEŞA ÇAREM

KOVARÊN REWŞEN, JIYANA REWŞEN, REWŞEN-NAME

4.1 Rewşen

Piştî ku di sala 1991ê de, K.T.yê wekî qanûneke sererastkirî, “qanûna bi hejmara 2932yan, ya ku ji bilî zimanê Tirkî axaftina bi zimanên dîtir qedexe dikir” (Kubilay, 2004: 56), ji meriyetê radike, mijarên wekî mafên zanav û nasnameya çandî û zimanî û xebat û çalakiyên di vî warê de bêtir dikeve rojeva Kurdan û cî û girîngiya xwe dide. Wekî encama vê yekê, di sala 1991ê de, li Stenbolê, saziyeke çandî ya bi navê xwe yî Tirkî Mezopotamya Kültür Merkezî (NÇM: Navenda Çanda Mezopotamyayê) tê damezirandin. Vê saziyê, digel xebat û çalakiyên sînema, şano, muzîk, govend (dansên gelêrî) girîngiyeke taybet dide çand û zimanê Kurdî û wekî nîşaneya vê girîngîpêdanê; di bin banê NÇMyê û di Sibata sala 1992yan de yekem hejmara kovara Rewşenê diweşe.⁴⁰

Di hejmara yekem ya kovara Rewşenê de, wekî xwedyê kovarê İbrahim Gürbüz tê daxuyandin. Her wiha, digel serkara karên nivîsan û berpirsê karên weşanê, sazûmana (redaksiyona) nivîsî jî heye ku ji navên wekî, Hasan Bildirici, Feqî Huseyn Sağnıç, Ali Temel, Abdurrahman Dürre, Hüseyin Kaytan, Mehmet Gemsiz û İbrahim Genç pêk tê. Wekî periyoda weşana kovarê, tê daxuyandin û gotin, “REWŞEN, Kovara Çandê, Mehê carekê tê weşandin.” (Rewşen, 1992: 2) Çendî ku di hejmara yekem de periyoda weşanê ya kovarê wekî mehane tê diyarkirin jî, hejmarên kovarê gelek caran dereng derdixin û kovar, piştî hejmara 13emîn, êdî du hejmaran bi hev re der diçe. Di nivîsa sergotariyê ya hejmara 14-15an de tê gotin, “Me vê mehê du hejmar bi hev re derxist. Ji ber sedemên aborî, ta çend mehên din jî, dê Rewşen du hejmar bi hev re bê weşandin” (Rewşen, 1994: 4, hej, 14-15). Digel vê yekê jî, ji bilî sedemên aboriyê, her wekî ku di nivîsara sergotariyê ya hejmara 20-21ê de tê daxuyandin û tê gotin, “Hejmarên me yên 18-19’an hatin berhevkirin” (Rewşen, 1995: 2, hej, 20-21) ji ber ku serdestiya rêveber ya K.T.yê astengiyan bo kovarê çêdikin û kovarê berhev dikin, loma jî kovar nagihîje ber destê

⁴⁰ *Di wê salê de, Rojnameya Welat û kovara Nûbihar jî, wekî weşanên xwerû bi Kurdî dest bi weşanê dikin.*

xwendevanan. Ji ber vê yekê kovara Rewşenê, carinan wekî du mehane û carinan jî wekî du hejmaran digel hev û dereng derdiçe. Kovara Rewşenê ku hejmara wê ya yekem di meha Sibatê ya sala 1992yan de diweşe û bi temamî 23 hejmarên ne sererast û ne lidûhev û ne birêkûpêk derdiçe, piştî ku di Ocaq (Çileyayê) 1996an de bi hejmarên 22-23yan ya digel hev derdiçe, bêyî ku di kovarê de sedema wê bê diyarkirin û were daxuyandin, kovara Rewşenê piştî hejmara 22-23yan dawî li weşana xwe tîne.

Statîstîka perîyoda weşanê ya kovara Rewşenê

<u>Hej</u>	<u>Meh</u>	<u>Sal</u>
1	Sibat	1992
2	Adar	1992
3	Nîsan-Gulan	1992
4	Hezîran	1992
5	Tîrmeh	1992
6	Tebax	1992
7	Îlon-Cotmeh	1992
8	Mijdar-Berfanbar	1992
9	Kanûna paşîn-Sibat	1993
10	Adar-Nîsan	1993
11	Îlon	1993
12	Sibat	1994
13	Adar	1994
14-15	Avrêl-Gulan	1994
16-17	Pûşper-Tîrmeh	1994
18-19	Berfanbar	1994
20-21	Ağustos	1995
22-23	Ocaq	1996 ⁴¹

Di nivîsa sergotariyê ya kovara Rewşenê de ku bi du zimanan (Kurdî û Tirkî) ye û bi sernava Kurmancî ya Çima Rewşen hatiye nivîsîn, wekî sedema weşandina kovarê, pêşî tê gotin, “Çanda me Kurdan, çanda berxwedaniyê ye” û bal tê birin ser berxwedana

⁴¹ Me dest neda navê mehan, wekî çawa li ser rûpelên Kovara Rewşenê hatiye nivîsîn, me jî wek wisa nivîsî.

ku li pêşberî pêkanînên qedexekirinê hatiye dayîn û bi gotina “Hê jî çanda me ber bi kemilandinê ve rê dikudîne” (Rewşen, 1992: 4, hej, 1) tê destnîşankirin ku ji ber tûşîbûn û dûçarmayîna qedexekirinê, bi qasî ku karibe hewcetî û pêwîstiya dabîn bike û ji roja xwe re bibe bersiv, nekemiliye. Bi domana nivîsê re, wekî armanca Rewşenê wiha tê gotin, “Armanca me ya yekemîn ev e ku em di waleya gelemperî de bibin neynika (eynika) çanda Kurdî”⁴² û bal tê birin ser wateya giştî ya Kurdî ku kovar dê bi rola awêneyî rabe ku çalakiyên ‘nîşandan’ û ‘dîtin’ê di xwe de dihevine. Di pêdeçûna daxuyandina armanca kovarê de, tê gotin, “Em girîngiya herî mezintirîn didin zimanê Kurdî” û em bi vê hevokê fam dikin ku kovara Rewşenê li xwe dike armanc ku zimanê Kurdî ji rewşa xwe ya ku piştî pêkanînên serdestiya mêtîngîrîyê ya K.T.yê li hember zimanê Tirkî ketiye derava cewêlekîyê, xelas bike, an jî qet nebe ew ê Kurdî bigihîne asta wê ya zimanê komeke etnîk an jî zimanê neteweyekê. Lê belê, hema bi dû re tê gotin, “Dibe ku di hejmarên me yê peşîn de nivîsarên bi Tirkî hebin. Lê em hinekî neçar in. Di nava demê wê kovara we bi tenê zimanê Kurdî bê weşandin” (Rewşen, 1992: 4, hej 1) û em pêşî hay jê dibin û piştî jî pê dizanin ku piştî pêkanînên 12ê Îlona 1980yê, Kurdên di nav sînorê K.T.yê de dijîn, kêma zêde gihîştine qonaxa ‘durehî’yê û loma jî dibe ku beşek ji nivîskar û xwendevanên kovarê hebin ku nikaribin bi Kurdî binivîsin û bixwînin. Digel vê jî, her çend tê diyarkirin ku dê piştî çend hejmaran kovara Rewşenê bi tenê Kurdî biweşe jî, heta hejmarên dawî (22-23) jî kovar bi du zimanî, (Kurd û Tirkî) derdixe. Wekî domandina daxuyandina armanca kovarê, tê gotin “em dixwazin eniyeke zanîst-çand û hunerê çêbikin. Netewa me ji aliyê çandî ve jî di bin zor, zehmetî û sitemê de ye. Her weha çanda me jî hatiye dagîrkirin” (Rewşen, 1992: 5, hej 1). Em bi rêya van gotinan dizanin ku kovara Rewşenê, di hîm û esasa xwe de li xwe kiriye armanc ku di biwara çand û zimanî de ‘eniyeke neteweyî’ ava bike da ku zor û stema asîmîlasyonîst ku li ser çanda Kurdî tê meşandin, biqede an jî ji hêz û pêkanîna xwe qels bikeve. Ji bo cîbicîanîna vê yekê jî behsa qadeke rabûnê ya berxwedanî ya di biwara çandî û zimanî de tê kirin û digel pêkanînên serdest(î) ya mêtîngîrîyê ku tê gotin “Çekên dijminan yê zanîn û hunerê, bêwekatî, belavî, xerakirinî (dejenere) û rizandin in” û amaje bi rol û rista kirin û çalakgeriya bireweriyane û rewşenbîriyane tê kirin û di berdewamiyê de jî bi gotina, “Rewşenbîr li pêşberî gelê xwe berpirsiyar e. Îro gelê Kurd

⁴² a) Me dest neda awayê nivîsînê û ji niha û pê de jî wekî çawa di kovarê de hatibe nivîsîn em ê wek wisa binivîsin. b) waleya: wateya

li pêşberî qirkirinan e. Divê rewşenbîrên Kurd van tiştan bînin ber çavên xwe û bi hêza xwe bi xwe van astengan ji holê rakin” (Rewşen, 1992: 5, hej 1) bar û binbariya vê rabûnê li ser milê rewşenbîran tê kirin ku wekî xwendeyên gelê xwe, dikarin bi nivîsîna xwe ve balê bikişînin ser çand û zimanê neteweya xwe ya ku di serdestiyeke mêtîngeriyane de maye bindest û çand û zimanê wê di çerxa pêkanînê asîmîlasyonê de ber bi windabûn û tunebûnê ve diçe.

4.1.1 Ranêzikiya Zimanî di Rewşenê de

Kovara Rewşenê, hê di hejmara yekem de ranêzikiya xwe ya zimanî dide der û hem bi elfabe û awayê zimanê ku di nivîsara sergotariyê de hatiye bikaranîn hem jî bi nivîsa bi navê ‘DERSÊN ZIMANÊ KURDÎ’ ku ji alî FARQÎNÎ ve hatiye amadekirin, bi me dide nîşan ku ew ê di periyod û qonaxa weşana xwe de li ser elfabe û gramera C. A. Bedirxan bimîne. Ji bo vê yekê jî, gava em bala xwe didin nivîsa FARQÎNÎ ya li ser dersên Kurmancî, em dibînin ku hem ji alî danganî hem jî ji alî tîpan ve yek bi yek jêgirtina elfabeya C. A. Bedirxan e. Digel vê yekê jî, FARQÎNÎ, di dersên zimanê Kurdî de, bi mînakdayîna “A-drêj e: al (bayrak), afîr (yemlik), agir (ateş), av (su...)” (Rewşen, 1992: 51, hej, 1) bergînda Tirkî ya peyvên Kurdî li beranberî tîpan û peyvên dinivîse. Em ji ber vî awayê amadekirina dersên zimanê Kurdî, dikarin destnîşan bikin û bêjin; 1) dema ku C. A. Bedirxan alfabe amade kiriye û ji bo danzanîna dengên tîpan peyv li beranberî wan nivîsiye, pêwîstî pê nedîtiye ku bi zimanekî dîtir (bi taybetî bi zimanê neteweyekê ku serdestî Kurdan e) rave bike û wateya wan binivîse, 2) lê belê, FARQÎNÎ pêwîstî pê dîtiye ku wateya Tirkî ya peyvên Kurdî li beranberî wan binivîse; ji ber ku di dema derçûna Rewşenê de, Kurd êdî bi tevayî ketibûn ber çerxa asîmîlasyonê û Kurdî jî êdî li bajaran ne zimanê yekem bû; û digel vê yekê jî, wê hingê tenê nexwendeyên Kurd dikaribûn xweşikî bi Kurdî biaxivin û herçî xwendeyên Kurd yê wê hingê bûn; ji ber ku ew di dibistanan de bi Tirkî hatibûn perwerdekirin û êdî zimanê wan yê fikirîna li ser zanist û agahiyê bi Tirkî bû, her çend karibûn bi Kurdî biaxivin jî, pêwîstî pê didîtin ku di ser zimanê Tirkî re dengên Kurdî û tîpên ku beranberî wan dangan tînan, nas bikin. Loma jî, rêbaza ku FARQÎNÎ di vî warî de pêk aniye, tevî ku di hînkirina zimanan de rêbazeke zanistî ye û di hînkirina zimanê dayikê de hinekî absurd û eletewş xuyanî dibe jî, rêbaza ku hatiye bikaranîn ji aliyekî din ya taybet ve rasterast berê me dide ‘durehiya bi hişberî’ ya ku “demajoya berevajîkirina neyînkirina fermî” (Bhabha, 2016: 219) dide destpêkirin û bi vê destpêkê ve jî, ev rêbaz; zimanê duyem, - yanî zimanê serdestan-, yê

ku bi lêsepandina qanûnî hatiye meşrûkirin, ji ciyê wî dişiqitîne; pê re jî jihevcihêbûna her du zimanan datîne rastê û durehiya ku bi vî awayî tê rûniştandin hem “...daxwazên narsîstîk û lasayîker yên hêza mêtînger li hejê dixê” (Bhabha, 2016: 223) û hem jî zimanê bindestan yê qedexekirî di ser zimanê serdestan re dike xwedî meşrûbûneke xwezayî û jiyanî.

Digel vê jî, kovara Rewşenê, di du hejmarên dîtir de nivîsarên bi navê, ‘Di Kurmancî de Tewandina Navan’, (hej, 3) ‘Di Kurmancî de Çewt Bikaranîn an ji Ziman Avêtina hin Daçekan’ (hej, 4), ku ji alî Felat dilgeş ve hatine amadekirin û taybetiyên gramerî yên Kurdiya Kurmancî rave û şîrove dikin û zincîrenivîsên Feqî Huseyn Sağnıç ya bi navê ‘Zman, Zman û Rastnivîs’ û pê re jî di her hejmara xwe de ferhengokeke bi du zimanî (Kurmanciya jorîn û Tirkî) belav dike û hem di biwara perwerdehiya Kurdî ya di ser peyvan re hem jî di biwara hevrûkirina du zimanan de keys û derfetê derpêşî xwendevanên xwe dike da ku karibin li zimanê xwe yî ku bi kartêka pêkanînên asîmîlasyonîst jê dûr ketine, vegerin.

Her wiha, digel ku kovar bi du zimanî weşiyaye jî, di kovara Rewşenê de hejmareke zêde ji nivîsarên Kurmancî ku hêjayî gotinê ye, weşiyane. Ji bo ku em karibin xweşikî bibînin û pê bizanin ka rengê Kurmanciya ku di kovara Rewşenê de weşiyaye, çi ye û çawa ye, em ê bala xwe bibin ser çend mînakên.

Ji nivîsa bi navê ‘DÎROKA WÊJEYA KURDÎ’

“Mirov dikare wêjeya Kurdî li du beşan pareve bike. Yek jê nivîsarî, yê din jî zargotinî ye. Mixabin ku piraniya berhem û helbestên zargotinî hunda bûne, an jî derheqa wan di dest de zêde agahdarî nîn e. Bi gelemperî mirov dikare bibêje ku wêjeya Kurdî, bi du zaravên Kurdî hatine nivîsandin” (Şefîq, 1992: 21).

Zimanê nivîsarê, ew ziman e ku li ser zimanê pêaxaftinê ya ku di kovara Rojî Kurd û Jînê de saz bûbû û di Hawarê de gihîştibû standardiya xwe ya giştî. Her wiha, ji alî bikaranîna paşdaçekên bazinedaçekan ve jî nivîsar li ser xeta Hawarê ye ku li şûna awayê bikaranîna ‘di...da’ ya Rojî Kurd û Jînê ku li ser zimanê wêjeya klasîk, pêaxaftin û folklorîk e, bazinedaçekên ‘di...de’ hatiye tercîhkirin.

Ji nivîsa bi navê ‘Ziman û Bîrdozî’

“Dagîrker, mêtîngehkar û çîna serdest, civatek bi vî awayî naxwazin. Ew divên ku civat bi çarenûsa xwe ya ku wan nivîsiye, qaîl bin. Civat guhdariya wan bike û ji gotina wan dernekeve der. Ew riya ponijandin û ramankirinê li civatê dixitimîn” (Ronahî, 1992: 39).

Di vê parçenivîsarê de, serê pêşî bala me diçe ser têgihên ku tên bikaranîn. Têgihên wekî, ‘çîn, mêtîngehkar’ wekî eger û kartêkeke nivîsarê tên bikaranîn ku ev yek jî bi me dide nîşan ku; di kovara Rewşenê de, Kurdiya Kurmancî di asta raman û felsefeyê de jî hatiye bikaranîn û têgihên ku di serdema Hawarê û Tîrêjê de nehatine bikaranîn, di kovara Rewşenê de hatine bikaranîn û di zimên de cî dane xwe.

Ji nivîsa bi navê ‘ÇARŞEM’

“Ew roja ku jêra “Roja bê bereket” dıgotın, ew çî roje û çra bê berekete? Ew roja ku jêra “Roja bê oxır” dıgotın, ew çî roje û çra bê oxire? Ew roja ku seydayên medresan jî suxtên (telebên) xwera “Roja çarşemê dest bî sey û pirtûkên nû bıkın da zû bıqedın. Jı ber bê bereketiya wê rojê, sey û pirtûk kurt dıbin û mrov zû jı wan dıfılite” dıgotın” (Sağrıç, 1994: 41).

Di vê nivîsarê de, serê pêşîn bala me diçe ser elfabeya ku ji elfabeya C. A. Bedirxan cuda û wekî elfabeya Latîni ya Tirkî hatiye bikaranîn. Lê digel wê jî, tîpên bi kumik wekî qaydeya Celadet danî hatine nivîsîn. Digel vê jî, hin peyvên ku ji Hawarê û şûn de awayê wan yên nivîskî wekî standard hatine qebûlkin, cuda hatine nivîsîn. Wekî mînak, peyva ‘çira’ wekî ‘çra’, peyva ‘mirov’ wekî ‘mrov’ hatiye nivîsîn. Em ji vê nivîsê û nivîsên din yên F. Huseyn Sağrıç tê digihîjin ku wî nivîsên xwe elfabe û rastnivîseke taybet daniye û bi wî awayî dinivîse. Loma jî, em ê nikaribin nivîsên Sağrıç wekî mînak hildin û bêjin, qebûla kovara Rewşenê li ser vê yekê heye û loma jî van nivîsan wisa diweşîne. Belkî em karibin bêjin, ev yek nîşaneyê bêhnfirehî û qebûla bo fikrên cuda ya kovara Rewşenê ye ku her wekî di hejmara kovarê ya yekem û di nivîsa sergotariyê de hatiye gotin, “Kovara me platforma gotubêj û gengîşîyan e” (Rewşen, 1992: 4, hej, 1).

Ji nivîsa bi navê ‘VEJÎNA TERALEKÎ’

“Çavên xwe ji xewê vekir. Serê wî lê giran bûbû. Bi giranî her du destên xwe bir serê xwe di nav destên xwe de guvaşt. Serê wî jan dikir,

westiyabû. Nikaribû li ser kêleka xwe vegere. Çavên wî ji delavê xwînê, ji ber şevê tirs û xof derbazdibûn, sor dibûn. Çend şev û rojan ji nav ciyê xwe derneketibû. Bi destên xwe çavên xwe paqij dikir” (Eksen, 1994: 18).

Nivîsa ku wekî çîrokeke honaksazî hatiye weşandin, bi zimanekî pêaxaftinê lê belê sererastkirî hatiye nivîsîn. Gava em bala xwe didin ser hevokan, em dibînin ku di vegotinê de hevokên kurt hatine nivîsîn û herçî awayê nivîsîn û zimên e, bi temamî li ser xeta C. A. Bedirxan e ku em dikarin bêjin, êdî ji vê hejmarê û şûnde kovara Rewşenê gihîştîye reng û awayê standard yê Kurdiya Kurmancî ku di roja îroyîn de jî Kurmancî bi heman awayî tê nivîsîn.

Li ser mînakên me dayî, em dikarin bêjin; kovara Rewşenê, xwedî helwêsteke hevengî kovara Hawarê ye ku ziman, wekî sereke nîşaneyê ‘jihevcudabûna’ neteweyan qebûl dike û bi hewldaneke taybet ku roja ku tê de ye rengê wê diyar dike, girîngî bi ziman dide û tê de dixebite ku rûpelên kovarê bike warê hebûniya zimanê Kurdî û bi rengekî aşkera, di biwara ziman de helwêsta xwe ya ‘cudabûna ji gel û çandên din’ dide der.

4.1.2 Ranêzikiya Zanava Neteweyî di Rewşenê de

Herçî helwêst û ranêzikiya zanava neteweyî ye, di kovara Rewşenê de bi çarçoveyeke giştî li ser terîtoryaya zimanî ye. Di rûpelên kovara Rewşenê de, nivîsarên bi sê zaravayên Kurdî, Kurmanciya Jorîn, Kurmanciya Jêrîn (Soranî) û bi Kirmanckî (Zazakî) cî dane xwe. Gava em bala xwe li ser vê yekê hûr digerin, em dibînin ku kovara Rewşenê ne tenê ji bo Kurdiya ku di nav sînorên K.T.yê de pê tê axaftin weşanê dike; digel wê yekê jî bi helwêst û ranêzikiyekê radibe ku amaje bi terîtoryaya giştî dike. Em vê yekê di zincîrenivîsên bi navê ‘Niştimana Xwe Binase’ de dibînin ku ji hejmara yekem heta hejmara dawî, bajar bi bajar, hemû beş û parçeyên ku Kurd lê dijîn, ax û warê Kurdan hatiye nasandin.⁴³ Loma jî em li ser vê helwêst û ranêzikiya kovarê ya zimanî û çandî û terîtoryayî dikarin bêjin; kovara Rewşenê li ser çand û zimanî xwedî taybetiyeke niştimanî ye.

⁴³ Di hejmara 13emîn ya kovara Rewşenê de, nivîsa danasîna bajaran ya bi navê ‘Niştimana Xwe Binase’ cî negirtiye.

Ev taybetî û ranêzikî di gelek nivîsarên wê de didin der ku bi hewldan û helwêsteke dij-mêtinger radibe. Di nivîsa bi navê ‘PARASTINA ZIMANÊ KURDÎ JÎ BÎREKE GIRÎNG JI PARASTINA NETEWA KURD E’ de ku ji alî Hogir Ehmed ve hatiye nivîsîn, bi hevoka destpêkê ku dibêje, “Zimanê Kûrdî, hebûna netewa Kurd, ta îro parastî ye” (Rewşen, 1991: 9, hej, 1) hema ji serî de hemû sedem, angaşt û palderên nivîsarê dide der ku hebûna neteweyekê bi temamî bi hebûna zimanê wê neteweyê ve dibestîne ku Herder jî dipirse û dibêje, “Gelo ji bo neteweyekê, tiştekî ji zimên hêjatir û giranbihatir heye ku ji bavûkalê wê maye jê re? Di nava zimên de, hemû nerît û kelepûr, dîrok, ol û rêgezên hebûniyê dijîn; ziman dil û gîyan e” (Raguhastin: Özkırımlı, 1999: 15). Destpêkeke bi vî rengî berê me dide sedema avabûnê, yanî zimanê ku bi pêkanînên mêtingerî û asîmîlasyonîst di wê qonaxê de negihîştiye bext û armanca xwe. Nivîsar bi hevoka “Bi rastî, dijminên netewa Kurd, di gelek waran de gihane pêkhanîna armanca xwe” balê dibe ser pêkanînên mêtingeriyê û qonaxa ku polîtîkayên asîmîlasyonê gihîştiye û rewşa mirovê Kurd datîne rastê ku zimanê wî di hemû aliyên ‘qada giştî’ de hatiye qedexekirin. Pê re jî, bi ranêzikiyeke navxweyî, bi gotinên, “...bi rastî em îro bi zarokên xwe re bi Kurdî deng nekin, Kurdî zimanekî resmî yê xwe nebînin...” ji awirekî berevajî de bala me dibe ser ‘meşrûbûna zimanekî qanûnî’ ku Kurdî ne ew ziman e û divê bi awayekî navxweyî di nava Kurdan de wekî zimanekî meşrû yê heq û xwezayî bê dîtin û li ser vê yekê girîngî pê were dayîn. Loma jî ev ranêzikî, di hevoka dawî de bi gotinên, “Divêt em mîna xwîna jiyanê, ya di reh û damarên xwe de, zimanê xwe di jiyana xwe de bi kar bînin û bidin pêş” helwêsteke xwebûniyê dide nîşan ku digel gotina Thiong’o ya, “Ziman di xwebûniya min de pêbestînek e” (2017: 43) digihîje rengûawayê xwe yê dij-mêtinger.

Digel vê helwêsta dij-mêtinger ku hemû awayên asîmîlasyonê û kartêka zimanekî dîtir ya li ser zimanê koma etnîk ya bindest, yanî zimanê Kurdî, red û neyîn dike û berê xwe dide rê û rêbazên ji xelasbûna kartêkên asîmîlasyonê jî, em ê bala xwe bibin ser nivîsara bi navê ‘BO ŞÊRÎN Î XWEŞKIRINA ZIMANÊ KURDÎ’ ku ji alî Xelîl BIRÎNÎ ve hatiye nivîsîn. Nivîs balê dibe ser çend tîpên elfabeyê û bi palderiya ku Kurdî zimanekî ji malbata Hîndî-Ewropî ye û di zimanên Hindî-Ewropî de tîpa ‘î’ ya bi kumik nîn e û digel çend pêşniyazên xwe, bi gotina “Pêşnêrîna min ev e: 1) Tîpa (i), (î) bila mîna elfabe Tirkî be” (Rewşen, 1991: 32, hej, 2) pêşniyaza ‘wekTirkîkirin’a tîpên ‘i û î’ yê dike. Ranêzikiyeke bi vî rengî, bi giştî helwêsta dij-mêtinger û dij-

asîmîlasyonîst ya Hawarê û bi taybetî ya C. A. Bedirxan pûç dike. Digel wê jî, gava em bala xwe didinê, em dibînin ku ji nivîsarên hemû hejmarên kovara Rewşenê xuya ye ku Rewşenê bi awayekî giştî elfabe û gramera ku Celadet daniye, li xwe kiriye rêber. Di heman demê de, pêşniyazeke bi vî rengî, yek ji armanca sereke ya pêkanînên asîmîlasyonîst ya ‘wekxwekirin’ê ku Löffler destnîşan dike, qebûl dike û gotina Lacan ya ‘tiştê ya xwaza kirdeyê’ (2013; 96) tîne bîra me. Digel vê jî, nivîsara bi navê “DIVÊ EM XWE JI ALFABETÎZEBÛNA TIRKÎ XELAS BIKIN” ku ji alî S. RÊVÎNG ve hatiye nivîsîn, piştî ku ji gelek aliyan ve behsa taybetiyên zimanê Kurdî (û bi taybetî Kurmanciya jorîn) dike, bi gotina “Lewra sedem çî bin bila bibin, di warên alfabe ya rastnivîsandinê de, cudayî û problem derketine pêşîya me” (Rewşen, 1992: 6, hej, 6) arîşeyên heyî qebûl dike, li ser gelemşeyên heyî disekine û di pêdeçûna nivîsara xwe de li dijî pêşniyaza bikaranîna tîpên ‘î û î’ yê ya wekî ‘ı û i’ ya Tirkî radibe û dibêje,

“...kesên ku bi tenê tîpên î-i yên Celadet Bedirxanî diguherin û bi awayên î-i dinivîsînin jî, ji vî karê xwe re, bi ya min sedemeke yekcar bêbingeh didin pêş: “*Hêsantir e*” Çima? “*Çunkî nêzî alfabeya Tirkî ye û piraniya Kurdan li Kurdistana Tirkîyê dijîn*” (Rewşen, 1992: 9, hej, 6).

Nivîsar, palder û angaştê ku wekî ‘*hêsantir e*’ tê kirin, bi awayekî ne rast û durist û ne di cî de qebûl dike ku bi gotina ‘sedemeke yekcar bêbingeh didin pêş’ nanakirina xwe qayîm dike û di dawîya nivîsara xwe de, bi gotina “Alfabeya Bedirxanî hem ji aliyê dengên Kurdî, hem ji aliyê şiklên tîpan ve ji bo nivîsandinê bersiva xusûsiyetên zimanê me dide. Pêwîstiya guhertina wê alfabeyê niha tune ye” (Rewşen, 1992: 10, hej, 6) li ser helwêsta ‘dij-mêtingerî, dij-asîmîlasyonîst û dij-wekxwekirin’ê ya Hawarê dimîne û piştgirî bi rêbaza dij-mêtingeriyê dike ku di heman demê de, govaniya serdestiyê ya ku Fanon diyar kiriye jî, “Çanda ku di statuya mêtingehiyê de hatiye westarkirin, (...) li dijî mirovên xwe govaniyê dike” (1967: 44) bi wê de dike û pê re jî, di ser zimên re zanava neteweyî destnîşan dike ku ji alî C. A. Bedirxan ve bi rêya ziman û bi danîna elfabeyê cuda hîma wê hatiye danîn; û bi helwêsteke ku ‘jihevcihêtiya zanavan’ diparêze û digel destnîşankirina “Zanav, derbar hebûniya me ya polîtîk ya xwedî dorhêleke berfireh de ye; hevîyekî û jihevcihêti, jêbûnî û xweserî, ewlehî û azadî, pişkî û gerdûnî tê de cî bi cî dibin” (Mollaer, 2018: 31) bi ‘jihevcihêkirina’ elfabeya zimanê xwe ya ji elfabeya zimanê serdestê xwe, helwêsta xwe ya ‘dij-mêtinger û dij-serdestî’ datîne rastê; û di

heman demê de, bi pûçkirin û qebûlnekirina gotina ‘*hêsantir e*’ jî, ‘durehî’ ya negatîf ku bi awayekî bêhişberî di giyanê mirovê marastî de pêk tê jî, ji helwêsta xwe dûr dike.

4.1.3 Ranêzikî û Hewldana Fêrgehbûnê di Rewşenê de

Di nivîsa sergotariyê ya kovara Rewşenê de, bi taybetî bal tê kişandin û tê gotin, “Zanîn îro hin bêhtir ji bo me Kurdan pêwîst e” (Rewşen, 1992: 5, hej, 1). Ev balpêdan, rasterast fikrên wekî, em ji zanînê bêpar mane, an jî me nekariye zanîn bi kêrî xwe binin û fikrên wekî wê tîne bîra mirov ku; gava em ji berevajiyê ve difikirin em ê hay jê dibin ku armanca vê gotinê peyamek e ku dixwaze bêje, kovara Rewşenê ji bo peydekirin û belavkirina vê zanînê li ber destê we ye. Ev zanîn, dê ne yekalî be û di ser rêbaza perwerdehiya giştî re bê belavkirin.

Pergala perwerdehiya K.T.yê ya ku li ser ‘yekzimanî’ ye û tenê encama asîmîlasyonê dide û bêtî daxwaz û tercîha wan, mirovan ‘durehî’ û li xwe neban dike, di 24ê Îlona 1925an de bi Plana Îslehkirina Şerqê hat danîn ku “...di meclîsê de hat qebûlkirin û çî kesê ku ji bilî Tirkî bi zimanekî din xeber dida, bi ceza dikir” (Akçura, 2009: 56) û bi vî awayî bêtî ku navê Kurdî were hildan, Kurdî hat nexuyakirin û bi awayekî fîlî hat qedexa û qedexekirin. Vê qanûnê, tenê zimanê Tirkî kir zimanê qanûnî û zimanê komên etnîk yên bindest jî qedexa kir; û wekî encama vê pêkanînê, ‘yekzimanî’yek saz kir. Vê pergala yekzimanî, ‘yekagahî’yê jî bi xwe re anî û her mirovê ku di nav sînore K.T.yê de li jiyanê xweş bû, tenê dikaribû bi rêya zimanê Tirkî bibe xwedî zanîn û agahî. Loma jî, Kurdên ku piştî girêdana peymana Lozanê di nav sînore K.T.yê de mabûn, ketibûn ber bayê vê çerxa asîmîlasyonîst û -her çend, piştî sala 1970yê pey der pey bi hejmareke hindik be jî pirtûkên bi Kurdî weşiyabûn û kovara Tîrêjê jî di sala 1979an de derçûbû jî-, qedexekirina heyî tu carî ji şidiyayîbûna xwe neketibû û du nîşên ku heta sala 1980yê kêmkirî li bajaran bi Kurdî diaxivîn û li ber pêkanînê asîmîlasyonîst li ber xwe dabûn, zêde keys û derfet nedîtibûn ku zanîn û agahiya ku di ser Tirkî re peyde dibû biqulîbînin ser Kurdî û wê agahiyê di zimanê xwe de belav bikin.

Demajoya perwerdehiya ku bi vê pêkanînê û sepandinê dest pê dike, pey der pey berê xwe dide qonaxa avabûna zanaveke çandî ya li ser nîrx û zimanê mêtînger ku bi xwendin û şuştina hiş û mêjiyê mirovê mêtîngehiyê û bi pûçkirina çanda wî ya xwecihî dest pê dike. Navê vê demajoyê asîmîlasyon e ku takekesê di fêrgehên pergala dewletê de bi perwerdehiyê yekzimanî zimanê serdest û mêtîngeran hîn dibe, “xwe bi tiştên

ku hîn dibe re dike yek” (Zehar, 1999: 27). Ev xweyekkirin, di heman demê de, di asta zanîn û agahiyê de ye jî. Loma jî, kovara Rewşenê bi vê hayjêbûnê di sergotariyê de dibêje, “Em dixwazin eniyeke zanîst-çand û hunerê çêbikin” (Rewşen, 1992: 5, hej 1) û ji bo zimanê vê eniyê jî, zimanê Kurdî tê hilbijartin û danîn. Ev awa hilbijartin û arastekirin, ji destpêka xwe ve helwêsteke dij-mêtinger û dij-asîmîlasyonîst e; yanî di asteke ramanî de amade ye ku *decolonizasyonê* pêk bîne. Ev ranêzikî, wekî bivênevêtiyekê, barê vê eniyê li ser milê rewşenbîran dike û dibêje, “Rewşenbîr li pêşberî gelê xwe berpirsiyar e. (...) Divê rewşenbîr van tiştan bînin ber çavên xwe û bi hêza xwe ve van astengan ji holê rakin.” (Rewşen, 1992: 5, hej, 1) Û xuya ye ku ‘rewşenbîr’, ji ber ku dikarin di nav zimanan de pêwendiyên daynin, zanîn û agahiyan ji zimanekî derbasî zimanekî dîtir bikin û bi vî awayî jî bi rola ‘çalakger û aktîvîstên fêrgehî’ rabin û di biwara zanîn, agahî û hunerê de nûnertiya gelê xwe bikin, wekî xwendeyên neteweyekê, di naveroka vê ranêzikiyê de, bi taybetî hatine hilbijartin.

Di hewldan û ranêzikiya kovara Rewşenê de, daxwaza lêvegerandina tiştê ku bi qasî heştê salan ji dest çûye û Kurd pê kar nekirine, heye. Ev daxwaz di heman demê de daxwaza ‘vegerîna li zimanê xwe’ ye jî. Loma jî, kovara Rewşenê hay jê heye ku; tiştê li Kurdan û zimanê Kurdî hatî qewimandin, ne ji ber ‘şemirandina’ wan e ku Chinua Achebe dibêje, “Gelo çi qas rast e ku mirovekî rabe ji bo zimanê mirovekî dîtir zimanê xwe bişemirîne” (Raguhastin; Thiong’o, 2017: 31). Lê belê, tiştê li Kurdan hatî qewimandin, ‘lêsepandina şemirandina zimanê xwe’ ye. Ev yek jî bi rêbazên mêtingerî yê ‘yekzimanî’ û ‘yekagahî’ yê hatiye pêkanîn. Ji ber hindê ye ku kovara Rewşenê, bi hewldan û ranêzikiyeke fêrgehî radibe û nivîsên ku di nav rûpelên kovarê de belav bûne her yek ji hêlekê û ji dîsîplînekê ve bal û hêza xwe dide ku tiştê lê hatî qewimandin pûç û bêbandor bike û dibêje, “...eger em bi aborî, ramiyarî û çandî (...) bisekinin, pêwîst e em zimanê xwe jî biparêzin” (Rewşen, 1992: 10, hej, 1) û parastina zimên li xwe dike armanca pêşî û sereke û bi nivîsareke wergerê, agahiya zanistî ya li ser kok û bingeha zimanê Kurdî “Cara yekê, destnivîsa Avista ji aliyê Fransizekî ve ku navê wî Anquetil Duperron e, ji Hindistanê, di sala 1762 de hate Ewrûpa û wergerandina wê di sala 1771 de hate belav kirin” (Rewşen, 1992: 23, hej, 3) belav dike û dîsa bi nivîsareke wergerê ya bi navê, ‘Wêje bi Farisiya Navîn’ ku dibêje, “Li gor girêkiyan, gelek deq ji **Avista** hatine girtin. Ev deqin wergerîna Farisiya Navîn, paşê bi ser ve zêde bûn û bûn pirtûk” (Rewşen, 1992: 37, hej, 8) agahiyeke zanistî radigihîne ku zimanê Avestayê pêşî li

Farisiya kevn hatiye wergerandin. Digel vê jî, ji alî dîrok û dîroka çandê ve jî berê xwe dide zanist û agahiya ku bi qedexekirinê ji Kurdan hatiye veşartin ku di nivasara bi navê ROJJIMÊR (SALNAME) de tê belavkirin û tê gotin “Ji Kasîtan heta Medan, hezar û sed û çil û heft (1147) sal derbas bûye. Ji Medan vir de jî, **rojijimêr** bi gelemperî dom dike” (Rewşen, 1993: 8, hej, 9) û bal pê dayîn ku ji dema Medan ve ku bavûkalên Kurdan in, salname û ‘rojijimêr’ heye. Pê re jî bi agahiya, “Kurd ji berê de, bircan nas dikin. (...) Rojijimêra Kurdî ya berê (b.z.) heyvî, lê rojijimêra îro ya rojê ye” tê diyarkirin ku rojijimêra taybet ya Kurdan hebûye ku wan ew salname li ser jimêra heyvê daniye û bi kar aniye.

Di nivîsa bi navê “Konevaniya Bişaftinê ya li ser Kurdan” de jî li ser zanîna ku hatiye veşartin, agahî tê dayîn ka Kurdî kengê û bi çi awayî hatiye qedexekirin û serdestiya K.T.yê, bi pêkanînên her cure mêtîngeriyê, -aborî, siyasî, çandî û zimanî- Kurd dane ber çerxa asîmîlasyonê (Rewşen, 1994: 17, hej, 16-17). Digel hejmarek nivîsên bi vî rengî, zincîrenivîsa ku bi navê ‘Niştimanê Xwe Binase’, -ji bilî hejmara 13emîn- di hemû hejmaran de belav dibe, wekî beşa cografya û etnografyaya fêrgehekê zanîn û agahiya li ser ax û niştimana Kurdan radigihîne Kurdan. Bi nivîsarên li ser çandê ku bi giştî li ser zanîn û agahiya folklorê Kurdan disekine û hê di hejmara yekem de bi nivîsa ‘FOLKLOR’, bi gotina, “...dagîrker û mêtîngeran, ku nîrxên gel yê folklorîkî ji mirovê Kurd û axa ku ew li ser hatine afirandin dîrdixin, bînasname dikin û bikartînin...” (Rewşen, 1992: 46, hej, 1) tê ragihandin ku pêkanîn û polîtîkayên asîmîlasyonîst di heman demê de mirovê bindest yê marastî ji çand û nîrxên wî yê folklorî jî dûr dixê û wekî encama vê yekê ku Edward Said jî dibêje, “Sedema esasî ya jihevparvebûna komên etnîk ew e ku; çand kan û jêderkeke zana ve ye” (1998: 14) Kurd ji zanava xwe ya etnîk û neteweyî dûr dikevin. Digel nivîsara navborî, hejmarek nivîsarên din jî tê weşandin di kovara Rewşenê de ku balê dibe ser pêkanînên li ser biwara folklore hatiye meşandin.

Herçî biwara zimên e, ji hejmara yekem û şûn de, hem bi weşana sê zaravayîbûna xwe ve hem bi nivîsarên ku li ser dersdayîn û hînkirina gramera Kurdiya Kurmancî bela dibe û hem jî bi beşa ferhenga Kurdî-Tirkî ku hînkirina Kurdiya Kurmancî li xwe dike armanc, kovara Rewşenê bi roleke wekî fêrgeha zimên radibe. Digel ranêzikiyên di biwara zimên de, kovara Rewşenê di biwara wêjeyê de jî rûpelên

xwe wekî şûngeheke fêrgehî saz kiriye û bala xwendevanên xwe biriye ser dîrok û do û îroyîna wêjeya Kurdî û nivîsarên di biwara wêjeyê de weşandine.

4.1.4 Ranêzikiya Wêjeyî di Rewşenê de

Her çend di sergotariya hejmara yekem ya Kovara Rewşenê de behs jê nayê kirin ka kovar di biwara wêjeyê de xebat û çalakiyeke çawa datîne pêş xwe jî, di hejmara duyemîn de em rastî hejmarek nivîsaran tên ku li ser dîroka wêjeya Kurdî û li ser şaîr û wêjekarên Kurdiya Kurmancî sekinîne. Nivîsara bi navê ‘Şairên Kurd û Cûrên Helbestan’, bi gotina “Di her demê de, ji Kurdan pir şaîr (hazan-biwêj) rabûne...” (Rewşen, 1992: 14, hej, 2) çespendineke pêşekî dike û pê re jî bi destnîşankirinekê li ser naverok û awayê helbestên klasîk, bi gotinên,

“Eliyê Herîrî, gelek helbestên dilsoj û hêja nivîsiye. Feqiyê Teyran jî, Qewlê Hespên Reş û Destana Şêxê Senaniyan nivîsîne. Mele Ehmedê Batê (1414-1495) mawluda kurmancî nivîsiye. Mele Ehmedê Cizîrî jî, dîwana xwe ya şahane ji wêjeya gelê Kurd re pêşkêş kiriye... Gava ku hezretî Xanî (Ehmedê Xanî 1651-1707) dest bi wêjeya netewî dike...” (Rewşen, 1992: 15, hej, 2).

Nivîsar, di naveroka xwe de bi giştî destnîşankirinekê dike li ser dîroka wêjeya Kurdiya Kurmancî. Nivîsê ne tenê destnîşankirinê dike, di heman demê de, wekî nivîsa destpêkî ya kovarê ya di vê mijarê de, bi hewldaneke fêrgehî û hînîkirinê radibe ku peyta M. Hroch ya ku dibêje, “...neteweyên biçûk, di zimanê xwe yî wêjeyî de jî ne xwedî kelepûrekê ne ku karibin seraqetiyê di berhênanên çandî de pêk bînin” (2011: 30) jî bi vê nivîsarê û bi nivîsare bi navê ‘Dîroka Wêjeya Kurdî’ (Rewşen, 1992: 21, hej, 3) re, di çarçoveya neteweya Kurd de pûç dibe û nivîsar, bi vî awayê xwe ve hebûna wêjeyeke klasîk digihîjîne şûngeha zanava neteweyî ku kakileke stewandî ye. Di heman hejmarê de, nivîsa bi navê ‘CIGERXWÎN’, bi giştî ser şaîriya Cegerxwîn disekine û bi gotina,

“Cîgerxwîn di ware toreyê de deryayeke zanistê bû, zimanê Kurdmancî li ser lêvên wî dihat senakirin li gel pêûsê wilo baxek li deştê bi her û şorên renga reng avdikir û derî ji gel re vedikir ku her kes here bîna xwe pê veke.” (Rewşen, 1992: 21, hej, 2)

bi temamî hewlê dide da ku bide nîşan ‘kelepûra wêjeya Kurdî stewiyayî ye.’ Cegerxwîn ew şa’ir bû ku dengê peyvê yê ji bo arûz û ahenga ş’ira klasîk di helbesta

xwe de şikandibû û dengê ş'ir û helbestê û ahenga hêma û wateyê bi hev gihandibû. Hewldaneke bi vî rengî ku di ser Cegerxwîn re tê dayîn, bi gotina 'deryayeke zanistê bû' bale dibe ser agahiya di naveroka helbesta modern de heyî û bi gotina, 'zimanê Kurdmancî li ser lêvên wî dihat senakirin' jî hebûnê û zanava zimanê ku di wêjeya neteweyekê de xuyanî dike. Digel vê yekê jî, hevpeyvînek digel Osman Sebrî tê kirin ku wê hingê O. Sebrî hê li jiyana xweş e û wekî ku Jann Assman radiguhêzîne me û dibêje, "Nivîskarekî Misrî dibêje, 'Neteweyekê bes dikare bi jiyandina borîroja xwe bijî'" (2018: 142) kelepûr û borîroja wêjeya Kurdî bi hebûna nivîskarekî ku ji borîrojê tê, car din tê jiyandin. Dîsa çîroka bi navê 'APÊ HISO' (Rewşen, 1992: 26, hej, 3) çîroka yekem ya honaksaziya modern e ku di kovara Rewşenê de tê weşandin û çîrok; di ser paşxaneyêke dîrokî ya pêkanînên mêtîngeriyê re behsa têkoşîna dij-mêtîngeriyê dike ku çendserîbûna civaka Kurd li xwe dike palder û bi vegotîneke çîroka modern pê de diçe. Em dikarin vê çîrokê wekî çîroka yekemîn ya bi honaksazî û bi şêwaza vegotina modern biçespînin ku di kovara Rewşenê de weşiyaye. Her wiha, helbestên bi navê 'PEVÇÛN' ku ji alî Dara Azadî DILGERM ve û helbesta bi navê 'EZIM' ku ji alî Îrfan ÖZTÜRK ve hatiye nivîsîn, ji alî bikaranîna dengê peyvên ya ji bo dengê helbestê û ahenga hêmayê û ji alî naveroka helbestê ve helbestên rengmodern in ku di kovara Rewşenê de weşiyane. Her çî qas em di her du helbestan de jî rastî beşavend û ahenga di rengê forma çarîn û dûrîkan tîn jî, gava em bala xwe didin dengê helbestan; ne ji bo ahenga peyv û pîveran ku di ş'ira klasîk de heye, hatine sazîkirin, lê ji bo dengê hêma û naveroka helbestê hatine sazîkirin. Loma jî, dengê di zimên de heyî, ne di xizmetî pîvera arûzê de ye û xizmetî wî dengî nake ku helbestkar dixwaze saz bike; helbestkar di van helbestên xwe de, dengên di zimên de heyî, di helbestê de car din saz dikin û bi rêya sazîkirina metaforên zimanê û hêmayên wêjeyî wî dengî car din li zimên vedigerînin. Helbestên weşiyayî, bi awayê xwe yê vegotinê, "Wextekê barbengê/Li lotika çiya/Bizrê gulên kesk û sor û zer/Zêvî fetiqandin/Mezin bûn, kulîlk dan/Û şax vedan li çar aliyên/Di ba de/Di bahoze de" (Dilgerm, 1992: 19) ku di rengê vegêrana bêjeriyê de ye û domdariyekê bo vegêranê saz dike, bi me didin nîşan ku; tevî ku di kovara Rewşenê de hejmareke hindik helbestên di reng û teşeya modern de hatine belavîkirin jî; û her çend "...zimanê hindikaniyan bi kelepûr û paşdemayîne ve tê biyekîkirin û wisa tê pênasîkirin" (Durgun, 2014: 130), dê wêjeya Kurdiya Kurmancî, di hewldan û ranêzikiya fêrgehî ya kovara Rewşenê de berê xwe bide siberojêke dîtir ya zimanê û

wêjeyî; û li ser xet û paşxaneya ku bi Hawarê dest pê kiriye û bi Tîrêjê domdarî daye xwe, bikude.

Di kovara Rewşenê de, ranêzikiya wêjeyî, di ser ranêzikiya zimanî û zanava çandî û zimanî re ava dibe. Wêje, di polîtîkaya weşanê ya kovarê de wekî berhema çand û zimanê neteweyekê tê dîtin û qebûlîkirin ku dê di çarçoveya wêjeya neteweyî de li kar bikeve û bi rola xwe ya avakar û dij-mêtingeriyê rabe. Digel vê yekê jî, di helûmercên ku kovara Rewşenê diweşe de zêdetirî Kurdên xwendewar li bajaran dijîn û pêkanînên asîmîlasyonîst bi temamî li ser wan kar kiriye û zimanê wan yê yekemîn zimanê Tirkî ye û di biwara lixwenebanbûnê de gihîştine ast û qonaxa jortirîn. Kovara Rewşenê, di van helûmercan de, nifşa duyem û nifşa sêyem ya Kurdên di nav sînorê K.T.yê de dijîn, bi hev digihîne. Ev bihevgihandina hanê, kartêkeke taybet dike di biwara çand û ziman û wêjeyê de. Ev kartêk dibe sedem ku ji her du nifşan nifşeke hevpar ya taybet peyda bibe ku xwedî rengûawayekî arizî xwe ye. Ev taybetî û rengûawa di statîstîka nivîsarên ku bi Kurdiya Kurmancî di kovarê de hatine weşandin de xweşîkî tê dîtin.

Statîstîka nivîsarên li ser ziman û wêjeya modern yên di Rewşenê de weşiyayî

<u>Hejmar</u>	<u>Çîrok</u>	<u>Werger</u>	<u>Helbest</u>	<u>Ziman</u>
1	-	-	2	5
2	-	-	4	2
3	1	1	1	-
4	-	1	3	2
5	1	-	3	2
6	1	-	6	3
7	1	1	7	3
8	2	1	4	2
9	2	1	5	1
10	-	1	2	3
11	1	1	1	4
12	1	3	3	1
13	1	1	2	1
14-15	1	2	2	-
16-17	2	2	-	1
18-19	3	4	2	2

20-21	1	3	1	1
22-23	2	1	3	1
T. G.: 23	20	23	51	32

Gava em bala xwe dibin ser nivîsarên di hemû hejmarên kovarên Rewşenê de belavbûyî, em dibînin ku; 1) nivîsarên ku bi armanceke polîtîk hatine nivîsîn, bi zimanê Tirkî ne, 2) nivîsarên bi armanca ragihandina zanîn û agahiyê, yên ku li ser mijarên giştî hatine nivîsîn, hem bi zimanê Tirkî hem jî bi zimanê Kurdî ne, 3) gelek cure nivîsar ji zimanên Fransî, Tirkî, Erebi, bo Kurdî hatine wergerandin,⁴⁴ 4) û nivîsarên çandî, hunerî û wêjeyî hemû jî, bi ranêzikî û helwêsteke ‘yekzimaniyeke dij-mêtinger û dij-asîmîleker’ hatine belavkirin. Ev yek bi me dide nîşan ku; helwêsta kovara Rewşenê ya dij-mêtinger û dij-asîmîlasyonîst ku di rûpelên wê de xuyanî dibe; sere pêşîn berê xwe dide kelepûr û paşxaneya zimanî û digel ku zanîn û agahiya di ser zimanên wekî Fransî, Îngilîzî, Tirkî, Farisî û Erebi re hatî bidestxistin bi kêrî xwe tine jî, bi taybetî li ser zimanê Tirkî namîne û bi zimanê xwe yî dayikî û neteweyî ve dimîne û “ji bo ku hêma û awayên vegotinê yên jiyanbexş yên zimanê xwe yî dayikî û neteweyî zêft bike” (Thiong’o, 2017; 32) bi helwêst û ranêzikiyeke dij-mêtinger ku şikandin û rêlibergirtina kartêk û encamên pekanînen asîmîlasyonê li xwe dike armanc û bi rêbaza lidarxistina çalakiya jiyanî û praxisê ku dê lixwenebanbûnê pûç bike û durehiyeke (meleziyeke) xwehişber û rengerênî biafirîne, berhemên xwe yên çandî, hunerî û wêjeyî bi zimanê neteweyî diafirîne û belav dike.

4.1.5 Ranêzikiya Wergerê di Rewşenê de

Pêhisîna jêcihêbûnê, li ser bingeha jihevcihêbûna hêmanên neteweyî, bi taybetî di ware çand û zimanî de dide der ku “Jihevcihêtiya çandî, awayên zanavan dide ber pirsyaran û tiştên ji hev cihê bi bîr dixê û bervekirî ye ji bo şîrove û wergera çandî” (Bhabha, 2016: 299). Gava em bala xwe dibin ser derbirana ‘awayên zanavan dide ber pirsyaran’, em digihîjin wê qonaxê ku ‘awayên zanavan’ di heman demê de hem

⁴⁴ Di gelek hejmarên kovara Rewşenê de wergera nivîs, çîrok û helbestan heye ku ji helbestkar û nivîskarên ji zimanê Farisî, Rûsî, Elmanî ne. Digel vê yekê jî; ji bilî wergera Fener Rojbiyanî ya di hejmara 22-23yan de ku hatiye diyarkirin ku ji Erebi hatiye kirin û wergera nivîsarên zimanzanê Fransî Pierre Lecoq ku wê hingê Tirkiya wan nivîsan tunebûye û me ew wergera ji Fransî qebûl kir; di tu wergerekê de nehatiye diyarkirin ka nivîs, çîrok û helbest ji kîjan zimanî hatiye wergerandin û ji ber ku wê hingê wergera Tirkî ya wan nivîs, çîrok û helbestan heye, me ew di kategoriya wergerandina ji zimanê Tirkî de qebûl kirin.

xuyakirina ji bo jihevcihêtiya wan wekî qadeke hebûn û xweheyîkirinê ye hem jî paldereke bingeîn e ji bo danedera vê hebûnîyê ya di qadeke dîtir de.

Werger jî, li ser ‘şîroveya çandî’, ware çalakgerîya zimanekî ye ku di ware zimanekî dîtir de û li ser ‘jihevcihêtiya zanavan’ ku bi ziman (û pê re jî bi çandê) xuya dike. Loma jî “Ziman, dinyaya nedîtî û nebihîstî ya ku biyanî ye dixwe nava xwe û pê re jî xwazeke nûtir çêdike” (Burke û Hsia, 2010: 117) ku ev xwaz; di ziman û çand û dinyaya zanav û zimanê dîtir de, bi rengê xweheyîkirinê dide der. Her wiha, deq û berhema ku ji zimanekî bo zimanê dîtir tê wergerandin, digihîje çand û ziman û dinyaya ku lê hatiye wergerandin û zimanê ku hestê ‘jêcihêbûnê’ şîyar kiriye û di wergerandinê de wekî jêderk hatiye der, di heman demê û di şûngeheke dîtir de, ji bo ziman û çanda ku leqayî çewisandinê hatiye, dibe warê xweheyîkirin û şanîdana hebûnîyê.

Kovara Rewşenê, hem ji alî çandî hem jî ji alî zimanî ve, bi hişberîyeke ku hay ji taybetî û reng û awayê cihêbûna ji çand û zimanê gelên dîtir heye, dide ser rê. Loma jî di pêşgotina hejmara yekem de, hêleke vê rengûawayê, bi gotinên wekî “Çanda me Kurdan, bi rastî jî çanda berxwedaniyê ye.” (Rewşen, 1992: 4, hej, 1) hatiye derbirandin ku derbirana ‘çanda berxwedaniyê’ ji alî berevajîyê ve berê me dide çewisandinekê; ji ber ku bi awayekî diyalektîk, li wî cî û dera ku lê ‘berxwedanî’ hebe çewisandinek jî heye û pêwendîya wan jî wekî sedem-encam li rastê ye.

Digel vê yekê jî, tevî ku çand û zimanê Kurdî, rastî qedexekirin û asîmîlasyonê hatiye û di dema weşandina Rewşenê de asîmîlasyonê êdî demajoya pêkanînên xwe temam kiriye û qonaxa danedera encamên asîmîlasyonê dest pê kiriye jî, hevoka “Bi rewşa xwe ya îroyîn çanda me, (...) bi pêşveçûna xwe dikare demxa xwe li çanda hemdem bixe.” (Rewşen, 1992: 4, hej, 1) hayjêbûnekê dide der ku li ser qonaxa çand û zimanî ye û pê re jî bixwebawerîyeke arizî xwe datîne rastê ku ev arizîbûn li ser hinêrbarîya naverokê ava ye.

Di vî barî de, “...ji ber ku tiştên ku jêderka çandî di xwe de dihevin, hêmanên zimanî ne” (Strauss, 2016: 129) û ziman û çanda binelî gava leqayî zimanekî (û pê re çandeke) jê cihê tê, di qada wergerandinê de serwerîyek bo zimanê hîmî (zimanê armanc) çêdibe ku ji alî ‘hebûnîya zanavî’ û ‘xwederbirana çandî’ ve rastî kend û kospên taybet hatiye. Loma jî, werger, wekî encama çalakgerîya zimanî û çandî, di ser

‘jihevbiyanîbûna zimanan’ re (Benjamin, 2001: 172), “ji bo pênasekirin û watedarkirinê dibe hoy û merceke çandî ya jênager” (Bhabha, 2016: 61)

Kovara Rewşen, li ser vê hişberîya naverokî û ‘jihevbiyanîbûna zimanan’ û bi mebesta xweheyîkirina di warê çand û zimanên dîtir de, di weşana xwe de cî dide wergerên zimanî û wêjeyî.

Di warê wergerên zimanî de, ji li ser jêderk û beşên zimanan di hejmara 3yan û 9an de du nivîsarên Pierre LECOQ ji Fransî hatine wergerandin.⁴⁵ Nivîsara yekem bi sernavê “Avista û Zimanê Avistî” hatiye wergerandin ku wekî naverok balê dibe ser pirtûka pîroz ya Zerdeştîyê ku bi bîrûbawerîyeke giştî wekî pirtûka pêşîn ya bi Kurdîya kevn hatiye nivîsîn tê qebûlkin. Naverok û mebesta wergerandina vê nivîsarê bi me dide zanîn ku hişberîyek heye li rastê ku dixwaze û hewlê dide bi rêya wergerandinê, bigihîje agahîya xwe ya jê bêpar hatî hiştin ku “jêderka çandî di xwe de dihevin.” (Strauss, 2016: 129) Nivîsara duyem ya zimanî ya ji Pierre LECOQ, ji alî Mamo CUMÎ ve, bi sernavê “Rêzkirina Zimanên Îranî-Arî yên Rojava” hatiye wergerandin ku dîsa wekî naverok balê dibe ser têkilîya di navbera zimanên Îranî û Hind-Arî de heye. Her wiha sedema wergerandina vê nivîsarê jî dîsa li ser heman mebestê ye ku dixwaze bigihîje agahîya jêderkî ya der barê zimanê Kurdî de ku wekî pêkanîna serdestîya mêtînger hatiye qedexekirin û li ser ‘yekzimanî’ û ‘yekagahî’yê ji sedem û agahîya xwe bêpar hatiye hiştin.

Wekî wergerên nivîsarên wêjeyî, di hejmara 4an ya kovara Rewşenê de, çîrokeke modern ya ji Farisî ya bi navê “Xelek” ku nivîskarê wê wekî V. SOLOGOB hatiye dîyarkirin ji alî P. CÎHANÎ ve hatiye wergerandin. Di hejmara 7an de, nivîsareke li ser wêjeya kevin ya Pierre LECOQ, ji alî wergêr AMED ve û bi sernavê “Wêjeyên Îranî yên Kevin” hatiye wergerandin ku wekî dîrokî, li ser wêjeya ku bi zimanê Îranî yên kevin hatine kirin û tekstên ku hatine nivîsîn, agahîyan dide. Wekî mebest, wergerandina vê nivîsarê, berê me dide dîroka wêjeyê ku agahîya hîm û jêderka wêjeya Kurdî datîne rastê.

Di hejmara 11an de, çîrokeke modern ya ji Samed Behrengî ya bi navê “lawikê silqfiroş” ji alî wergêr Felat Dilgeş ve ji Tirkî hatiye wergerandin ku mebesta vê

⁴⁵ *Tevî ku wergêrê bi navê AMED, diyar nekiriye ka ji kîjan zimanî wergerandiye jî, di epîgrafa nivîsarê de wiha hatiye nivîsîn, “Di 26 Şibatê 1992’an de, Professor Pierre LECOQ, zimannasê navdar, di nav semînarên Kurdî de ku li Sorbonê dibin, semînarek li ser Avista û Zimanê Avista da. Li jêr kurtiya wê ye.” û em ji epîgrafê fam dikin ku ji zimanê Fransî hatiye wergerandin.*

wergerê berê me dide çîrokên bo zarokan yê modern û nivîskî ku heta wê hingê çîrokên zarokan yê bi zimanê Kurdî bi tevayî li ser çanda devkî hatiye û wekî çîrokên modern yê nivîskî bi hejmareke kêr hebûye.

Di hejmarên 22-23yan de, nivîsareke Mahmûd Ahmed MUHAMED ku der heqê helbesta klasîk ya bi soranî de ye, ji alî wergêr Fener ROJBÎYANÎ ve ji zimanê Erebi hatiye wergerandin. Em ji vê wergerê fam dikin ku, mebest gihîştin û daneheva agahîya navxweyî ya neteweya Kurd e û bi dibetiyê mezin, sedema ku ev werger hatiye kirin ev e; hem ji ber nivîsîna bi tîpên Aramî-Erebî ye ku Kurdên bakur nikarin pê binivîsin û bixwînin hem jî ji ber ku welatê Kurdistan di nav sînorên dewletan de parçe bûye, wêjeya bi zaravaya soranî û ya bi zaravaya kurmancî û kirmanckî ji hev dûr ketine û ji agahîya der heqê hev de bêpar mane.

Kovara Rewşenê, her çi qas wekî gav û pêngaveke taybet, wergerandina nivîsaran nekiriye yek ji rêbaz û polîtîkaya sereke ya weşana xwe jî, li ser hîma cihêbûna çand û zimanê Kurdî ya ji çand û zimanên dîtir, bi mebesta xweheyîkirinê ya bi rêya wergerê, zêde ne bi kartêk be jî, çalakî û praksîsa wergerê pêk aniye. Û ev çalakî ku dixwaze û hewlê dide ku bendê dayne ber pêkanîna ‘yekagahî’ û ‘yekzimanî’ yê yê asîmîlasyonîst yê serdestiya mêtînger, di qadeke xweser de hebûnîya xwe bi rengûawayê xwe yê cihê dide der. Bi vî awayî jî, ji bo çand û zimanê Kurdî dibe qadeke cihê û kartêker ya xwederbiranê.

4.1.6 Nav û Nasnava Nivîskarên Rewşenê

Nivîskarên kovara Rewşenê, di nivîsên xwe de, nav û nasnavên xwe bi awayên wekî: 1) Navê fermî yê di nifûsê yê dewleta K.T.yê de qeydkirî, bi kar aniye. Wekî; Abbas Alkan, Abdurrahman Durre, Adil Baran. Berçem Eksen, Besra Eksen, Cemil Gündoğan, Edibe Şahin, F. Hüseyin Sağnıç, Faik Bulut, Fatman Arslan, Fevzi Bilge, Hüseyin Kaytan, İbrahim Genç, İbrahim Gürbüz, İsmail Beşikçi, M. Sait Üçlü, Medeni Ayhan, Şefik Beyaz, Yaşar Kaya. 2) Navên adetî yê ji cî û warên ku lê ji dayika xwe re bûne an jî jê hatine an jî navê eşîr û bavikên xwe wekî nasnav bi kar aniye. Wekî; Adil Xazî, Cudî Xaniyan, Farqînî,⁴⁶ Girê Dêrsilê, Gulê Sîlopî, Selahattin Mihotulî, Seyda Berçemî, Torî. 3) Nivîskaran bi helwêsteke dij-mêtînger û navekî taybet ku amaje bi

⁴⁶ Farqînî, di hejmarên 1 û 2yan de bi vê nasnavî nivîsiye piştî guherandiyê û bi nasnavê Zana Farqînî nivîsiye.

Kurdbûna wan dike, ji xwe re bijartine û wekî nasnav bi kar anîye. Wekî; Adar Jiyan, Amed Tîgrîs, Dilbixwîn, Cemîla Celîl, Felat Dilgeş, Hogir Ehmed, Jîr Dilovan, Lerzan Jandil, Rojbîn, Rojê Civaknas, Şevîn Civaknas, Xamevan, Zana Farqînî. 4) Nivîskaran nasnavên xwe tevlihev bi kar anîne; heke navê wan yê fermî bi Erebi, Farisî û Kurdî be ew wekî awayê bilêvkirin û nivîsîna bi Kurdî bi kar anîne û paşnavê xwe guherandine. Wekî; Bekir Bahoz, Îbrahîm Xort, Mistefa Reşîd, Mustafa Serhat, Said Heste, Şemsetîn Ronahî.

Pircureyîbûna nasnavên nivîskarên kovara Rewşenê, ji du aliyan ve xuyanî ye: 1) Beşek ji nivîskaran di nivîsên xwe yên bi Tirkî de navê xwe yî fermî yê K.T.yê bi kar anîye. Wekî; İbrahim Genç. 2) Heman nivîskaran gava bi Kurdî nivîsîne an jî nivîsên wan ji Tirkî bo Kurdî hatiye wergerandin, vê carê paşnavê xwe motamot wergerandine Kurdî û wek wisa bi kar anîne. Wekî; İbrahîm Xort. Digel vê yekê, nivîskarên wekî Feqî Huseyn Sağnıç, Abdurrahman Durre ku bi temamî bi Kurdî nivîsîne, di nivîsarên xwe de navê xwe yê fermî neguherandine, bes Huseyn Sağnıç wekî navlêkekê navê ‘Feqî’ li xwe kiriye.

Tevî ku nivîskarên kovara Rewşenê nasnavên pircure bi kar anîne jî, ev yek ne ji ber bêserûberî û bêbiryariyê ye. Ji ber ku, gava em xweşîkî bala xwe dibine serê, em dibînin ku nivîskaran bi awayekî zelal cihêtiyek xistine navbera zimanan, -bi taybetî zimanê Tirkî û Kurdî- û di ser vê cihêtiyê re, rabûneke dij-asîmîlasyonîst nîşan dane û wekî ku Palmer jî dibêje, “Tiştê ku piştê dide ramana jineteweyekêbûnê û zanava neteweyî car dî hildiberîne, ramana yektabûn û wekhevbûna wê ye” (Palmer, 2001, s.144) nivîskarên kovara Rewşenê, bi hewldana jinûvehilberandina zanava neteweyî û bi helwêsteke dij-mêtinger(î) pêkanînên ‘wekxwekirin’ û ‘wekîhevkirin’ê yên mêtingeriyê red û neyîn kirine û xwestine bi rêya ziman ‘yektabûn’ û ‘wekhevbûna’ neteweyî bidin der.

4.2 Jiyana Rewşen

Kovara Jiyana Rewşenê, wekî berdewama kovara Rewşenê di bin banê NÇMyê û di Kewçêra sala 1996an de bi hejmara xwe ya yekem dest bi weşana xwe dike. Di hejmara yekem de, Yıldız GÜLTEKİN wekî xwediya kovarê tê diyarkirin. Murat BATĞİ wekî berpirsiyarê nivîsaran tê daxuyandin. Herçî desteya redaksiyonê de nayê aşkerakirin û wekî kunyeya kovarê ‘Kovara Edebî, Çandî û Hunerî’, Kovara Mehane (Aylık Dergi) dinivîse. Her çend zimanê kovara Jiyana Rewşenê wekî Kurdî ye jî, di

sergotariyê de tê gotin, “Ji ber ku hin nivîskarên me bi zimanê kurdî nizanin, emê di çend hejmarê pêşîn de bi zimanê tirkî nivîsan biweşînin.” (Rewşen, 1996: 4, hej, 1) Ev yek, wekî bêgavîyekê tê gotin; û gava em bala xwe didin naveroka hejmarên bi dû hejmara yekem, em dibînin ku vê rewşê, an jî vê bêgavîyê, heta hejmara çarem domandiye û ji hejmara pêncan û bi şûn de, heta hejmara 50emîn, kovara Jiyana Rewşenê bi tevayî bi Kurdî, bi zaravayên Kurmanciya Jorîn, Kurmanciya Jêrîn (Sorani) û bi Kirmancî (Zazakî) weşiyaye.

Di nivîsa sergotariyê de ji gotina, “Piştî demeke dirêj, em bi kovarekî nû, bi kovarekî çandî, hu-nerî, û edebî dîsa bi xwendevanên xwe re ne”⁴⁷ (Jiyana Rewşen, 1996: 4, hej, 1) em têdigihîjin ku kovara Jiyana Rewşenê dê di van biwaran de weşanê bike. Pê re jî, bi gotina, “Her qonaxekî dîrokî zimanê nivîskarên xwe û di melodiyên hunermendên xwe de tene naskirin” bal tê kişandin ku nivîskar û hunermend dê bi roleke giran û mezin rabin di rûpelên kovarê de. Ev awa şîrove berê me dide kartêka ku di ‘qonaxa ajdanê’ de kêma, di ‘qonaxa pêkhatinê’ de xwebûniya xwe ava kir, di qonaxa şikestî de negiha armanca xwe û di kovara Rewşenê de jî hewl û xebat bo wê hat dayîn da ku geşepêdana wê dest pê bike û bandorên asîmîlasyonê yên wekî, ‘lixwenebanbûn’, ‘durehîbûna neyînî’ û ‘cewêlekîya zimanî’, bişikê. Loma jî, ji bilî têkoşîna di warê siyasî de, rol û mîsyonek bo nivîskar û hunermendên gelê Kurd tê dayîn ku dê bi berhemên xwe yên afirandî bibin stûneke qayîm ji rizgarbûna bindestiyê û mîna ku dê bibe pêtal di rê û rêça kudandinê de, tê gotin, “Berhemên hunermendên mezin in yên ku dîrok anîne îro û îro dibine pêşerojê.”

Nivîsa sergotariyê, tevî ku vê rol û mîsyonê dispêre nivîskar û hunermandan jî, saziyê mîna kan û navenda vê yekê diyar dike û dibêje,

“Navenda Çanda Mezopotamya, çawa ji her hêlê ve ji bo pêşveçûna huner û çandê, xwe xwedî wezîfe dibîne, ji hêla weşanan jî, ji bo pêşveçûna nivîsa kurd jî xwe xwedî wezîfe dibîne” (Jiyana Rewşen, 1996: 4, hej, 1)

Mîsyon û xwewezfedardîtina NÇMyê ya bi vî rengî û weşandina kovara Jiyana Rewşenê, ‘şûngeha hêvîdariyê’ dike para kovarê. Ev şûngeh, şûngeha zanava neteweyî ye ku her çend di qonaxên demê û gera dîrokê de ji alî siyasî ve têkşikiyabe jî, her bi

⁴⁷ Me dest neda awayê rastnivîsa nivîsê û ji vê û şûn de jî, di kovara Jiyana Rewşenê de nivîs çawa hatibin nivîsîn em ê jî wek wiha binivîsin.

afiranên çandî, folklorî û wêjeyî ve maye li ser xwe. Loma jî, di pêdeçûna nivîsa sergotariyê de piştî ku xebatên heta wê hingê hatine kirin, tê çêlkirin, li ser derçûna kovarê tê gotin, “Jiyana Rewşen, bi tecrubeya ku ji kovara Rewşenê jî girtiye, û kêmasiyan tespît kiriye, wê bibe neynika edebiyata Kurdî.” Destnîşankirina bi vî rengî aşkera dike ku kovara Jiyana Rewşenê bi awayekî ji awayan berdewamî û peyrewa kovara Rewşenê ye; û em ji ber hindê jî car din bala xwe dibin ser têgiha xwe ya ‘şûngeha hêvîdariyê ku di heman demê de ji alî çand, ziman, huner û wêjeya Kurdî de, kovara Rewşenê dike yek ji nûnera zanava neteweyî ya dîrokî ku “Zanava dîrokî hewîner û bervekirî ye; diparêze ku zanava çandî ya ku her tim xwe hildiberîne, ew ê tu carî temam nebe” (Larrain, 1995: 217) û ew bi xwe bi gotina, ‘bi tecrubeya ku ji kovara Rewşenê jî girtiye’ dide der û dide nîşan ku ‘zanav çandî’ ya Kurdî her xwe hildiberîne û ji ber hindê jî temambûna wê nakeve behsê û kovara Jiyana Rewşenê peyrewa kovara Rewşenê ye.

Kovara Jiyana Rewşenê, pêncî (50) hejmar weşiyane; digel wê jî du hejmarên taybet hatine weşandin ku piraniya rûpelên kovarê bi taybetî ji bo nivîsarên nivîskarên ku di girtîgehê de ne, hatine terxankirin. Loma jî, her çend li ser nimre û hejmar nehatibe nîşandan jî, em dikarin bêjin, kovara Jiyana Rewşenê bi tevayî pêncî û du (52) hejmar weşiyane. Di van hejmaran de, di biwarên ziman, wêje, çand, folklor û hunerê de nivîsarên cur bi cur hatine weşandin. Digel van nivîsaran jî, di biwarên felsefeya hunerê, sosyolojî û sosyo-polîtîka ziman û hunerê de nivîs hatine belavkirin. Herçî hejmar û cureyên nivîsarên ku di Jiyana Rewşenê de hatine weşandin e, em dikarin wekî statîstîkeke li jêr bidin zanîn û agahdariyekê destnîşan bikin.

Statîstîka nivîsarên wêjeya modern yê di Jiyana Rewşenê de weşiyayî

<u>Hejmar</u>	<u>Çîrok</u>	<u>Werger</u>	<u>Helbest</u>	<u>Rexne-Nirxandin</u>
1 (1996)	-	2	2	-
2 "	-	2	-	-
3 "	1	3	-	-
4 (1997)	1	3	-	-
5 "	2	1	-	1
6 "	2	4	2	-
7 "	2	5	-	-

8	"	4	2	8	-
9	"	5	2	8	-
10	"	3	1	5	-
11	"	1	4	8	-
12	"	4	2	11	-
13	"	4	1	8	-
14	"	2	1	10	-
15 (1998)		3	3	10	-
16	"	4	2	7	-
17	"	1	3	11	1
18	"	5	-	12	-
19	"	5	-	12	-
20	"	-	1	13	-
21	"	1	3	6	-
22	"	-	2	8	-
23	"	4	1	12	-
24	"	-	2	8	-
25	"	3	2	9	-
26 (1999)		1	3	5	-
27	"	3	4	6	-
28	"	1	2	6	-
29	"	2	4	3	-
30	"	2	3	12	-
31	"	3	4	12	-
32	"	4	5	15	-
33	"	3	1	12	-
34	"	4	2	10	1
35	"	-	3	7	1
36 (2000)		1	1	12	1
37	"	4	3	7	-
38	"	3	3	8	1
39	"	1	2	13	1

40	"	-	-	12	-
41	"	4	3	7	-
42	"	3	3	8	-
43	"	2	2	6	-
44	"	4	3	9	-
45	"	5	5	12	1
46	"	2	1	14	-
47	"	2	3	5	-
48	(2001)	1	2	5	-
49	"	3	2	6	1
50	"	2	4	8	-

Hejmarên Taybet:

Kewçêr-1997	5	3	4	-
Sermawez-1998	6	2	4	-

T.G: 52	130	119	398	9
---------	-----	-----	-----	---

Gava em li ser vê statîstîka nivîsarên li ser ziman û wêjeyê ya di kovara Jiyana Rewşenê de weşiyayî, hûgeriyê dikin, serê pêşîn bala me diçe geşedana ku di biwara wêjeyê de pêk hatiye. Digel wê jî, em dikarin bêjin; ji bilî çend destnîşankirinên di nivîsarên ku di biwara wêjeyê de hatine nivîsîn, nivîsarên di biwara zimên de, hema bêje qet nîn e. Lê belê, çendî ku di biwara zimên de nivîsar di kovarê de nîn in jî, kovar ji awirtêdan û ranêzikiyeke zimanî ne dûr e. Wekî nîşaneya berdewamiya duzimaniyê, ji hejmara 13emîn heta bi hejmara 22yemîn ya kovara Jiyana Rewşenê, di rûpelên dawiyê de, ferhengok hatiye amadekirin ku li ber peyvên zimanê Kurdiya Kurmancî wateya Tirkî wekî bergind hatiye danîn. Her wiha, heke em gotina di nivîsara sergotariyê de hatî gotin, ‘bi tecrubeya ku ji kovara Rewşenê jî girtiye’ li xwe bikin palder û nîşane, em ê karibin bêjin; ranêzikiya fêrgehiyê ya kovara Rewşenê, di vî warî de bi ser ketiye ku hem li dû wê kovareke ku xwe peyrewê wê dihesibîne, weşiyaye hem jî zimanê Kurdî, bi taybetî Kurdiya Kurmancî, bi awayekî xuyayî, ji bandora neyînî ya serdestiya asîmîleker ya K.T.yê dûr ketiye û bi lidarketina durehiyeke xwehişber û rengerênî, bêyî ku pêwîstî bi nivîsên dersdayîn, hînîkirin û yên perwerdekirinê yên di biwara zimên de hebe, rûpelên kovarê bi nivîsên nivîskarên ku êdî di warê zimên de pijiyayî û pêkhatî ne

hatiye dagirtin. Ev yek nîşaneyê rengûawayê ranêzikiya kovara Jiyana Rewşenê ya taybet e di biwara zimên de.

4.2.1 Ranêzikiya Zimanî di Jiyana Rewşenê de

Kovara Jiyana Rewşenê, wekî berhema ku ji fêrgeha kovara Rewşenê gihîştîye û bûye derçûyiya wê, dest bi perîyoda weşana xwe dike. Nivîsarên li ser zimên, yên ku di kovara Rewşenê de diweşin, her yek dibin kevirê avahiya zimanî. Di vê avahiya zimanî de, her beş dibe egera peydebûna menzelên Kurdiya Kurmancî ku devokên ji herêmên cuda cuda tê de bi cî dibin; û di her menzelê de jî, beşên taybet ava dibin ku her yek di biwar û dîsîplînekê de, Kurmanciya hemû herêman li xwe dike hîm û binetar ji bo avabûn û peydebûna zanîn û agahiya çandî, hunerî û wêjeyî.

Di nivîsa sergotarê ya hejmara yekem ya Jiyana Rewşenê de, bi gotina, “Pirî caran em dibêjin edebiyata kurdî mîna deryayekî ye. (...) Ev tişt ji bo zimanê Kurdî jî wisa ye” (Jiyana Rewşen, 1996: 4, hej, 1) bal tê kişandin ser pêwendîya di navbera ziman û edebiyatê de heyî ku bêguman e; û di vê pêwendiyê de jî bal tê dayîn ku ‘her du biwar jî mîna deryayekê ne.’ Di pêdeçûna nivîsê de gotinên wekî, “Belê, xebatên gelek girîng û hêja hatine kirin, lê ji ber ku ev xebat pirî caran nayê nirxandin, kêmasî nayê dîtin, berhemên delaltir dernakevin holê” bal tê birin ser kêmasiyan. Kêmasiyên ku ji ber tunebûna nirxandin û rexnekirinê, xebatên hatine kirin wisa mane li rastê û negihîştine qîmet û hêjahiya xwe. Ji vê destnîşankirinê em fam dikin ku; dê rûpelên kovara Jiyana Rewşenê, ji nivîsarên li ser ziman û arîşeyên zimanî zêdetir bi nivîsarên wêjeyê bîr dagirtin ku dê amaje bi ziman bikin; zimanê Kurdî di diyarkirin û destnîşankirina zanava neteweyî de bigihîjînin ast û şûngeha xwe ya rasertirîn ku ew ast û şûngeh, wêje bi xwe ye. Digel vê jî, pêwîstî pê tê dîtin û tê daxuyandin û tê gotin, “Jiyana Rewşen, di gel edebiyatê wê bi pîrsgirêkên huner ve jî eleqeder bibe. Pîrsgirêkên zimên jî wê di kovarê de cî bigirin” (Jiyana Rewşen, 1996: 4, hej, 1). Ev pîrsgirêk çî ne nayê aşkerakirin lê belê em dikarin ber û bala xwe bibin ser nivîsên wêjeyî yên cur bi cur yên di kovara Jiyana Rewşenê de belavbûyî û bi dayîna mînakên bizanibin ka demajoya guherîn, çareserbûna pîrsgirêkan û geşepêdana zimên çî reng e.

Ji nivîsa bi navê Arzeba -I-

“Li pêşiya wan, di nav kincên spî de serhonazek. Li her du teniştên koroyê du keçikên poragir û bejnşemal. Miriyên ku koro anîbûn himatê, her yekî keweke spî dabû destê xwe û di nav nukilê kewên spî de sosinên pelro. Kincên miriyên di koroyê de wekî kirasekî sorebirq, diteyisîn fena stêrkan” (Kayan, 1996: 19).

Nivîsara ku ji serî heta dawî bi heman reng û awayê zimanî didome, bi Kurmanciyeke petî û ji zimanê axaftina rojane hatiye darêjtin. Digel vê yekê jî, destkariyeke wisa ji hundir de û bi bikaranîna keys û derfetên peyvسازیê yên Kurmancî hatiye kirin ku yekser Melayê Cizîrî tîne bîra me. Hostatiya afirandina rengdêran ku bi Cizîrî re hebû û wî di helbestên xwe de û bo ahenga pîvan û peyvên helbestê ew bi kar anîbûn, vê carê heman awa hostetiya zimanê wêjeyê di vê nivîsa pexşanî de, bi rengdêrên ‘serhonaz, poragir, bejnşemal, pelro û sorebirq’ derdikeve pêşberî me ku ji alî zimanî ve pêngaveke berpêyî jor e di deqên wêjeyî de.

Ji nivîsa bi navê Navê Stranan

“Warê muzîka kurdî, ji her hêlî ve, pir bi hêsanî em dikarin bibêjin ku warekî beyar û xam e. Li hêviya xebatên akademîk û zanistî ye... Di rewşeke wiha de em jî hewl didin xwe ku, em tiştinan bikin û bibêjin, ligel ku wê kêmasî û şaşî tê de hebin. Bi gotineke din ne gengaz (mimkûn) e ku her tiştên ku em bibêjin, wê ji sedî sed rast bin.” (Farqînî, 1996: 8).

Nivîsar, bi zimanekî vegotinî li ser nav û cureyê stran û kilamên muzîka Kurdî disekine. Gava em bala xwe didin awayê Kurmanciya ku nivîs pê hatiye nivîsîn, em dibînin ku tevî ku zimanê rojane yê pêaxaftinê hîm û esas e jî, gihanekên wekî ‘ku’ ji bo sazkirina hevokên fikrî li gorî axaftina rojane û vegotinê, zêde hatine bikaranîn. Ev yek jî bi me dide nîşan ku; hewldana avakirina Kurmanciyeke ku zanîn û agahiyên zanistî jî di xwe de dihevine, di vê nivîsê de li dar e. Ev yek, di heman demê de helwêsteke dij-yekzimanî ye li dijberî pêkanîn û lêferzkirinên mêtîngeriyê ku ji bo ku zanîna zanistî di destê xwe de bihêle, ‘yekzimanî’yê ferz dike.

Ji helbesta bi navê DÊ Û LAW

“Gava ez diçûm

Nivîstek çêkiribû

diya min

Ji bo min sê nanê firnê qewl kiribû

Ji bo ku bayê ezmanan li min nexista

Lêvikên wê dicirifîn

çavikên wê diperpitîn” (Jiyan, 1997: 27).

Helbest, bi zimanê ku pê hatiye nivîsîn, yekser berê me dide rojên bihurî û dibe li ser helbesta C. A. Bedirxan ya bi navê ‘Bilûra Min’ dihêle. Deng û ahenga ku di helbestê de hatiye sazîkirin, bi tevayî li ser dengê helbestkar û îmaj û hêmaya helbestê ye ku dixwaze bide der. Her wiha, helbest, ne ku zimên girantir û nefamdar dike, berevajîya wê, bi vebêjîyeke petî û sade, zimên di hundirê xwe de hêsanîr dike û her wiha dike ku ziman di ast û payeya wêjeyê de xizmetî xwe bike û xwe binimîne.

Ji nivîsa bi navê NÊRÎNÊN FELSEFÎK YÊN LI SER HUNER Û ESTETÎKÊ

“Di her civak û avahiyê de huner hebûye û rola xwe ya hevdem û taybetî pêk aniye. Her civak li gorî jiyana xwe, li gorî bîr û baweriyên xwe dibe xwedî “Çanda estetîkeke xwezayî”, ev estetîka xwezayî, jiyana wê civakê ya hunerî û estetîkî dide kifşîkirin. Ku tu bala xwe didêyî, di nav gel de gelek têgihên ku ji estetîkê re bibin bingeş hatine afirandin. Têgihên wek “Bedew, nerind, erjeng, bilindî, gernasî û hwd.” Bi van têgihan jiyana civakan ya hunerî û estetîkî, tê avakîkirin” (Kayan, 1997: 34).

Nivîsar, her çend huner û estetîkê li xwe dike mijar jî, bi vê tenê namîne. Li ser zimanê toreyî, folklorîk û kelepûrî disekine û bala xwendevanên xwe dibe ser têgihên ku di zimanê civakê de dihevin û di ger û çerxa dîrokê de, bi awir û riwangeyeke estetîkî ya jiyana hatine afirandin. Bi mînakên ku ji têgihên Kurmancî ne nîşan dide, bi awirê zimanparêzî destnîşan dike ku; çî gava pêwîstî pê çêbû, ji bo ku em têgihên felsefeya huner û estetîkê bi kar bînin, em ê rasterast berê xwe bidin zimanê xwe yî kelepûrî. Ev yek, di heman demê de nîşaneya bîra takekesî ye ku di yektatiya xwe de

berhênanê dike û di çarçoveya tevayîbûnekê (kollektîfbûn) de borîrojê vediguhêzîne roja îroyîn.

Em ji nivîsarên di kovara Jiyana Rewşenê de weşiyayî bi dest xistine jî fam dikin ku; ziman, êdî di wê qonax û deraxê de ne wekî gelemşeyeke sereke ye. Zimanê Kurdî, bi taybetî Kurdiya Kurmancî, ku heta wê hingê, bi saya berhemên gelêrî, folklorîk û wêjeya xwe ya klasîk, li hember pêkanînen mêtîngeriyê ji taybetiya xwe ya nimandina zanava çandî ya neteweya Kurd neketiye ku "...zanava çandî, diyardeyeke temambûyî û kakileke stewandî ye" (Larrain, 1995: 217) û bi awayekî stewiyayî her maye wekî xwe; taybetiyên xwe parastine; û piştî perwerdehiya ku bi Hawarê dest pê kiriye, bi Tîrêjê reng daye xwe û bi kovara Rewşenê 'qonaxa geşedanê' li xwe kiriye 'asoya dengvedanê', êdî amade ye ku duzimaniya Kurdên di nav sînorê K.T.yê de bi kêrî xwe bîne; jê 'durehiyeke xwehişber û berevajîker' peyde bike û mîrateya ji xebatên zimanî yên fêrgehî yên ji kovara Rewşenê mayî, di biwarên wêje û hunerê de têxe xizmeta zimên; û di çarçoveyeke yekzimaniya ku xwebûnî pê ava dibe de, zanîn û agahiyên ku di wêje û hunerê de dihevin, têxe ber xizmeta ziman û kelepûrê.

Loma jî, em bi hevrûkirinekê dikarin bêjin; di kovara Rewşenê de, ziman bo avakirin û danîna zanava neteweyî hebû û xizmetî wê dikir; û pê re jî ziman xizmetî pêşveçûna zimên ya di çarçoveya zimanzanîyê de jî dikir. Ji ber hindê jî di kovara Rewşenê de nivîsarên li ser zimên zêdetir bûn ji nivîsarên wêjeyî. Herçî kovara Jiyana Rewşenê ye; li xwe kiriye armanc ku wêje, ji bo berdewamiya kelepûrê berhemên wêjeyî biafirîne; kelepûra ku wekî mîrateyekê maye û ji bo neteweyeke bindest ne tenê paşxaneyê borîrojê, di heman demê de kana hebûn û xwebûnê ye jî. Wêje bi afirandina berheman xizmetî zimên jî bike û pê re jî zimên binimîne. Loma jî ziman ew kan e ku çand û huner û wêje lê dibin 'Şûngeha Haft'⁴⁸ û bi afirana û berhênanan car din li kanê, yanê li zimên vedigerin. Di vê deravê de û bi vê destnîşankirinê, em wekî dawî dikarin bêjin; ranêzikiya kovara Jiyana Rewşenê ya di biwara zimên de, taybetiyeke arizî xwe di xwe de dihevin ku xwe dispêre berhemdarî û afirîneriya wêjeyî.

4.2.2 Ranêzikiya Wêjeyî di Jiyana Rewşenê de

Kovara Jiyana Rewşenê, di nivîsara sergotariyê de, bi gotina "Her qonaxekî dîrokî bi zimanê nivîskarên xwe û di melodiyên hunermendên xwe de têne naskirin"

⁴⁸ 'Şûngeha Haft': ew cî û şûn e ku li herî jor e.

(Jiyana Rewşen, 1996: 4, hej, 1) amaje bi qonaxekê dike ku bi hayjêbûnekê li ser hatiye sekinandin û hîm û pîlan û egerên wê hatiye danandin. Em ji vê hevokê, bi zelaî fam dikin ku kovara Jiyana Rewşenê, di dem û qonaxa ku derdîçe de, bi taybetî di biwarên wêje û hunerê de, li xwe dike armanc ku bi roleke diyarker rabe, loma jî di pêdeçûnê de, bi gotina, ‘...wê bibe neynika edebiyata kurdî...’ bal tê kişandin ku wêje dê bibe biwar û dîsîplîna diyarker ya kovarê. Kovara Jiyana Rewşenê hay jê heye ku daye pey angaşt û îddîayekê ku gotina, “Ev îdîa îddîayek mezin e, lê dema îddîayên mezin jî ev dem e” (Jiyana Rewşen, 1996: 4, hej, 1) dike û dide zanîn ku gelemşeyên zimanê Kurdî ancax dikare bi wêjeya Kurdî xweşîktir xuyanî bibe û çareyên ku mimkun in ku di vê biwarê de, peyde bibin. Loma jî, piştî diyarkirina hîma kovarê, pîlana weşîna kovarê bi gotina, “Ji ber vê, emê bi piranî li ser pîrgirêkên edebiyata kurdî bisekin in. Rola wî ya dîrokî, di nav edebiyata dinyayê de cihê wî û pêşeroja wî” (Jiyana Rewşen, 1996: 4, hej, 1) tê diyarkirin ku ranêzikiya kovara Jiyana Rewşenê ya di biwara wêjeya Kurdî, -bi taybetî ya di Kurmancî- de, li ser bilindkirina asta wêjeya dinyayê ye. Di pey van gotinan re, em bi gotinên, “Mamoste û Seydayên me yên mîna Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Cigerxwîn, Osman Sebrî Apê Mûsa û bi sedan rewşenbîr rolên xwe yên dîrokî leyistine” (Jiyana Rewşen, 1996: 4, hej, 1) êdî em bi temamî hay ji egerên weşandina kovarê dibin ku kovara Jiyana Rewşenê bi hîm, pîlan û egera weşana xwe û bi hêmanên çandî ve ku “wekî ziman û borîroja hevpar; kesîde, komika etnîk û neteweyê ji “ên dî (dîke)” ji hev cihê dike” (Özkırımlı, 1999: 87) li xwe dike armanc ku digel berhênanên wêjeyî, di biwara zanava neteweyî de jî ‘cîhêtiya Kurdan’ ya ji komên din yên etnîk binimîne. Ji ber ku “...zanava te û ya dîkeyê, qonaxeke dîrokî, civakî û ramanî ye ku dive her tim lêgerîn bo wê bê kirin” (Said, 2012: 347) da ku dem û qonax her tim bi awayekî dîtir zanavê ava bike. Jiyana Rewşenê, di vê qonaxê de, piştî hewldan û destnîşankirina kovara Rewşenê ya zanava Kurdî ya di ser zimên re, li ser wê hizirê ye ku; êdî ew dem û qonax e ku; ‘jihevcihêkirina’ zanavên serdest-bindestiyê dikare di ser wêjeyê re û di şûngeha wêjeyî de bê nimandin. Her wekî Gramscî jî destnîşan dike û dibêje, “Hemin ku rast e ku zimanekî giyan û hêmanên çanda neteweyekê di nava xwe de dihevine” (Raguhaştin: Ives, 2011: 135) em dikarin bêjin; mirov dikare bi rê û saya zimanê ku takekesek pê diaxive û ramana xwe saz dike, cîhêtiya cîhanbîniya wî takekesî jî nas bike û jê fam bike. Wêje, wekî biwareke rasertir ku agahiya palandî tê de diheve, dikare bibe şûngeha diyarkirina vê cîhêtiyê û cîhanbîniya takekesê Kurd binimîne. Loma jî,

armanca ku kovara Jiyana Rewşenê daye ber xwe, ew e ku; bi rê û şûngeha rasertir ku nav lê wêje ye, ‘jihevcihêti’ya neteweyên Kurd û Tirk nîşan bide û nimandinê bo neteweya Kurd bike. Loma jî, bi bibîrxistina ‘borîroja hevpar’ hem di biwara ziman hem di biwara rewşenbîrî û ramanwerî û hem jî di biwara wêjeya Kurdî de, nivîskar û rewşenbîrên ku nûneriya dîrokî dikin, wekî mînak tê dayîn û di vê nûnertiya dîrokî û borîrojê de, bang li ‘bîra hevpar’ jî tê kirin û ji ber ku “Bîr, demajoyeke guherbar e ku ji borîrojê zêdetir ji alî dînamîkên dema têdeyî ve tê diyarkirin; û li gorî pêdiviyên dema têdeyî ji nû ve reng û dirûv digire” (Connerton, 1999: 25-31) tê armanckirin ku ‘bîra hevpar’ ya bang lê kirî, di ‘dema têdeyî’ de li gorî pêdiviyên roja îroyîn bibe rêber û rênişanderên mînakî. Ev awa ranêzikî, hem hewldana avakirina roja îroyîn e hem jî xwedîtîlêkirina borîrojê ye ku dê bibe sedem ku neteweya Kurd karibe bi xuyanîkirina cihêtiya xwe, hebûnî û xwebûniya xwe dayne rastê. Digel vê jî ev awa ranêzikî, di asta hizirînê de, teorî-pratîka çalakiya jiyanî û praxisê ye; ku şikandina ‘asîmîlasyona nebanker’ jî bi xwe re tine û pratîka wê jî; kudbarkirina (domdarkirina) weşana kovarê û derxistina asta rasertir ya wêjeya Kurdî û Kurmancî ye.

Armanca kovara Jiyana Rewşenê, li ser îddîayekê ye û Jiyana Rewşen tenê li ser nave xwe îddîa nake û îddîayên xwe jî tenê li ser ziman danayne. Îddîaya hatî kirin hem di biwara borîroj hem jî di biwara avakirineke nû û nûjen de ye; û ji ber ku “Wêje, ne teşeya giştî ya her cure berhema zimanî ye û ne ew şûngeha gerdûnî ye ku berhema zimanî tê de bi cî dibe” (Foucault, 2015: 62) Jiyana Rewşenê li xwe dike armanc ku di biwara wêjeya neteweyî de bigihîje qonaxa wêjeya gerdûnî; û ji ber ku wêje, “şûna rasertirîn û bandeva sêkujekê ye ku; pêwendiya berhemê ya bi zimên re û ya zimên bi berhemê re li wir digihîjin hev” (Foucault, 2015: 62-63) loma jî Jiyana Rewşenê pîlan dike û li xwe dike armanc ku wêjeya modern ya di rûpelên kovarê de ji bo biwarên dîtir wekî çand, fêklor û huner jî bibe şûngeheke bîngehîn. Digel vê yekê jî, hevoka sergotariyê ya ku dibêje, “Armanca kovarê ya bîngehîn pêşvexistina edebiyat û şîra Kurdî ye. Xebatên me piranî wê bi vî rengî bin” (Jiyana Rewşen, 1996: 4, hej, 1) soz û belênek dide. Ev soz û belêna ku tê dayîn, di şûngeheke hatî diyarkirin de bi cî dibe ku ew şûngeh, hem mîrate û kelepûra ji wêjeya borîrojê mayî ye hem jî avakirin û geşepêdana wêjeya modern e. Digel wê jî, kartêk û rola herî zêde ya vê belêndanê, ya wêjeyê ye ku “Belêndana wêjeyê dibêje: bes zimanekî min heye û ew jî ne yê min e; ‘zimanê min’ li gorî min ew ziman e ku nayê asîmîlêkirin. Zimanê min, zimanê kesê din

e ku tiştê ku diaxivim jê dibihîsim û axaftina pê re qebûl dikim” (Ertürk, 2018: 282). Loma jî, gava wêje li kovara Jiyana Rewşenê dibe armanc, di heman demê de dibe şûngeha helwêsteke dij-mêtinger(î) û dij-asîmîlasyonê ku qonaxa fêrgehiya kovara Rewşenê kêm zêde tê de temam bûye û Jiyana Rewşenê jî êdî xwe amade û têr qebûl dike ku belêna avakirina şûngeha wêjeya dij-mêtinger bide û pêngavên pêşvetir û girîngtir biavêje; û digel ku cî ji bindestiya neteweya wê neşiqitiye jî, ew ê karibe bersiva pirsê, “Gelo mirovên mêtingehê bi kîjan denga diaxivin? Bi dengê xwe diaxivin an jî bi devok û dengê ku ji serdest-efendiyê xwe qerz kirine, diaxivin?” (Loomba, 2000: 259) bide û bi helwêsta xwe ya dij-serdestî ya avakar ku ‘xwebûniyê’ li xwe dike hîm û bingeha hebûnê, bi zimanê xwe yî ku wêjeya xwe li xwe kiriye şûngeha jortirîn, biaxive.

Ev awa axaftin, ne axaftineke xwezayî û jixweber e; axaftina zimanekî hatiye ‘cewêlekîrin’ e ku wekî demajoyekê di sala 1876an de dest pê kiriye, di sala 1925an de bi Pîlana Îslehkirina Şerqê cî li xwe xweş kiriye û jê û şûnde bi pêkanînen asîmîleker yên K.T.yê heta bi sala 12ê Îlona 1980yê gihîştîye qonaxa xwe ya encamwergirtinê. Loma jî, dema ku kovara Rewşen dest bi weşanê dike, êdî zimanê Kurdî bi temamî ji qada xwe ya giştî bêpar e û ‘durehî’yeke ku ne bi awayekî xwezayî û dilxwazî li takekesê Kurd qewimiye, lê belê ‘durehiyeke asîmîleker’ lê qewimiye û bo lêvegerê pêwîstî bi ‘reha xwezayî’ û ‘kakilê giyanî’ heye; û şûngeha vê lêvegerê, kovara Rewşenê ye. Loma jî, bi rengûawayên nivîsaran û şêwaza zimanî, kovara Rewşenê dibe qada fêrgeha zimanê Kurdî. Endamên nifşa sêyem ya Kurdên ku di nav sînorê K.T.yê de mane, ji vê fêrgehê derdiçin û di qonaxa Jiyana Rewşenê de dibin xwedî avantaj û keyseke xweş; mîrateya zimanî, çandî, fêklorî û wêjeyî ku heta bi nifşa duyem hatiye parastin, jê werdigirin; wê mîrateyê bi zanîna ku ji zimanê Tirkî û ji zimanên dîtir wergirtine re didin ber hev; û di asta ‘xwehişberî’yê de bi çalakgeriya jiyanî û praxîsê vediguherînin ‘durehiya berevajîker’ û bi taybetî di biwarên wêjeyî yên helbest, çîrok û wergerê de, dest pê dikin zimanê Kurdî, -û bi taybetî Kurdiya Kurmancî -ku hatiye ‘cewêlekîrin’ û ‘axaftin lê hatiye birîn’, didin axaftin.

4.2.2.1 Helbesta Kurmancî ya Modern di Jiyana Rewşenê de

Kovara Jiyana Rewşenê, di nivîsara sergotariyê de, bi hevoka, “Lê armanca kovarê ya bingeîn pêşvexistina edebiyat û şîra kurdî ye...” (Jiyana Rewşen, 1996: 4,

hej, 1) destnîşan dike ku dê digel cureyên dîtir yên wêjeyê, helbest ciyekî taybet bigire di nav rûpelên kovarê de. Gava em bala xwe didin ser statîstîka nivîsarên di hemû hejmarên Jiyana Rewşenê de, em dibînin, wekî hejmar herî zêde helbestên modern hatine weşandin. Tevî ku kovara Rewşenê di biwara zimên de ber û meyla xwe dabû ser modernî û nûjenkariya kovara Hawarê û wekî peyrewêke Hawarê hewl dida û di çarçoveya zanava neteweyî de zimanê Kurdî li xwe dikir sembol û şaneka sereke jî, di biwara wêjeyê de vê yekê xuyanî nedikir; û her çi qas hindik be jî me di kovara Rewşenê de nîşaneyên helbesta modern didîtin jî, em dikarin bêjin; bi qasî ku em karibin nirxandin û analîzekê li ser bikin, bi hejmarî be jî, pêşveçûneke berbiçav xuya nedikir.

Lê belê, her wekî me ji nivîsara sergotariyê jî gelek caran mînak danê, kovara Jiyana Rewşenê ne tenê di biwara zimên digel wê di biwara wêjeya modern de jî bi temamî dide ser şopa kovara Hawarê û tevî ku car caran mînakên ji şîra klasîk di rûpelên kovarê de tên weşandin jî, ev yek tenê her wekî J. Assman radigihîne me ku, “Nivîskarekî Misrî dibêje, ‘Neteweyekê bes dikare bi jiyandina borîroja xwe bijî’” (2018: 142) referansê bi borîrojê dike; û di biwara helbesta modern de, digel hewldana nûjenkariya helbesta Kurdiya Kurmancî, hewla libêrêhiştina kelepûr û borîrojê dide; û di heman demê de jî bi reftara xwedîtîlêkirin e jî radibe.

Wekî gerdîş û kevneşopekê kartêka çewsîner ya şîra Kurdiya Kurmancî ya klasîk heta qonaxa kovara Jiyana Rewşenê jî, tu carî ji ser wêjeya Kurmancî kêmbûye. Ev kartêk di rûpelên kovara Rewşenê de jî xweşikî tê dîtîn. Herçî xwedîtîlêkirin e, heta wê demê jî ne li ser hizira ‘ji bo sibê do pal û pişt e’ bû; tenê rihetiya berdewamiyê bû, loma jî konformîstiyek bi xwe re peyde dikir û vê konformîstiyê dikir ku texlît û lasayîkirineke sîmulatîf pêk were û wêje li paş jiyanê bimîne.

Lipaşmayîna jiyanê ku em dibêjin, ne li ser sazkirina ‘wêjeya siyasetê’ ye, helbet li ser avakirina ‘siyaseta wêjeyê’ ye ku raserbûna çand û zimên jî bi xwe re saz dike. Ji bo lidarketina vê yekê jî, ramanekê moderniyê ya li ser çalakgeriya jiyanê û praxîsê danandî pêwîst e û rexneyeke borîrojê ya radîkal. Rexneyeke ku hem xwe ji nirx û hêjahiyên borîroj û kelepûrê nake û pê ve dimîne bestandî hem jî doza guherîn û nûjenkariyekê dike ji bo siberojê. Ev yek jî, lêgerîna moderniyê ye. Vê lêgerîna ku di warê helbesta Kurmancî de, bi qonaxa pêkhatinê ya kovara Hawarê dest pê kiriye û bi qonaxa şikestî ya Tîrêjê nîvçe maye, di qonaxa hewldana geşepêdanê ya kovara

Rewşenê de rengê xwe daye û hatiye di ‘*qonaxa geşepêdanê*’ û di rûpelên kovara Jiyana Rewşenê de reng û bêhna xwe daye ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî.

Helbesta ku reng û bêhna modern dide der, di hejmara yekem ya kovara Jiyana Rewşenê de, bi navê ‘De Were Nazenîn’ ku bi şêwaza xwe ya nivîsînê û bi zimanê ku hatiye bikaranîn ve, dengê berpêyî derve dide hîskirin ku ristên wekî “De were nazenîn,/bes e bi giranî.../bese leyîstika malê xelkê/bes bimije zarokê biyana” (Zinar, 1996: 29, hej, 1) bangkirinek e ji nazenînê re ku bi taybetî rista ‘bes bimije zarokê biyana’ bi metaforiya ku amaje bi zimên dike, di rista “Tu kengî tê,/ava zelal,/bûka bê ziman/cewahîra veşartî...” de xwe digihîne vebêjiyeke wêjeyî ku metafora ‘bûka bê ziman’ amaje bi ax û terîtoryayeke ‘bêzimanhiştî’ dike û di xwe de nîşaneyên ‘zimanê cewêlekîrî’ dihewîne. Tevî ku ‘De were nazenîn’ helbesta rengmodern ya yekem ya di kovara Jiyana Rewşenê de weşiyayî ye jî, em di helbestê de rastî sistemeke zimanî tên; û digel wê jî, di helbestê de sistemeke şanekî û referansî jî heye ku em di ş’ira klasîk de rastî wê sistemê nayên. Loma jî, çendî ku ş’ira klasîk gerdîşeke wêjeyî ava dike jî, ji ber ku “...gerdîş, bi awayekî metaforîk, wekî helbest û deqa ku ji alî hemû hêmanên çandê ve hatiye afirandin, xuya dike” (Andrews, 2017: 25) domdariya xwe di helbesta modern de winda dike. Lê belê ev windakirin zêdetir di reseniya takekesî de xuyanî dike. Reseniya ku dikeve behsê, pêwendîdar e bi ast û xurtiya redkirin û neyînkirina helbestkar re; û ev redkirin dike ku helbestkar di helbestên xwe de teşe û formên arizî xwe biafirîne. Loma jî helbesta bi navê ‘Bişeng û Siya Werzeba’ (Nemir, 1997: 8) di nav sistema xwe ya zimanî ya resen de, teşeyeke gotina helbestiyane saz dike û di vî şêweyê zimanî de pêşî bi ristên “Li ber mala me/Bişengeke penaber/Tu tişt ji bîr nake” bala me dibe ser penaberîya ku ji pêkanînên ‘warguhêzîkirinê’ yên mêtîngeriyê qewimiye û pê re jî bi ristên “Di mêjiyê min de/Tîrên zimanekî sayî û biyan/Yekem car ji dibistanê reviyabûm/Qasî derziyê bijîşkê ereqxur/Zimanê min diêşand/Tîpên nerm yên Tirkî” polîtîka û pêkanînên asîmîlasyonîst yên K.T.yê di temaya xwe de bi rengekî peyvraştî derbiranê dike. Bi vê aşkeratî û yekseriyê, “helbestê ji bandora ş’ira klasîk ya sofîyane xelas dike” (Calinescu, 2017: 86) û rê û mesîlên wisa pirşax bo helbesta xwe vedike ku dikare bo anîn û dannîşana mebesta xwe bi şanek, metafor û referansên pirreng bişuxule. Helbestkar, bi rista ‘Yekem car ji dibistanê reviyabûm’ pêşî bala me dibe ser perwerdehiyê û pê re jî bi ristên, ‘Qasî derziyê bijîşkê ereqxur/Zimanê min diêşand’ êş û jana ku ji ber zimanekî dîtir pê re çêbûye bi me dide hîskirin ku em tenê

dikarin gotina ‘êşa zimên’ bixwînin; lê belê ne em dikarin bi awayekî pratîk hest bi wê êşê bikin ne jî dikarin bi awayekî ne şênber xweşikî ji metafora ‘êşa zimên’ fam bikin. Ji ber ku helbestkar, behsa êşeke aîdî xwe dike ku; pêşî ‘qasî derzîlêdaneke bijîşkê ereqxur’, ziman û giyanê wî bi hînkirina her tîpeke Tirkî hatiye tîştîştîkirin, piştî jî di heman demê de; hem zimanê wî jê hatiye girtin û hem jî ew ji şûngeha zimanê xwe hatiye ‘penaberkirin’ ku rista ‘Tu tiştî ji bîr nake’ peyama lêvegerîna bo şûngeha jêderkî dide ku em fam dikin dê takekesê asîmîlekirî pêşî xwe di bîra lixwenebanbûnê de bişo û paşê bi “dikûrdeçûna xwebûniyê” xwe jê bifilitîne û “dest bi dest bi liv û tevgerê bike” (Gasset, 1995: 38).

Helbesta bi navê ‘Pêdiviya Tazî’, bi tevayî di ser ‘jêbûn-aîdbûn’, ‘resenî’ û ‘hebûniya bi xwebûnî’ re hatiye sazîkirin. Rista ku helbest pê dest pê dike, “Bila tu kes xwe nexapîne/Ji şîrê derew/Çi mast çêdibe, çi dew” (Ozer, 1999: 53) yekser balê dibe ser ‘hurbûn’ê ku wekî şûngeh amaje bi kan û jêderkê dike. Ev jêderk; jêderka çandî ye di heman demê de; û ji ber serdestiya zimanekî biyan, bi modernîyeke ku li gorî helûmercên ne resen lê hatiye ferzîkirin, ji şûngehên xwe yên perîferî û lêbelavbûnê bêpar maye û hatiye ber rizîn û ber çikînê. Helbestkar ji bo vê rewşê, amaje bi sê sedeman dike û dibêje, “Sedemên vê yekê sisê ne:/Meşka rûreş, haveyna xerab, axa bêxew” Her sedemek berhema ku ji ‘hurbûn’ê xwe hatine dûrxistin datîne ser baskên nepêbawer û em ji rengê berhemeke wisa fam dikin ku; afirandên ku di ‘meşka rûreş’ de û bi ‘haveyna xerab’ hatine kilandin û li ser ‘axa bêxew’ hatine belavîkirin, tu carî dê nebin afirandên ‘hur.’ Lidîjrabûneke bi vî rengî, berê me dide asîmîlasyonê ku tê wateya “Veguherandina kan û giyanekî li kan û giyanekî dîtir ku êdî ji resenî û xwezaya xwe dûr e; tê wateya ku kelûmelên biyan û nejê dibe tevçîna giyanê heyînekê” (Bauman, 2017: 149) Asîmîlasyona ku bi vê rola xwe ya veguherandinê ve, zanava çandî ya takekes û neteweyan ji navê wînda dike û kan û jêderkê dihêle ji çikîn û ziwabûnê re. Lidîjrabûna helbestkar ya dij-mêtingerî li ser vê yekê ye ku; pêkanîna asîmîlasyonê ya li ser neteweya wî, çanda wî ya resen hiştiye ji aqûbeta ‘çikîn û ziwabûn’ê re û keys ji neteweya wî biriye; û ji ber ku “qonaxa pêkhatina zanava çandî, zimanî û neteweyî bi ‘jêcudabûn’ê ji ‘dîkeyê’ temam dibe” (Bourse, 2009: 29) û ji ber ku neteweya wî ya bindest tê marastin, nikare bi kan û jêderka çanda xwe ya resen xwe ji ‘dîkeyê’ cudatir bibîne û bi hestpêkirina ‘hurbûn’ê, berhemên xwe biafirîne. Helbestkar, ‘axa bêxew’ wekî şûngeha vê afirandê nîşan dide ku em bi hêmaya ‘xew’ê dikarin di aşopa xwe de

ava bikin û bêjin; ji ber ku tim ling li ser pest û çewisandinê pê ve dikin ku navê vê yekê mêtîngerî ye, ax jî nikare razê û tim ‘bêxew’ e. Loma jî, helbestkar di dawiya helbesta xwe de bi ristên, “Kiryarên vê yekê jî sisê ne:/Tirk û ecem û erebên bêfedî” vê şûngehê, yanî ‘axa bêxew’ berfirehtir û diyartir dike; amaje bi terîtoryayeke jihevparçekirî dike û pê re jî lidijrabûn û qebûlnekirina xwe ya ku li ser helwêsta dij-asîmîlasyon, dij-windaker û dij-mêtînger saz kiriye, bi rengdêra ‘fedî-bêfedî’ nerm dike û di nav ‘mirovbûn’ê de bikev dike.

Helbesta bi navê ‘Baz’ bi rista “tu yê mezin bibî helbet rojekê/piştî rojekê li dawiya rojan/mayende...” (Çiyayî, 2000: 39) dest pê dike û em bi lêkera ‘mezin bûn’ê re, têgiha ‘kakila stewandî’ ya Larrain tînin bîra xwe û li bendê dimînin û dixwazin bizanibin ka mezinbûna ku dê rojekê pêk bê, bi çi rengî be. Helbestkar demajoya mezinbûnê ne bi yekrengî, lê belê bi durengbûnê nîşan dide û pêşî bi rista “qencî-xerabî, aderî-binketî” bala me dibe ser ‘dualîfî’ya ku di heman demê de hev watedar û heyî jî dikin û di vê durengiyê de berê me dide zanavan û bi rista “du nasnameyên bî/mayî ji laşekî” amaje bi du zanavên ku ‘nestewiyane’ dike. Di vê amajepêkirinê de, peyva ‘bî’, bala me dibe ser ‘serdest(î)’ya nêrane ku di bêxwedîtiyê de diheve û bibîrxistinê bo tunebûna xweserwerî û desthilatdariya Kurdan dike. Rista “dijberî hev û tevlîhev/sar ango germ/ dê bibine diraxe...” dinavhevdebûna van her du zanavan wekî ‘sar’ û ‘germ’ pêname dike ku gava li nav hev dikevin ji hev dixwin; û tu yekê jî namîne wekî xwe. Ev rewş ‘durehî’ bi xwe ye ku rista “li hêviya bijartîneke neserbixwe/û rê/en tî û dirêj/dureh ê bikişin/ji serê pozê pêlavên te...” pêşî bi gotina ‘bijartîneke neserbixwe’ helwêsta helbestkar ya dij-serdestî dide der ku ‘durehî’ bêhemd û bi pêkanînên mêtîngeriyê pêk tê; û loma jî ji ‘azadbûnekê’ bêpar e û ‘rê, yên tî û dirêj’ ku kartêka serdestiya mêtîngeriyê ya li ser bindestan diyar dike ku di demajoya asîmîlekirin û marastînê de li wan diqewime. Di vê rêya tî û dirêj de, ku sar û germ li nav hev dikevin, ‘durehî’ya ku Bhabha wê wekî “hilberandina mêtîngeriyê” (Raguhaştin: Oğuz, 2018: 81) pêname dike, pêk tê. Helbesta bi navê ‘Baz’ bi van ristên xwe ve, bi kodkirina rengdêrên ‘sar’ û ‘germ’ balê dibe ser ‘jihevcihêbûn’ê û zanavê jî di nav van kodan de cî bi cî dike û bi qebûlkirîneke ku dikare vê rewşa lê qewimî bi ‘xwehişberiyekê’ veguherîne ser ‘durehiya berevajîker’, helbesta xwe bi ristên “dema tu jîr bî/(...)/berbang ne dûr, nêzîk/stêrkên çavên te bi xwe ne!...” bi dawî dike û helwêsta xwe ya dij-mêtîngeriyê di helbesta xwe ya bi navê ‘Baz’ û ‘tûjahiya çavên Baz’ de dide der.

Helbestên ku me li ser wan hûrgerî kirin, bi armanca ku bi hin têgih û diyardeyan nimandin û bibîrxistinê pêk bînin, nehatine nivîsîn. Gava em li şêwaz û şêweyê zimanê ku di helbestan de hatine bikaranîn dinêrin, digihîjin ser vê fikirê û ji ber ku “Jidiliya di helbestê de taybetiyên derbar zimên in” (Eagleton, 2011: 180) ziman û awayê bikaranîna wî, di heman demê de jidiliya helbestkar jî dide der. Jidiliya ketî behsê, di xalingbûna hestê helbestî de ye. Digel wê jî, helbesteke din ku em ê karibin bêjin bi zimanekî ku jidiliya helbestkar dide der û di kovara Jiyana Rewşenê de hatiye nivîsîn, helbesta bi navê, ‘Hebhinarkê’ ye. (Jiyan, 2000: 18) Helbest, bi atmosfereke ku ne ji bo nivîsînê, lê ji bo gotinê ye dest pê dike û heta dawiyê jî wisa didome. Rista “bêhna firîkên şewitî dihat ji çolê” bala me dibe ser êşên giran ku ji ber şewitîna firîkan,- yanî heyîn û berhemên nestewiyayî- di jana mezin de bi cî bûye û rista “li çaraliyê çefiya min/diçirûse şûna şûrê şilfîtazi yê îskenderê/mezin” jî şûngeha vê êşa giran nîşan dide ku ‘şûr’ yanî şer, kuştin û talanên ku li neteweya helbestkar qewimiye, di navenda vê şûngehê de ne. Pê re jî ristên “li çiyayê şengalê/komek xinzîr teyrê tawiz ji xwe re biraştine” amaje bi qirkirinên ku li Kurdên Êzdî hatine qewimandin, dikin. Rista “hebhinarka delalî/bi cizbê ketin hêsirên te yên firyalî/li ser goleke mêşinî” jî wekî encama ku ji ber ‘şûrên şilfîtazi’ mane dide der ku vegotineke bi vî rengî; vegotina ku bi wekandin û bi bibîrxistinan xwe digihîne cureya vegotina sembolîk ku me heman cure vegotin di helbesta ‘Bilûra Min’ ya C. A. Bedirxan de destnîşan kiribû ku helbesta ‘Bilûra Min’ mînakê yekem ya helbesta modern ya Kurmancî bû. Rengpêdana ku helbestkar dike, di nava xwe de kurtgotineke helbestiyane jî dihevine ku; ev awa kurtgotin hinek be jî serweriyê ji destê qaliban digire û digel hêmapêdanê ziman di hundirê xwe de aza û serbesttir dibe û “êdî peyv ne di giraniya xwe ya berê de ne” (Ertürk, 2011: 111) û peyv, her wekî di helbesta klasîk de heyî, êdî ne mecbûr in li gorî şûn û pîvera qaliban di helbestê de cî bigirin; û ji ber hindê jî, êdî du şûngehên helbestê hene; 1) peyv, 2) dengê peyvê ku di heman demê de dengê helbestê ye jî. Herçî dengê helbestê ye, bi pêjnîkariya helbestkar ve bestandî ye ku di teşe û şêwazê de dide der. Loma jî, helbesta ‘Hebhinarkê’ vê pêjnîkariyê ne bi peyvên ku amaje bi xwe û wateya xwe dikin, lê bi peyvên ku amaje bi bibîrxistinan, bi wekandinan û bi paşxaneyekê dikin, nîşan dide. Di vê çarçoveyê de jî, ‘siyaseta helbestê’ dike ku êdî serdestî û mêtîngerî û talankerî û ‘şûrê şilfîtazi’ nikare ji ‘hêsirên firyalî’ re bibe serwer û jê bixwe û bimarêse; loma jî helbesta ‘hebhinarkê’ li dijî pêkanînen windakirina

mêtingeriyê di ser tişt û diyardeyên ku tunene re tê sazkin û êdî ‘hebbinarka delalî’ ‘teşîya bê’ ye ku nayê zefî, ‘destara berfê’ ye ku nayê hêrandinê û ‘bêrîvana baranê’ ye ku nayê doşîn û jêxwarin û marastin.

Helbestên di kovara Jiyana Rewşenê de weşiyayî, ji hejmara yekem û şûnde, di nav sîstemeke zimanî de ku ji kovarên Hawar, Tîrêj û Rewşenê dest pê kiriye, pêngaveke xurt daye xwe. Sîstema zimanî ya Kurmancî ji dortengiya xwe hatiye xelaskirin ku ji şîra klasîk ya Kurdiya Kurmancî heta helbesta ‘Bilûra Min’ di nav şîra bi pîvan û qalibên arûzî de asê maye. Bi şikandina qaliban û bi danîna sîstema jêderkî ya Kurdiya Kurmancî, helbestên mînanî ‘Bilûra Min’ di kovara Hawarê de belav bûne. Pê re jî, her çend temenkurt û di qonaxê şikestî de be û çendî ku “armanca Tîrêjê berîya wêjeyê heyîn û ‘temsîlkarî’ ye” (Amîda, 2016: 89) jî, helbestên Kurmancî yên ku di kovara Tîrêjê de hatine weşandin, kiriye ku pêngava pêşrewa wê avêtî, gaveke dîtir jî bi pêş de biçê û bi dû re jî kiriye ku kovara Rewşenê pal û pişt xwe bide van pêngavan; û ji bo vê sîstema zimanî, ku bi qasî heştê (80) salan ketiye ber çerxa asîmîlasyon û windakirinê, bibe fêrgehek û hewla berbelavkirina wê bide.

Qonaxa kovara Jiyana Rewşenê ku hem di warê sîstema zimanî hem jî di warê berhemdariya wêjeya Kurmancî ya modern de xwe spartîye qonaxên beriya xwe; û bi “Armanca kovarê ya bingeşîn ku pêşvexistina edebiyat û şîra Kurdî ye” (Jiyana Rewşen, 1996: 4, hej, 1), bûye ew qad û şûngeha ku helbesta modern ya Kurmancî di nav sîstema xwe ya zimanî de, peyv aza û serbest hiştiye û kovara Jiyana Rewşenê; 1) hem bûye nûnera zimanê ku bi tunehesibandinê hewla windakirina wî hatiye dayîn, 2) hem bûye afirandina helbestên dij-asîmîleker û dij-mêtinger, 3) û hem jî di biwara afirandina berhema wêjeyî de ku “...bi tevayî ne ziman e ne jî berhem e” (Foucault, 2015: 62) bûye şûngeheke taybet ji bo helbestên ‘qonaxa geşedanê’ ku di nav rîtm helûmercên jiyanê de bi rîtm û ahenga xwe ya arizî helbestên xwe ‘praxisa wêjeyî’ li dar xistiye.

4.2.2.2 Çîroka Kurmancî ya Modern di Jiyana Rewşenê de

Her çend me di hûngerîya xwe ya berê de jî diyar kiribû, ji bo dem û qonaxên ku çîroka Kurmancî ya nivîskî tê de derbas bûye zelaltir bibe, em pêwîst dibînin car din bêjin; çîroka Kurmancî ya nivîskî ku cara pêşî em di rûpelên kovara Rojî Kurd de rastî wê tên, hêçandinek e ku hewla avêtina pêngavekê dide berpêyî vegêrana modern. Lê belê ew gava ku ji alî Fuat Temo ve tê avêtin, hê di serî de, dişikê û gava pêşî ya çîroka

nivîskî ya Kurmancî ya yekem, di cî de dimîne. Di hejmara çarem ya kovara Hawarê de bi weşandina çîroka bi navê ‘Ber Tevna Mehfûrê’, (Hawar, 1998: 83) ku ji alî C. A. Bedir-Xan ve hatiye nivîsîn, diweşe û di biwara çîroka Kurmancî ya nivîskî de jî dibe pêşengeke avakar. Nivîskarên wekî K. A. Bedir-Xan, O. Sebrî, N. Êsif (N. Zaza) hejmareke hêjayî gotinê ya çîrokên Kurmancî hatine nivîsîne û digel ku resenê û nûjenxwaziyeke balkêş di wan çîrokan de dide der jî, heta derçûna kovara Tîrêjê, tu geşedaneke hêjayî balpêdanê çênebûye di vê biwarê de. Çîrokên Kurmancî yên ku di kovara Tîrêjê de weşiyane jî, wekî peyrewên çîrokên di Hawarê de hatine nivîsîn, bi heman rengî, lê bi naverokên cudatir hatine nivîsîn. Di kovara Rewşenê de jî, hejmarek çîroka Kurmancî hatine weşandin ku wekî teşe, ziman, honaksazî û naverok li ser heman rêça Hawarê ne; û em dikarin bêjin zêdetirî ji çîrokên di kovara Rewşenê de weşiyane, ‘siyasîbûneke req’ jî di xwe de dihevin. Li gorî helûmercên dema ku kovar tê de weşiyaye, ev rewş wekî tiştekî jênager xuya dike. Ji ber ku di wê demê de êdî asîmîlasyona li ser çand û zimanê Kurd hatî pêkanîn, ber bi encamwergirtina xwe ve diçe û nivîskarên çîrokan, wekî reaksiyoneke liberrabûnî, xweparastinî û xwebûniyê, çîrokên ku di vegotina wan de reqbûneke siyasî heye lê belê naveroka wan jî bi tevayî li ser dij-asîmîlasyon, dij-mêtinger e dinivîsin. Em dikarin bêjin, ev yek hewldanek e ku dixwaze bandor û kûrahiya cewêlekîya ku li zimanê Kurdî hatiye qewimandin, di warê çîroka nivîskî de kêmî bike, an jî rawestîne.

Herçî kovara Jiyana Rewşenê ye, hê di nivîsara sergotariyê ya hejmara yekem de destnîşan dike ku “Armanca kovarê ya bingeşîn pêşvexistina edebiyat û şîra Kurdî ye” (Jiyana Rewşen, 1996: 4, hej, 1) û loma jî ew ê di perîyoda weşana kovarê de, hemû hêz û meyl û pala xwe bide ser pêkanîn û geşepêdana bo armanca xwe. Hewldana ku ji bo vê armancê hatine dayîn, di gelek rûpelên kovara Jiyana Rewşenê de xuyanî dibe ku nivîskar-çîroknivîsan bi çîrokên Kurmancî xwe tev li vê hewldana geşepêdanê kirine. Loma jî em dikarin bêjin, digel helbesta Kurmancî ya modern, berhemên çîrokî yên Kurmancî yên di kovara Jiyana Rewşenê de belavbûyî jî, berhema peyrewên xwe ne. Digel vê yekê jî, aliyê ku van çîrokan ji yên peyrewên xwe cudatir dike, digel hin kitekitên naverokî, awayê honaksazî, awayê bikaranîna Kurmancî û şêwaza wan ya vegotinê ye. Ev yek hem nîşana geşepêdana wêjeyî hem jî naverokî ye.

Çîroka bi navê ‘Dilekî ji nû ve şiyarbûyî’ (Zinar, 1997: 36) çîroka yekem ya Kurmancî ya rengmodern e di kovara Rewşenê de weşiyaye. Çîrok, wekî naverok û

mijara ku li ser hatiye nivîsîn, mînamek e ji bo ‘wêjeya siyasetê’ ku honaka wê li ser vegotina rasterast hatiye sazkirin. Zimanê ku di vegotinê de hatiye bikaranîn, zimanê rojane û yê pêaxaftinê ye ku ji nîşandana zimên û gihandina wî ya bo asta rasetir zêdetir, xizmetî armanc û naveroka çîrokê dike; loma wêje jî ji bo ziman nabe şûngeha rasetir. Nivîskar ji bo leheng Ehmed ku xwendekarekî lîseyê ye, hevokeke wekî “hûn ji welêt re lazim in, ji bo roja mêranî û namûsê amade bin” saz dike ku bi tevayî amaje bi îdeolojiya neteweparêziyê dike û peyvên wekî ‘mêranî’ û ‘namûsê’ê jî, ji derveyî çarçove û deqbanda feodalîteyê, di Kurmanciya gerdişî û adetî de wekî şanek amaje bi ‘lêxwedîbûna hebûniyê’ dikan. Ev amajepêkirin, ji paş û ji wêdetirê zanava ku hatiye çewisandin û windakirin tê kirin ku li ser gotina “Her polîtîkaya rizgarîxwaz, divê bi wê tiştê ku resen e dest pê bike” (Eagleton, 1993: 31) saz dibe û reseniya ku di vê gotinê de diheve; li ser ‘hestên zanavekê’ ye ku peyva ‘namûsê’ ji şanîdana feodalîteyê zêdetir, hêma bi rabûna li dijî pêkanînen ku lê hatine qewimandin, dide û di paş perdeyê de jî amaje bi ‘rizgarkirina resenî û otantîkiya’ xwe ya etnîkî û neteweyî dike ku dij-mêtinger e.

Çîroka bi navê ‘Serdestiya Cewrikan’ (Bakî, 1997: 20) bi vegotina xwe ya îronîk, zimanekî nû saz dike di vegêrana nivîskî ya çîroka Kurmancî de ku bi gotina “Tenê rêya xelasiya min di xelasiya laşê min de dibûre” amaje bi gewdeyeke yekparçe dike ku di çarçoveya şaneknasiyê (semiology) de gewdeya neteweyekê bi bîr dixê. Bajaroka Dêrikê jî wekî parçeshûngeha vê gewdeyê ye ku ‘ji esman mîna cewrikên kûçikan diweşe û bi ser serê Dêrikê de dibare’ û cewrikên ji esman bariyayî ku pir girîngî didin rêxistinî û pêxistinîyê’ û li parçeshûngehê belav dibin û li gewdeyê dibin serdest û bi carekê re “alên xwe li ser laşê Dêrikê radixin” û çendî ku navê partiyên wan cuda bin jî hemû jî di xwe de navê ‘kûçik’ dihevin ku ji ‘hemnîjad’ in û ‘ji zîkekî welidîne.’ Di şewazeke bi vî rengî ya îronîk de, sembola ‘kûçik’ ku ala wan ‘yekreng’ e lê ew bi xwe gelek in, hêma bi pêkanînen mêtingeriyê ya ‘yekzimanî’ û ‘yekrengî’ û ‘yekneteweyî’ dide ku bi carekê de ji gelek aliyan ve li mirovên bindest tê sepandin. Hevoka “Her kû birçîbûn, goştê wê xwarin, lê her ku têjî bûn lingên xwe yên dawiyê rakirin û bi ser de mîstin” amaje bi awayê pêkanînan dike ku, ‘goştê wê xwarin’ bi temamî marastina aborî û (çav)kanî ya mêtingeriyê dixê bîrê ku ‘bi ser de mîstin’ jî qirêjkarî û rûxîneriya marastina mêtingeriyê dide der. Çîroka ‘serdestiya Cewrikan’ bi zimanê xwe yî îronîk, ku wer xuya ye cara pêşî ye di vegêraneke çîrokî ya Kurmancî de

hatiye bikaranîn, digel ku bi taybetî bi peyva ‘laş’ nimandinê bi hebûniya terîtoryaya yekpare dike û reftareke dij-mêtinger nîşan dide jî, ji alî şêwaza vegotinê ve ‘siyaseta wêjeyê’ dike. Nakeve ber bayê peyamdan û gihana armancê; û bêtî ku li ser klîşe, gotinên qelew û qalibên rûniştî bimîne ku “Klîşe gava tî navoyîkirin, bi ser dikevin. Ew ne tenê sepandinên mêtinger yê li ser mirovên bindestkirî û marastî ne ku bi awayekî beranberî û li ser zanîna hev diafirînin” (Deane, 1993:14, nivîsa destpêkê) Çîroka ‘Serdestiya Cewrikan’, bi şêwaza xwe ya vegêrana îronîk ku “bêguman zimanê îronîk raserziman e” (Tosun, 2011: 282) û bi şêweyê xwe yê sazkirina çîrokê, ziman di şûngeha raser ya wêjeyî de bi cî dike û ji wir, hem hêma bi zimanê ku nivîskar dinimîne hem jî hêma bi laşê ku terîtoryaya hebûna ziman e, dide.

Çîroka bi navê ‘Çûyîn an jî Mirin’ (Mahsûm, 1998: 30) bi hevoka “Saet berêvarkî pênc” dest pê dike ku ew dem; ew dem e ku dê li lehengê ezvebêj ji nav çîroka xwe derkeve û têkeve nav dema çîroka xwe û pê re jî bi hevokên, “Li otogarê gelek otobas û li derdora wan gelek mirov” bi vegotîneke di bin re, şûngeha ku dê leheng li dû xwe bihêle û otogar dê bibe şûngeha têrebihurînê ya çîrokê nîşan dike. Vebêj, li otogarê û di rêwîtiya xwe ya di otobûsê de, çîroka xwe ya ku dê li dû xwe bihêle, vedibêje û bi hevoka “Cara yekem ezê ji Amedê derketama” şûngeha ku dê li dû xwe bihêle dide zanîn û bi hevokên “Cara yekem ez bigiriyama, wê tu kes ez aş nekirama. Cara yekem ku ez bikeniyama, wê tu kes tev lî vî kenê min nebûya” hestên xwe di şûngeha ku dê li dû xwe bihêle de cî bi cî dike û di pey re bi hevoka “Cara yekem min ê kesek an jî kesên biyan nas bikira” jî, çûna jibêgavî, yanî sirgûnê, yanî warguhêziya ne bi dil û daxwaz, di navenda çîroka xwe de bikevî dike. Nivîskar bêtî ku vegêraneke dûr û dirêj bike û çîrokê di nav vegotina xwe de bifetisîne, bi şêwaza ‘kurtgotin û qengotin’ê, bi çend hevokan bi me dide zanîn ku ew li ber rêwîtiyeke jibêgavî ye ku nav lê sirgûn, warguhêzîkirin an jî warguhêzîbûna ji bêtî ye ku “Sirgûn; di navbera mirovekî û warekî, di navbera xwe û welatê xwe de, terazineke nesarêjane ye” (Said, 2019: 173) û çî kesê ku jibêgavî hat û li ber pozê vê ‘terazina nesarêjane (nekew)’ ma, êdî ew kes di ser zanava çandî re berendam e ku têkeve nav krîzeke zanava neteweyî û bi dilkovaniyeke rasteqîn ku “tu kes nikare bi dilkovaniya rasteqîn re serederiyê bike” (Said, 2019: 177) tê dagirtin û ancax dikare bi hevokên ku “cara yekem...” dest pê dikin, keser û dilkovaniya xwe bêtî. Di vê qonaxê de, pêwîst e em balê bibin serê û bêtî ku hevokên ku bi “cara yekem...” dest pê dikin, teyisîna krîza zanava neteweyî ye.

Tirsa jiyîna li warekî biyan, hem hestê jêbûnê (aîdiyetê) û hem jî zimanê ku mît û çîrokên çandî yên takekesî di xwe de dihevin, şiyar dike; û ji ber ku ziman “Berî her tiştî navgîna avakirina çandî ye ku wate û xwebûna me pê tê avakirin” (Chambers, 2014: 41) takekesê ku berê wî dikeve sirgûn û warguhêziyê, bi hestê ku dê bibe ‘dike’ yê çandeke biyan, dest pê dike serdestiya ku nekariye têkoşînê pê re bidomîne an jî ji heqê wê derkeve der, dide ber pirsyan. Çîroka ‘Çûyîn an jî Mirin’ê, di vegêranê de, bi teknîka flashback û bibîranînê, di şûngeha xwe de radiweste, di aşopa leheng de hevoka “Kalê min Nezîr digot: ‘Ma behsa bextê kê dikî? Ma wan carekê, ji text û bext, bext dane ciyekî; bûne xwedî text’ bi leheng dide sazîkirin ku çîrok bi vê hevokê re dayîna agahiyên xwe yên der heqê xwe de jî temam dike. Bi hevoka, “Niha li Stenbolê, em yek jî wan dilopan in û em bi erdê ve zeliqîne” bêcûwariya ku bi sirgûniyê lê qewimiye, pênasê dike û bi şayesê ‘em bi erdê ve zeliqîne’ jî, ji akincîbûnê zêdetir, asêbûna di şûngehekê de tîne ziman ku ev yek nîşaneyê belawelabûneke ruhî û giyanî ye ku hema bi dû re, bi hevoka “Lê niha nizamî wê kengê Stenbolê dev ji ruhê me berde û emê kengê jê birevin?” fetisîna ku ji ber vê asêmayîn û belawelabûnê lê qewimiye, dide der ku ‘bi erdê ve zeliqîn’ amajê bi şûngeheke dîasporayî dike ku “têgiha dîasporayê bêrehî û bêwariyê tîne ziman” (Alinia, 2007: 103) û hest û daxwaza şûnvegerîna bo war û şûngeha xwe jî di gotina, ‘emê kengê jê birevin’ de diheve, hem xwesteka xelasbûna ji belawelabûnê hem jî xwesteka lêvegerê ye ku “ferasetê (re)terîtoryayî xwebûniyê ji bo armancekê û ji bo welatekî ji nû ve saz dike an jî birêkûpêk dike” (Alinia, 2007: 103). Loma jî, hevoka ku dide dû vê ferasetê, bi gotina, “Lê tu Amedhez nikare zêdeyî hefteyekê jê bi dîr bikeve” şûngeha lêvegerê diyar dike ku di heman demê de bi helwesteke dij-mêtinger şûngehê polîtîze dike ku “Polîtîzasyona şûngehê, hem ji alî dewletan ve hem jî ji alî tevgerên antî-kolonyal ve tê pêkanîn” (Alinia, 2007: 121). Ev şûngeh di heman demê de hêmayê terîtoryaya aşopkirî jî nîşan dide û çîrok bi hevoka “Ku bi dîr ket, ev bi xwe êdî mirin e”, di şûngeheke lêasêmayî de, bala me dibe ser ‘lixwenebanbûnê’ ku çîrok bi vê hevoka xwe lihevnekirina çandan dide der ku “çand hevîkariyeke du alî ye” (Oğuz, 2018: 57) û ‘mirin’ ew peyv e ku; an dê bi ‘dûrketina ji war û şûngeha bingehîn’ bi encamê ‘lixwenebanbûnê’ bibe navê ‘tunebûnê’ an jî dê bi ‘lêvegerê’ bibe ‘mirina mirinê’ ku ev awa vegotin serketina ziman e ku dê pê hebûniya zanavê xuyanî bibe û li dar bikeve.

Di çîroka bi navê ‘Xezal Ba Radimûse’ de (Mehmed, 2000: 50) em dibin govan ka ziman di nav deq û vegotineke wêjeyî de çawa car din û ji nû ve tê sazkirin. Epîgrafa çîrokê, “Xezal ba radimûse/Xezal bi pey bayê sibehê ketiye/Xezal ketiye/Xezalê di nav xwînê de maye/Xezalê miriye” hemû çîroka ku di nav çîrokiya çîrokê de hatiye gotin, bi vebirî dibêje. Vegotina çîrokê jî dema ku tê vegotin kîjan dem dibe bila bibe di her carê de vedigere dema niha û ba jî, bi hevokên “Nîvro ye û ba nemaye. Bi nazan xap li xwe dane û çûye”/“Berêvar e. Beêvara ba ye.” bi vegerîna dema çîrokê re vedigere wê dema ku çûye û “Ba bi hemû giyanê xwe û ramûsan, mîna Bozê Rewan tê” û car din di nav demê de cî bi cî dibe. Çîroka Kurmancî ya gotinê ya devkî, careke din jî digihîje kargîniya xwe ya ku “kargîniya ziman ne ew e ku nûneriya rasteqîniyê bike, kargîniya ziman sazkirina rasteqîniyê ye” (Tosun, 2011: 131) û rasteqîniyê di nav vegêrana nivîskî de saz dike û çîroka Kurmancî ji şûna wê ya devkî vediqetîne; û di heman demê de pê ve bestandî jî dimîne û bi gotina “mîna Bozê Rewan tê” di nav dema ku di çîrokê de digere û bi ziman hatiye afirandin de car din şûnvedigere. Ev şûnvegerîn; çendî ku şêweyekî flashbackê ye jî, ji ber ku vegerîn bo şûn û demeke dûr e û vegereke wisa ye ku tu pevgirêdana wê bi naverok û temaya çîrokê ya bi dema niha ve tune ye, şûnvegerîneke taybetî xwe ye; awa û rengêkî çirandina demê ye û ji ber ku “Ziman, tiştê wisa ye ku demê ‘girê dide’” (Foucault, 2015: 96) dema niha ya çîrokê ya ku ‘bi çûn û hatina ba re’ jî her û her dimîne di dema xwe de. Bayê ku mîna Bozê Rewan tê, avaniyekê di xwe de hewandîye û bi xwe re aniye ku “Ba” bi ‘çirandina demê ve’ “Bi giyanê Memê Alan hatiye” û çendî ku di dema niha de nayê û tu tişt li ba nake jî, “Hatiye û porê Xezalê ya negirêdayî li ba kiriye.” Û dema borî; ya ku bi dastana Memê Alan û hespê wî yê Bozê Rewan, ku sembola bilezî û çistîtiyê ye û di ‘hişê hevpar (kollektîf)’ ya Kurdan de bikeys bûye; hem ji ber ku ‘Neteweyek bes dikare bi jiyandina borîroja xwe bijî’” (Assman, 2018: 142) û ancax dikare zanava xwe ya neteweyî bi di nav çarçoveyek hevpar û kollektîf de saz bike û hem jî ji ber ku “Zanav pirseke hişberiyê ye ku hem di asta takekesî hem jî di ya civakî de têbor e” (Bourse, 2009: 139), Bozê Rewan, bi hêmayê ‘bayê ku bi lezî û çistiya xwe ve tê’ tê dayîn û Memê Alan jî bi ‘giyanê ku sekn û helwêsta zanavekê dide der, bi zimanekî dema nihayî di şûngeha çîrokê ya dema niha de tê cîbicîkirin. Loma jî, Xezala ku têkoşereke dij-mêtinger e û gava “Ku... çek û rext germ dibû, laş sar dibû; ku... laş germ dibû, çek û rext û hemû hesinên hinav û dil sipûsar dibûn” (Mehmed, 2000: 51) vegêrana ku derbar dema niha

ye û bi bayê ku ji borîrojê hatî liv li xwe dixe, di şûngeheke nû ya dîtir de cî bi cî dibe ku pêşî ‘laş sar dibe’ û di sariya mirinî ya hesin de ‘hinav û dil sipûsar’ dibin û demajoya xwînrij û mêtinî ya bindestiya zanava ku ketiye pey avakirina borîroj û sîberoja xwe, di dawiya çîrokê de hevoka “Zemên dev ji kwîtana xwe berda” amaje bi nediariyekê dike ku ziman xwe berdide navê û hevoka dawî ya çîrokê; “Û xwîn pijiqî ser pêjnên ba jî! Bayê ku hema berî wê kêlikê çûye, bayê ku piştî pêjnînê hatine nikaribû vegeriya jî, hetaaa...” ziman û vegêranê vedigerîne destpêka epîgrafa çîrokê ku bi hevoka “Xezalê miriye” diqede.

Vegotin, karaktera sereka ya çeşn û cureyê bi navê ‘çîrok’ e. Vegotina ketî behsê, hem bi devkî hem jî bi nivîskî li dar dikeve. Herçî çîroka devkî ye, li ba Kurdan, di nav cureyên vegêranê de xwedî ciyekî serek bû heta Hawarê. Loma jî, Fuat Temo jî ne xwedî hişberiyek bi vî rengî bû û ji ber hindê jî navê ‘Çîrok’ê (Temo, 2002: 36) li çîroka xwe kiribû. Dibe ku ya Temo texlîd û lasayîkirinek bû û dibe ku wî ji bo ku bê zanîn êdî çîrok tên nivîsîn jî, navê çîroka xwe wisa lê kiribû. Her çend ev yek li ser dibetiyekê be jî, ji bilî ‘Çîrok’ê Fuat Temo, tu çîrokeke rengmodern di rûpelên kovarên ku di ‘qonaxa ajdanê’ de derçûne, nehatiye weşandin. Loma jî, Hawar di vî warî de jî, destpêkek e ji bo wêjeya modern ku C. A. Bedir-Xan bi çîroka xwe ya bi navê ‘Ber Tevna Mehfûrê’ xeteke xuya kişandiye di navbera serdemên wêjeya Kurmancî ya modern de. Ji ber ku rêjeya xwendin û nivîsîna Kurdan ya wê hingê gelekî kêr bûye di nav Kurdan de; ev xeta hanê jî ku rengê avangardiyê dihevwîne di xwe de jî, her wekî xeta elfabe û gramera zimên, tenê ji alî Kurdên ku xwende ve hatiye dîtin.

Çîrokên Kurmancî ku di kovara Rewşen, yanî destpêk û gava yekem ya ‘qonaxa geşedan’ û di kovara Jiyana Rewşenê, yanî lidarketina ‘qonaxa geşedanê’ de hatine weşandin, wekî peyrewên Hawar û Tîrêjê, bi awayekî xuya ketine nav hewldana pêşvexistina wêjeya Kurdî. Di vê çarçoveyê û di biwara wêjeyê û bi taybetî di cureyê çîroka nivîskî ya rengmodern de, kovara Jiyana Rewşen, qonaxeke diyarker e ku hem di helbestê hem jî di çîrokê de bûye şûngeheke wêjeyî. Çîrokên di kovara Jiyana Rewşenê de hatine weşandin, bi paşxaneyê ku ji pêşrewên xwe hilgirtine, ziman û bilindkirina wî ya di asta wêjeyî de, li xwe kirine arîşeyeke taybet. Loma jî, ji bo ku karibin bigihîjin şûngeha deqîtiyê (textuality), pêwendiyêke taybet bi zimên re danîne. Pêwendiya ku çîroknivîsan bi zimên re daniye, li ser hûngerîya bo ziman û vekolerîya periferiyên zimên rûniştîye. Ev yek, di helûmercên hingê de helwêsteke dij-mêtinger e ku K.T.yê ji

sala 1923yan heta sala 1992yan, bi qedexekirina Kurdî û bi pêkanînên xwe yên asîmîlasyonîst, zimanê Kurdî li pêşberî zimanê Tirkî, ya ku di qanûnê de ‘yekziman’ e, di şûn û rewşa ‘zimanê cewêlek’ de cî bi cî kiriye. Loma jî, ji ber ku “Di demajoya ku zimanek dikeve derava cewêlekiyê de, ziman ji navgîn(îy)ê wedetir e; û êdî zimanê ku tê bikaranîn, bêtir çalakiyeke civakî an jî neteweyî ye” (Alinia, 2007: 247) nivîskar, hunermend, lêkoler, helbestkar û çîroknivîsên ku nivîsên xwe di kovarên Rewşen û Jiyana Rewşenê de belav kirine, berî her tiştî, pêwîstî pê dîtine ku di biwara zimên de berê xwe bidin borîrojê û li ser zanava xwe ya çandî bimînin ku “...zanava çandî û dîrokî, hewîner û bervekirî ye; û her tim xwe hildiberîne û ew ê tu carî temam nebe” (Larrain, 1995: 217). Loma jî, çendî ku ziman di wê qonaxê de hê jî di gundewarên ku Kurd lê dijiyan de geş û zindî bû jî, çanda ku ‘dîrokî, hewîner û bervekirî’ bû û di nav zimên de diheviya, dibû hilgirê vî zimanî. Aliyê ku ji nivîskarên kovara Rewşen û Jiyana Rewşenê re dima, vekolerî û hûrgeriya wî zimanî bû.

Demajoya hûrgerî û vekoleriyê, bi xwe re (ve)guherandina şeweyê vegotina çîroka bi Kurdî, bi taybetî Kurmancî, jî aniye. Loma jî, gava em bi hûrgerî li zimanê çîrokên ku bi taybetî di kovara Jiyana Rewşenê de hatine nivîsîn, dinihêrin, em dibînin ku; ne tenê hûrgerî li ser derfetên zimên hatiye kirin, di heman demê de, ziman ji rengûawayê xwe yê vegêrana devkî û zargotinî hatiye qetandin û şêwe û şewazên vegêranê, ji vegêrana îronîk heta bi vegêrana fantastîk reng daye xwe. Di vê rengdanê de; di warê mijar, naverok, avakirina şûngeha çîrokê û pêwendiyên tîp û lehengên di çîrokan de, digel hebûna hewldaneke nûxwaz û avakirina çîroka Kurmancî ya modern, helwêsteke dij-mêtinger jî xuyayî ye ku li gorî Abbas Vali “Çarçoveya dîrokî ya zanava Kurd di nav diyalektîka ‘înkâr’ û ‘berxwedan’ê de reng û dirûv daye xwe (Raguhastin: Alinia, 2007: 240); û zanava ku di bin ‘neyînkirin’ û qedexekirina qanûnî de asê maye, di çîrokên di kovara Jiyana Rewşenê weşiyayî de wekî ‘berxwedana zimanî’ daye der ku ev ‘berxwedan’; li ser xwehişberiyekê ava bûye û bi ‘durehî’yeke ku ‘fermîbûnê berevajî dike’ û ji bo pûçkirina ‘lixwenebanbûnê’ çalakiya ‘lixwevegerîn’ê pêk tîne, hatiye danandin û bi reng û şeweyekî ku di wêjeya xwe de zimên dide axaftin, hatine nivîsîn.

4.2.3 Wekî Biwara Sêyem: Werger

Pircureyiya zimanan, taybetiyên wan yên çandî û giyanî, eger û nîşaneyêke xuyayî ye di jihevcihêbûn û jihevfam(ne)kirina wan de. Jihevcihêbûn diyardeyeke

xwezayî ye û famkirina ji heyîn û mirovê dîtir pêwîstiyêke bivênevê ye ji bo mirovan. Nexwe berî her tiştî, ji bo ku mirov kend û benda famnekirinê ku ji ber pirrengiya zimanan derdikeve rastê, ji navê rake; an jî bi awayekî ji awayan jê hilbibore, divê rêyekê peyde bike; rêyekê dîtir ya sêyemîn ku dê bibe têreborîna her du hêlên ji hev cihê; ew rêya sêyemîn, werger bi xwe ye û “Ji ber ku mirov bi zimanên ji hev cuda diaxivin, werger heye” (Riceoeur, 2008: 20) û bi wergerê re, zimanekî dîn jî tev li zimanên dîtir dibe û di biwareke sêyemîn de heyî dibe.

Werger; wekî çalakiyêke wêjeyî û wekî dîsîplîneke serbixwe, pêwendîya xwe bi gelemşeya ‘hebûnê’ ve heye ku hem keysa axaftina derbar du zimanan de dide hem jî dike ku em mesafe û dûrahiya di navbera du çand û zimanên de heyî, ku ‘ji hev cihê’ ne, pê bihisin. Ev reng pêhisîn, dike ku mirov ranêzikiyêke saz bikin ji bo ‘nêzikbûna çanda cuda’; loma jî, ji ber ku “Jihevcihêtiya çandî, awayên zanavan dide ber pirsyaran û tiştên ji hev cihê bi bîr dixê û bervekirî ye ji bo şîrove û wergera çandî” (Bhabha, 2016: 299), bi rêya wergerê, digel danîna pêwendîya du zimanan, şîroveyekê çandî jî tê kirin; û her berhema ku tê wergerandin di heman demê de tê şîrovekirin jî. Di vê şîroveyê de, du war, du ziman û du dinyabînî bi hev digihin ku her du jî pala xwe didin ‘jihevcihêtiya zanavan’ ku bi rêya ziman (û pê re jî çandan) xuyanî dibe; û “Ziman, dinyaya nedîtî û nebihîstî ya ku biyanî ye, dixê nava xwe û pê re jî xwazeke nûtir çêdike” (Burke û Hsia, 2010: 117) ku ev xwaz; ziman, çand û dinyaya zanav û takekesê dîtir ku ‘jê cihê’ ye, dike warekî gihînbar. Her wiha, ji awirekî berevajiyê ve, deq û berhema ku tê wergerandin jî, bi rêya wergerandinê, digihîje çand, ziman û dinyaya ku lê hatiye wergerandin û gava “deqek tê wergerandin, ji çanda ku jê afiriye, (ve)diqete û di şûn û şûngeheke nû de tê cîbicîkirin” (Burke û Hsia, 2010: 117). Her du çand û ziman, bi taybetî bi rêya wergerandina wêjeyî, di dinyayêke dîtir û nûtir de digihîjin hev ku ew jî wergera wêjeyî ye ku dibe rêya biwara sêyemîn ji bo hebûniya zanavan.

Hebûniyêke bi vî rengî, di heman demê de “bi navçîtiya zimên, demajoya binelîkirina çanda ‘jê cihê’” (Ertürk, 2018: 81) dide destpêkirin; û ji ber ku hêmanên biyan û ‘jê cihê’, yên çanda dîtir, dikevin nav çand û zimanê armanc, ev yek bi xwe re rewşêke ‘nebanker’ jî dafirîne. Ji ber hindê jî, takekesên zimanê armanc yê binelî, dûçarî ‘biyanî’tiyêke dibin ku ev yek jî ji xwezaya zimanê wan re çep û vajî ye. Dibe ku ev çepbûn bibe sedema neyîniyêke jî û hêmanên neyînî jî bibin sedem ku endamên çand û zimanê binelî têkevin nav pêjnkirineke redkirin û neyînkirinê. Lê belê demajoya vî

hestê neyînkirinê, zêde ne kartêker e; 1) ji ber ku hêmanên di zimanê biyan de, zêde ne diyarker in û ji ber ku pir beloq in, kartêka wan jî di nav dûrahiya ku di navbera her du zimanan de heye qels dibe, 2) ji ber ku “Tiştên ku jêderka çandê di xwe de dihevin, hêmanên zimanî, lêzimî û aborî ne” (Strauss, 2016: 129) û ji ber ku ev hêman çand û zimanê binelî xuyanîtir û serwertir dikin, demajoya lêbanîna takekesê ku endamê zimanê armanc e, zêde ne dirêj e û 3) ji ber ku giyanê zimanê armanc û binelî, nasyariyekê dide takekesê ku endamê wî ye û ji ber ku “Tiştêkî bi navê naveroka zimên tune ye û ziman bi awayekî jixweberê, her tiştê ku hinêrbar e, dihinêre” (Benjamin, 2001: 172) hestê ‘biyanîbûnê’ zêde nadome.

Lê belê, digel vê jî “Pênaseya ‘jihevbiyanîbûna zimanan’ ya Walter Benjamîn, ji bo pênasekirin û watedarkirinê dibe hoy û merceke çandî ya jênager” (Bhabha, 2016: 61) û pênasekirin û watedarkirin jî dimîne ji behredariya wergêr re. Herçî wergêr e, di ‘nebankerî’ya wergerandinê de hay jê heye ku ‘tiştên ku tên ziman, ew tişt in ku li zimên tên wergerandin’ (Uygur, 2003: 38) û loma jî wekî pêşqebûlekê li pêşberî ‘hêmanên berxwedêr yên di demajoya veguherînê de’⁴⁹ rêzgir e û her hevokerê wergerê bêyî ku ‘tiştên biyan yên zimanê jêderk’ tune bihesibîne û ‘nebankirinê’ bindoşek bike, bi hayjêbûna ‘durehî’ya xwe, bi kêrî çand û zimanê binelî û armanc tîne. Ev yek jî, di çalakiya wergerandinê de ku biwareke sêyemîn ava dike, ji bo takekesê ku bindest e û zimanê wî hatiye ‘cewêlekkin’; qebûlkin û hayjêhebûnê bi xwe re çêdike û dike ku li ser çalakiya jiyanî û praxisê ‘durehiyê berevajîker’ li dar bikeve. Ev awa çalakgeriya wêjeyî, rê li ber wan hêman û hincetan digire ku dê mirovê bindest û marastî bikin ‘dike’yê zimanê jêderkî; û digel hemû awayên çalakgerî û praxisê, di çarçoveya hebûniya her du zimanan de, zimanê takekesê ku ‘durehî’ ye û zimanê ku ketiye rewşa ‘cewêlekî’yê, di şûngeha sêyemîn ya ‘hebûna kirdeyî’ de bikeve dike.

4.2.3.1 Wekî Bizava Wergerê: Jiyana Rewşen

Wergera zimanî û wêjeyî ji bo wêjeya Kurmancî ne xwedî ezmûneyeke xurt e û çalakiyê nû ye. Her çend, Feqiyê Teyran Şêxê Sen’anî, Bersîsê Abid wekî menzûme û li ser rêbaz û cureyê wergera serbest anîne ser çand û zimanê Kurmancî jî, vê yekê wekî kevneşopeke wergerê nedomandiye. Heke em ji roja îroyîn de li wê rojê binêrin û

⁴⁹ Ev têgih, ya Walter Benjamîn e ku vê hêmanê wekî “hêmana ku di wergerandinekê de destûra wergerandina xwe nade” pênase dike. (Benjamin, Walter (1968) *Illuminations*, (Translated. H. Zohn), New York: Shoken Books, 75

qaydeya ‘wergera serbest’ an jî lêanînê (adaptation) li menzûmeyên Şêxê Sen’anî, Bersîsê Abid bisepînin, em ê karibin bêjin; çendî ku pêwîstî bi lêkolaneke hûrgerî heye jî, ihtîmal û dibetiyek heye ku lêanîn û wergerandina serbest ya menzûmeyên Şêxê Sen’anî, Bersîsê Abid wergerandinên yekem bin di Kurmancî de. Digel vê yekê, Ehmedê Xanî, bi ferhenga xwe ya bi navê Nûbihara Biçûkan ku duzimanî (Erebî-Kurdiya Kurmancî) ye li xwe kiriye armanc ku zimanê Erebî hînî zarokên Kurdan bike û bi vî rengî, bi awayekî ji awayan çalakgeriya wergerandinê li dar xistiye û berginda wateya peyvên Erebî bi Kurdiya Kurmancî di ferhenga xwe de nivîsîne. Heke ferhengsazî xebat û çalakgeriyeke zimanî be, em dikarin bêjin; ji ber rêbaz û duzimaniya wê, ferhenga Nûbihara Biçûkan, yekem çalakgeriya wergera zimanî ye di Kurmancî de. Her wiha, em dikarin wergera “Hewar û Fîzar Misilmanî” (Modanî, X., 2002: 70) ya Modanî X. (Xelîl Xeyalî) ku; bêtî ku diyar bike ka helbest ya kê ye û ji kîjan zimanî hatiye wergerandin, helbesta Mehmet Akif (Ersoy) wergerandiye Kurdî jî, wekî wergera yekem ya Kurmancî ya wêjeya modern diyar bikin.”⁵⁰ Digel vê yekê, wergerên ku ji zimanê Fransî li ser rêbaza adaptasyonê (adaptaiton) di kovara Hawarê hatine kirin jî, di rengê wergerandina serbest de ne û çîrokên Fransî li çand û giyanê Kurmancî hatine anîn. Wekî me diyar kiribû, di kovara Tîrêjê de jî, tu nivîseke wergerê ya bi Kurmancî nehatiye weşandin. Herçî kovara Rewşenê ye, hejmareke hêja nivîsên bo Kurmancî wergerandî hatine weşandin ku der barê zimên, polîtîka, sosyolojî û hunerî de ne. Ji ber ku ev werger li ser armanc û pêwîstiya kartêka fêrgehbûnê, avakarî û danandina zanava neteweyî ya di ser zimên re hatine kirin, awa û cureyên wergerên di kovara Rewşenê de hatine kirin, pê nehatine ser da ku kovar ji bo wêjeya bi Kurmancî, bibe şûngeha sêyemîn.

Ji bo wêjeya Kurmancî, şûngeha sêyemîn Kovara Jiyana Rewşenê ye. Çendî ku kovarê bi taybetî diyar nekiriye ka di çalakiya wergerandinê de rêyeke çawa bide ber ziman û wêjeya Kurmancî jî, hê di hejmara xwe ya yekem de nîşaneyan dide der ku kovar dê bibe pêngav û bizaveke wergerê. Digel her du hejmarên taybet, bi giştî pêncî û du (52) hejmaran de, ji zimanên wekî Tirkî, Farisî, Erebî, Îngilîzî, Fransî, Swêdî û di serî de helbest, di warên dîtir yên wêjeyî de deq bo Kurmancî tên wergerandin.

⁵⁰ Navê helbesta M. Akif (Ersoy), “Müslümanlık Nerede” ye. (Ersoy, Mehmed Akif (2010) *Safahat*, (Neşre Hazırlayan: M. Ertuğrul Düzdağ), Ankara: TDV Yayınları, birinci basım

Çalakgeriya wergerandinê ya di kovara Jiyana Rewşenê de li dar ketî, di biwara wergerê de, bizaveke ‘veavakirina jihevcihêtiyê’ ye. Hewldanên ku di biwara zimên û zanav neteweyî ya di Rewşenê de hatî dayîn, beşek derçûyiyên taybet afirand ji fêrgeha xwe. Ew derçûyiyên fêrgehê, beşek ji takekesên Kurd ya ji nifşa sêyem bûn û pêwendiya wan hindik be jî bi nifşa duyem re hebû û berendama mînakbûnê bûn bo nifşa çarem. Yanî ew derçûyî, yên endamên nifşa sêyem, ku lingekî wan di nav behra nifşa duyem lingekî wan di nav çala nifşa çarem de bû; birîndarên giran yên diranokên çerxa asîmîlasyonê bûn. Aliyekî endamên nifşa sêyem mabû wekî xwe, aliyekî wan ketibû ber demajoya lixwenebanbûnê û aliyekî wan jî berpêyî dinyayên dîtir bûn ku ‘hebûniya’ zimanên dîtir tê de diheviyan.

Kovara Jiyana Rewşenê, di nav vê pirrengiyê de, ji bo ku ‘jihevcihêtiya çanda Kurdî’ xuyanî bike, dide ser rêya ku berpêyî biwara wergerê diçe. Di vê rêwîtiyê de, gava yekem, bivê nevê berpêyî zimanê Tirkî ye. Ji hejmara yekem heta bi hejmara 7em hemû nivîs ji zimanê Tirkî bo Kurmancî hatine wergerandin.⁵¹ Pêwîst e em balê bibin serê û bêjin nivîsarên Tirkî yên bo Kurmancî hatine wergerandin, hemû jî nivîsarên nivîskarên Kurdan in ku bi zimanê Tirkî hatine nivîsîn. Çawa ku kovarê di nivîsa xwe ya sergotariyê ya hejmara yekem de diyar kiribû û gotibû “Ji ber ku hin nivîskarên me bi zimanê kurdî nizanin, emê di çend hejmarên pêşîn de bi zimanê tirkî jî nivîsan biweşînin” (Jiyana Rewşen, 1996: 4, hej 1) nivîsarên Tirkî yên ku bo Kurdî nehatine wergerandin jî, yên nivîskarên ji neteweya Tirk in. Ev awa praxisa (çalakiya jiyanî), bi me dide nîşan ku; 1) hewldana wergerandina nivîsarên Tirkî bo Kurdî yên nivîskarên Kurd, nîşaneyê doz û xwaza ‘lêvegerînê’ dide der, 2) û digel vê lêvegerîna ku berdibetî ye (îhtîmal e), ev awa helwêsta wergerandinê, di heman demê de têxebitîn û daxwaza başkirin û kewandina birînan e ku ji ber çerxa asîmîlasyonê çêbûne, 3) pê re jî hewldana nîşandana ‘jihevcihêtiya çanda Kurdî’ û ‘têrdariya zimanê Kurdî’ ye ku bêjara serdestiya K.T.yê ya li ser polîtîkaya asîmîlasyonê hatî danandin, pûç û berçoder dike.

Çalakiya wergerandinê ku serê pêşîn hewlê dide nivîsa nivîskarên Kurd wergerîne ser Kurdî, rewşeke taybet bo Kurdî çêdike. Ev awa çalakgerî, di çarçoveya ‘jihevcihêtiya çandan’ de, ji bo Kurdiya di rewşa ‘cewêlekiyê’ hatiye xistin, ‘qadeke navberî’yê çêdike. Bi vî rengî, çanda Kurdî jî bi rêya zimanê Kurdî, dikeve nav wê

⁵¹ Ji hejmara 7an û şûnde jî, nivîsarên hunerî û wêjeyî yên ji cureyê helbest, çîrok, danasîna berheman û portre, ji zimanê Tirkî hatine wergerandin.

‘qada navberî’ yê û rewşa wê ya hindikaniyê rengê “çalakiya ‘naywergerandiniya çandê’ dilkêştir dike û bi vî awayî dabaşa binelîkirina çandê ku kabûsa serdestê asîmîleker û nijadperest e, di wêdetirê veguhastinê de bi cî dike” (Bhabha, 2016: 399). Loma jî, çalakiya wergerandina deqên Tirkî ya bo Kurdî, di heman demê de, bêjara K.T.yê ya ku zimanê Kurdî hem dike malê xwe hem jî dike malê zimanên dîtir, tan dide ‘wêdetirê veguhastinê’ û li ser hebûniya zimanê Kurdî ‘jihevcihêtiya çandan’ xuyanî û destnîşan dike û di biwara çand û zimanî de demajoyeke ‘durehiya ku fermîbûnê berevajî dike’ dide destpêkirin.

Çalakiya wergerandinê ya bi vî şêweyî, digel ku ziman li xwe dike kutek û stûna esasî, wergera çandî jî lê dike bingeş. Di demajoya wergerandinê de jî, rengûawayê çanda neteweya bindest xuyanîtir dike ku ji alî pêkanînên mêtîngeriyê ve hewla binaxkirina wê hatiye dayîn. Loma jî, wergera çandî, xwe dispêre ‘hêmanên berxwedêr’ yê çanda binelî û di demajoya wergerandina ji zimanê serdestê mêtînger de wan hêmanên xwe derax dike û car din dide ber ‘tava vejînê’. Her ku ew hêman ji tava vejînê dixwin, vedixwin û diperesin, çanda binelî ya neteweya bindest di wergera çandî de, “Hemû pîroziya rawêjên ku li ser nîv-zîlaliya serweriya çandî hatine danîn, berçoder dike” (Bhabha, 2016: 399). Bi çalakiya wergerandinê ya bi vî rengûawayê, çanda Kurdî ya binaxkirî û zimanê Kurdî yê cewêlekîrî doz û daxwaza ‘ez ji çand û zimanên din cihê me’ dike û di vê doza hanê de, bi bikaranîna rêbaza xwe ya wergerandinê angaştî ku pîrozbûna serweriya çand û zimanê Tirkî yê serdest dike, pûç dike. Rêbaza Binelîkirinê ku “Bi gotîneke din ‘jixwebiyankirina bi rêya wergera çandî’ ye” (Burke û Hsia, 2010: 89) ku wekî çalakiya wergera çandî û zimanî di kovara Jiyana Rewşenê de tê lidarxistin, di heman demê de neyînkirina ‘ziman û wêjeya mînor’ e jî. Ev neyînkirin dike ku hemû deriyên çanda binelî û resen li endamên xwe vebibe û deriyên çanda ‘biyanî’ di wêdeyê hebûniyê de bê aşopkirin û sêwirandin; û çand û zimanê Kurdî, êdî bi temamî bibe pênaseker û diyarkerên zanava Kurdî ya neteweyî.

Ji ber vê çendê ye ku ji Hawarê heta bi kovara Jiyana Rewşenê, ziman diyarker e û vê diyarkeriyê; digel bizav û çalakgeriya wergerandinê ya di kovara Jiyana Rewşenê de hatî lidarxistin, ‘durehiya berevajîker’ jî pêk aniye ku serdestê mêtînger ji eyara xwe derdixîne û çalakiya wergerandinê; di hejmara heftan ya kovarê de, bi wergerandina du helbestên bi navê ‘LIHEVBÛN’ û ‘ALBATROS’ (Jiyana Rewşen, 1997: 43, hej, 7) yê helbestkarê Fransî Charles Baudelaire, berê xwe daye ‘qada hebûniya dinyayê.’ Her du

helbest jî, li ser du awayên pêkhatina berxwedanê hatiye wergerandin ku wergêr “zorê dide ser zimanê xwe ji bo ku hêmanên biyan qebûl bike” û “zorê dide ser zimanê biyanî ji bo ku barê xwe dayne hundirê zimanê armanc” (Raguhastin: Riceoeur, 2008: 14). Di helbesta ‘Lihevûn’ê de, ristên “*Xweza perestgehek e ku tê de sitûnên zindî/Vedengine biyanî didin car caran/Mirov dibore li wir di nav daristanên sembolan/Ku wî temaşe dikin bi çavî nas*” û di helbesta ‘ALBATROS’ê de jî, ristên “*Gelek carî, ji bo xwe re şa bibin keştîvan/Albatrosan digirin teyrên beharan yên ecêb/Ku didin pê, xemsarên li kêleka kerwên,/Keştiya li ser ava şor dişemite*” bi peyvên, wekî ‘vedengine biyanî’, ‘daristanên sembolan’ ‘Albatrosan digirin’ û ‘Keştiya ku li ser ava şor dişemite’ nîşan dikin ku Kurmancî bi zimanekî biyan re ketiye nav pêwendiyê û hevok û gotinên hatine bikaranîn, ji awayê bikaranîna Kurmanciya adetî û rojane dûr e; û hestekî ‘jêbiyanîbûn’ê çêdike bi mirov re.

Wergera nivîsa bi navê “PEYKERÊN VICTOR HUGO” (Jiyana Rewşen, 1997: 43, hej 8) ku ji zimanê Îngilîzî hatiye kirin, mînak e ji bo ‘binelîkirina zimanê huner û agahiya li ser hunerê’ ku tê de hevokên wekî “di vê navê de du komikên peykeran û gelek pêşnûma û berhemên netamambûyî ku nayê hejmartin derket holê” û “Nasname û kesayetiyên xudawên hunerên bedew diguhere” ci digirin; ji bilî Kurdiya rojane, di asta agahiya hunerî û zanista hunerî de tê bikaranîn; û dibin berdibetî ji bo ku zimanê Kurdî yê ‘cewêlekîrî’ ji pêbendiya Tirkî xelas bibe.

Wergera kurteçîrokên bi navê “KÛÇIKÊ BIAQL”, “RÊVÎ”, “DU QEFES” (Jiyana Rewşen, 1999: 17, hej 26) ku ji zimanê Îngilîzî hatine kirin, di warê hîlbijartina cureyê deq û teksta ku dê bo Kurmancî bê wergerandin de, balê dibe ser xwe; ji ber ku zimanê kurteçîrokan zimanekî lêder e ku bi hevokên kurt lê bi wateyên zêde û kûr tî. Loma jî çalakiya wergerandinê, ji bilî zimên, pêwîstî bi wergera çandî jî dibîne. Wergera her sê kurteçîrokan ku bi sernavê ‘DÎN (THE MADMAN)’ hatiye weşandin, hevokên kurteçîroka RÊVÎ yên “Rêviyekî di ronkaya sibehê de, li siya xwe nerî û got, “Îro ezê di firavîna de logekî bixwim.” Û heta ber nîvro li logekî geriya. Lê nîvro dîsa çav li siya xwe ket —û got, “Mişkek besî min e.” û hevokên kurteçîroka DU QEFES yên “Li nav baxçê bavê min, du qefes hene. Di yekê de şêrek, ku xulamtiya bavê min li çola Nînvî girtibûn; di ya din de jî serçeyek bêawaz. Her sibe serçe bangî şêr dikir û digot, “Sibe te bi xêr, birayê girtî.” bi me didin nîşan ku zimanê Kurdî ya Kurmancî, xwedî wê

şîyan û behreyê ye ku dikare di dinyaya vegêrana zimanekî dîtir de jî cî bide xwe û hebûniya xwe xuyanî bike.

Wergera helbesta bi navê ‘lyric’ (Jiyana Rewşen, 2000: 32, hej 41) ku ji zimanê Îngilîzî hatiye wergerandin, bi ristên wekî “Xaniyê tarî, dîsa ew der/di kolana kirêt û dirêj de/ez, li hember disekim/Destekî kîpkirî bê poşmanî/min biparêze, lew re nema/dikarim rakevim,/û mîna tawanbarekî/dizî ve di sibeha zû dikişim/ber bi sîloyê” bi giştî Kurmanciya rojane û ya pêaxaftinê bi bîra me dixê ku em dikarin bêjin, bi wergerandina bi zimanekî bi vî rengî ku çandî ye jî, Kurmancî careke din jî ‘binelî’ dibe û di heman demê de jî wekî lêvegerînekê silavê li helbesta ‘Bilûra Min’ ya C. A. Bedir-Xan dike ku peyva Kurdiya Kurmancî ya rojane û pêaxaftinê derxist asta raser ya wêjeyî û helbest ji nîrê nivîsîn û xwepêşanîdanê filitî û jê û şûnde helbest, ‘mîna ku bêje’, hat nivîsîn.

Kovara Jiyana Rewşenê, bi çalakgeriya xwe ya wergerandinê ve, di biwara ‘heyîbûna di dinyaya zimanên din’ de, bi girîngîpêdana wêjeyî û bi weşandina wergerên di biwara hunerî û wêjeyî de, serê pêşîn bûye ew qad ku zimanê Kurdî û Kurmancî; ji benda ku wekî “naywergerandiniya pêşî, naywergerandiniya ku ji gava destpêkê ye” (Riceoeur, 2008: 41) tê pênasekirin derbas kiriye û pê re jî hem pêwendî bi ‘*hêmanên xwe yên berxwedêr*’ hem jî bi ‘*hêmanên berxwedêr yên zimanên din*’ re daniye û kiriye ku bi awayekî beranberî, di qad û dinyaya hev de bi cî bibin û di warê wergêriyê de jî destnîşankirina Paul de Man ku dibêje “Karê wergêriyê nemimkuniyek e, têkçûnek e. Loma jî wergêr mecbûr e ku dev ji vekifşkirina tiştê ku jixwe li wir e, berde” (Raguhaştin: Chambers, 2014: 55) bûye warê şikandina ‘nemimkuniyê’ û serketina li pêşberî ‘têkçûnê’ û bi wergerandinên ku xwedî hemû awayên çalakgerî û praxisê ye, di çarçoveya hebûniya dinyaya du zimanan de, zimanê takekesê ku ‘durehî’ ye û zimanê neteweyekê ye ku ketiye rewşa ‘cewêlekî’yê, di şûngeha sêyemîn ya ‘hebûna kirdeyî’ de car din heyî dike; hêmanên ‘binelî’ di deqên wergerandî de bi keys dike û wekî bizava wergerê dibe şûngeha sêyemîn.

4.2.4 Nav û Nasnava Nivîskarên Jiyana Rewşenê

Nivîskarên kovara Jiyana Rewşenê, di nivîsên xwe de, nav û nasnavên xwe bi awayên wekî: 1) Navê fermî yê di nifûsê yê dewleta K.T.yê de qeydkirî û bi tîp û elfabeya zimanê Tirkî bi kar aniye. Wekî; A. Rahman Çelik, Abbas Alkan, Abdullah Ertan, Ayten Çağan, Cemil Denli, Cemil Oğuz, Deniz Gündüz, Derya Dağlı, Düzgün

Deniz, Emin Bozan, Esmâ Eksen, Fatma Savcı, Gülay Ersoy, Halime Kurt, Hüseyin Kaytan, İbrahim (Seydo) Aydoğan, İkrâm İşler, İlhamî Özer, Kemal Orgun, M. Zahir Kayan, Medenî Ayhan, Melahat Akay, Mehmet Esen, Murat Batği, Mustafa Borak, Necat Ayaz, Nihat Çelik, Nijad Yaruk, Rıdvan Karaaslan, Şermin Aygören, Talip Kalın.

2) Navên adetî yên ji cî û warên ku lê ji dayika xwe re bûne an jî jê hatine an jî navê eşîr û bavikên xwe wekî nasnav bi kar aniye. Wekî; Beşîr Botanî, Bro Omerî, Celîlê Celîl, Derwêş M. Ferho, Ehmedê Neco, Girê Dêrsilê, Miraz Pîranî, Osman(ê) Mehmed, Medenî Ferho, Mûsa Vazgalî, Rizoyê Xerzî, Seîd Karesî, Helîm Yûsiv, Şêxmûs Sefer, Yeqîn Şemrexî, Zana Farqînî.

3) Nivîskaran nasnavên xwe tevlihev bi kar anîne; navê xwe yê fermî ku bi Erebi, Farisî û Kurdî ye, wekî awayê bilêvkin û nivîsîna bi Kurdî bi kar anîne û paşnavê xwe li ser qaydeya navlêkirina Kurdî guherandine. Wekî; Dilawer (Dîlaver-Dîlawer) Zeraq, Ehmed Huseynî, Evdile Koçer, H. Kovan Baqî (Hamdullah Baqî), Hesên Zinar, Îrfan Amîda, Miraz Ronî, Mîrza Samed, Remezan Alan, Serhat Hemdem, Samî Berbang, Salihê Kevirbirî, Samî Hêzil, Şengül Pak, Xecê Perîzad, Yaqob Tilermenî, Zelal Mûnzûr.

4) Nivîskaran navekî taybet ku amaje bi Kurdbûna wan dike, ji xwe re bijartine û wekî nasnav bi kar aniye. Wekî; Adar Jîyan, Arjen Arî, Asmîn Ararat, Bamed Serdar, Berhîm Paşa, Berken Bereh, Bêrî Bihar, Bêwar Îbrahîm, Cîhan Roj, Çiya Mazî, Dost Çiyayî, Gabar Çiyan, Jan Dost, Jana Seyda, Jîr Dîlovan, Konê Reş, Kawa Nemir, Kejo Bajar, Lal Laleş, Mem Bawer, Pîr Rûstem, Rênas Jîyan, Rêzan tovjîn, Rizoyê Xerzî, Rodî Zerya, Roşan Lezgîn, Serkan Birûsk, Serkeft Botan, Rojîn Xewn.

5) Nivîskaran navê xwe wekî yê fermî hiştine lê belê paşnavê xwe li gorî bilêvkin û qaydeya Kurdî guherandine. Wekî; Ayhan Meretowar, Cemîl Andok, Harbî Soylû, Medenî Ayhan, Mehmet Dicle, Yıldız Çakar.

Tevî ku nivîskarên kovara Jiyana Rewşenê, her wekî nivîskarên kovara Rewşenê, nav û nasnavên pircure bi kar anîne jî, gava em xweşîkî bala xwe dibîne serê, em vê pircureyiya xwehişberiyê dibînin; beşek ji nivîskaran tercîha pêwendiya bi qanûnîbûnê û bi navê xwe yê fermî mane; beşên mayî jî, bi awayekî zelal cihê xistine navbera zimanan, -bi taybetî cihê xistina navbera zimanê Tirkî û Kurdî- û di ser vê cihê xistinê re; rabûneke dij-asîmîlasyonîst nîşan dane û bi tercîha xwedûrxistina ji hemû awayên navên fermî û alfabeya Tirkî, ketine nav hewldana jinûvehilberandina zanava neteweyî û bi helwêsteke dij-mêtinger(î), pêkanînen ‘wekxwekirin’ û ‘wekîhevkin’ê

neyîn kirine û bi armanca xuyanîkirina ‘jihevcihêtiya çandan’, li ser bingeha ziman xwestine ‘yektabûn’ û ‘wekhevîbûna’ zanava neteweyî ya Kurd bidin der.

4.3 Rewşen-Name

Kovara Rewşen-Name, her wekî kovarên Rewşen û Jiyana Rewşen, di Adara sala 2003yan de, ji alî NÇMyê ve tê weşandin.⁵² Di kunyeya kovarê de tê nivîsîn; Kovara Wêjeyî, Çandî û Hunerî, Kovara Mehane (Aylîk Dergi). Her wiha, wekî berpirsiyarê Nivîsaran Mehmet Mehmetoğlu û wekî edîtorê kovarê jî Kawa Nemir û navên; Şefîk Beyaz, Davûd Özalp, Kawa Nemir, Mehdi Tanrikûlû, Mehmet Dicle, Şevîn Gulşenî wekî desteya weşanê tê diyarkirin. Kovara Rewşen-Name bi tevayî sê (3) hejmar derdîçe û her wekî kovarên Rewşen û Jiyana Rewşen ku pêşrewên wê ne, bêtî ku sedem bê diyarkirin, weşana xwe radiwestîne.

Di nivîsa sergotariyê ya hejmara yekem ya Rewşen-Nameyê de tê gotin, “Sala 2001’ê, (...) me navber dabû weşana xwe. (...) hişt ku devîdevî du salên bêtî kelepûra me ya bi navê **Rewşen û Jiyana Rewşenê** derbas bibin” (Rewşen-Name, 2003: 3) û em bi van gotinan fam dikin ku kovara Rewşen-Nameyê li ser bingeh û peyrewiya kelepûr û tradîsyona van her du kovarên navborî tê weşandin; û di vê peyrewiyê de, her wekî kovarên Rewşen û Jiyana Rewşenê, kovara Rewşen-Nameyê jî çand, ziman û hunera Kurdî li xwe dike armanc ku di berdewama nivîsarê de tê gotin, “...em doza xwe ya bipêşvebirina hemû şax û şovên zimanê kurdî, kelepûra wêjeya xwe û pêvejoyên çanda xwe eşkere bikin” û bi van gotinan jî bal tê kişandin ser çand, huner û zimanê kurdî. Digel vê yekê jî, piştî ku bi hevokên wekî, “Tevî hemû êrîşên ku bi destên bêtar, dirrinde û cinawirên pergala dagirkeran tên kirin” balpêdaneke kurt li ser rewşa siyasî û bindestiya neteweya Kurd tê kirin, di pêdeçûnê de, hevoka “ev saziya *ramana kurdûna nû* û *nûneriya mirovahiyê* ava dibe” berê me dide alî helwêsta dij-mêtinger û dij-asîmîlasyonîst ku bi hevoka “di gorapana wêje, huner û çandê de cerdê bi ser kurdan de tînin” destnîşan dike ku dê kovara Rewşen-Nameyê ne tenê xwedîtî lê bike, di heman demê de dê bibe şûngeha vê helwêsta dij-mêtinger û bipêşvebirina çand û wêjeya Kurdî ku bi zimanê xwe zanava neteweyî dinimîne.

⁵² Her çend di kunyeya kovarê de navê NÇM nayê nivîsîn jî, em ji nivîsara sergotariyê fam dikin ku kovara ji alî vê sazîyê ve tê weşandin.

Kovara Rewşen-Nameyê di berdewama nivîsara sergotariyê de, ji bo nivîskar û hunermendên neteweya ku bindest e û tê marastin, hin pêşniyazan tîne. Gava vê yekê dike, bi hevoka “Kesên ku ew qas bi dilsafî bifikirin ku huner, wêje û siyaset tu car nabin yek tişt, dê her tim hebin” pêşî balpêdaneke dike ji bo hayjêbûnê ku bêjara mêtîngeriye bi bêjarên ku saz dike “Desthilat û agahiyê tim û tim pev dixe” (Çelebi, 2000: 512) û piştî jî balê dikişîne ser agahiya ku serdestiya mêtînger hildiberîne û ew agahî misêwa bandorên desthilatê berbelavtir û berfirehtir dike. Angaştî ku bi gotina *wêje û huner divê ji siyasetê dûr bibin* tê kirin jî yek ji bêjara sereke ya desthilat û mêtîngeriye ye ku “...rewşenbîr gava dest bi afirandina berhemeke hunerî dike, hay jê çênabe ziman û teknîka ku ji mêtîngerê xwe deyn girtiye bi kar tîne û ew ziman jî bi kêrî mêtînger tê” (Fanon, 2007: 217). Desthilata mêtîngeriye tim û tim di nav hewldanê de ye da ku xwendeyên neteweya bindest ji nîrx û afirandên komên xelkê dûr bike. Loma jî di pêdeçûna nivîsara sergotariyê ya Rewşen-Nameyê de tê gotin, “...teqez cureyek îdeolojî û bîr û baweriyê heye ku serdestî her kesekî/ê wê civakê ye” û bi balpêdaneke pêhisandinî ku gotina Fanon ya “Rewşenbîrê mêtîngehê ku bi berhemên xwe yên hunerî li gelê xwe vedigere, di rastiya xwe de biyanek e” (Fanon, 2007: 217) bi bîr tîne û bi vê balpêdanê tê xwestin ku bila wêjekar û hunermend li neteweya xwe ‘neban’ nebin. Di dawîya nivîsara sergotariyê de bi gotinên “Em bi navê **Rewşen-Name**, bi rêveçûna dirêj ber bi we ve hatin. Bi banga Guhîran, Hê Bêtir Guhîran û Veguhîran!” (Rewşen-Name, 2003: 4) banga guherîneke hîmî û ji rehê ve tê kirin ku dê bibe eger û kartêka bipêşveçûneke radîkal jî ku “...guhîrîna radîkal ancax dikare ji alî tiştê ku divêtiya wê dide nîşandan ve were kelkdarkirin” (Eagleton û yên din, 1993: 37-38) û kelka jê hatî girtin bibe hêza esasî û likarxist ya bipêşveçûnê.

Di her sê (3) hejmarên kovara Rewşen-Nameyê de, nivîsarên ku raman û helwêsta kovarê aşkera dikin hatine weşandin. Lê belê, ji ber ku kovara Rewşen-Nameyê, her wekî kovara Jiyana Rewşenê bipêşvebirina wêje û hunera Kurdî li xwe dike armanca sereke, herî zêde nivîsarên di vî warî de di rûpelên kovarê de cî dane xwe. Herçî wekî hejmar e, li gorî statistîka me çêkirî, xuya dike ku dîsa herî zêde helbest hatine weşandin. Lê belê, bêtir ku em hûrgeriye lê bikin, em dibînin ku nivîsarên wergerandî ne kêmtir helbestan in ku; her wekî di nivîsara bi nave ‘Çima Rewşen-name’yê de tê diyarkirin, werger yek ji armanca sereke ya kovara Rewşen-Nameyê ye.

4.3.1 Eger û Armanca Derçûna Rewşen-Nameyê

Kovara Rewşen-Nameyê, eger û armanca xwe ya derçûnê, bi nivîsa bi navê ‘Çima Rewşen-name’ (Rewşen-Name, 2003: 4-5) aşkera kiriye. Nivîsar, bi çarçoveyeke berfireh dadixuyîne ku dê bipêşvebirina wêje, -pê re jî zimanê ku tê de di hewe û wêjeyê heyî dike- û hunerê bibin egerên sereke yên weşanê. Hevoka ku dibêje, “Di pêvajoya pêkhatina kesayetî û neteweyan de, di hemû dem û serdeman de, huner û wêjeyê her tim rol û ciyekî xwe yê sereke hebûye” rasterast amaje bi zanava neteweyî dike. Ev amajepêkirin xwe dispêre hewldan û praxisa kovara Rewşenê ku di ser zimên re pênasaya zanava neteweyî dihat kirin; û çalakgeriya tê de ya ku ji bo binavkirin û xelaskirina zimanê Kurdî li dar ketibû. Nivîsarê, di pey re bi sazkirina hevoka “Pênûs bi wî awayî bûye temînata jiyana hestên hevpar û piştî demekê jî, bûye afirînera neteweyekê” balpêdanê bo hestên hevpar yên neteweyekê dike ku “...hêmanên wekî ol, ziman û borîroja hevpar; takekes û neteweyê ji “ên dî” cihê dike; di heman demê de, wan bi hev ve jî girê dide” (Özkırımlı, 1999: 87). Bihevvegirêdana ketî behsê, hem kar hem jî kartêka pênûsê ye ku hema di pey re tê gotin “ji ber ku nivîs gihişt asteke bilindtir, estetîze bû, bi dû re nivîsa awarte, ango wêje derket holê.” (Özkırımlı, 1999: 87) Bi vê destnîşankirinê, êdî em xweşîkî pê dizanin ku, kovara Rewşen-Nameyê, wekî derçûya ji fêrgeha zimanî ya Rewşenê û ji pratîka wêjeyî û wergerî ya Jiyana Rewşenê, daye ber xwe û li xwe kiriye armanc ku zimanê Kurdî û bi taybetî Kurmancî, bigihîne asteke rasertir û di bilindciya wêjeyê de cî bi cî bike. Ji bo vê yekê jî, doza hewldaneke wêjeyî tê kirin ku bi hevokên,

“Em jî, wekî kovar pê bawer in ku kurd di warên wêje, felsefe û ramanê de Ronesansekê dijîn û her wiha em xwediyê vê dahkê ne ku em di vê pêvajoya vejîn û hişyariya giyanî de nebin dûvik, bibin ekola zimanekî hevgirtî, bi kar û berhemên xwe xwe bibin bersiva pîrsa ‘Wêjeyeke çawa û wêje, lê ji bo kê?’”⁵³ (Rewşen-Name, 2003: 4, hej 1)

amaje bi şiyarbûneke giştî tê kirin ku; kovarê jî wekî şûngeha bizava vejîn û bersivdanê destnîşan dike û wekî çawa Fanon jî ‘Wêjeyeke têkoşanê’ pêşniyaz dike ku armanca wê “...avakirina hişberiya neteweyî” ye” (2007: 192). Kovara Rewşen-

⁵³ Me sererastkirin li ser nivîsarên di kovarê de hatine weşandin, pêk neanî.

Nameyê, bi vê balpêdanê bi zelalî aşkera dike ku kartêk û aktorên vê hewldanê nivîskar in ku ew ê bibin bersiva pîrsa ‘*Wêjeyêke çawa û wêje, lê ji bo kê?*’

Ji bo peydekirina bersiva vê pîrsê, di nivîsara ‘Çima Rewşen-name’ yê de pêşî tê destnîşankirin ku Kurd ji ber jihevparçebûna fizîkî bi giştî di bin bandora çanda serdestan de mane û di pey re jî bi gotina, “Kurdan pêşketin û geşedanên xwe yên biçûk negihandine hevûdin, nekarîne bigihînin hevûdin” bal bi wê tiştê tê dayîn ku; kelepûra heyî, ji ber jihevparçebûnê, bi awayekî tevayî û yekgirtî bandorê nake. Ji ber vê çendê jî, vê deravê bandora xwe ya neyînî daniye ser wêjeya Kurdî ku bi hevoka “...herêmîtiya diyardeya wêje, huner û çandê her ji dijmînên koka me qewimiye” çespendinekê tê kirin ku gotina, “Mirovên mêtîngehê tu carî nikarin wekî takekes bîn karakterîzekirin û mafekî wan heye; windabûna di nav kollektîvîteyêke anonîm (nediyar) de” (Memmi, 1996; 88) kartêka mêtîngeriyê ya li ser wêje û hunerê diyar dike ku ji ber jihevparçebûna fizîkî, jihevparçebûneke çandî, zimanî û wêjeyî jî pêk hatiye ku ji bo bêtêkîkirin û jînavêrakirina vê rewşê “...divê rewşenbîrê mêtîngehê, yê ku daye dû reseniya neteweyî, têbigihîje ku heqîqeta neteweyî berî her tiştî rasteqîniya neteweyî ye” (Fanon, 2007: 219). Loma jî kovara Rewşen-Nameyê dide dû peydekirina vê ‘heqîqeta neteweyî’ ku ji alî mêtîngeriyê ve ji xwedîya wê hatiye vedizîn ku; dibe sedem ku ‘gerokên rojavayî di sedsala 20. de dirûvê rewşa skotiyan ya li hemberî îngilîzan bi kurdan dixê?’ (Rewşen-Name, 2003: 5, hej 1) û di vê rêwîtiyê de, bi bixwebaweriyekê tê gotin; “Rewşen-name amade ye ku bibe platforma ronîkirina vê yekê” û pê re jî, bi hişberiyêke kollektîf bi hevoka “Bi piştewaniya hemû nivîskarên me yên ku xebata wêjeyê, hunerê û çandê bi helwesta bîrdozî û polîtîk re wekî diyarde difikirin û bi wê rêbazê diafirînin” daxwaza pevrerêveçûnê ji nivîskar, wêjekar û hunermendan tê kirin ku dê di şûngeha têgihîştina ‘rasteqîniya neteweyî’ de bigihîje hev.

Di berdewamê de, tê diyarkirin û gotin ku “Karê vê rêveçûnê rûxandina wan rastiyên kambax e, ku heya niha wekî tekane rastî li ser me sependine” û bi van hevokan bal tê kişandin ku sedema ‘dermîrovîkirin, asîmîlekirin, bêzanavkirin, durehîkirin û cewêlekîkirin’ê pêkanînê mêtîngeriyê ne ku gava “Gelê mêtîngehê van hemûyan dizane (...) di kêliya ku vê rasteqîniyê kifş dike de, amadekariya têkoşanê dike” (Fanon, 2007: 49). Nivîsarê jî li ser vê çespendina Fanon diçe û dibêje, “Bi tenê (...) em dikarin dînamîkeke xurt ji nasnava xwe re biafirînin. Ev jî bi tenê ji nava me û bi destê me û bi

xurtkirina çanda kurdî diafire”⁵⁴ ku di vê qonaxê de êdî ‘xwehişberiyek’ dabaş e û doz û banga *dekolonîzasyonê* tê kirin. Ji bo pêkanîna vê *dekolonîzasyonê* jî, serê pêşîn bi rexnekirinekê tê gotin “Hûn bi kelepûra zimanê xelkekî, ruhê xelkekî dixuliqîn” bal tê kişandin ser ‘durehiya neyînî’ ku piştî demekê dibe sedem ku mirovên bindest yê tê marastin ‘ruh û çand û ziman û nirxên’ xwe winda bikin û qonaxa asîmîlasyonê di wan de tamam bibe. Loma jî, ji ber ku “Neteweya bindest û endamên wê, di her qonaxê de ku xwaz û xwesteka wan ya jiyanê ‘kel û hesreta hebûniyê û nirxên wan yên hevpar’ li wan germ û geş dibe, car din vedigerin kelepûra xwe” (Assman, 2018: 142) dê ‘ruhê bindest û marastî’ yê takekesê mêtîngeriye yê bindest jî, dê bi *dekolonîzasyonê* vegere ser kelepûra ruh û giyanê xwe yî resen. Di vê qonaxê de jî, digel ku wekî şiverêya vê rêveçûna bi hev re, kelepûr wekî kan û jêderk tê nîşandan jî, bersiva pirsê ‘*Wêjeyê çawa û wêje, lê ji bo kê?*’ bo dem û çalakgerî û praxisa wêjeyî, -bi taybetî bo rexne û wergerê- tê hiştin.

**Statîstîka nivîsarên li ser ziman û wêjeya modern yên
di Rewşen-Nameyê de weşiyayî**

<u>Hejmar</u>	<u>Çîrok</u>	<u>Werger</u>	<u>Helbest</u>	<u>Rexne-Nirxandin</u>
1 (2003)	5	6	14	1
2 "	2	13	16	2
3 "	3	22	10	2
T.G: 3	10	31	40	5

Digel van pêşdehatinên xwe û li ser statîstîka nivîsarên kovara Rewşen-Nameyê, em dikarin bêjin; kovara Rewşen-Nameyê, bi sê hejmarên xwe ve û bi rêjeya nivîsarên ku tê de cî dane xwe û her wekî di pêşgotina hejmara yekem de jî tê gotin “Em bi navê **Rewşen-Name**, bi rêveçûna dirêj ber bi we ve hatin. Bi banga Guhîran, Hê Bêtir Guhîran û Veguhîran!” (Rewşen-Name, 2003: 4) bi awayekî çalakîya wêjeyî, di biwara wergerê de bi pêş de tê ku; 1) livdarîya li ser wergerê di kovara Rewşenê de dest pê kiriye 2) û di kovara Jiyana Rewşenê de teqla bizavbûnê daye xwe 3) digihîjîne asta herî jor û herî xurt û di rûpelên xwe de girîngîyeke hêjayî gotinê cî dide berhemên ji

⁵⁴ Di vê hevokê de, mebest ji peyva ‘nasnav’ê, ne maxlas e, lê belê ‘zanav’ e.

zimanên dîtir wergerandî û her çend sê hejmar weşiyabin jî, ji bo xwederbiran û xweheyîkirina zimanê Kurdî û bi taybetî ji bo zaravaya Kurmancî, dibe şûngeheke dîtir ya bizava wergerê.

4.3.2 Ranêzikiya Wergerê di Rewşen-Nameyê de

Kovara Rewşen-Nameyê, digel ku derçûyiya wê fêrgehê ye ku ji hemû kelepûr û paşxaneyê ziman û wêjeya Kurdî pêk tê, di heman demê de, berdewamiya kovara Rewşen û Jiyana Rewşenê ye jî. Ev yek di hemû war û biwaran de, ji ranêzikiyên zimanî heta bi nêziktêdayînên hunerî, xuyanî ye. Herçî biwara wergerê ye, demajoyeke temambûna durehiyê û hêz û şiyana rabûnê jê re divê û piştî vê demajoyê pêwîst e xwehişberiyê ji rengê ‘durehiya berevajîker’ di xwe de pêk bîne. Loma jî, bizava wergerê ya ku pêwîst e, heta nivê demajoya weşana kovara Jiyana Rewşenê bi rengekî xurt li dar neketiye. Her çend, bizava wergerê di dema kovara Rewşenê de kêmtir û qels e jî, hewldanên ku piştî hejmara 7an di kovara Jiyana Rewşenê de hatiye dayîn, hêja ye ku wekî ‘Bizava Wergerê’ were pênasê û binavkirin. Eger û naveroka vê pênasê û bilêvkirinê, ronahiya xwe dide ser kovara Rewşen-Nameyê û kovar digihîje wê serketina hêjayî gotin û qedrdayînê; û di sê (3) hejmarên xwe de, ji zimanên cuda cuda, sî û yek (31) deq û tekstên wêjeyî û hunerî ku li Kurdî hatine wergerandin di rûpelên xwe de belav dike. Ev yek amaje bi du tiştan dike; 1) di dema kovara Rewşen-Nameyê de, nivîskarên Kurdî ku bi tevayî ji nifşa sêyem ya Kurdên di nav sînorê K.T.yê de ne, demajoya durehiya ku wekî encama pêkanînên asîmîlasyonîst yên K.T.yê ye, temam kirine û digel vê temamkirinê jî ew hêz û şiyana bi xwe re çêkirine û karibûne kelepûr û paşxaneyê ku jê derçûne, bi kêrî wêjeya Kurdî binin, 2) kovara Rewşen-Nameyê, li xwe kiriye armanc ku di çarçoveya ‘berevajîkirina tiştê ku fermî ye’ de, bibe berdewama Bizava Wergerê ya bi kovara Jiyana Rewşenê dest pê kiriye.

Ev armanc, di nivîsa bi navê ‘haveynê ronesans û geşedanê raguhestin e’ de (Rewşen-Name, 2003: 6) tê ravekirin û eger û palderên wê ya ku li ser bipêşvebirin û xurtîtkirina bizava wergerê ye, tê aşkerakirin. Nivîsar bi bêjara (discourse) ‘Bi Navê Yezdanê Mezin Raguhêze!’ dest pê dike.⁵⁵ Gotina ‘Raguheze!’ bi awayekî ji awayan

⁵⁵ Di vê nivîsarê de, nivîskar w. mazlum doğan, peyva ‘raguhastin-raguhestin’ê wekî hevwateriya peyva ‘werger-wergeran(din)’ê bi kar tîne.

sîmulasyona bêjara sereke ya Îslamiyetê ye ku dibêje, ‘Bixwîne!’⁵⁶ Û ev awa sîmulasyon, texlît û lasayîkirinekê jî di xwe de dihevine ku “dijberê wê pêk tîne” (Bloom, 2008: 69) û bi nîşandana rasteqîniyeke dîtir ‘bêjara dij-mêtinger’ saz dike û em dikarin bêjin; ji ber ku “Texlît jî dikare veguhere ser berxwedanê. Ji ber ku her texlît têkder e. Bi vî awayî pêwendiya ‘kirde-tiştê’ û ‘avakar-yê tê avakirin’ xera dibe; û ‘avaniyên dureh(î)’ derdikevin rastê” (Parla, 2018: 12), ancax ‘durehiya berevajîker’ dikare lasayîkirineke bi vî rengî pêk bîne; bêyî ku li xwe şikber bibe û bêje, ‘gelo dibe ku ez bi vê lasayîkirinê reng û dirûvê serdestê xwe bi xwe dixim û ji çand û kakilê xwe, ji jêderka xwe dûr dikevim?’ Loma jî, di naverok û çarçoveya berxwedêriyeke bi vî rengî de, hevoka “Raguhêze! (Wergerîne!) wê bibe binesazê **Ronesansa Kurdistan**, ku çav li riyê bûne stêrk, lê hê jî berê xwe nedaye kurdan” amaje bi hewldaneke nûbûn û (ve)avakirinê dike ku; heta wê hingê, bi qasî ku hêja ye em balpêdanê bikin û behs jê bikin, di helbest û çîrokê de pêk hatiye û dê yek ji şaxên kêmmayî ya wêje û hunera Kurdî, yanî wergerandin pê geşe bide.⁵⁷ Nûbûneke bi vî rengî, di heman demê de xwejêdûrkirina dubarekirina borîrojê ye jî ku “A ku divê em biafirînin, civakeke nû ye; digel hêzên hilberîner yên demên modern, afirandina civakeke zengîn û digel biratî û hevgeriya rojên borî, afirandina civakeke germ e” (Césaire, 2005:156) ku di biwara wêjeya Kurdî de, bi ‘dirûşm’a ku bi peyva *ronesansê* (ve)avakirinê li xwe dike armanc û guherîna ku dê zimanê Kurdî di demajoya wergerandinê de dûçarî wê bibe, dide ber çavan. Nûbûneke bi vî rengî, ku bi xwehişberiyê taybet û wêrek dide ser rê ku hay jê heye; ku dê ziman, çand, huner û wêjeya Kurdî di vê demajoya hanê de bigihîje asta rasertir û dê di çavê endamên neteweya Kurd de “ji hêla bandorhildana giyanî û psîkolojîk ve bigihîje şûngeha meşrûbûneke neteweyî” (Fanon, 2007: 205) û dê bi baweriya vê qebûla meşrûbûnê; digel “angaşt û îddîaya têrîxwekirinê û neyînkirina navbêjiya ‘heyîna biyan’” (Riceoeur, 2008: 11) bandora mêtingeriyê ya asîmîlasyonîst, ya ku windaker û tuneke e, bişikê.

Nivîsar, balê dikişîne ser dema ku tê de ye ku borîrojê ji roja çûyî hildide û ji ber ku “Dema borî tu carî ne ew tişt e ku di borîrojê de qewimiye: dema borî tiştêkî wisa ye ku her tim di nav dema niha de geş û zindî ye” (Bergson, 2013: 46) borîrojê ji kewara

⁵⁶ *Balkêş û îronîk e ku; piştî hatina Îslamiyetê, çand û ziman û wêjeya Kurdî, dûçarî ‘kartêkkirinên neyîni’ yên çand û zimanê serdestan dibe.*

⁵⁷ *Şaxa çarem; rexne-nîrxandin e.*

kelepûr û paşxaneyê hildide û tîne li ser sifreya roja îroyîn datîne û li ser qebûla ku ‘ziman, çand û wêjeya Kurdî piştî gelek qonaxan car din hatiye û li ser qonaxa hişyarbûneke nû maye’ bi rê ve diçe û tevî ku bi jêgirtin û mînakdayînekê gotina “Tiştê ku hêz û şiyane dide serdemên hişyarbûnê raguhestin e”⁵⁸ li xwe dike *rêbera* vê ronesansê jî, bi hevokên wekî “Şert û merc dijwar in, lê divê mirov li hêviya Mehdî nemîne!...” çav nade derveyî war û hebûniya xwe û hay jê heye ku hêz û şiyana ku pêwîst e, pê re ye. Ev yek, nîşaneyê temambûna ‘qonaxa xwehişberî’yê ye ku Gasset wê wekî ‘jiyana çalak, yanî praxis’ bi nav û pênase dike. Di bixwebaweriya vê xwehişberiyê de sazkirina hevoka “Raguhestin wê zimanê Kurdî bisû, ku ji ber qedexekirin û sersariyê ko bûye” bala me dibe ser wê yekê ku; ‘xwehişberî’ya pêkhatî li ser du şeweyan rûdinê; 1) hayjêbûna ji demajoya qedexekirin û pêkanînên asîmîlasyonîst ku hê jî berdewam e, 2) helwêsta xwerexneyî ku bi gotin û binavkirina ‘sersarî’ berbiçavtir dibe û ji ber ku “...mîrovên mêtîngehê hemû êşên ku kişandiye, bi nav dike” (Fanon, 2007: 75) hemû êşên ku zimanê Kurdî kişandiye, bêyî ku dilê xwe bi xwe bişewitîne, bi nav dike û bi helwêsteke dij-mêtînger û bi gotina “Lew re raguhestin haveyna geşedan û vesazînê (reform) ye” pêşniyaza (ve)avakirinekê dike.

Her çend kovara Rewşen-Name bi tenê bi sê (3) hejmaran weşiyaye jî, hem ji alî hejmara nivîsarên wergerê hem ji alî zimanên ku ji wan wergerandin bo Kurdî hatine kirin hem jî ji alî naverok, reng û cureyên nivîsarên ku hatine wergerandin ve, di temenê xwe yî kurt de, kariye hêz û şiyaneke nûtir û dîtir di xwe de ava bike û bi çalakgeriyeke wêjeyî û bi praxiseke jiyanî vê hêz û şiyane di rûpelên kovarê de bi nivîsarên wergerandî bexş û keremî wêjeya Kurdî, bi taybetî bo wêjeya Kurmancî, bike.

4.3.3 Ranêzikiya Wêjeyî ya di Jiyanê Rewşen-Nameyê de

Di sergotara hejmara yekem ya kovara Rewşen-Nameyê de, hevokeke ku balê dibe ser mebesta serdestîyê ku bi awayekî hov û dirinde li ser çand, zanav û girseyên neteweyî tê qewimandin û di hevokê de wiha tê gotin. “Mîrov bi hiş û laşê xwe çawa li ser rûyê cîhanê hat kuştin, êdî diyar e. Çerxên vê mekanîzmaya ku gelekî bêguneh û dîlpak tê xwiyakirin, êdî li ber çavan e.” (Rewşen-Name, 2003: 3) Bipêşdehatineke bi vî rengê berê me dide hişberîyeke wisa ku êdî hayjixwebûna xwe datîne rastê. Ji ber ku

⁵⁸ *Bi qasî ku di kovarê de agahî tê dayîn û jêgirtin tê kirin, ev gotin ya prof. Hilmi Ziya Ülken e. (Ülken, H. Z., Uyanış Devirlerinde Tercümenin Rolü, İstanbul: İş Bankası Kültür Yayınları)*

mirovê ku bi ‘laş û hişê xwe’ hatî kuştin, digel tundîya derbê û xwîna rijîyayî, wek gewdeyî li wê navê disekine; û ew gewde, gewdeyeke girseyî ye. Hiş jî, ew ‘hişê jêderkî ya zanava çandî û neteweyî ye ku berî ku pêkanîneke wekî asîmîlasyon lê biqewime, wekî resenî û xwezayîbûna xwe heye.

Hişê ku piştî vê derbê û qewimînê dikare hevokeke wisa saz bike, ew *hişê li ser xwe* ye ku hay ji derba xwarî heye û di qonaxên ‘durehî’, ‘lixwenebanbûn’ û ‘cewêlekîyê’ re bihurîye û kartêkên wan qonaxan li ser xwe berevajî kirine û hay ji jihevparçebûna xwe ya fizîkî, çandî, zimanî û wêjeyî heye û ji bo bêkartêkkirin û jînavêrakirina vê rewşa lê qewimî di nav hewla guherandinekê de ye ku “...divê rewşenbîrê mêtîngehê, yê ku daye dû reseniya neteweyî, têbigihîje ku heqîqeta neteweyî berî her tiştî rasteqîniya neteweyî ye” (Fanon, 2007: 219).

Loma jî ev danexwe û rabûna bîrewerîyane, li ser têgihîştina ‘rasteqîniya neteweyî’ berê xwe dide qonaxa avakirina ‘resenîya neteweyî’ û bi hayjêhebûneke wêrek, çibûn û kîbûna kujyarê ‘laş û hişê kuştî’ dide zanîn û bi hevoka “Tevî hemû êrîşên ku bi destê bêtar, dirrinde û cinawirên pergala dagirkeran tên kirin, ku ev xwînmij nexasim rewşenbîr, nivîskar û hunermendên *tirk* in ku di gorepana wêje, huner û çandê de cerdê bi ser kurdan de tînin.” (Rewşen-Name, 2003: 3) tê rastê.

Helwêsteke bi vî rengî lidirabûneke xweserî xwe dide der ku êdî gihîştîye qonaxa demajoya berevajîkirina neyînkirina fermî û daxwazên narsîstîk û lasayîker yên hêza mêtînger li hejê xistiye û di xwe de “*durehîyeke berevajîker*” (Bhabha, 2016: 223) ava kiriye. Li ser vê hîma ‘durehîya berevajîker’ jî, ji ber ku wêje ne teşeyêke giştî ye û mirovekî ku bixwaze bi resenîya xwe wê ava bike û digel hebûna xwe, wê di şûngeheke gerdûnî de dayne rastê û her wekî Fanon diyarkirî, pêwîst e “Wêjeyeke têkoşanê” (2007: 192) bîne rastê û di biwara wêjeyî de “...avakirina hişberiya neteweyî” (2007: 192) li xwe bike armanc.

Ev reng armanca ku li ser guherînxwazîyê hatiye pêş di hejmara pêşî ya kovara Rewşen-Nameyê û di nivîsa bi navê “Çima Rewşen-name?” yê de jî bi awayên cure bi cure hatiye dîyarkirin. Hevoka ku dibêje, “Di pêvajoya pêşketina kesayetî û neteweyan de, (...), huner û wêjeyê her tim rol û cîyekî xwe yê sereke hebûye...” (Rewşen-Name, 2003: 4) di guherînxwazîyê de kesayet û neteweyê ji hev cihê nake. Ji ber ku takekesîya afirandî wêjeyî bi berbelavbûna xwe ve kartêkê li neteweyê û guherîna wê dikan, pêwîst

wekî alav û şaneka afirana wêjeya nivîskî “...bûye temînata jiyana hestên hevpar û piştî demekê jî, bûye afirînera neteweyekê.” (Rewşen-Name, 2003: 4)

Di vê afirînerîyê de, nivîs û awayên wê yên ku her tim bervekirî ne ji guherîn û veguherînê re, bi pêdeçûnê û bihurîna di qonaxan re, bi hişberîya avabûyî ya takekesî û bi afirînerîya wî ya wêjeyî û bi zimanê ku pê tê nivîsîn, her wekî Gramsci jî amaje pê dike û dibêje, “Zimanekî, giyan û hêmanên çanda neteweyekê di nava xwe de dihevine” (Raguhastin: Ives, 2011: 135), hiş û giyanê nivîsê digihîjînin astekê ku di vê astê de; hem ji bo berevajîkirina pêkanînen asîmîlasyonîst hem ji bo litewşêbirina encamên pêkanînen asîmîlasyonîst yên serdestîya mêtînger hem jî ji bo xurtbûn û geşepêdanê amaje bi takekesekî tê kirin ku bi nivîsên wêjeyî yê ku xwe ji her awayê gotin û vegotinên herêmkî dûr xistiye,⁵⁹ radibe. Pê re jî, di bergeha ramana neteweyî de berfirehtir çûye û di rêveçûna xwe de, xwe ji ‘dudilîya’ ku ji ber kartêka ziman û çand û wêjeya serdest filitandîye û bi paldana kelepûra xwe û bi palderiya ast û rengûawayên nivîs û wêjeya neteweyên dîtir, di biwara ziman û wêjeyî de gihîştîye nirxên xwe û li ser van nirxan “di xwebûniyê de bi kûr de çûye” û “dest bi liv û tevgerê kiriye” (Gasset, 1995: 38) û wekî dongiya vê çalakgerî û praksîsa zimanî û wêjeyî, ‘zanaveke rengneteweyî’ di xwe de ava kiriye û di ser vê zanavê re jî pîrsa “Wêjeyeke çawa û wêje, lê ji bo kê?” (Rewşen-Name, 2003: 5) dike û di vê guherînxwazîya wêjeyî de, bi taybetî di biwara wergerê de û bi awayekî nirx û afirandî xwemalî de cî dide helbest û çîrokên ku guherînen bi vî reng û şeweyî li xwe xistine.

Di hejmara yekem ya kovara Rewşen-Nameyê de, çîroka bi navê “Danişîn” ya h. kovan baqî⁶⁰ (Rewşen-Name, 2003: 72) şeweyê vegotineke wisa ye ku ji naveroka xwe ne serbixwe ye û bi şeweyê vegotinê ku bi taybetî ji bo vegotina vê çîrokê hatiye sazîkirin, xwe ji rengûawayê vegotinên çîrokî yên berî xwe cihê dike. Çîrok bi hevoka “Her kes li ciyê xwe rûnê, danişîna sedsalê dest pê dike” amaje bi destpêka serdestiya mêtînger dike ku bi qasî sed sal berî nivîsîna vê çîrokê li dar ketiye û bi vê destpêkê re jî pêkanînen asîmîlasyonîst li ser ziman û çanda Kurdî jî dest pê kirine. Çîrok ji serî heta dawî, di vegotina xwe de, vê sedsalê dide ber dadê û bi hevoka “Dadger bi hişkî çakûç di rûyê maseyê de lê xist: Huşş bin!..” bi me dide zanîn dadgerê heye û wê vegotin

⁵⁹ Li vê derê mebest ji gotina herêmkî; mayîna di nav taybetîyên gelêrî yên neteweyî de ye ku guherînxwazîya ku dixwaze teqlê li wêjeya Kurdî bixe, rabihartina sînorên neteweyan jî li xwe dike armanc ku wê wêjeya kurdî bi hemû reng û awayên xwe ve bigihîne asta navneteweyî.

⁶⁰ Di kovarê de navê nivîskaran bi tîpên biçûk hatine nivîsîn.

berê xwe bide çîrokeke darizandinê. Lê belê di vê darizandinê de, ji serî heta dawiyê, mirov tunene û piştî ku dadger ‘çakûç di rûyê maseyê de lê dixê’, tiştêkî dîtir tê pêş û vebêj ji me re dibêje, “Xweziya kursîyan di ber de ma. Huşbûn çarenûseke qewîn e û ji roja roj de bo kursîyan saz bûye: “Ku yek wechê xwe ji vê re tirş dike, bi xweşkahi lêvên wan tene dirûtin.” (Rewşen-Name, 2003: 72)

Vegotina bi vî awayî, ya ku sembola xwe ji naveroka xwe peyde dike û wan ji bo naverokên derveyî dike şanekek, teqleke guherînxwaz e di vegotin û di çîroka Kurdî de ku; naverokê jî ji hev parçeparçe dike û belavî pêdeçûna vegotinê dike û em êdî pê dizanin ku darizandin ne di navbera dadger û dozger û bersûc û parêzer û beşdar û temaşevanan de diqewime. Êdî dadger û kursîyên dadgehê hene û dadger wekî ‘kirdeyekî serdest’ tê dixebite hikmê li ‘tiştêyên bi navê kursî’ bike; û di vehonana çîrokê de, dadger nûnerîya serdestê mêtînger dike û kursîyên vala ku kes li ser rûnanê jî bindestên ‘lêvên wan dirûti’ ne, yanî bindestên ku heqê axaftinê ji wan hatiye girtin in, yanî nûnerîya cewêlekîyê (subaltern) dikin. Kursî wek tiştêyên asayî bêzarûziman in û di vegotina çîrokê de, bi rola nûnerîya mirovên zimanê wan ji wan hatî girtin, radibin ku ew mirov bi tu awayî nikarin xwe bidin der. Loma jî gava yek wechê xwe li wan tirş dike, ‘bi xweşkahi lêvên wan tene dirûtin.’

Ji ber ku vegotina sembolîk ya bi vî rengî, ji hêlekê ve, tiştêyên xwe ji şûngehên di nav vegotina xwe de peyde dikin; kursî, bi bêdengîya xwe û bi ‘lêvên xwe yên dirûti’ ve, wekî liberrabûneke pasîf, wê têgihanê bi me re çêdike û dibêje; ‘hemin ku tu min dixî şûna tiştêyê û tune dihesibîn û heqê min ê axaftinê berbend û qedexe dikî, tu nikarî min darizîn jî.’ Vegotina bi vî rengî ya cihêreng û guherînxwaz, naverokê nake sembol lê belê sembolê bi xwe di nava çîrokê de li xwe dike naverok û sembolê di şûngeha hebûna xwe bi xwe de pûç û betal dike. Di hevokên bi vî rengî û di tevahîya çîrokê de, bi hevokên ji vegotineke sembolîk, serdestîya mêtînger ya sed salî tê pûçkirin û bi taybetî; bi gotina ‘lêvên wan tene dirûtin’ amaje bi asîmîlasyon û qedexekirina zimanê Kurdî tê kirin ku ev yek di biwara vegotina wêjeyî de, helwêsteke dij-mêtînger û vegotineke dijraber e û digel wê jî, em dikarin bêjin; ji bo cewêlekê (subaltern) ku heqê axaftinê jê hatiye girtin, war û şûngeha rabûn û xweheyîkirinê ye.

Di hejmara yekem ya kovara Rewşen-Nameyê de, helbesta bi navê “beybûnên bêjî” ya rodî zerya⁶¹ (Rewşen-Name, 2003: 26) mînakê yek ji wan helbestan e ku wekî guherînxwazîya di Rewşen-Nameyê de derdikeve pêşberî me. Helbest, li şûna ku behsa rastînê bike, rastînê bi xwe dide der û datîne rastê. Di ser vî şêweyî re, ji alî zimanê ku bi kar tîne ve jî, dibe xwedî taybetîyekê. Ev taybetî, “Jidiliya di helbestê de” ye ku “Taybetiyên derbar zimên in” (Eagleton, 2011: 180).

Loma jî ‘jidilî’ya gotinê, bêyî ku bi vir de û wir de bike, bi gotineke rasterast û bi rista “ey berbeyanên derewîn” berê me dide rastîneke hundirîn ku heta dawîya helbestê wê ev rastîn ji şopa xwe veneqete. Ev şopa hanê bi ristên “wexta me mîna zarokan hêvîyên we di xewnhêlanên xwe de dilorandin/dilên we yên i’tim pêl me kirin û em pelçiqandin” dest bi pêdeçûnê dike û amaje bi jêvegerînekê dike ku neteweyekê dev ji xeyalên xwe yên derbar xwe de berdaye, xeyalên xwe li xwe kirine xewn û li ser vê ‘kuştina xeyalên xwe’ daye dû xeyalên neteweyeke din û “di ‘xewnhêlanên xwe lorandine’ û di pey re jî ‘bi dilê neteweya ku xwe kiriye qurbanîya wê’ hatiye pelçiqandin. Ev her du rist, xwerexnekirinek e ku tu li pêşberî tu heyîn an jî ji bo tu fikirekê nayê kirin û yekser berê xwe dide xwe û bêyî ku dilê xwe bi xwe bişewitîne, ‘bêbextîya lê hatî kirin’ derdibire.

Di pêdeçûnê de, ristên “wexta em ji bo we dihatin kuştin/we hemû deriyên xwe heta roja qiyametê ji me re girtin” sedema ‘bêbextîya hatî kirin’ di xwerexnekirinê de dide der ku ‘neteweyek xwe ji bo neteweyeke din kuştîye’ û jidilî û dilrastiya hatî şanîdan bi awayekî berevajî û neyînkê gihîştîye bersiva xwe ku heta qiyametê derî li neteweya qurbanî hatiye girtin. Bi van risteyan, em têgihîjin ‘neteweya xwe kiriye qurbanî’ Kurd in ku di dîrokê de her ligel serdestîya mêtînger şer kirine û wekî dawî jî piştî avabûna K.Tyê û şûnde hatine wek netewe neyînkirin. Digel vê yekê jî, armanca helbestê, taybetîya gotina xwe ya guherînxwaz û hayjixweheyî û bixwebawer bi rista, “ne xem e” xwe dide der ku xwe di mexdûrîyê de venaşêre û em pê dihisin ku neteweya hatî neyînkirin hebûniya xwe li xwe nake arîşe.

Ji ber hindê ye ku gotina helbestê vê carê muxatabê xwe aşkeretir dike û dibêje, “em ê li hev mikur bîn êdî welato/tu bê pîrik za/li ber rûreşîya pîçîka pozê vê dîrokê/ebeden gunehê xwe bi xwe neyne/çermê çîrokên te gurandin ji gumikan heta

⁶¹ *Di kovarê de navê nivîskaran bi tîpên biçûk hatine nivîsîn.*

paşsiqulka te/rojê fatîheyek xwendin li ser kolaneke te” (Rewşen-Name, 2003: 73). Gotina helbestê, di vê qonaxê de, ji xwerexnekirinê berê xwe dide lixwemikurhatinê û digel ku welat ‘bêpîrik zaye’ jî, ev zayîn di heman demê de amaje bi hebûnîyekê dike ku neyînkirinek li vê hebûnîyê qewimiye û ‘çermê çîrokê wî tê gurandin’ da ku bêkiras û bê dîrok bimîne. Her wiha ‘rûreşiya pîçika pozê dîrokê’ heye li ser pêkanînên serdestiyê yên çewisandin û neyînkirinê û ji bo ku neyînkirina serdestiyê ya ketî behsê û neteweya bindestkirî bibe dayne ser qebûla tunebûnê, ‘rojê fatîheyek hatiye xwendin li ser kolanên wî’ û bêtêlqîn ew welat hatiye çalkirin. Vegotineke bi vî rengî ku xwe ji xwerexnekirinê nade alî û tu hincetan nade ber xwe û xwe ji çemê mexdûriyetê dişo û dikare bêje, “ne xem e welato ne xem e” nîşaneyê xweheyîkirinê ye ku “di xwebûnîyê de bi kûr de çûye” (Gasset, 1995: 38) û ji bo “avakirina hişberiya neteweyî” (Fanon, 2007: 192) amade ye “dest bi dest bi liv û tevgerê bike” (Gasset, 1995: 38).

Ristên “li dû çûyîna te welato/hûrhûrî kirin hemû nasnavên me” dibin bingeş ji bo vê amadebûnê ku gotina helbestê, di pêdeçûnê de, yên ku xwe ji bo “avakirina hişberiya neteweyî” amade kirine, wekî ‘bêjî’ yên ku ji keç û lawên welat pêk tên, bi nav dike ku sembolîzekirina rabûn û liv û tevgerê ya li ser praksîsa jîyanê dîsa di (ve)gotina helbestê bi xwe de temam dike ku “Pêwendiya berhemê ya bi zimên re û ya zimên bi berhemê re digihîjin hev” (Foucault, 2015: 62-63). Di vê hevgehîştinê de, êdî ‘bêjî’ yên welat hene ku “wext ji bo wan toltajîyeke gumre” ye û “sêwiyên welato bahoz in” ku “barê wan baran e” û di praksîsa jîyanê de bi liv û tevger in ji bo şûştina qirêj û pêdekirinên serdestiya mêtinger û; “êdî ji bo wan xem xem e/xem xem e xweş xem e.” (Rewşen-Name, 2003: 73).

Zimanê helbesta “beybûnên bêjî”, bi sembolên zimanî ya derveyîn mebesta helbestê venaşêre, bi gotin û vegotineke aşkere û rasterê, sembolên zimanî dike armanca vegotinê. Ji ber hindê jî, di (ve)gotina helbestî de, digel naverokê, doza şêweyekî zimanî dike ku xwe ji tu reng û teşeyê venaşêre û li ser bingeşa “Wêje, ne teşeya giştî ya her cure berhema zimanî ye û ne ew şûngeha gerdûnî ye ku berhema zimanî tê de bi cî dibe” (Foucault, 2015: 62), di şûngeha ‘wêjeya neteweyî’ de, bi lîdirabûneke taybet, hewldana avakirina zanaveke xurt dide û ji bo jînavêbirina pêkanînên serdestiya mêtinger, di biwara wêjeyî de, doza guherînxwaziyê ji xwe dike da ku karibe li ser bingeşa ‘jêcihêbûnê’ xwe ava û heyî bike û gotina xwe bike gotina cewêlekê (subaltern).

4.2.4 Nav û Nasnava Nivîskarên Rewşen-Nameyê

Nivîskarên kovara Rewşen-Nameyê, di nivîsên xwe de, nav û nasnavên xwe bi awayên wekî: 1) Navê fermî yê di nifûsê yê dewleta K.T.yê de qeydkirî û bi tîp û elfabeya zimanê Tirkî bi kar aniye. Wekî; Ayten Çağan, Cemil Oğuz, Edip Polat, Gülay Ersoy, M. Zahir Kayan, Mehmet Dicle, Mehmet Esen, Nihat Çelik. 2) Navên adetî yên ji cî û warên ku lê ji dayika xwe re bûne an jî jê hatine an jî navê eşîr û bavikên xwe wekî nasnav bi kar aniye. Wekî; Mûsa Vazgalî, Osman Mehmed, Yeqîn Şemrexî. 3) Nivîskaran nasnavên xwe tevlihev bi kar anîne; navê xwe yê fermî ku bi Erebi, Farisî û Kurdî ye, wekî awayê bilêvkirin û nivîsîna bi Kurdî bi kar anîne û paşnavê xwe li ser qaydeya navlêkirina Kurdî guherandine. Wekî; Dilawer Zeraq, Evdile Koçer, H. Kovan Baqî, Salihê Kevirbirî, Samî Hêzil, Şêxmûs Sefer, Şevîn Gulşenî, Yaqob Tilermenî. 4) Nivîskaran navê xwe yê fermî wekî nasnav bi kar aniye lê navê xwe bi bilêvkirina Kurdî nivîsîne. Wekî; Yıldız Çakar. 5) Nivîskaran nasnava ku bi nîşanekê ji navê fermî vediqete bi kar aniye. Wekî; W. Mazlum Doğan. 6) Nivîskaran navekî taybet ku amaje bi Kurdbûna wan dike, ji xwe re bijartine û wekî nasnav bi kar aniye. Wekî; Arjen Arî, Azad Rêbiwar, Berken Bereh, Cîhan Roj, Dilxwaz Herdem, Kawa Nemir, Kejo Bajar, Lal Laleş, Merdan Newayî, Rodî Zerya, Rojîn Xewn.

Tevî ku nivîskarên kovara Rewşen-Nameyê, her wekî nivîskarên Rewşen û Jiyana Rewşenê, nav û nasnavên pircure bi kar anîne jî, di nasnava nivîskarên vê kovarê de du awayên taybet balê dikişîne ser xwe ku ji yên din cuda ye. Her wiha, gava em xweşikî bala xwe dibine serê, em di pircureyiya nasnavên di kovara Rewşen-Nameyê de xwehişberiyêke cîlixwegirtî dibînin. Helwêsta dij-mêtinger(î) ya nivîskarên kovara Rewşen-Nameyê, xwe ji pêkanînen ‘wekxwekirin’ û ‘wekîhevkirin’ê ya polîtîkayên asîmîlasyonîst, rizgar kiriye û bi hayjêbûneke taybet ku êdî ‘durehiya berevajîker’ e û ‘cewêlekkirina zimên’ bi wê de dike, di biwara wêjeyê de ku şûngeheke rasertir bo ziman ava dike, rengê ‘yektabûn’ û ‘wekhevbûna’ zanava neteweyî ya Kurd dane der.

ENCAM

Pêwendiyên desthilat(dar)î ku di xwe de beranberiyê bivênevê dihewîne, di pratîk û taybetiya karakterîstîk ya serdest(î)-bindest(î) de, li ser her du aliyan jî kartêkên diyarker dihêle. Diyarkeriya vê kartêka hanê, hem wekî şûn û pozîsyon hem jî ji alî pêkanîn û lêdûçarmayînê ve encamên cuda dide ji bo her du aliyan. Herçî, aliyê serdest e, desthilatdariya ku li ser bindestan pêk tîne, di heman demê de dibe sedema çespendin û xuyanîbûna kirdebûna wê. Aliyê bindest ku di ‘teoriya neynikê’ ya Lacan de tiştê kirdeyê ye, bi bindestbûna xwe ve her tim hebûna serdestiyê heyî dike. Ev rewş, taybetiya karakterîstîk ya serdestiya mêtîngeriyê ye ku zalbûnekê bi dest xwe ve tîne û di demajoya pêkanîna vê zaltiyê de xwazeke taybet diafirîne ji bo hestpêkirina hebûniya xwe ku tim û tim xwe bi ciyê dîkeyê ve dibestîne û hemû encamên derbar pêwendiya di navbera serdest û bindest de heyî, di ser vê ‘xwaz’ê re didin der.

Pêkanînen serdestiya mêtîngeriya rengmodern hewlê dide bindestê ku bûye tiştê wê, têxe rengê dermîrovî û wî kêmbixe. Digel pêkanîna xwe ya sereke ku asîmîlasyon bi xwe ye, serdestiya mêtînger avakirina ‘yekzanavî’, ‘yekzimanî’ û ‘yekagahî’ li xwe dike armancên pêşîn ku wekî encam ‘dîkekîrin’, ‘lixwenebankîrin’ û ‘cewêlekîrin’ê bi xwe re tîne. Ev yek jî, di biwarên ziman û wêjeyê de zelatir û aşkeratir xuyanî dibin.

Di demajoya avabûna wêjeya bi Kurdî ya nivîskî de teqla pêşî serdema klasîk e. Berhemên pêşîn yên edebîyata Kurdî ya klasîk bi zaravaya Kurmancî ne û paşxane û kelepûra klasîk ya wêjeya Kurdî bi piranî li ser vê zaravayê ye. Di dema avabûna wêjeya Kurdî ya klasîk de, serdestiya zimanê Erebî ya di biwara zanîn û perwerdehiya dînî de û serdestiya zimanê Farisî ya di biwara wêjeyê de, wekî encam kiriye ku; Cizîrî, Feqî û Xanî, bi rengvedaneke li ser arîşeya hebûniyê rûniştî û bi pêdagîrî û bi tercîhkirina hişk, bi zanîn û hişmendî bi Kurmancî binivîsin û her sê bi hev re bibin avakarên wêjeya Kurdî ya klasîk ku; em ê li ser vê xwehişberî, pêdagîrî û tercîha wan ya ku xwedî rengê ‘*deconstructionist*’ e, her sê pêşengên wêjeya Kurdî ya klasîk, wekî ‘*Her Sê Felaket*’ bi nav bikin.⁶²

⁶² 1) *Deconstructionist*: ew kesê ku ji bo veavakirinê derbê li tiştên kevn û heyî dixê û avaniyêke nûtir û dîtir saz dike.

2) ‘*Her Sê Felaket*’: (bi îng: *gorgeous threesome*, bi tr: *muhteşem üçlül*)

Kurdên li ser zimanê Osmanîkî û ji Mektebên Eşîretan û ji dibistanên dewletê derdiçin, bala xwe didin ser raman û reftara modernîzmê ya ku di ser dewleta Osmanî re di nav bîrewerên Kurdan de berbelav bûye. Raman û reftara modernîst, di demeke kurt de qada bandorkirina xwe berfirehtir dike û nêrîn û ranêzikiyên Kurdan ya bo reng û qalib û qaydeyên wêjeya Kurdî ya klasîk diguhere û her çend kêr û tîrnekir bin jî, di kovarên wê hingê de pêngavên dîtir berpêyî wêjeya modern ya Kurdî tên avêtin. Ev pêngav, di pey re dibin qonaxa avêtina tovên wêjeya Kurdiya Kurmancî ku dîsa li ser zimanê rojane û pêaxaftinê ye û bi taybetî li ser zimanê Osmanîkî ‘durehî’ bûye. Ev qonax, ji hêla ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî ve, digel kovarên ramanî, zimanî, wêjeyî û hunerî ku wê hingê li Stenbolê derçûne; bûye mînak dem û qonaxa xwe ku ji bo pêşrewên xwe berdewamîyek e û ji bo peyrewên xwe jî ‘qonaxa *ajdanê*’ ye.

Derçûna kovara Hawarê ya di sala 1932yan de, ji alî dem û helûmercên siyasî û rêveberiyê ve demeke taybet e ku; Kurd wê hingê, di wî parçeyê warê xwe de rastî çewisandin, qedexekirin û tunehesibandîna nayên. Loma jî, kovara Hawarê, bi naveroka xwe ve; eger û sedemên xwe yên derçûna xwe di nav helûmercên rihet û kêmasteng de bi cî tîne. Di warê bipergalkirina zimanê Kurdiya Kurmancî de pêngavên mezin û radîkal di kovara Hawarê de hatine avêtin û ji alî wêjeya Kurdiya Kurmancî ya modern ve jî çalakiyên giranbiha û berbiçav li dar ketine; û encamên girîng hatine bidestxistin ku em dikarin wê demê wekî wekî ‘qonaxa *pêkhatinê*’ bi nav bikin.

Pêkanîna qedexekirin û berastengkirinê yên K.T.yê yên ji bo zanav, ziman û çanda Kurdan, digel ku car caran wisa bo demên pir kurt, teng û qûş li pêkanîna bo çand û zimanê Kurdî sist kiriye jî, tu carî ji bandora xwe ya serdest(î)ya rengmêtinger tiştê kêr nekiriye. Di demeke sistiyê ya ku ketî behsê de, li Îzmîrê kovara Tîrêjê derçûye; û berî ku bigihîje rengê xwe, di dema derçûna xwe de maye wekî ‘qonaxa *şikestî*.’

Di dawiya salên 1990î de, reng û leza têkoşîna bo mafê xwe ya neteweya Kurd, guheriyê û piştî rakirina pişkî ya qedexekirina li ser zimanê Kurdî heyî, Kovara Rewşenê, di biwara çand û zimanê Kurdî de, wekî hewldana zelaltirkirina hişberiya dij-serdestiyê, derçûye. Çawa ku pêşveçûnên siyasî yek ji sedema derçûna kovara Rewşenê ye, wek wisa hewldana afirandina berhemên bi zimanê xwe yek ji egerên girîng û mezin e ku pêşketina hişmendiya neteweyî afirandîna bîrewerên mêtîngehê diguherîne û wan zelaltir dike.

Her çend, gava kovara Rewşenê derçûye; nêzî heftê (70) sal temam bûye ku zimanê Kurdî li ber kend û bendan ketiye; û rêya bajarîbûnê, -yanî rêya xwendin û perwerdehiya zanîn û zanistê ya bi zimanê Kurdî- lê hatiye girtin û rê bo xwe nedîtiye da ku ji qada gundewarî derbasî qada bajarî bibe jî, piştî derçûna kovara Rewşenê, zimanê Kurdî, bi taybetî Kurmancî; hêdî hêdî, bi nîfşeke ditir ya xwende rabûye; û wê nîfşê di biwara ‘durehî’ û ‘pirzimanî’ de hay ji rewşa xwe hebûye û bi xwehişberî pêngavên nûtir berpêyî zanîn û zanistê avêtiye. Pêngavên ketî behsê, berhemên wê xwehişberiyê ne ku bi reng û dengê têkoşîna bo maf hatiye dayîn. Herçî xwehişberiya navborî ye, piştî ku zelaltir bûye, ji xwe re li şûngeheke dîtir ya taybet geriyaye da ku karibe guherandinê pêk bîne û ji ‘bindestiya hişmêtinger’ dûr bikeve û rizgar bibe.

Digel vê jî, ji ber ku piştî afirandina *bêjareke derbar xwe* wêjeya neteweyî pêk tê; û ji ber ku afirandina *bêjara derbar xwe* di heman demê de reftareke ‘berêxwedanxwe û liserxwehûrbûn’ê ye, xwehişberiya zelalbûyî, ji bo jêdûrketin û jêrizgarbûna ji çand û zimanê lêsepandî, pêwîstî dibîne ku *bêjara derbar xwe* biafirîne. Loma jî, kovara Rewşenê, şûngeha afirandina vê bêjarê ye ku dij-mêtinger e.

Zelalbûna hişmendiya neteweyî ne tenê guhertinan di şewaz û temayên wêjeyî de çêdike, di heman demê de girseyeke nû ya ji xwîner û nivîskaran pêkhatî jî diafirîne. Loma jî kovara Rewşenê ne tenê şûngeha afirandina vê bêjarê ye, di heman demê de deriyê şûngeha wêjeya neteweyî ye ku piştî afirandina bêjarê bûye ‘*rengê berêxwedanxwe*’yê û rengûawayê wê yê teyisîn û dengvedanê; yanî ji hêleke din ve û bi wateyeke din, kovara Rewşenê; -bi rola xwe ya ku wekî fêrgehekê pê rabûye, bi pêdagiriya xwe ya ji bo dannîşana zanava neteweyî ya di ser zimên re û bi peyrewiya xwe ya kelepûrparêz û nûxwaz-; ‘*bêjara derbar xwe*’ ye.

Derçûna kovara Jiyana Rewşenê û Rewşen-Nameyê rastî paşdemeke taybet tê ku; êdî hejmareke hêjayî gotin û balpêdanê ya ji Kurdên ku bi xwendin û nivîsîna bi Kurdî dizanin, heye ku ji fêrgeha kovara Rewşenê derçûne.

Loma jî êdî hebûniya zimên, ne ew behs e ku bê nîşandan û deng û nirxên ku di xwe de dihevin tenê li ser bêjara hebûniya wê were hiştin. Ziman êdî ew tişte e ku pêwîst e were *dekolonîzekirin*; û ji fetisîna di nav zanava serdest(î)yê de rizgar bibe; yanî pêwîst e êdî zimanê Kurdî bibe yek ji nîşane û şaneka zanava neteweyî; êdî dem ya axaftina zimên bi xwe ye, yanî dema bizimankirina bêjarê ye, bi wateyeke din, dema dema axaftina ‘*bêjara derbar xwe*’ ye; û ziman êdî hêz û navgîna ‘kirasqetandin’ û

şikandina demajoya ‘lixwenebanbûnê’ ye; ziman êdî yê hînbûna sîstematîk û lêvegerînê ye ku takekes wekî xala destpêkê ji xwe û ji kakilê xwe dest pê dike û li ser zimanê xwe, li ser xwebûniya xwe hûr dibe û bi vî awayî dikare pêwendîyeke baş bi zimanên dîtir re dayne û digel wê jî di deqband û çarçoveya ‘yekzimanî’ ya pêkanîna mêtîngeriyê de dikare bi helwêsta neyînkirina ‘cewêlekîrînê’ rabe. Digel vê jî, ji bo ku karibe geşe bi qonaxê bide, bi taybetî takekesê nivîskar û xwîner ku dij-mêtînger e, pêwîst e bi yên ku arizî xwe ye dest bi xebatê bike û bi vî rengî jî di xwe de ‘durehiyeke berevajîker’ pêk bîne.

Her çî qas qonaxa Kovara Rewşenê, digel helûmercên ku tê de bûye, hewldana nîşandan û lixwedanqebûlkirina hebûna zimanê Kurdî ye jî, qonaxa Jiyana Rewşenê û Rewşen-Nameyê, ew helwêst e ku pêkanîna ‘cewêlekîrî’ ya bo zimanê xwe red û neyîn dike û li xwe dike armanc ku ‘cewêlek’ê bide axaftin û li ser ‘durehiya berevajîker’, wêjeyê li xwe bike şûngeha rasertir û tê de beş û menzelên wekî; menzela helbestê, menzela çîrokê, menzela wergerê ava bike û nîşan bide û bêje; ‘cewêlek dikarin biaxivin.’

Qonaxa Rewşen, Jiyana Rewşen û Rewşen-Nameyê, ne ew hewldan e ku li xwe dike armanc ku zimanekî lal û fafîkî bide axaftin. Hewldan û çalakgerî û praxisa vê qonaxê, ew helwêsta dij-asîmîleker, dij-nebanker, dij-cewêlekker e ku ji ruh, naverok, paşxane, kelepûr û ji duh û îroya zimanekî, rabûye; û di biwara ‘destnîşankirina zanava zimanî’, ‘durehiya berevajîker’ û ‘axaftina cewêlek’ê de, qonaxa her sê kovaran; Rewşen, Jiyana Rewşen û Rewşen-Nameyê; qonaxeke dij-mêtînger e ku em ê di biwara ziman û wêjeyê de wê qonaxê wekî ‘qonaxa geşedanê’ pênase bikin.

Her wisa, ‘qonaxa geşedanê’ bersiveke taybet e li ser bersiva Spivakê ku pêşî di ser femînîzmê re hûrgerî û hûrkolanê li ser zanav-zayendê dike û dipirse, “Gelo cewêlek dikare biaxive?” û di helûmercên pêkanînên desthilata sermiyanê kapîtalîst û postkolonyal de li ser derfetên xwederbirana cewêlek disekine û bersiva xwe dide û dibêje, “Na. Cewêlek nikare biaxive”. Digel vê jî, ‘qonaxa geşedanê’, bersiveke çalakgeriya jiyanî û praxisî ya wê pirsê ye ku dibêje “çendî ku bêzarûziman be jî, gelo tu tişt tune ye ku cewêlek li hemberî vê zilm û zordariyê bike? Serîhildan, berxwedan, qet nebe guhnedana sivîlî”

Wekî gotin û destnîşankirina dawî, em ê wekî encama hûrlêgerîn, vekolan, analîzkirin û nirxandinên xwe karibin bêjin; ‘qonaxa geşedanê’, bersiveke ‘derbar xwe’

ye ku taybetiya dij-serdestiya mêtinger di xwe de dihevwîne û hem bi ‘*zimanekî, yê xwe*’
diaxive hem jî ‘*bi zimanê, yê xwe*’ ku pê diaxive û dinivîse, bersiveke çalakgeriya jiyani
û dij-metinger e û dibêje; ‘*Cewêlek dikare biaxive!*’

ÇAVKANÎ:

Pirtûk:

- Adak, Abdurrahman (2019) *Teşeyên Nezmê di edebiyata kurdî ya klasîk de*, İstanbul: Nûbihar Yayınları, çapa yekem.
- (2014) *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, İstanbul: Nûbihar, çapa duyem.
- Akçura, Belma (2009) *Devletin Kürt Filmi, 1925-2009, Kürt Raporları*, İstanbul: New Age Yayınları, birinci basım.
- Akçura, Yusuf (2008), *Türkçülüğün Tarihi, Yusuf Akçura'nın Eserleri-1*, (Çevrim Yazı ve hazırlayan. Sadık Perinçek), İstanbul: Kaynak Yayınları, ikinci basım.
- Akın, Salih (2007) *Pêşgotina "Bingeha Gramera Kurdmancî"*, İstanbul: Avesta basın yayın, birinci baskı.
- Akpınar, Alişan (2012) *Lisan-ı Osmanî'den Türkçe'ye, (Di nava 'Înatçı Bir Bahar-Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat' de)*, İstanbul: Ayrıntı Yayınları, birinci basım.
- Alakom, R. (1998) *Hoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*, Stenbol: Avesta Basın Yayın, birinci basım.
- Alan, Remezan (2009) *Bendname-Li ser ruhê Edebiyatekê*, İstanbul: Avesta Basın Yayın, çapa yekem.
- (2019) *Keşkûl*, Stenbol: Weşanên Peywend, çapa yekem.
- Alinia, Minoo (2007) *Diaspora Mekanları-Kürt kimlikleri-Öteki olma deneyimleri ve aidiyet politikaları*, (Çev. Fahriye Adsay), İstanbul: Avesta Basın Yayın, birinci baskı.
- Amîda, Îrfan, (2016) *Qonaxeke Modernîzma Kurdî-Helbesta Tîrêj*, Diyarbakir: Weşanên Lîs, çapa yekem.
- Anderson, Benedict (1995) *Hayali Cemaatler-Millîyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması*, (Çev. İskender Savaşır), İstanbul: Metis Yayınları, ikinci baskı.
- Andrews, G., Walter (2017) *Şiirin Sesi, Toplumun Şarkısı*, (Çev. Tansel Güney), İstanbul: İletişim Yayınları, 9. Baskı.
- Armağan, Servet (2014) *1982 Türkiye Cumhuriyeti Anayasası*, İstanbul: Çağrı Yayınları, birinci basım.

- Aschrot, Bill, Griffiths Gareth, Tiffin Helen, (1995) *The Post-colonial Studies Reader*, (General introduction), London: by Routledge.
- Assmann, Jan (2018) *Kültürel Bellek*, (Çev. Ayşe Tekin), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, üçüncü basım.
- Attâr, Feridüddin (2006) *Mantık Al-Tayr*, İstanbul: İş Bankası Kültür Yayınları, birinci baskı.
- Avcioğlu, Doğan (1978) *Milli Kurtuluş Tarihi (1938'den 1995'e), İkinci Kitap*, İstanbul: Tekin Yayınevi, birinci basım.
- Balçık, M. Berk (2008) “*Milliyetçilik ve Dil Politikaları*” *Modern Türkiye’de Siyasi Düşünce-Milliyetçilik İçinde*, İstanbul: İletişim Yayınları, Cilt 4, birinci basım.
- Bauman, Zygmunt (2017) *‘Modernlik ve Müphemlik’*, (Çev. İsmail Türkmen), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 3. Basım.
- _____ (2017) *Akışkan Modernite*, (Çev. Sinan Okan Çavuş), İstanbul: Can Yayınları, 1. Basım.
- _____ (2018) *Kapımızdaki Yabancılar*, (Çev. Emre Barca), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 1. Basım.
- Bedlîsî, Şerefxanê (2007) *Şerefname*, (Wer. Ziya Avcı), Stenbol: Avesta Basın Yayın, çapa sêyem.
- Benjamin, Walter (2001) *Son Bakışta Aşk*, (Amedekirin û derpêşkirin: Nurdan Gürbilek), İstanbul: Metis Yayınları, üçüncü basım.
- Bergson, Henri (2013) *Metafiziğe Giriş*, (Çev. Atakan Altınörs), İstanbul: Paradigma Yayıncılık, 1. Baskı.
- Bhabha, Homi, K. (2016) *Kültürel Konumlanış*, (Çev. Tahir Uluç), İstanbul: İnsan Yayınları, birinci baskı.
- Bhambra, K., Gurminder (2015) *Moderniteyi Yeniden Düşünmek Post-kolonyalizm ve Sosyolojik Tahayyül*, (Çev. Özlem İlyas), İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, birinci baskı.
- Bloom, Harold (2008) *Etkilenme Endişesi-Bir Şiir Teorisi*, (Çev. Ferit Burak Aydar), İstanbul: Metis Yayınları, birinci basım.
- Bottomore, T. (1983) ya *Dictionary of Marxist Thought*, Oxford: Basil Blackwell
- Bourdieu, Pierre (2016) *Seçilmiş Metinler*, (Çev. Levent Ünsaldı), Ankara: Heretik Yayınları, 3. Baskı.

- Bourse, Michel (2009) *Melezliğe Övgü*, (Çev. Işık Ergüden), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, birinci baskı.
- Boyer, P., Wertsch, J. V. (2015) *Zihinde ve Kültürde Bellek*, (Çev. Yonca Aşçı Dalar), İstanbul: İş Bankası Kültür Yayınları, 1. Basım.
- Bozarslan, Hamit (2004) *Türkiye'nin Modern Tarihi*, (Çev. Heval Bucak), İstanbul: Avesta Yayınları, birinci basım.
- Bulut, Faik (1995) *Ehmedê Xanî'nin kaleminden Kürtlerin bilinmeyen dünyası*, İstanbul: Tüm zamanlar yayıncılık, birinci basım.
- Burke Peter û Hsia, R., Po-chia (2012) *erken modern avrupa'da Kültürel Çeviri*, (Çev. Ferit Burak Aydar), İstanbul: İş Bankası Yayınları, 1. Basım.
- Burke, Peter (2008) *Kültür Tarihi*, (Çev. Mete Tunçay), İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.
- Calinescu, Matei (2013) *Modernliğin Beş Yüzü*, (çev. Sabri Gürses), İstanbul: Küre Yayınları, üçüncü basım.
- Cassirer, Ernst (1980) *İnsan Üstüne Bir Deneme*, (Çev. Necla Arat), İstanbul: Remzi Kitabevi, 1. Basım.
- Celîlê, Celîl (1992) *XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler*, (Çev. Mehmet Demir), İstanbul: Özge Yayınları, 1. baskı.
- Celîlê, Celîl (2001) *Kürt Aydınlanması (Ondokuzuncu Yüzyıl Sonu-Yirminci Yüzyıl Başı)*, (Çev. Arif Karabağ), İstanbul: Avesta Basın Yayın, birinci baskı.
- Cemil Paşa, K. (Zinar Silopi), (1991) *Doza Kurdistan*, Ankara: Özge Yayınları, ikinci basım.
- Césair, Aimé, (2005) *Sömürgecilik Üzerine Söylev*, (Tercüme. Güneş Ayas), İstanbul: Doğu Kütüphanesi.
- Ceyhun, Demirtaş (1993) *Ah Şu Biz Karabıyıklı Türkler*, İstanbul: E Yayınları, birinci basım.
- Chambers, Ian (2014) *Göç, Kültür, Kimlik*, (Çev. İsmail Türkmen ve Mehmet Beşikçi), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, ikinci basım.
- Chirguh, Bletch (2009) *Kürt Sorunu Kökenleri ve Nedenleri*, (Çev. Nihat Nuyan), İstanbul: Avesta Basın Yayın, birinci baskı.
- Cizîrî, Melayê (2010) *Dîwan*, İstanbul: Nûbihar Yayınları, çapa sêyem.

- Collits, Tery (1994) *Theorizing Racism*, London: Routledge (Di nava Describing Empire, Postcolonialism and Textualitiy de).
- Connerton, Paul (1999) *Toplumlar Nasıl Anımsar*, (Çev. Alâeddin Şenel), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, birinci basım.
- Connoly, William, E., (1995) *Kimlik ve Farklılık*, (Çev. F. Lekesizalın), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, birinci basım.
- Coşkun, V., Derince, Ş., Uçarlar, N., (2010), *Dil Yarası*, Diyarbekir: DİSA.
- Cyrstal, David (2015) *Dillerin Katli-Bir Dilin Ölümü Bir Milletin Ölümüdür*, (Çev. Gökhan Cansız), İstanbul: Profil Yayıncılık, birinci baskı.
- Çağlayan, Handan (2014) *Heman Mal Zimanên Cuda*, (wer. Luqman Guldivê), Diyarbekir: Weşanên DÎSAyê, çapa yekem.
- Deane, Seamus (1993) *Milliyetçilik, Sömürgecilik ve Yazın* (Di nav nivîsara destpêkê de), (Çev. Ş. Kaya), İstanbul: Kabalcı Yayınevi, ilk basım.
- Deleuze-Guattari (1990) *Bin Yayla- Kapitalizm ve Şizofreni*, (Çev. Ali Akay), İstanbul: Bağlam Yay, birinci baskı.
- Dêreşî, Seîd (2011) *Dîwana Feqiyê Teyran*, (Amadekar: Seîd Dêreşî), Diyarbekir: Weşinên Lîs, çapa yekemîn.
- Dilgeş, Felat (1998) *Kurdistan (Rojnameya Kurdî ya Pêşî)*, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, çapa yekem.
- Dirlik, Arif (2005) *Postkolonyal Aura: Küresel Kapitalizm Çağında Üçüncü Dünya Eleştirisi*, (Çev. Galip Doğduaslan), İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi, birinci basım.
- Durgun, İ., (2014) *Ulus İnşası ve Milliyetçilik*, Ankara: Binyıl Yayınevi, birinci baskı.
- Dündar, Fuat (2001) *İttihat ve Terakki'nin Müslümanları İskan Politikası (1913-1918)*, İstanbul: İletişim Yayınları, birinci basım.
- Eagleton, T., Jameson, F. û Said, E., (1993) *Milliyetçilik, Sömürgecilik ve Yazın* (Di nav gotara, 'Milliyetçilik: İroni ve Bağlılık' de), (Çev. Ş. Kaya), İstanbul: Kabalcı Yayınevi, ilk basım.
- Eagleton, Terry (2011) *Şiir Nasıl Okunur*, (Çev. Kaya Genç), İstanbul: Agora Kitaplığı, birinci basım.
- Eisensdadt, S. N. (2014) *Modernleşme-başkaldırı ve değişim*, (Çev. Ufuk Coşkun), İstanbul: DOĞUBATI, ikinci basım.

- Ekinci, Tarık Ziya, (2006) *Türkiye'nin Çağdaşlaşması ve Kürtler (Makaleler, Konferanslar, Söyleşiler)*, İstanbul: Peri Yayınları, birinci baskı.
- Emerson, Rupert (1965) *Sömürgelerin Uluslaşması (Asya ve Afrika Halklarının Ortaya Çıkışları)*, çev. Türkkaya Ataöv, Ankara: Türk Siyasi İlimler Derneği Yayınları.
- Epözdemir, Şakir (2015) *Medrese-yên Kurdistanê*, İstanbul: Nûbihar, çapa yekem.
- Eriksen, Thomas Hylland, (2001) *Kültür Terörizmi-Kültürel Arınma Düşüncesi Üstüne Bir Deneme*, (Çev. A. Önder Otçu), İstanbul: Avesta Yayınları, birinci basım.
- Ersanlı, Büşra (2010) “*Türkiye’de Anadil Algısı ve Siyaseti*”, *Eğitim Sen anadili Sempozyumu 2 Bildiriler Kitabı*, Ankara: Eğitim Sen Yayınları.
- Ertürk, Nergis (2018) *Türkiye’de Gramatoloji ve Edebi Modernlik*, İstanbul: İletişim Yayınları, 1. baskı
- Fanon, Frantz (1967) *Toward the African Revolution, (Racism and Culture)*, (Wer bo ing. H. Chevailier), London: Pelican.
- (2007) *Yeryüzünün Lanetlileri*, (Çev. Şen Süer), İstanbul: Versus Kitap, birinci basım.
- (2014) *Siyah Deri Beyaz Maske*, İstanbul: Versus Kitap, 3. baskı
- Ferro, Marc (2002) *Sömürgecilik Tarihi*, Ankara: İmge Kitabevi, birinci basım.
- Foucault, Michel (1987) *Söylemin Düzeni*, (Çev. Turhan Ilgaz), İstanbul: Hil Yayın, birinci basım.
- (1992) *Hapishanenin Doğuşu*, (Çev. M. A. Kılıçbay), Ankara: İmge Yayınları.
- (2000) *Özne ve İktidar*, (Seçme Yazılar-2), (Çev. Işık Özgüden, Osman Akınhay), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 2. Baskı.
- (2006) *Sonsuza Giden Dil*, (Çev. I. Ergüden-T. Birkan), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 1. Baskı.
- (2015) *Bilginin Arkeolojisi*, (Çev. Veli Urhan), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 1. Basım.
- (2015) *Büyük Yabancı-Dil, Delilik ve Edebiyat Üstüne Konuşmalar*, (Çev. Savaş Kılıç), İstanbul: Metis Yayınları, ilk basım.
- Fraser, Nancy (1997) “*From Redistribution to Recognition*”, *Justice Interrupts: Critical Reflection on the ‘Post-socialist’ Condition*, Routledge.

- (2005) “*Kamusal Alanı Yeniden Düşünmek: Gerçekte Varolan Demokrasinin Eleştirisine Bir Katkı.*” Kamusal Alan, Meral Özbek (der.), (Çev. M. Özbek ve C. Balcı), İstanbul: Hil Yayınları, birinci basım.
- Fromm, Eric (1981) *Psikanaliz ve Zen Budizm*, (Çev. İlhan Güngören), İstanbul: Onur Basımevi, 1. baskı.
- Gasset, Ortega, Y., (1995) *İnsan ve “Herkes”*, (Çev. Neyire Gül Işık), İstanbul: Metis Yayınları, 1. Basım.
- Gellner, Ernest (1992) *Uluslar ve Ulusçuluk*, (Çev. Büşra Ersanlı ve Günay Göksu Özdoğan), İstanbul: İnsan Yayınları, birinci basım.
- Georgeon, François (2005) *Türk Milliyetçiliğinin Kökenleri Yusuf Akçura 1876-1935*, (Çev. Alev Er), İstanbul: Tarih Vakfı.
- Giddens, Anthony (2000) *Sosyoloji*, (Çev. H. Özel ve C. Güzel), Ankara: Ayraç Yayınları, birinci baskı.
- (2018) *Modernliğin Sonuçları*, (Çev. Ersin Kuşdil), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, sekizinci basım.
- Gökberk, Macit (1999) *Değişen Dünya Değişen Dil*, İstanbul: Yapı Kredi Yayınları, birinci baskı.
- Günel Tekin, Gülçiçek (2009) *Beyaz Soykırım*, İstanbul: Belge Yayınları, baskı I.
- Günel Tekin, Gülçiçek (2012) *Dilsel Jenosid ve Türkiye’nin Dilkırım Politikaları, (Dinava ‘İnatçı Bir Bahar-Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat’ de)*, İstanbul: Ayrıntı Yayınları, birinci baskı.
- Habermas, Jürgen (2010) “*Öteki*” Olmak, “*Öteki*”yle Yaşamak, (Çev. İlknur Aka), İstanbul: Yapı Kredi Yayınları, birinci baskı.
- Halbwachs, Maurice (2016) *Hafızanın Toplumsal Çerçevesi*, (Çev. Büşra Uçar), Heretik Yayınları.
- Hassanpour, H., (2005) *Kürdistan’da Milliyetçilik ve Dil*, (Çev. İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan), İstanbul: Avesta Basın Yayın, birinci baskı.
- Hegel, Georg, W. F., (1986) *Tinin Fenomenolojisine İlişkin Temel Düşünceler*, (Çev. Nejat Bozkurt), İstanbul: Remzi Kitabevi, birinci basım.
- (2016) *Tinin Görüngübilimi*, (Çev. Aziz Yardımlı), İstanbul: İdea Yayınevi, birinci basım.
- Heidegger, Martin (2018) *Varlık ve Zaman*, İstanbul: Alfa Yayıncılık, birinci baskı.

- Hîngerê Zimanê Kurdî (2008) *Kürt Talebe Hêvî Cemîyeti-İlk Pratîk Kürtçe Öğrenme Kitabı*, İstanbul: bgst Yayınları, birinci basım.
- Hobsbawm, E. J., (1995) *1780'den Günümüze Milletler ve Milliyetçilik*, (Çev. Osman Akınhay), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, ikinci basım.
- Hroch, Miroslav (2011) *Avrupa'da Milli Uyanış, (Toplumsal Koşulların ve Toplulukların Karşılaştırmalı Analizi)*, (Çev. Ayşe Özdemir), İstanbul: İletişim Yayınları, birinci basım.
- Ives, Peter (2011) *Gramsci'de Dil ve Hegemonya*, İstanbul: Kalkedon Yayınları, ilk baskı.
- İmamoğlu, İ. Sıddık, (2016) *Büyük Dini Hikayeler*, İstanbul: Osmanlı Yayınları Fatih Yayınevi, birinci baskı.
- İnce, Özdemir (2002) *Tabula Rasa*, İstanbul: Kültür Yayınları, birinci basım.
- Jameson, Fredric (2008) *Modernizmin İdeolojisi, (Çok Uluslu Kapitalizm Çağında Üçüncü Dünya Edebiyatı)*, (Çev. Kemal Atakay, Tuncay Birkan), İstanbul: Metis Yayınları, ilk basım.
- Jîr, Sîdar (2007) 'Gulê': 'Çîrokên ku Ji Rengê Sor ê Keskesorê Hez dîkin'-nivîsara pêşekiyê-, Diyarbekir: Weşanên Lîsê, çapa yekem.
- Jusdanis, Gregory (1998) *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür, Milli Edebiyatın İcat Edilişi*, (Çev. Tuncay Birkan), İstanbul: Metis Yayınları, birinci basım.
- Jwaideh, Wadie (2009) *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi*, (Çev. İsmail Çekem-Alper Duman), İstanbul: İletişim Yayınları, 6. Baskı.
- Kastoryano, Riva (2000) *Kimlik Pazarlığı, Fransa ve Almanya'da Devlet ve Göçmen İlişkileri*, (Çev. Ali Berktaş), İstanbul: İletişim Yayınları, birinci baskı.
- Kurdo, Qanatê (2010) *Tarixa Edebiyata Kurdî*, Amed: Weşanên Lîs, çapa yekemîn.
- Lacan, Jacques (2012) *Benim Öğrettiklerim*, (Çev. Murat Erşen), İstanbul: Monokl Yayınları, birinci basım.
- (2013) *Psikanalizin Dört Temel Kavramı*, İstanbul: Metis Yayınları, 3. Basım.
- Laleş, Lal (2012) *Türkiye'de Kürtçe Edebiyat, (Di nava 'Înatçı Bir Bahar-Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat' de)*, İstanbul: Ayrıntı Yayınları, birinci basım.
- Larrain, Jorge (1995) *İdeoloji ve Kültürel Kimlik*, (Çev. Neşe Nur Domaniç), İstanbul: Sarmal Yayınevi.

- Lenin, V., İ., (2011) *Seçme Yazılar- Devrim, Demokrasi, Sosyalizm*, (Çev. Sungur Savran), İstanbul: Yordam Kitap, 1. Baskı.
- Loomba, Ania (2000) *Kolonyalizm Postkolonyalizm*, İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Lucy, Niall (2004) ya *Derrida Dictionary, Blackwell*, (Raguhastin: Mollaer, Fırat, (2018), *Kimlik, Tanınma Mücadelesi ve Şarkıyatçılık*, İstanbul: Metis Yayınları, birinci basım).
- Luraghi, Raimondo, (2000) *Sömürgecilik Tarihi*, (Çev. Halim İnal), İstanbul: E yayınları.
- Mackenzie, D. N., (1981) *Kurdish dialect studies*, London: Cambridge University Press.
- Malmîsanij, (2002) *Kürt Talebe-Hêvî Cemîyeti*, İstanbul: Avesta basın yayın, birinci baskı.
- Maruf, A., (1974) *Kürt Dili Hakkında Neler Yazıldı*, Bağdat: Kürt Külliyyatı Yayınları, (Raguhastin: Bulut, Faik, (1993), *Kürt Dilinin Tarihçesi*, İstanbul: Karınca Yayın Dağıtım Pazarlama, birinci baskı.
- Marx, Karl (2007) *Yabancılaşma: 1844 El Yazmaları*, (Çev. Kenan Somer, Ahmet Kardam), Ankara: Sol Yayınları.
- Mem, H., (2002) *Üçüncü Öğretmen Xanî*, İstanbul: İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, birinci baskı.
- Memmi, Albert (1996) *Sömürge ve Sömürgeleştirilen İnsan*, Ankara: Öteki Yayınevi, birinci basım.
- Mill, J. S., (1972) *On Liberty, Utilitarianism, Liberty, (Representative Government)*, London: Dent&Sons.
- Minorsky, V. û Thomas B., (2008) *Kürt Millîyetçiliği*, (Çev. Karahan, E., Akkuş, H. ve Uğrulu, N.), İstanbul: Örgün Yayınevi, birinci basım.
- Minorsky, V., (2004) *Kürtler-Kürdistan*, (Çev.Kamuran Fıratlı), İstanbul: Doz Yayınları, birinci baskı.
- Mitchell, Timothy (2001) *Mısır'ın Sömürgeleştirilmesi*, (Çev. Zeynep Altok), İstanbul: İletişim Yayınları, birinci baskı.
- Mollaer, Fırat, (2018) *Kimlik, Tanınma Mücadelesi ve Şarkıyatçılık*, İstanbul: Metis Yayınları, birinci basım.
- Oğuz, Ayla (2008) *Hanîf Kureishi ve Kara Plak- Göç, Kimlik ve Aitlik Sorunları*, Ankara: Pegem Akademi, birinci baskı.

- Ose, Hoşeng (2012) *Arap Şiiri ve Kültürünün Kürt Şiirinin Üzerindeki Etkisi- İnatçı Bir Bahar-Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat içinde*, (Derleyen: Vecdi Erbay), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, birinci basım.
- Önen, Ronayî (2018) *Ziman Ê Netewesazî (Lêhûrbûnek li Ser Kovara Hawarê)*, Stenbol: Weşanên Peywend, çapa yekem.
- Özkırımlı, Umut (1999) *Milliyetçilik Kuramları: Eleştirel Bir Bakış*, İstanbul Sarmal Yayınları, birinci basım.
- (2010) *Milliyetçilik Üzerine Güncel Tartışmalar: Eleştirel Bir Müdahale*, İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, Birinci baskı.
- Özlem, D., Ateşoğlu, G., (2006) *Tarih Felsefesi / Seçme Metinler (Herder-Kant-Fichte-Schelling-Hegel-Schopenhauer)*, Ankara: Doğu-Batı yayınları, 4. Basım.
- Özsoy, F. ve Eriş, T., (2007) *Öncesi ve Sonrasıyla 1925 Kürt Direnişi*, Stenbol: Weşanên Pêrî, çapa yekem.
- Özyavuz, Tuncer (1997) *Osmanlı-Türk Anayasaları*, İstanbul: Alkım Yayınevi, birinci basım.
- Palmer, Catherine (2000) “From Theory to Practice. Experiencing the Nation in Everyday Life,” *Journal of Material Culture*, Vol. 3 (2) s. 175-199.
- Parla, Jale (2018) *Efendilik, Şarkıyatçılık, Kölelik*, İstanbul: İletişim Yayınları, 7. Baskı.
- Parmaksızoğlu, Burhan (1996) “Tekin alp: Osmanlı İmparatorluğu’nun Son Devrinde Bir Aydın”, İstanbul: TTK Bildiriler, IX.
- Pîrbal, Ferhad (2010) *Rêbazên Edebî*, (wer-lêanîn. Hêvî Berwarî), Dihok: Weşanên Êketiya Nivîskarên Kurd, çapa yekem.
- Renat, Zahar (1999) *Sömürgecilik ve Yabancılaşma*, (Çev. Bayram Doktor), İstanbul: İnsan Yayınları, birinci baskı.
- Ricoeur, Poul (2008) *Çeviri Üzerine*, (Çev. Sündüz Öztürk Kasar), İstanbul: YKY, birinci basım.
- (2012) *Hafıza Tarih Unutuş*, (Çev. M. E. Özcan), İstanbul: Metis yayınları, 1. Basım.
- Sadinî, M. Xalid (2009) *Feqiyê Teyran-Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, İstanbul: Nûbihar Yayınları, çapa sêyem.
- Sadoğlu, Hüseyin (2003) *Türkiye’de Ulusçuluk ve Dil Politikaları*, İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, 1. Baskı.

- Sağrıç, F. H., (2002) *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, çapa yekem.
- Said, Edward (1998) *Kültür ve Emperyalizm*, (Çev. Necmiye Alpay), İstanbul: Hil Yayınları.
- (2000) *Kış Ruhu: Edward Said'den Seçme Yazılar*, (Çev. Tuncay Birkan), İstanbul: Metis Yayınları, birinci basım.
- (2002) *Yenibinyılda Filistin Sorunu*, (Çev. A. Cüneyt) Diyarbakır: Aram Yayınları, birinci baskı.
- (2004) *Yazınsal Eleştiri -Söyleşiler-*, (Çev. Salih Özer), İstanbul: Hece Yayınları, birinici basım.
- (2009) *Başlangıçlar, Niyet ve Yöntem*, (Çev. Ferit Burak Aydar), İstanbul: Mestis Yayınları, birinci basım.
- (2012) *Şarkiyatçılık, (Batının Şark Anlayışları)*, (Çev. Berna Ülner), İstanbul: Metis Yayınları, altıncı basım.
- (2019) *Sürgün Üzerine Düşünceler*, (Çev. Salih Özer), İstanbul: Hece Yayınları, 2. Baskı.
- Samur, Azîz (2012) *Destana Zembîlfiroş û Gulxatûn*, (Berhevkar. Azîz Samur), İstanbul: Nûbihar Yayınları, çapa yekem.
- Sapir, Edward (1999) *Yirminci Yüzyıl Dilbilimi, Dilbilim*, (Çev. Emel Ergun), İstanbul: Multilingual Yayınları, birinci basım.
- Schnapper, Dominique (2005) *Sosyoloji Düşüncesinin Özünde Öteki ile İlişki*, (Çev. Ayşegül Sönmezay), İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.
- Sebrî, Osman (2011) *Hevalê Çak*, Diyarbakır: Weşanên Lîs, çapa yekemîn, çapa yekem.
- Shiva, V., (1993) “*Decolonizing the North*”, London û New Jersey: Zed Books.
- Smith, Anthony D., (1994) *Millî Kimlik*, (Çev. Bahadır, Ş.), İstanbul: İletişim Yayınları, 1. Basım.
- (2002) *Ulusların Etnik Kökeni*, (Çev. Sonay Bayramoğlu, Hülya Kendir), Ankara: Dost Yayınları, birinci baskı.
- Somay, Bülent (2008) *Çok Bilmiş Özne-Madunların Küstahlığı*, İstanbul: Metis Yayınları, birinci basım.
- Spivak, Gayatri, Chakravorty (2016) *Madun Konuşabilir mi*, (Çev. D. Hattatoğlu-G. Ertuğrul-E. Koyuncu), İstanbul: Dipnot Yayınları, 1. Baskı.

- (2017) *Yapısöküm, Postkolonyalizm, Madunluk*, (Çev. Soner Torlak), İstanbul: Zoom Kitap, birinci basım.
- Strauss, C. Lévi (1997) *İrk, Tarih ve Kültür*, (Çev. Haldun Bayrı), İstanbul: Metis Yayınları, üçüncü basım.
- (2013) *Mit ve Anlam*, (Çev. Gökhan Yavuz Demir), İstanbul: İthaki Yayınları, 1. basım.
- (2016) *Hüzünlü Dönenceler*, (Çev. Ömer Bozkurt), İstanbul: Yapı Kredi Yayınları, 1. baskı.
- Şeker, B. D., Sirkeci İ., Yücesahin M., (2015) *Göç ve Uyum*, London: Birleşik Krallık, ikinci baskı.
- Tan, Samî (2011) *Rêzimana Kurmancî*, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, çapa duyemîn.
- Taylor, Charles (1996) “*Tanınma Politikası*”, *Çokkültürcülük*, (Haz. Amy Gutman), (Çev. Yurdanur Salman), İstanbul: YKY, birinci basım.
- Tekinalp, Munis (2001) *Türkleştirme*, Ankara: Kültür Bakanlığı Yayınevi.
- Thiong’o, Wa Nigũgĩ (2017) *Zihni Sömürgeden Azad (Afrika Edebiyatında Dil Politikası)*, (Çev. Şebnem Mantu), Ankara: Hece Yayınları, birinci basım.
- Tosun, Necip (2011) *Modern Öykü Kuramı*, İstanbul: Hece Yayınları, birinci basım.
- Uygur, Nermi (2001) *Dilin Gücü*, İstanbul: Yapı Kredi Yayınları, ikinci baskı.
- (2003) *Kültür Kuramı*, İstanbul: YKY Yayınları, birinci basım.
- Ürer, Levent (2003) *Azınlıklar ve Lozan Tartışmaları*, İstanbul: Derin Yayınları, birinci basım.
- Üstel, Füsun (1997) *İmparatorluktan Ulus-Devlete Türk Milliyetçiliği: Türk Ocakları (1912-1931)*, İstanbul: İletişim Yayınları, birinci basım.
- Wagner, Peter (2005) *Modernliğin Sosyolojisi; Özgürlük ve Cezalandırma*, (Çev. Mehmet Küçük), İstanbul Ayrıntı Yayınevi, birinci baskı.
- Weinstein, Brian (1979) “*Language Strategists: Redefining Political Frontiers on the Basis of Linguistic Chocies*”, *World Politics*, Cambridge Univesity Press, Stabl URL: <http://www.jsotr.org/stable/2009993> (dema daxistinê: 18/08/2018).
- Xanî, Ehmedê (2008) *Mem û Zîn- Hemû Berhem*, Diyarbakır: Lîs Basın Yayın, çapa yekem.

- Yeğen, Mesut (2009) *Müstakbel Türk'ten Sözde Vatandaşa*, İstanbul: İletişim Yayınları, 2. Baskı.
- (2011) *Devlet Söyleminde Kürt Sorunu*, İstanbul: İletişim Yayınları, birinci basım.
- Yıldırım, Kadri (2010) *Ehmedê Xanî-Mem û Zîn-Çeviri ve Kavramsal Tahlil*, İstanbul: Avesta Basın Yayın, birinci baskı.
- Yıldız, Ahmet (2007) “*Ne Mutlu Türkm Diyebilene*” *Türk Ulusal Kimliğinin Etno Seküler Sınırları, (1919-1938)* İstanbul: İletişim Yayınları, ikinci basım.
- Yücel, Clémence Scalbert (2018) *Kürt Edebiyatının Anatomisi*, (Çev. Yeraz Der Garabedyan), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, birinci basım.
- Zaza, Nûredîn (2007) *Gulê*, Diyarbakır: Lîs Basın Yayın Pazarlama, çapa yekem.
- Zehar, Renat, (1999) *Sömürgecilik ve Yabancılaşma*, (Çev. Bayram Doktor), İstanbul: İnsan Yayınları.
- Zeraq, Dilawer (2012) *Çağdaş Kürt Öykücülüğünün Nabzı, (Di nava ‘Înatçı Bir Bahar-Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat’ de)*, İstanbul: Ayrıntı Yayınları, birinci basım.
- (2014) *Rajena Kurdî-Nivîsarên Libarey Ziman û Wêjeyê*, Diyarbakır: Weşanên Lîsê, çapa yekemîn.
- (2018) *Bêjara Neteweparêz di Kovara Hawarê de*, Diyarbakır: Weşanên Lîs, çapa pêşîn.
- Zêrevan, Arif (2007) *Dîwan-Melayê Cizîrî*, (Transkripsiyon. Arif Zêrevan), Hewlêr: Aras, çapa yekê.
- Zinar, Zeynelabîdîn (2012) *Kürt Medresesin'nin Kürt Edebiyatındaki Rolü- Înatçı Bir Bahar-Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat içinde*, (Derleyen: Vecdi Erbay), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, birinci basım.

Kovar:

- Akin, Salih (2007) *‘Fêrkariya Kurdî ya Taybet li Tirkiyeyê: Pirsgirêk û pêşbînî’*, Stenbol: Kovara Zend, hej, 5, Zivistan.
- Alan, Remezan (1997) *‘Mem û Zîn ve Edebiyatımızdaki Yeri’*, İstanbul: Kovara War, hejmar 1, havîn.

- Aydoğan, Îbrahîm Seydo (2009) '*Celadet Bedirxan, çavkaniyên Hawarê û kurdîyatiya nû*', Stenbol: Kovara Zend-rêzepirtûk, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, hejmar 12, havîn.
- Azîzan, Herekol (1986) *Hawar*, Stockholm: Weşanên Nûdem, cild II, hej. 33.
- Bakî, Hamdulah (1997) '*Serdestiya Cewrikan*', Stenbol: Kovara Jiyana Rewşen, hej 9, Pûşber.
- Barnas, Rojen (1979) '*Ez Mendaleki Çar Sali me, Mamo!*', İzmir: Kovara Tîrêj, hej, 1.
- Bayrak, Mehmet (2013) '*Şükrü Kaya ve Gizli Türkleştirme Genelgesi*' (1930), Kürt Tarihi, Mayıs, sayı, 6.
- Bedirxan, Salih (2002) '*Berî Şûr Qelem*', Rojî Kurd (1913), Îstenbol: Weşanên War, çapa yekem.
- Bereh, Berken (1979) '*Jî ba me rê diçe xweşitiyê*', İzmir: Kovara Tîrêj, hej, 2.
- Boleli, N., Ertekin, N., (2017) *Ferhengên Menzûm Di Edebiyata Kurdî De*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Kasım, cilt: 3, sayı: 5.
- Bozarslan, M. Emin (1985) *Kovara Jîn- "Jîn" Dergisi Üzerin Genel Bilgiler, Kurdî-Tirkî, Kürdçe-Türkçe Dergi*, (1918-1919), (Werger ji tîpên Erebi bo tîpên Latîni, M. Emîn Bozarslan) Upsala Weşanên Deng, Cild: I-II-III-IV-V.
- Cevdet, Abdullah (2002) '*Bir Hitap*', Rojî Kurd (1913), Îstenbol: Weşanên War, çapa yekem.
- Cevdet, Abdullah (2002) '*İttihad Yolu (Birlik Yolu)*', Rojî Kurd (1913), Îstenbol: Weşanên War, çapa yekem.
- Çelebi, Vedat, (2000) '*Michel Foucault'da Bilgi, İktidar ve Özne İlişkisi*', Sosyal ve Beşeri Bilimler Dergisi, Cilt, 5 no, 1.
- Çiçek, Cuma (2008) '*Zimanek Çima Tê Qedexekirin?-Dagirkerî, Netewe-Dewlet û Polîtîkayên Zimanî*', Zend Rêzepirtûk, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê.
- Çiyayî, Dost (2000) '*Baz*', Stenbol: Kovara Jiyana Rewşen, hej 41, Pûşber.
- Dilgerm, Dara Azadî (1992) '*Pevçûn*', Stenbol: Kovara Rewşen, hej, 2, Adar.
- Eksen, Berçem (1994) '*Vejîna Teralekî*', Stenbol: Kovara Rewşen, hej, 18-19, Berfanbar.
- Espar, J., (1996) '*Çend Nuştey û Kitabê Kirdkî*', Stenbol: Kovara Zend, Hejmar 1, Payîz.

- Farqînî, Zana (1996) *'Navê Stranan'*, Stenbol: Kovara Jiyana Rewşen, hej, 3, Berfanbar
- (1997) *'Di kurmancî de erk û fonksiyona 'di'yê'*, Stenbol: Kovara Zend, Payîz 1997, hejmar 3.
- (2008) *'Zimanê Wêjeya Klasîk ya Kurdî'*, Stenbol: Kovara Zend, Payîz 2008, hejmar 10.
- Fîkrî, Lûtfû (2002) *"Kürd Milliyeti"*, Îstenbol: Rojî Kurd, çapa yekem.
- Hakkî, İsmail Babanzade (2002) *'Kürdlüğün Taelisi'*, Rojî Kurd (1913), Îstenbol: Weşanên War, çapa yekem.
- (2002) *'Kürdlük ve Müslümanlık'*, Rojî Kurd (1913), Îstenbol: Weşanên War, çapa yekem.
- Hawar, (1998) Stockholm Weşanên Nûdem, Cild I, II.
- Hekarî, E. Rehmî (1985) *'Memê Alan'*, (1918-1919), (Werger ji tîpên Erebi bo tîpên Latîni, M. Emîn Bozarslan) Upsala Weşanên Deng, Cild: IV-V).
- Işık, Ayhan (2016) *'İttihatçı 'Bir Kürd', Abdullah Cevdet'*, İstanbul: Kürt Tarihi Dergisi, sayı 25, Temmuz-Ağustos.
- Işık, Ayhan û Arslan, Serhat (2012) *'Bir Asimilasyon Projesi: Türkiye'de Yatılı İlköğretim Bölge Okulları'*, İstanbul: Toplum ve Kuram, hej, 6-7, Zivistan-Bihar
- İlter, Tuğrul (2006) *'Modernizm, Postmodernizm, Postkolonyalizm: Ben-Öteki İlişkileri ve Etnosantrizm'*, Küresel İletişim Dergisi, Sayı, 1.
- İplikçi, Alper (2017) *'Kolonyalizm ve Emperyalizm Üzerine Bir Değerlendirme'*, Erzurum: Atatürk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, Aralık 2017 21(4):1527-1540.
- Jîn, (1986) *Kovara Kurdî-Tirkî, Kürdçe-Türkçe Dergi*, (1918-1919), (Werger ji tîpên Erebi bo tîpên Latîni, M. Emîn Bozarslan) Upsala Weşanên Deng, Cild: I-II-III-IV-V, çapa yekem.
- Jiyan, Rênas (1997) *'Dê Ê Law'*, Stenbol: Kovara Jiyana Rewşen, hej, 14, Berfanbar.
- (2000) *'Hebhinarkê'*, Stenbol: Kovara Jiyana Rewşen, hej 40, Avrêl.
- Jusupova, J. A., (1993) *'Golos Kurda (Dengê Kurdan)'*, Weşana Navenda Çanda Kurdî ya Moskovayê, (Çev. Pelin Zerdali-Serdar Dicle), Medya Güneşi, Pûşpera 1993yan, hejmara 1.

- Kavak, Abdulcebbar (201) *'Melayê Cizîrî Ve Tasavvufî Kürt Edebiyatının Gelişim Dönemi'*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Kasım, cilt: 1, sayı: 2.
- Kayan, Zahir (1996) *'Arzeba -I-'*, Stenbol: Kovara Jiyana Rewşen, hej, 1, Kewçêr.
- Kiraz, Sibel (2011) *'Yabancılaşmanın Kökeni Üstüne'*, FLSF (Felsefe ve Sosyal Bilimler Dergisi), Güz, sayı 12.
- Koca, Selçuk Kürşad (2010) *'Genel Hatları İle Kültür Ve Sembol İlişkisi'*, Sakarya: Sakarya Üniversitesi Fen Edebiyat Dergisi, II, sayı, 16.
- Kubilay, Çağla (2004) *'Türkiye'de Anadillere Yönelik Düzenlemeler ve Kamusal Alan'*, İletişim Araştırmaları Dergisi, sayı 2, c, 2.
- Mahsûm, Amed (1998) *'Çûyîn an jî Mirin!'*, Stenbol: Kovara Jiyana Rewşen, hej 23, Rezber.
- Mehmed, Osman (2000) *'Xezal Ba Radimûse'*, Stenbol: Kovara Jiyana Rewşen, hej 44, Rezber.
- Mesud, Süleymaniyeli (2002) *"Herflerimiz ve Okuma Kolaylığı"*, Rojî Kurd, Îstenbol: Weşanên War, çapa yekem.
- Modanî, X. (2002) *'Ziman û Nezaniya Kurdan'*, Rojî Kurd (1913), (Werger û tîpguhêzî. A. Meretowar-C. Amedî-S. Azad Aslan), Îstenbol: Weşanên War, çapa yekem.
- _____ (2002) *"Hewar û Fîzar Misilmanî"*, Rojî Kurd (1913), Îstenbol: Weşanên War, çapa yekem.
- _____ (2002) *"Ziman"*, Rojî Kurd (1913), Îstenbol: Weşanên War, çapa yekem.
- Necdet, Fikrî Diyarbekirî, (2002) *'Erdê ê Me'*, Rojî Kurd (1913), (Werger û tîpguhêzî. A. Meretowar-C. Amedî-S. Azad Aslan), Îstenbol: Weşanên War, çapa yekem.
- Nemir, Kawa (1997) *'Bîşeng û Siya Werzeba'*, Stenbol: Kovara Jiyana Rewşen, hej 9, Pûşber.
- Ozer, Îlhamî (1999) *'Pêdiviya Tazî'*, Stenbol: Kovara Jiyana Rewşen, hej 26, Rêbendan.
- Öpengin, Engin, (2014) *'Kadim Kürtçenin İzinde-Tevatür ve Temellük Kıskaçında Kürt Kültür Tarihçiliği'*, Kürt Tarihi Dergisi, Şubat-Mart, sayı 11.
- Qedrî, Mamoste (1996) *'Dîroka zimanê kurdî ya nivîskî û perwerdeyî ya di konseptê medreseyê de'*, Stenbol: Kovara Zend, hejmar zivistan 06.

- Rehmî, A. (1986) *Kovara Jîn, Kurdî-Tirkî, Kürdçe-Türkçe Dergi*, (1918-1919), (Werger ji tîpên Erebi bo tîpên Latîni, M. Emîn Bozarslan) Upsala: Weşanên Deng, Cild: I, hej, 1, çapa yekem.
- Resûl, Îzzeddîn Mistefa (1998) '*Feqiyê Teyran (Jîyan û Berhemên wî)*', Kovara War, hejmar 3, zivistan.
- Rewşen, (1991-1996), *Kovara Çandê*, Stenbol: Navenda Çanda Mezopotamyayê, hej, ji 1ê heta 23yan.
- Rewşen-Name (2003) *Kovara Wêjeyî, Çandî û Hunerî*, Stenbol: Weşana NÇMyê-Berdan matbaacılık, hejmar, 1-2-3.
- Ronahî, Şemsettîn (1992) '*Ziman û Bîrdozî*', Stenbol: Kovara Rewşen, hej, 8, Mijdar-Berfanbar.
- Sağnıç, F. Huseyn (1994) '*Çarşem*', Stenbol: Kovara Rewşen, hej, 12, Sibat.
- Salar, Feridun (1979) '*Car Zane, Zêr Zane, Zor Zane...*', İzmir: Kovara Tîrêj, hejmar 1.
- Spivak, Gayatri, Chakravorty (2010) '*Yeni Madun: Ses-siz Bir Mülakat*', İstanbul: Toplumbilim Dergisi, sayı 25.
- Şefiq, M., (1979) '*Kuda Dışın*', İzmir: Kovara Tîrêj, hejmar 1.
- Şengül, Serdar (2016) '*Melayê Cizîrî Ve Diwan Okuma Geleneği*', Uluslararası Kıbrıs Üniversitesi, Folklor Edebiyat, cilt: 22, sayı 86.
- Temo, Fuat (2002) '*Çîrok*', Rojî Kurd (1913), (Werger û tîpguhêzî. A. Meretowar-C. Amedî-S. Azad Aslan), İstanbul: Weşanên War, çapa yekem.
- Timuçin, Afşar (1992) '*Yabancılaşma Sorununa Genel Bir Bakış*', Ankara: Felsefe Dünyası Dergisi, Türk Felsefe Derneği Yayını, sayı 5.
- Tîrêj, (1979) *Kovara Çandî û Pişeyî*, İzmir: Doğan Basımevi, hej, 1, 2, 3, 4.
- Turanlı, Gül (2017) '*Edward Said'in Oryantalist Söylem Analizi*', Şarkiyat Mecmuası, sayı 30.
- Varol, Murat (2015) '*Zaza Edebiyatında Tîrêj Dergisinin Yeri*', Mardin: Mukaddime Dergisi, Artuklu Üniversitesi Yayınları, (6), 1.
- X. M., (2002) '*Bextreşî û Mehrûmîya Kurdan*', Rojî Kurd (1913), İstanbul: Weşanên War, çapa yekem.
- Yetişkin, Ebru (2010) '*Postkolonyal Kavramlar Üzerine Notlar*', İstanbul: Toplumbilim Dergisi, 25.

Zinar, Hesên (1996) 'De Were Nazên', Stenbol: Kovara Jiyana Rewşên, hej 1, Kewçêr.

————— (1997) 'Dilekî ji nû ve şiyarbûyî', Stenbol: Kovara Jiyana Rewşên, hej 4, Rêbendan.

Ferheng:

Botî, Kamêran (2007) *Ferheng, Kurdî-Kurdî*, Stenbol: Weşanên Do, çapa yekem.

Farqînî, Zana (2004) *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, çapa yekem.

Püsküllüoğlu, Ali (2012) *Türkçe Sözlük*, Ankara: Arkadaş Yayıncılık, birinci basım.

Saadallah, Salah (2000) *Ferhenga Îngilîzî-Kurdî ya Selahedîn*, İstanbul: Avesta Basın Yayın, birinci basım.

Çavkaniyên Înternetî:

Koyî, H. Qadir (2004) 'Dîwan', Stockholm, Weşanxane Nefel, Sandfjärdsgatan, 10,11 tr. çapa dijital, http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/haci_qadire_koyi_diwan_02.pdf?NR:79, (Daxistina Dawî: 6.11.2019).

Hut, Davut (2016) 'Osmanlı Arap Vilayetleri, Arabizm ve Arap Milliyetçiliği', Vakaniyüs, Uluslararası Tarih Araştırmaları Dergisi/International Journal of Historical Researches, Yıl/Vol.1, Ortadoğu Özel Sayısı/Special Issue on the Middle East, <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/228072>, (Daxistina dawî: 18.10 2019,).

Dirlik, Arif (2003) 'Global Modernity?: Modernity in an Age of Global Capitalism, *European Journal of Social Theory*' 2003; 6; 275 https://www.academia.edu/5434256/Global_Modernity_Modernity_in_an_Age_of_Global_Capitalism, (Daxistina dawî: 28.10.2019).

Karadeniz, Ali (2015) 'Bersîsê Abid û Faust', <https://www.alikaradeniz.org/bersiseabid>, (Daxistina Dawî: 21.10.2019).

Yetişkin, Ebru (2013) 'Postkolonyal Düşünce ve Madun Çalışmaları'ndan Neler Öğrenebiliriz', Ankara: 13. Ulusal Sosyal Bilimler Kongresi Bildirisi, (4-6 Aralık 2013, Türk Sosyal Bilimler Derneği), <https://www.academia.edu>, (Daxistina Dawî: 24.08.2019).

Raková, Zuzana (2016) '*Çeviri Kuramları*', (Çev. Yusuf Polat), Ankara: Elektronik
PDF-Çevirmen Yayını,
<https://digilib.phil.muni.cz/data/handle/11222.digilib/130676/monography.pdf>,
(Daxistina dawî: 21.10.2019).
www. tr. m. wikipedia. org., (Dema jêwergirtinê: 27-03-2019).

Kişisel Bilgiler

Soyadı, Adı : Döğ r Dilaver
Uyruđu : T.C.
Doğum Tarihi ve Yeri : 05/03/1965, Silvan

Eğitim

Derece	Eğitim Birimi	Mezuniyet tarihi
Doktora		
Yüksek lisans	Y.Y.Ü. Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Bölümü	
Lisans	Dicle Üniversitesi, Eğitim Fakültesi, Matematik Ana Bilim Dalı/	07/10/1985

İş Deneyimi

Yıl	Yer	Görev
30	Diyarbakır	Matematik Öğretmenliği

Yabancı Dil

İngilizce

Yayınlar

.....

Hobiler

.....